


A black and white photograph of a mountainous landscape. The mountains are covered in dense vegetation, and the sky is bright. In the foreground, there is a small, thin tree on the right side and a large, light-colored rock on the left side.

Suhrab Tahîr

DU EVÎNDAR,
DU GULLE



Suhrab Tahîr û Ahmedê Hepo

Suhrab Tahîr

Du evîndar, du gulle (roman)



Unsîyyet
Bakû – 2008

Wergerandin ji azerbaycanî:

Ahmedê Hepo

Rêdaktor: Fexreddînê Muzaffer

Rêzkarê tîpên kompûtêrê: Ofeliya Mecîd

Rastkar: Sêymûrê Edîl

Hol, qesira ku, çêker, avayîker bi destemelî, bi meremê qenc, bi paqîşî şev-roj diçerçire ava dike, hunermendê ku, ji dil efrandarîkê diefrîne sal, zeman derbazbûnê ewa daha giran, daha zêde cîyê xwe digire û tê hêjandinê çawa peykelê dîrokê.

Gava torîvan Suhrab Tahîr ev karpêka bona heqîyê, bona dostîyê efrandinê, nivîsînê diqewime qe xwe jî nizanbûye, wedeyê bê ewê bi kurdî bê xwendinê û wê bibe pirtûkeke zernebûyî.

Xwendevanê bi rûmet !

Tu jî têkeve nava vê hol, qesirpirtûkê, bini-hêre qe çi heye, çi tune?

Çarenûsa xerîbîyêva hilatî

Karwanê ku, ewa heftêkê rê diçe, dîcedîne bigihîje avê, digihîjê; firinda ku, ewa çend sehetê nava erşê ezmînda difire, dîcedîne bigihîje menzîla xwe, dakeve erdê, dadikeve; lê ew mirovê ku, bêgav dimîne, ji mal-malbêta xwe, ji war-warkozê xwe, ji cîyê lêhatîye dunê, li cîyê ku, dayîkê hêleçana wî hejandîye, jêra "lûr, de lûr, berxê min, hêmin razê" gotîye, derkebe, lê careke mayîn, hetanî rojên kalbûna xweyê kûrda, nikaribe vegere wan derên hesretî, jêra çi bêjin, çi navî lêkin? Bêjin perşkesto, dilêşo? Lê ça-wa usa bêjin, ne ew kes jîyanê da, civakîyê da cîyê xweyî hêle girtîye, bûye yekî navdar. Serbarê serda, hinek çavnebarîya wî dîkin, lê kesek nizane, wekî ew kere-ker, hey xwera dibêje: "Mirovno, xwezilbûna xwe bi min neynîn, çarenûsa min xerîbîyêva hilatîye"

Xwendevanên rêzdar!

Ev hevokên bargiran derbarê helbestvan, nivîskar, rojnamevan, ji sala 1958-a Endamê yekîtiya nivîskarên Azerbaycanê, karkarê çanda Azerbaycanê, helbestvanê gel, yê xwedanê gellek xelatên bi rûmet, Suhrab Tahîrdaye.

Suhrab Tahîr Ebulfêz oxlû 27 gulanê sala 1926-a li Azerbaycana Başûr, bajarê Astarayê hatîye dunê.

Suhrabê tîfal mekteba navînda xwendinê, bona tevgelîya heja azadarîyê, serwêrtîya şahtîyê mal-

beta wana nefî dikine Kêrmênşahê. Li nefîkirinê da ew çend sala tevî bavê xwe, şîrketa neftêda karê dike.

Sala 1943-a, gava leşkerê Sovêta berê, dikebe Îranê, mecal tê sazîkirinê, malbeta wana cîguhastî Tebrîzê dibe. Li vira Suhrabê lawanî hedexanêda çawa kewaker dixebite.

Sala 1946-a li Azerbaycana Başûr hukumeta netewî hatinê damizrandinê, Suhrab Tahîr dişîninê Azerbaycana Sovêtê, bajarê Bakûyê xwendinê. Li vira dest bi rewşa jîyana wîye duda dibe. Ew xwendina bilind destdîne, bi serfinîyazî karên cuda-cuda da karê dike.

Her ku, sal ser Suhrab Tahîra tîr derbaz dibin, derd-kulên kişandî, rev-bez, nefîkirina dîtî, hizkirina cî-warên kal-bavan, mîna kozîyên êgir nava ruhê wîda gur dibin, hev dialin, hiş-sewdayê wî disotînin û rojekê qelema ji çekê tûj-kûr hildide, van gişkan dike rêzên helbestan û sala 1949-a helbesta xweye yekemîn dide weşandinê.

Ji wê rojêda helbesta pey helbestan, karpêka pey karpêkan, gotaran dor bi dor dinivîse, diefrîne, dinitirîne.

Ew nava efrandariya helbest û poyêmada hîl-nayê, dest davêje nivîsara serhatîyan, povêstan û romanên. Di nava wan da hinekî kesera dil bi firetî avreşîn dike. Kesera dilê wî, hesreta kişandî, xerîbîya dîtî ewe, wekî welatê wî di avbeza dîrokêda kirine du beşa. Yek jî pey hilweşandina hukumeta Azerbaycana Başûr ew nikare vegere warê kalbavên xwe.

Lema jî di rûpêlekî vê pirtûkêda bi dilêşî dinivîse:

"Ew kesên ku, ji gerdûnê, ji dunê, yanê jî, ji der-doran, ji welatê xwe dibe, ew pirr cara belengaz, hişkolekî, bê wate tê kivşê."

Belê, Keko, usane! Lê di alîyê derdkêşîya Welatda cudatîya me heye. Him nava welatê teda, him nava welatê mînda konê reş vegirtine.

Lê çîye sedem, menîya nava me kurdanda vegirtina konê reş? Kurt bi çend hevoka bidime kivşê. Sedemek dujmine. Em ya dujmin rind zanin, rind tê derdixin, xilta dilê wan bi xweşî nayê hildanê.

Sedemê duda, ne yekîtî, bê yekîtîya meye. Xwezila ji giramêra kurdî ji pêşîya gilîyê Yekîtîyê – daçekên "Ne" û "Bê" bihata derxistinê; bima yekîtî û ew yekîtî bibûya para gelê pîrmîlyon.

Em dixwezin vê nêt-daxweza xwe bi rêzeke dramatûrg û helbestvanê Îngîlîs Û. Şekspir makkin, ew dibêje, wekî agir, êgir dadîqurtîne. Em ji wî agirîne, wekî xwe, xwe dişewitînin!

Camêro, tu dubare dikî gazî, ez çarbare dikime hewar! Tu dilêşê du beşê welatî, ez nexweşê çar beşame!

Hevalo, tera du kon, yek sipî, yek reş vegirtine. Ya sipîda govenda azayê, serbestîyê hatîye girtinê, ya reşda heqî destê neheqîyêda dike zare-zar, lema jî tu him şayî, him posîdeyî.

Hogiro, rind bizanbe ez xweşîya xwe bi te naynîm, lê ez çawa bikim, gava çar konên reş li welatê kal-bavan, dê-pîrên min da bi zorê vegirtine, ji her çaran nalîn, kizîniya dilê nijadên min digihîje erşê ezmîn! Le ez bawerîya xwe unda nakim, zû, yanê dereng neheqîyê, ber heqîyê mîna xeleqên zincîra zeng girtiye rizîyayî wê hûrxaşbe!

Xwendevanên birêz!

Di nava efrandarîya xwe da Suhrab Tahîr çawa kesayet, bê xem ser çaranûsa gelê cîran-kurdanra derbaz nabe. Yek jî, çawa ew bi xwe dibêje, kurdan di nava jîyana malbeta wanda weynekeke mezin lîstîye, rojên nefikirinêye reşda, kurdan piştovanî li wan kirîye. Nan-xoya xwerî bîr nake! Minaka wê yekê romana destê wedaye.

Dostîya gelê Azerbaycanê – Kurdan, ya bi hezar salan, beqî nîgara Azerî, Îzo, lê mixenetîya dujmin beqî sîyaseta serkarên hukûmet û dewletê, yên zênkor, dûrnedîtî û beqî virîşikên bin destên wan, dertê holê.

Min du merem danî pêşîya xwe û bi dijarî, bi keda giran ev pirtûk ji Azerbaycanî wergerande zimanê kurdî. Meremê yekemîn ew bû, bila xwendevanên kurd pira dostiyêra derbazbin û efrandarîya dos-tê gelê kurd, yê hêja Suhrab Tahîra bibine nas.

Ya duda, dixwest çiqas ji min bê, dewlemendîya zimanê kurdî bidime kivşê. Gava mirov biçerçire, xwîdanê bide rêtinê, tuyê binihêrî her zimanek di hindava xwe da dewlemende, her dimîne tu li gilî-gotin, peyivînê xwe xwedî derkebî, hêmin pey hineka neşiqitî, neşimitî !!

Ahmedê Hepo,

Nivîskar, Endamê

Yekîtiya nivîskarên Azerbaycanê.

Beşa yekemîn

Wê rojê Azerî bi zexmandina hevalê xweyî mekteba leşkerîyê Kuvserî hatibû horga reqsê. Gişk direqisîn. Lê ewî şîbaqêra li xwendevanên mektebê, yên ku hewşêda diwerzîyan, mêze dikir. Ewî bi xwe jî nizanibû, çima ew li vê horga şên awa posîdeye. Diqewime ew mînanî yên mayîn nikare şabe, lema usa posîdeye? Lê te qey digot, ev posîdebûn, hinekî jî, ji çavnebarîyê bû.

Berxana mektedê, ya fireye bi ronahî, mîna horga reqsê bû. Raste, li vira raxerê mermer kirî, perdên hevirmiş, çirayê bi şewq-şemal tune bûn, lê bona cîwanê bizotî, yên ku fitil didane xwe, reqis dikirin, ber çavên wan cîkî mîna barîgehan fire bû.

Bi destûra serkarê mekteba leşkerîyê û bi qayîlbûna serwêrê mekteba Şahpûrêye navîn, dem bi dem li berxana mezin, horga reqsê dihate amedekirinê. Bi nêta şah gotî cîwan bi ruhê nûhva bê-ne torekinê, nêzikî hev bibin, bona bikarbin paş-demîyê çerxa memleketêye aborîyê û serwêrîtiya eskerîyê destên xweda xweyîkin, pêwîste naha da hevra bibine nas, dost û lap bizewcin jî.

Qamê reqsêyî, ku li wî serê berxanê bi heyte-hol, ji alîyê serbazada dihate lêdanê, te qey digot, xweşa gişkan dihat. Ev qam "Tango"-ya almana bû. Azerî reqs nedikir, lê ev miqam xweşa wî dihat. Ewî carna bin lêvava dikire vinge-ving û ev qam lêdida.

Wê demê hemû tişt almanî dihate kirinê. Kirîn-firotan, aborî, perwedekirina eskerîyê, kinc xwekirin, modawarî. Ji hemû vîtrînê dikana wêneyê ak-trîsên almana, yên bi ken, dihatine xanê kirinê.

Te tirê ji şûşên fotoaparatan cesûsên almana dihatine kivşê. Gotegotên derewîn hatibûne belakirinê, wekî ser bingeha dîndariya îranîya, xwedêgiravî Hîtlêr "Hêydere", zûva hîvîya wî bûn, ew îmage. Ew tê, wekî Îranê ji zulmê, ji hemû neartîya bide xilaz kirinê.

Orkêstr "Fokstrot"-a almana lêdida. Li wir kêçikeke reng zerîn sekinî bû. Kincên li wê mîna kincê şagirtên mektebên almana bû. Ewê tevî xwendevanekî jarikî bejin bilind diaxifî. Ew xwendevanê mekteba leşkerîyê, yê kûrsa dawîyê Kuvserî bû. Çavên keçikêye bedew hey-hey direqisîn. Li ser nêrînên wê gişk heyr-hejmekar mabûn. Porê mîna pêlên avê serhevra derbaz dibûn, çawa guşiyên tirîyaye karîbar daliqîbûne ser piştê. Berustuyê sipîyî mîna berfê, ya ku kincê mektebêva hatibû dirûnê, rewş, nûrşemal dida dêmê wê. Lê te hew dizanibû ev kêçika, ku bi kirinên xweva, bi bedewîya xweva ji hevalan dihate cudakirinê, xweşa Azerî nedihat. Lê di alîyê dinêda, dilê xweda çavnebarîya Kuvserî dikişand, yê ku şîrîn-şîrîn vê kêçika rindikra diaxife. Ne, li cîyê civakî keçikên awaye serbest xweşa tu kesî nayê. Li vira tenê "Tango"-ya almana dihate lêdanê û serbarê serda cîwana dicedandin têkebine rewşa Avropîyan, wan bidine kivşê, ji cî-war, erf-edetên kal-bavan dûrkevin. Ev yek mîna nexweşîke xirab nava gişkada bela dibû, hêdî-hêdî gişk dihingavt. Lê Azerî usa dişêwand, wekî ev nexweşîya nûh li vira, ji gişkan gellektir li bejin-bala kêçika rengzerîn û Kuvserîyê, ku wêra di axife, tê. Hema bona vê yekê ji

çavnebarîke ecêb ew hingavtibû. Te qey digot ew
hatiye nêreng kirinê û xwe bîr kirîye, wekî ewî li
kêderêye. Vê gavê ewî nêrînê keçika rengzerîn li
ser deremê rûyê xwe seh kir. Ewî vegeirî li wê
nihêrî. Nêrînên wan ketine ser hev. Te hew
dizanibû li berxanê hemû tişt helîya, dengê
orkêstrê hate birinê, der-dor hate sor kirinê.
Perdên sipîye li şîbaqê jî ketine rengê porê wê
keçikê. Tenê jî dûr, lap dûr dengê gopalê deholê
ketî dihat. Ev deng dengê dehola orkêstr bû, yê ku
"Tango"-ya almana lédida.

Keçika rengzerîn mîna cîwanê Avropayê, bi
qure-qure destê xwe da ser pîlê Kuvserî û bi
pêşnîyara wê kete meydana reqsê. Lê te tirê
lênihêrandina wêye gava dinê, li dêmê Azerîye sar
nicikîne mane. Porê wêyî mîna hevrîşim ber bê
babûyî, yên mîna ava kişîyayî, lênihêrandina wêye
bi heyr-hejmekar te tirê Azerî dîwêrva daye mismar
kirinê.

Ji her alî dengê bi ken-henek, şîrîn-kuncî
dihat, lê Azerî her tenê wê keçika rengzerîn, ya jî
gîşkan rintir-bedew mêze dikir.

Ew hatibû xitimandinê. Car-carna ber çavên
wî, li wî alîyê şîbaqê pêlên bera hêşîn dihatine
kivşê. Dengê orkêstir jî, ji wî alîyê berê dihatê
bihîstinê. Ber çavên wî hemû der bi rengê sorva
hatibû xemilandinê. Wî tirê ew vî rengî cara ewlîne
dibîne, nava bera vî rengîda sobekarîyê dike, bîna
wî tevî wî rengî dibe. Ewî bîr kiribû, wekî kincên li
wî, yê leşkerîyê jî, wî rengîdane.

- Keç sitê, dibe we dewatî reqsêkim?

Te qey digot, ev deng jî, ji wî alî berê hate bihîstinê.

Keçika rengzerîn vegerî li Azerî nihêrî. Ewê, ew ji sêrî hetanî pîya mêze kir, paşê porê xweyî reşqemer bi surrekê ba kir û ji keçhevalên xwe destûr stend, destê xweyî çepê dirêjî Azerî kir, serê xwe berjêr kir.

Azerî destê keçikê girt, bi rewşeke nedîtîva, qe bijangên xwe ne qirpand, kete meydana reqasê.

Ji peroştîyê kurt bi kurt bîna xwe dikişand. Dîtirsîya bîna wî rûyê keçikê kebe, lema hinekî dêmên xwe wêda dikir. Bîna porê reşqemer mîna gulavê li ser lêvên xwe tem dikir. Lê keçika rengzerîn li bişkokê zerîne birq vedayî, yên ku kincê Azerîye leşkerîyêva hatibûne dirûnê, dinihêrî. Ewê dixwest reqs zû xilazbe, ji ber ku, te hew dizanibû niqutîye dilê wê, wekî wexta ev xort hub-hizkirina xwe li wê eyanke. Lê de tu ware wedê reqsê hey dirêj dibû. Te hew dizanibû Azerî ketîye nava kenhenekê keçika porzerîn, ketîye nava pêlên huba wê û diperite. Ew ji xwe razîbû, wekî keçik dewatî reqsê kirîye. Azerî qe bawer ne dikir, wekî reqs xwedanê hêzeke mezine, balkêşe.

Car-cara ji piştî notên orkêstrê piçe-piça denga dihate bihîstinê. Van piçe-piçan pêlên bera seqirtî, şire-şira wane xirnik-zirav dikire bîra mirovan.

Reqs xilaz bûnê Azerî milê keçika rengzerîn girt û hetanî bal hevalên wê, wêra gav da. Piçe-piça keçikan bû. Azerî ji şîbaqê li hewşê dinihêrî.

Ev lênihêrandin ne mîna lênihêrandina gava dinê bû, wekî xemên çavan, posîdebûna li dêma, çavnebarîya xwe, ji gişkan veşêre, lê naha nedixwest keçik bi hizkirina wî bihese.

Ji awaza reqasa nûh şûşên şibaqê hejîyan. Ew qam "Ştraûş" bû. Ev qamê reqasêyî sivik te hew dizanibû per-bask da hemûyan, gişk ji cîyê xwe rabûn, reqisîn. Te tirê perde, wêneyên dardakirî û şemdan ketine reqsê.

Dewsa tarîya ku, gava dinê tijî dilê Azerî dibû, naha ronahîya kenê keçika rengzerîn tijî dilê wî dibû. Îdî ewî ji piştî awaza miqaman piçe-piçên mîna şire-şira berê nedibihîst. Çavên wî li keçika rengzerîn bû. Wan lênihêrandina te qey digot, wî dihelîne. Tarîyên hundurê wî, hêdî-hêdî sipî dibûn û şewq didane ser pêlavên wîye saq dirêje reş.

Gava cara çara dest bi reqasê bûnê, ew dîsa nêzîkî keçikê bû. Lê vê carê keçikê berî wî pêşwazîya dewetîya wî kir.

Ev kirina keçikêye nermijî ew hinekî ruhdar kir. Ewî çavên xwe kuta çavên keçikêye şermoke û te tirê li wir tişteki digere. Wirda dîsa pêlên karîbar dît, karîbar û pêlên şîn. Keçikê nêta lênihêrandina wî fem kir û lema jî serê xwe kire ber xwe. Azerî jî, ji vê şermayê, ji vê nenasîyê xwe şaş kir û pêlî lapûşka piyê keçikêye çepê kir.

Keçika rengzerîn dengê mîna dengê şire-şira avê derxist û kire ofînî.

- Sitê, biborîne, pirr-pirr hivî dikim biborîne,
- Azerî got, û ber keçikê duta kûz bû.

- Tişt nabe,-keçikê got, -û soro-moro bû, serê xwe berjêr kir.

Paşê ewê serda zêde kir:

- Ez bi xwe tawanbarim.

- Xêr, xanim, min ev reqs berêda hiznekirî-ye, lema jî nerind dileyîzim.

- Lê ji gişkan gellektir hûn dileyîzin.

- Xanim, ez bi xwe jî nizamim çima. Lê wê yekê rind dizanim, wekî wera reqs kirinê firnax dibim.

- Pirr şame.

Li klûba efseran, ku Mêrî xanimê kûrsê reqasê derbaz dikir, Azerî li wê yekê mîna tişteki netê dînihêrî û bi nêta wî ev yek nelayîqî mêrên şeqêne. Mêrî xanim bî bû, ewa ji Bêrlînê hatibû. Lê bejin-bala wê, navkêlka wêye zirav, rabûn-rûniştina wê xweşa wî dihat. Gellekê mîna hevalê wî - Kuvserî bona wê yekê dihatine vira, wekî reqsa vê jîna alman, xemla kinc xwekirina wê binihêrin, wedê reqsê ji navkêlka wêye zirav bigirin. Lê Azerî her tenê nedixwest dostê xwe Kuvserî li meydanê tenê bihêle, ser xatirê wî dihatê van kûrsan.

- Xanim, bila bî culetbe jî, dixwezim navê we bizanbim.

- Navê min? - keçika rengzerîn kenîya got:

- Merzîye... Lê navê min qe xweşa min nayê.

Navê pirîka min, li min kirine. Ev yek jî bûye ede-tekî pêsîra meva zeliqîye.

- Diqewimî navekî daha bedewî layîqî we, li we kirana. Lê nava qotinbêja navê weda sewtdayî-neke şengî heye.

Azerî bi şîrînî wekiland: "Merzîye". Paşê ewa usa hilda çerxand, lingên wê ji erdê hatine qetandinê. Merzîyeyê nava çavên wîye reşda hizkirineke bê pîvandî dît.

Ewê nexwest firnax bûna xwe, pesnê galegalê xwe veşêre û lema jî got:

- Ez pirr şame, wekî hûn awa nazikayî derz dîkin.

Û serda zêde kir:

- Bîr nekin, wekî di nava nav û nefsdarîyêda firqîke mezin heye.

- Raste, navê herî rind jîyan dide mirovan. Jîyan jî tu gava şaşîya nake.

- Hûn rast dibêjin. Nava van keçhevalên min-da yake reşqemer heye...

Merzîyeyê awa got û vegerî alîyê keçhavalên xwe nihêrî û keçikeke pêsîr sipî, bejin nîvçe da kivşê:

- Ewa keçikeke pirr hişê, gellekî rûnerme. Navê wê Zuhreye. Lê em gişk wêra dibêjin: "Perî". Rastî jî ewa perîye.

- Ewê yekê jî bizanibin, wekî bedewî seraser bidana mirovekî, wê demê mirovên dinê, wê bi ruhşikestî bihatana kivşê. Xwedê bedewî parevekirîye, ji wê her mirovekî tiştek dayê. Lema jî yekê xesîyetê wî, yekê dêmê wî, yekê navê wî bedewe, yekê jî mîna we çend bedewî danê. Ew mirov hetabe, ku çend alîyê bedewîyê bal wî rorobarî ser

hev bûye. Ew yek ne raste, wekî mirov bicedîne hemû nîdalên bedewîyê li bal mirovekî bigere. Bal hemû mirovan, nava her tiştîda bedewî heye. Wekî usane bedewîya tew, ew gerdûn bi xweye, ew dunê bi xweye. Ew kesên ku, ji gerdûnê, ji dunê, yanê jî, ji der-doran, ji welatê xwe dibe, ew pirr cara belengaz, hişkolekî, bê wate tê kivşê.

Beşişîneke bi wate lêvên Merzîyê hingavt. Ji vê yekê, te hew dizanibû Azerî ji piştî berê, li sibeke bi şewq-şemal mêze dike.

- Erê, ji axaftina we ew hasil dibe, wekî dunyayêda bal hemûya gewşînê qenc hene, lema jî gotî gişk şabin. Usane?

- Usane, dunyayêda mirovên xirab tunenin. Tu kes naxweze bibe mirovê xirab. Dizî kirin tişteki xirabe, wekî yek dizîyê dike, bizanibe qewilê pûç ew ber bi wê yekê birîye, hewcîyê ew bégav kirîye. Wekî usane ne ku, mirovê xirab, lê hawêr, qewlê xirab heye.

- Lê wekî usane, çima we xwe ji hemûya paşda digirt, li pêşmalê-hewşê dinihêrî? Ne hûn bi xwe dibêjin, wekî gerdûn di tewbûna xweda, her tişt kamilbûna xwe da bedewe.

Ev gilîyên ku, Merzîyeyê mîna zaroka rûstendî, anî serzara, xweşa Azerî hat.

Îdî miqamê reqasêyî dawîyê dihate lêdanê, Azerî bi carekêva xwe bîr kiribû. Ewî dixwest ev horga reqsê hetanî sibê bê domandinê. Te hew dizanibû, ew ne Azerîyê sehetekê berêye. Pêncekê wîyî reng şîn û şelê vî çelengsîyar ji gişkan rintir bejina wî dihat. Bersîya kaskêtêye reş, rewşeke

nebînîyayî dida rûyê wîyî gilover û çavên tasîn. Azerî bi heyîtiya xweye hundurva ji hevalên xwe dihate cudakirinê. Wekî bona pirseke ferz nava wî û hevalê wî hevketa, ewî tenê rojekê kîn dikişand. Neniherî wê yekê, wekî ew xwedanê vê xweşbînê bû, lê dilê xwe da çirpandin û valabûneke kûr seh dikir. Bona vê yekê, ew timê ditirsîya tenê bimîne. Gava ew tenê manê, vê valabûnê ew ber bi kûraya der-doran dikişand. Bona ew danekebe vê kûrayê, her sibe li mektebê surûd-kilam dihate stranê. Ewî bê hemdî xwe gilîyên surûdê xwera diwekiland û dicedand wê valabûnê ji xwe dûrxe.

Horga reqsê hatinê dawîyê, ji keçevalê Merzîyeyê tenê yekê ewa çavra dikir. Ew jî Zuhre bû. Ewê tê derxistibû, wekî Merzîye ser mêze-kirina Azerî bûye heyr-hejmekar, mîna xuşe-xuşa ava kanîyê guh dide gilî-gotinê wî û lema jî hetanî xilazbûna horga reqsê hîvîya wê sekinî bû.

Tirêjên tava payîza zerîn xwe avîtibûne derdora û hewake sayî her tişt nava xwe da pêça bû. Merzîye û Zuhre serê wan ber wanda, rê diçûn, hewa payîzêye sayî porê wanra ketibû reqsê. Azerî dibir keçikan hetanî malên wan verêke. Azerî li bal Zuhre ne ewqasî serbest bû, çawa li barîgeha reqsê. Zuhre diltengaya Azerî têderxist. Gava ewê nava van herdu cîwanada dida gava, bînteng dibû. Ewa menîyê digeriya, wekî ji wan biqete. Nişkêva Zuhre sekinî û got:

- Merzîye can, destûrê bidine min ez herim, mala me vê derêra nêzîkê. Pêwîste herime mala

apê xwe, bona romana "Kulîlkên Parîsê" hildim, bêm.

- Perî can, ne tuyê bihatayî mala me, lê çi bû?

- Ezê paşê bêm, -ewê got, -û şerma Azerî berê xwe wêda kir.

Paşê ber wan serê xwe hinekî berjêr kir, li ni-cê kuçê ta bû.

Cara yekem bû, wekî Merzîye ber xwestina xweye taybetî û carenûsa xwe rû bi rû sekinîbû. Te tirê, ewa li perava bê kes, ber behreke gume-gum û pêdayî sekinîye. Ne dikaribû pêşta here, ne paş-da vegere. Di vê rewşêda li bal mirovan seweke giran pêşta tê. Ew jî ew sewe, wekî nişkêva nuqî berê nebî. Ev sew bal Merzîyeyê zêde dibû.

Azerî ev rewşa wêye giran tê derxist û lema jî ev gilî anî serzara:

- Hûn kîjan pirtûkan dixûnin?

- Serhatîyên Lamarîtîn dixûnim, hûn zanin ewana çawa bi bandor û sêntîmêntalin. Nitrândina posîde bûna kevirê ber baranê, vije-vija mêşa ku, ji kulîlkan gulavê bîn dike, dewsa pîyên hub-hizkirî-yan, ya li ser mêrg-çîmana mayî, miqam-qamê xule-xula çemê kişîyayî... Dinihêrî çi hinberî hevki-rin û nitrândinên bedewîyêne... Lê romana "Kulîl-kên Parîsê" bi ecêbe. Car-carna "Tarzan"-ê jî dixûnim.

- Ez jî dixûnim. Lê di hemû pirtûkên, ku ez dixûnim, nikarim bersîva pirsên bona min he was-kar, pirsên ku ji civakîyê der mane, bibînim.

Merzîyeyê hêdî-hêdî têderxist, ku ev xort, ne xortekî mîna hemûyaye. Carna ewê qe bi xwe jî nîzan bû çima hinek kirinên qenc, ser Azerîda dibarîne û wî dide idêal kirinê.

Ewana hinda dîwarê bilind, yê avayê bacge-hêra derbaz dibûn. Ber bi stadîonê diçûn. Li wî serê kuçê dengê matorên karxana pembû dihate bihîstinê. Li hewşa karxanê, çewalê gewrike bi penbû tepisandî, dabûne ser hev, lod kiribûn. Lê dûrva depkerdîyên pincara sipindarê, gizêran, pîvazan hêşîn dikir. Lê li pey wana cote çavên reş dinihêrî. Çavnebarîya xwe li dilgermîya wan dihanî.

X X X

Êvarê, sehet 7-a Azerî vejerîya razanxana mekteba leşkerîyê. Îdî giranîya ser mila, vala bûna li dil, reşqemilbûna li dêman, ji ser wî kişîyabûn. Ew hate odê, selam da. Kuvserî rabû ser pîya û got:

- Tê kivşê tu hê mestî, mesta evînê...

Azerî usa tê derxist, wekî ew dengê Kuvserî ji dûr, lap ji pilanêta dûr dibihîze. Nava dengê wîda xeyîdaneke bi xemxur hebû.

- Çêbe, timê şeban, carekê jî ramazan,¹ – Azerî got, -û nêzîkî hevalê xwe bû, destê xwe danî

1. Şeban bi hucurî meha 8-e, pey hucurîyêra ramazan tê.

ser pîlê wî, serê xwe ser pirtûka, ku Kuvserî di-
xwend xar kir û ev hevok bi deng xwend:

- Ewî çavên xwe kuta bû niqitkeke ne eyan û
mitale dikir, gelo naha hizkirîya wî li kuye?

Paşê ser çarbera Kuvserî rûnişt û kelimî:

- O, qey dibêjî, tu pirtûkên derbarê evînîyêda
dixûnî.

- Erê, yek jiyanêda dibîne, yek jî pirtûka da.

Azerî derbarê heleqetîyên dostê xwe û Mer-
zîyeyê zanibû, got:

- Kuvserî, zanî ew keçikeke usa minûke, min
çavên wê nihêrînê şerm dikim. Ewa him jî keçikeke
bi hiş û bi toreya. Ez qe nizanim çima wêya ewqasî
dipesînim?

- Evîndariye, birao, evîndarî. Tu stuyê evîn-
dariyê heye, ger tu çavên wê dinihêrî, şerm dikî,
wekî usanê tu wê hizdikî. Binihêre, vê pirtûkêda jî
usa hatiye nivîsarê.

- Wekî ez wêya hizbikim, bizanibe ji wê
hizkirinê, wê minra tenê bîranînên tûjê bimînin.
Bavê wê serwêrê bacgehêye, bavê min ettare.

- Pêwîste ez xwe mûkur bêm, rastî jî ewa ke-
çikeke rinde. Gava hûn soqaqêda diçûn, min
parava we dinihêrî. Hûn li hev tîn.

Azerî kaskêtê xwe ji serê xwe derxist, danî
ber şîbaqê, xwe kuta çarbera xwe, lingên xwe ser
hevra bir û derbarê Merzîyeyêda kete mitala. Ji
xwendevana yekî li wî serê berxana razanxanê bi
destên xweva mîna diholê texte dixist û şîrîn-şîrîn
bi hewes digot:

“Derîdo, borîdo, şêkesto, bêdest,¹
Yelanra sero, sînevo, payo, dest”.

Lê Azerî dîsa derheqa Merzîyeyê da mitale dikir. Porê wêyî zerîn, bejina wêye nîvçe, destên wêye xindî kire bîra xwe û ber xwe da vebîşirî. Vê demê tîrêjên tava qulîbîye hinekî sor kirî, yên ku xwe avîtibûne ser dêmên wî, lê ber çavên wî her derê al-gevez dikir.

X X X

Ji wê rasthatina nişkêvaye xweş, ew çar sal bû derbaz dibû. Ewana çar sala berê hevra bibûne nas. Îdî ew hestên xweş, ew rojên delal parava mabûn.

Ew mehek bû, wekî leşkerê hevkar ketibûne Îranê. Di hêjayêda giran, di kaşê da sivik çî ku hebû, Rzaxan xwera hilda bû, biribû welatê dereke. Himberî hevkerinên berê hatibûne terbandinê. Di malbetada, di civakîyada, di nava dorgerên siyasîda, ku ji alîyê şah da hatibûne dasekinandinê terîbûn. Hogiran mekteba leşkerîyê xilaz kiribûn, bi peyvîra efsarê biçûk leşkerîyêda xizmet dikirin. Lê bextê wana lînedada bû. Ji ber ku, hema mekteb xilazkirinê, hevkar ketibûne memleketê. Pîre-pîrtî,

1. Hûrkin, jêkin, şkenadin, girêdan,
Serên pehlewana, singên wan, dest-pîyên wan.
(Ji karpêka “Şahname” E. Fîrdovsî).

bê rizimtî ketibû nava leşkerîyê. Li gelîyê nêzîkî Senendecêda, di nava kurdên şoreşvan û desta leşkerê şah da şer diçû. Eva ew cî-war bû, ku mehekê berê pareskerîya, ku Azerî têda qulix dikir şandibûne vira, wekî pêşîya leşkerê hevkarê bigire. Nava du rojên şêrda, pareskerên ordîya Îngîlîs, êpêce maşînê eskerîyê û çek-bar unda kiribû.

Naha dîsa ber çavên Azerî porê keçîka zerîne guşî, mîna pêlên bera hêşîn pêl dida. Gava ewî derheqa Merzîyeyê da mitale dikir, gava gewlezên porê wêî zerîn dikire bîra xwe, xût maşînen pareskerîya ordîya Îngîlîse zerîn dihatin ber çavên wî çît digirtin. Ev maşînan, ku li soqaqan, li xasbaxçan virda-wêda diçûn-dihatin, ber çavên wî dibûne kelem. Van rengên zerîn Azerî hêrs dixist. Lema jî ewî nava rengê porê Merzîyeyê karîbar da û nava rengê maşînen Îngîlîse zerînda dikire çirpe-çirp. Ewî nava wan herdu rengên zerînda hestên bi ecêb derbaz dikir. Herdu rengên mîna hev, yekî wî-ra germayî, yekî wîra kovanîya sar dihanî. Yekê hub-hizkirin, yekê kîn-rik.

Wedê mehekê berê Azerî li pêşa çîyayê Arîz, fitila gelîyê nêzîkî daristanên Sakizê û Baneyê, ku komandari dikir û dijî ordîya Îngîlîs emirê "agirkin" dida, nizanibû îdî çarenûsa memleketê hatiye care-serkirinê, lê zanibû hevkarên têkebine memleketê, xîreta wî ev yek neditemiland. Ewî du roja bi agirkirina topava pêşîya neyar girtibû. Nîşan avîtina wîye raste-rast, serkarê eskerê Îngîlîs heyr-hejmekar hîştibû. Nava du rojên dijî hevda 12 eskerê hinda hatibûne birindarkirinê, 2 tankê neyar ji holê hatibû

rakirinê. Pareskerîya, ku Azerî navda bû, fermana "bihêlin, derkebin" stendinê, nava serbaz û efseran da ruhşkestin û posîdebûna nebînîyayî pêşta anî. Vekir, ber çavan, neyar berdidane axa welat. Evê yekê jî şeref û heyîtiya efserên mîna Azerî pêpes dikir. Azerî çû dizîngava dest stuyê topêra bir û kere-ker girîya. Tu kesî ev yek nedît. Berêvarê pareskerê ordîya Îngîlîs hat derkete cîyê şervanîya wana û bona hurmeta leşkerê Îranê, sekinî "selama" eskerîyê dane wana. Evê yekê hinekî kînbuxsa dilê Azerî kêmkir. Dema gêralê Îngîlîs Vayvîlî ji maşînê peya bû û hat destê xwe dirêjî wan kirinê, aloza heyî hinekî jî kêmkir.

Gênêral Vayvîl got:

- Topên we rind davîtinê nîşanê. Ça bêjin binê, pêşekzanê almana li kêderêne? Ewana xwe ku veşartine? Dihate kîvşê nîşandarên wan armanc rind hildabûne nîşanê?

Azerî pêşta hat, bi rizma eskerîyê selam da û got :

- Em bi xwe topên xwe pêk tînin. Nîşandarî û tetika wana destê me bi xwedaye.

Vayvîl nêzikî Azerî bû û destê xwe danî ser pîlê wî bi Îngîlîsî got :

- "Kûd! Kûd!"

Azerî dihanî ber çavan, ku dema leşkerê Îngîlîs, yên zefîkar soqaqên bajêr yên mezinra derbazbûnê û berê xwe danê alîyê başûr, ber bi çîya çûnê, binelîyê ser pê, pey hev, pey hev sekinî, çawa bi kîn-rik wan dinîhêrî. Lê Îngîlîs ji van mirovên çît girtî, ji lêhirandinên wane tûj ditirsîya, serê xwe

dikirine ber xwe. Carna bona vê xofê hinekî bidine kêmkirinê, wana qutiyên şokolad û xurma davîtine mêzekaran. Lê ne şokolad, ne xurme nebûne pira nava binelîyan û dagirkaran. Ji rûyê binelîya agir-alav dibarî. Tank û maşînen wane rengzerîn ji ber çavên Azerî nediçû. Çavnebarîyê dilê Azerî disot. Ewî mitalê xwera porê Merzîyeyê, yên zerîn, ku mîna pêlên berê pêl didan û rengê maşînen Îngîlîsa, yên ku, zû-zû pey hev diçûn derbaz dikir, mitalên wî jî dibûne dudû.

X X X

Azerî ji Tebrîzê bû. Li sûka ser girtî dikanêke bavê, ya ettariyê hebû. Ewî bi wê dikanê xercê nanê rojê kar dikir û him jî daxweza wî ew bû, wekî kurê wî Darîyûş civakîyêda bibe mirovekî bi navdeng. Darîyûş dersxana 9-a xilazkirinê şûnda, bi zexmandin û xwestina bavê kete mekteba leşkerîyê. Ewî jî, mînan yên mayî nikaribû rizma leşkerîyê, rêkûpêka leşkerîyê hizke, lema jî salên xwendinê ewlîn dijwarî dikişand. Lê çi ku, ji wî di hate xwestinê, ew bê dijwarî hîn dibû. Zexma kincê leşkerîyê, ew efserîyêra dida girêdanê. Evê hewasê, hêdî-hêdî pêşê wîyî paşdemîyê bi wî dida hizkirinê.

Lê naha di nava vî pêşekîda hevrûtî pêşta hatibû. Şah berê dîroka Şahtîyê, text-tacitîya xwe mîna ayeyên-Quranê dida hînkirinê, lê naha ev gişk bin zincîrên tankên Îngîlîsda dihatine hûr-xwaş

kirinê. Şah bi xwe, bi rezîlî ji welat revî bû. Kurê wî Memmed-Rza Pehlevî dewsa wî girtibû. Naha binelîya mîna berê ji efser û zabîten Îranê hizne-dikirin. Vê gavê hatibû eyan kirinê, wekî leşkerê Şah çiqasî bi hêzbûye, ku nikaribûye du roja dijî dagir-karên dereke zeftê bîne. Her ku Azerî derheqa van yekada mitale dikir, hêrsa wî radibû, bîna wî teng dibû û dîcedand rêdîrba bivîne, wekî ji wan cizeretîyan xilazbe.

X X X

Merzîye keça serwêrê îdara bacgehê -Taxixan bû. Du jinê Taxixan hebûn. Ewana li taxên bajêre cuda-cuda da diman. Ew tevî jina xweye yekem, sê sala jîyînê şûnda, ewa bi fermî berda bû. Ew deh sal bû, wana hev nedîdit. Herdu keçikên ji jina berîn, ew dewsa bavê danetanîn. Ewana bi torê kalikê xwe mezin bibûn û îdî çûbûne mêr. Hizkirina Taxixane bawtîyê tenê bibû para keça wî - Merzîyeyê.

Porê Taxixan hemû weşîya bû, serê wî mîna tasa qela kirî dibiriqî. Belekî ketibûne nava simêla wîye bereya du tilîya. Simêl qe li wî nedihat. Ew simêl, mîna simêlê ku, bi zeliqokêva ber pozê aktyorê cîwanî necêribandî dixin, usa dihate kivşê. Merzîye zarotîyêda bi heyr-hejmekar, nava dewlemendîyêda mezin bibû.

Taxixan dîdit, wekî keçika wî gihîştîye, bûye ya xama. Çend sala berê ewî dîtibû, çawa ewa li

soqaqê, tevî efserekî bejinbilind diaxife. Ewî ev yek nedabû rûyê Merzîyeyê, lê derheqa hetabîya wêye paşdemîyê û malbeta wê da, kûr-dûr ketibû mitala.

Naha Merzîye 24 salî bû. Ewa keçikeke şeng-şepal, bi tendurust, bizêw bû. Ewa bi dilfirebûn, hemdfirebûn û bi bizotîya xweva ji keçhevalên xwe dihate cuda kirinê. Bi edetê heyî şermkirina keçikan, ew ser tacê cihêzê wê tê hêjandinê. Lê Merzîye ewqasî jî neşermokek bû. Ewa ji keçbûkên der-dorê xwe, bi wê yekêva dihate cuda kirinê, wekî ewê dikaribû li rûyê mêra, lap li çavên wan binihêre.

Li horga reqsê ewa bi dil Azerîra hatibû girêdanê. Nava van salên jîyana xweda Merzîyeyê derzkiribû, wekî vê dewra serobinda, dema dijar û hetab da, di rojên şa û posîde da pêwîste her keçikek sîngê mêrekî mîna Azerîda sitarbe, yê ku bi xemxur û serbilinde.

X X X

Merzîye bê bawerî ber neynûkê sekinî bû, porên xweye zerîn şe dikir. Tîrênjên tava sibê şibaqêra zêde bi zêde tijî hundûr dibû. Van tîrêjên zerîn xwe avîtibûne ser xalî-xalîçên pêda-pêda darda kirî û te tirê ewana hevra ketine govendê. Li dîwarê rû bi rû, ber bi dêrî tabloya dîdema xwezayê, ya wênekêşê ne eyan, hatibû lêdanê. Lê li alîyê rastê portrêtê Nadir Şah, yekî mezin hatibû darda kirinê. Balgîyên tepisandî ser çarberên verşo, mîna berfê

sipî dikirin. Lê wêneyê Merzîyeyê, yê zarotîyê, kiribûne nava çarçeveke şûşe kirî û danîbûne ser pêşxwîna nivîsarê, ewa bi rûken bû. Her ku ewê porên xwe şe dikir, mîna pişikê kaw-kaw dibû, qure-qure ser xwe da dinihêrî. Ewê dêrekî ji hevirmîşê Îraqêyî mîna qend xwekiribû. Nava vî dêreyîda, porê wêyî karîbar mîna rengê şabalîtê di hate xanêkirinê. Evê rewşê bedewîya wê daha jî dida zêdekirinê. Mirov nikaribû ber vê bedewîyêra bê xem derbazbe.

Ewê îro rastî Azerî bihata. Her roja îne, ewana rastî hev dihatin. Wedê ewa rastî wî dihat, tê derdixist, wekî ewê pê avîtiye nava dunyake nûh. Ewa bi ruh-sewdayê xweva sivik dibû. Dibû yeke ramanhiz. Ewê lêlêbû bask bigire û bifire. Vê gavê têderxist, wekî ewa dikare kêrî dunyayê bê.

Derî hate kutanê. Taxixan li ber şemîkê hate xanêkirinê, kincê navmalê lê bû. Ji muruz û sûkûmê wîyî horpizî di hate kivşê, wekî ew bi zikire.

Merzîyeyê ber bi wî hat û berî wî got:

- Bavo can, seiam!

- Selam, keça min, -Taxixan hinekî di rewşeke bi yekbêjî, hinekî bi ramanî bersiv da, -tê kivşê tu amede dibî derekêda herî?

- Bavo can, dixwezim herime mala Zuhrê wana. Ne tu, min tu derada nabî.

Ewê nazî kir, lêvên xwe ser hevda qerci-
mand, belengazîk da rûyê xwe.

Bavê destê xweyî rastê kişande porê wê û got:

- Ezê te bibime mêvandarîyê, îro hemû kesên bajêre navbilind û yên birêz wê li wê meclîsê bin.

Ji vê dewatîyê te tirê dilê Merzîyeyê hate guvaştinê. Tiştek bavê xwera ne got. Û bawer kir, ku hinekê derbazbe, ji îdara bavê karkarên bên, wê bona karekî ferz karnîyarî wî bibin, bi vî awayî serê bavê bi şuxulê rojêva tevhevbe û dewatîyê ji bîrê here. Paşê ewê vê yekê têke menî û here rastî dostê xwe Azerî bê.

Lê Taxixan derbarê tiştekî mayînda mitale dikir. Ewî zûda derbarê mêrkirina Merzîyeyêda dîya wêra şewir dikir. Lê vê pirsêra girêdayî, derbarê fen-fêlê xwe da jina xwera tiştek ne digot. Ew ser wê nêtê bû, wekî bi tîrekê du nîşanaxe. Ewî dixwest him keçika xwe bide mêr, him di nava mirovên bajêre navdarda hurmeteke bilind qezencke. Van mitala şevroj mêjûyê wî disotin. Ew salek bû, ku jina serwêrê îdara jandarma Razî miribû. Ejanên bajêr ji destpîya diçûn, wekî keçikên xweye xama bidine serheng. Serheng jî dixwest jineke dewlemend, bi cihêz, serbarê serda, cîwan û bedew bistîne. Taxixan ev kêmasîya serheng rind têderxistibû. Ger ew serheng Razîra bibûya qewm, wê bi rîya revokî, malê hevirmiş, ji Besreyê, Xanegînê û Bexdadê bihanîya memleketê û wê xerc-xeracê bacgehê nedaya. Ew perçên hevirmûş, ku ji wan bajaran dihanîne welat, zû dihate firotanê. Post-polîsyaneyên jandarma yên ku, ser rîya sekinîbûn, nedihîştin qaçaxtî bê kirinê, mifta vê yekê jî bal serheng Razî bû.

Taxixan û Merzîye faytona duhesp gembend
kirî sîyarbûn, xasbaxçera derbaz bûn, hatin derke-
tine mala Razî. Taxixan xwendin bi rizma kevin
destanîbû, lê ewî hiz dikir xwe mîna maqûlekî
xwedanê çanda Avropayê bide kivşê. Ew ku,
dewatî derekê kirinê, ewî kincên here rinde bi deb
xwe dikir, bona ku têdernexin jina wî oldar, fanatik
û nexwendîye, carna bi keçika xweva diçû meclîsa.
Lê naha derz kir, wekî şaş kirîye Merzîye anîye
mê-vandarîyê. Ji ber ku, îdî Merzîye ne zaro bû.
Xêncî wê dema meclîsêda hevra dikêtime hucetê,
çawa dibên, Merzîyeyê bi zimanê xwe nikaribû.

Fayton ber dergekî mezinî lesbiles vekirî
sekinî. Serheng Razî ewana li tayê duda, ber
şêmîka oda mêvanaye mezin pejirand.

- Hûn ser sera, ser çavan hatine! Ez çi mi-
rovekî hetabim, -got, -û destê xweyî qelew dirêjî
Taxixan kir.

Taxixan destê wî hişk-hişk guvaşt û ber wî
temene bû got:

- Ez gellekî şame, wekî hatime hizûra we!

Paşê qest hinekî xwe wêda da û Merzîye
nîşanî wî kir. Lê ev yek qe xweşa Merzîyeyê ne-
hat, wekî bav ewqasî ber pîyê serwêrê jandarman
Razî dibe xulî, jêra dilxweşîyê dike.

Serheng çavên xweye bijiqîye mest bûyî,
kuta Merzîyeyê û pirsî:

- Biborînin, xanim çiyî weye?

- Keçika mine, serkar.

Taxixan ev gilîyana gotin û bi qure sîngê xwe pêşta da. Merzîyeyê ji vî hereketê bavê xwe şerm kir.

Keçik bê gav ma û ber serheng serkûpî kir. Lê li rûyê wî nenihêrî. Serheng ev yek mîna tişteki şermoke hesab kir. Lê Merzîyeyê ji wî şerm nedikir, ji hereketê bavê şerm dikir. Yek jî, rastîyê bêjî, ewê derbarê Azerîda, derbarê rasthatina wanda mitale dikir. Him jî bona wê yekê ditirsîya rûyê serheng binihêrê, diqewime nişkêva ev mirovê dunedîtî ji lêhirandina çavê wê, nêtên wê derzke.

Serheng lap nêzikî keçikê bû, hetanî bîna porên wêye karîbar bînke, serê xwe ser wêda xar kir û got:

- Xanim, pirr xweş, ser sera, ser çavan hatîye vê mala meye nezerengî.

Hê kesek odêda tune bû. Taxixan wedê destpêbûna meclîsê rast zanibû, lê qest hinekî zû hatibû, wekî di nava rewşeke xweşda Merzîyeyê nîşanî serhengke.

Perdên odêye hevirmîşe bizme kirî, hatibûne bilind kirinê. Krêsloyên rû bi mexmer, bi pergar û rind li quncên odê hatibûne danînê. Pêşxwîna direje nava odêda danî, bi rizmê Avropî, bi rûkêşa şîn-va hatibû ser girtinê. Sê destê gul kiribûne guldana abegînê danîbûne ser pêşxwînê û kelmelên kevnar, ku li wir bûn, ber çavên mirovan birq vedida. Seheta dîwêrda dardakirî, pey hev, pey hey lêdida û seqirtîya odê diteriband.

Merzîyeyê wêneyên bi bilindaya cuda-cuda dîwar xistî mêze dikir. Ber çavên Merzîyeyê wêneyên nava çarçevên hêjada nedihatine kivşê. Di

nava van çarçevada çavên Merzîyeyê her tenê Azerî didît. Naha Azerî ber kînotêatra "Barbod"-ê sekinîye û bi çavên qerimî Merzîyeyê digere.

Serhengê kaşgiran, bi sivkayî fitil da xwe, hate oda mêvana û dîsa dest da Taxixan:

- Naha bêje binêma qe kêf-hal, rewşa te çawane?

Taxixan dît, wekî firsete, wê gavê derbazî meremê sereke bû:

- Serkar, hûn qe haj karê me tunenin. Bi heqî, karê me bi teva girêdaye. Qaçax şuxulê me diteribînin. Ewana bê jimar malên dizî di rîya Bexdayê, Xanegînê, Besrêra tînin, çavên wan têr nabe. Ger wana bigirin bidine destê min, ezê yeke usa bînime serê wan, wekî ev yek yên mayîna bibe ders.

Taxixan qest mesele awa hevaland, wekî bi nêta Razî bihese.

Ji qerçmekên rû, ji gilî-gotinên bi xemxur, mirovan tê derdixist, wekî serheng Razî haj gotinê Taxixan heye.

- Taxixan, ez tera qayîlim, -Razî got, -van paşdemîya qaçax zêde bûne. Ev yek him reva şahra, him leşkerê derekera girêdaye, ya ku ketîye memleketê. Bona dijî qaçaxan şerkarî bê kirinê, pêwîste em pêşnîyara bikin, tevayî bixebitin, dewlet jî pêşîya vê yekê bigire û nehêle rîya dizîva malkelmel bê Îranê.

- Elahezret berê xwe dabû Almanîyê. Hema ser hev, ser hev mator, fotoaparata, bûjenên bona nivîsarê, maşî dikişîya, dihate memleketê.

Serheng Razî mirovekî dunê dîtîbû. Ewî hiznedikir derheqa sîyasetêda biaxife. Gilîyên Taxixane derheqa elahezreta gotî, xweşa wî nehat. Ewî vegerî wêneyê jinêyî dîwêrda darda kirî nihêrî û got:

- Taxixan, jin rewşa malêye, serê tekim, hingî ewa çûye rehmeta Xwedê, vê malêda dengê ken nehatîye bihîstinê. Awa, tik-tenê mame.

Serheng ev gilî anîne serzara û kete dilqê mirovê belangazî bêgav û çavên Merzîyeyê belek nihêrî, te hew dizanibû van gilîyan nabêje Taxixan, lê Merzîyeyêra dibêje.

Merzîye jî, ji hêrsa pîrpijî bibû. Te tirê ewa ser kelema rûniştîye. Vê demê Taxixan got:

- Keça min, heta mêvan bên derên, rabe derdorê hewşa avayî xwera bigere, paşê ware.

Te qey digot, Merzîye hema hîvîya van gilîyan bû, rabû dêrîva deketinê, dengê serhengî bi qalim û zexm li wê tesele bû:

- Maşallah, keçika te horîye. Xwedê hetabke, bext bidê.

Taxixan dest xweda bersîv da:

- Serkar, ewa xulama weye, destê we radi-mûse.

Merzîye pilekanara daketinê, rû bi rû rastî çend mêvana hat. Ewê selam neda tu kesî. Ji derîyê mezin mîna gullê derkete derva. Azerî li ber kînotêatra bajêre navendî hîvîya wê bû. Ji wedê rasthatina wan nîv sehet derbaz bibû.

Azerî dîrva Merzîye dîtinê, şabûneke nebînî-yayî dêmên wîyî fire hingavt. Û wî hewzanibû,

dîsa hemû der-dor, afîşan, tablonan bi rengê karîbarva hatine wergirtinê.

Ewana li ber derê kînotêatrê rastî hev hatin. Azerî herdu destên wê girtin û ber bi lêvên xwe birin, pêçiyên wê ramûsa, paşê destên wê danî ser sîngê xwe û çavên wê nihêrî. Ji çavên Merzîyeyê hetabî dibarî. Bera karîbar hate kivşê, Azerî usa derz dikir, wekî ev pêlên bera karîbar li burîyê wî dikevin. Ji evê mêzekariya bi heyr-hejmekare germ, kevirên soqaqê zer dikirin.

Merzîye ji mêzekariya wî hate surandinê. Ewê desmala destê xwe, ya sipîye dor perawêze mor, mizdida. Merzîyeyê di nava mitalên xweda, ew û serheng Razî himberî hev kir. Ji hafiya van himberî hevkirina firnax dibû û bi ruhê xweva bilind-bilind dibû.

Azerî gote wêya:

- Do tu ketibûyî xewna min. Xwezila tu timê usa bibûyayî, çawa xewna min da.

- Gelo ez çawa ketibûme xewna te, dikarim bizanibim?

- Min xewnêda dît, tu kincê hevirmişe sipîda rex minra derbaz dibî. Min gazî te kir, ne kir, te nebihîst. Min milên teva girt, tu tirsîyayî, ketî ser milên min. Paşê em difirin. Tevî ewira dibin. Ew jî rengê karîbara daye.

Merzîyeyê guh dida wî, lê ewa hatibû surandinê. Te hew dizanibû ewa guh dide çîrokên bi sur û ser milên Azerîye, berbi ewiran difire.

- Diqewime keçikeke mayîn ketîye xewna te. Ne ez ji te narevim. Lê çawa bû, wekî te xewneke awa dîtîye?

- Xewin, -Azerî got, -timê rast dernayên. Yek jî bavê min dibê, ku kirina dunyayê çep-vajîye, birevî wê bere tedin, berdêyî wê bireve.

Merziyeyê wekiland:

- "Birevî wê bere tedin, berdêyî wê bireve"

- Min jî xewin dîtîye. Xwe jî tu dîtîyî.

- Qalke, ka binêm te çi dîtîye?

- Na, qalnakim.

- Tu xewna xwe ji min vedişêrî?

- Na, naxwezim veşêrim, lê Perî dibêje, gotî keçik xewnên xwe xortanra qal nekin. Qalkin, diqewime xewnêda çi dîtine gişk sero-binbe.

- Qalke, diqewime hema sero-binbe rinde.

- Na, -ewê miqîm got.

Rastî jî pêncşemîya derbazbûyî ewê Azerî xewna xweda dîtibû. Ewê dîtibû, wekî Azerî hespekî bi bijî sipî sîyar bûye û çargavî pêşîya leşker dajo. Yek diqîrya, wekî şere. Malavayî dişewitîn, mirov direvîn. Ewa bi xiroş berbi hespê Azerî çargavî direve. Azerî jî xardibe, ewê hildide, dide terkîya xwe. Ewana ber bi çîyan diçin.

Gava ewana gihîştine îmamzada kevîya ba-jêr, sekinîn. Dûyê hevalî, yê ku ji kurexanên bilûkerpîçan derdiketin, mîna werîsê reş bû. Aliyê rastê, êpêce maşîne ber bînzîndagirtên binerd sekinîbûn. Nava wanda maşînen Îngîlîsan, yên rengzerîn jî sekinîbûn.

Azerî herdu destên Merzîyeyê girt, zo kir û got:

- Merzîye, ez çima ewqasî ji te hizdikim?

Dêmên wîye nava rengê asoda mewicî hate ber çavên wê. Ew bi bejin-bala xweye bilindva xût mîna peykelekî tûnc bû.

- Êy dostê min, tu çiqasî daponijînhizî û bi romantîkî? Gotî tu bibûyayî helbestvan.

- Wekî ez bibûyama helbestvan, zanî minê çiqas helbest derheqa van best-beyarada, van çî-yayên bi serî berfda, van kanîyanda, van bedewîya da binîvîsîya. Minê derbarê van porên ku, jê bîna karîbaran tê, qezel binivîsîya.

Azerî parava destê xwe kişande porê Merzîyeyê.

- Wekî ez jî, -ewê got, -wênekêşbûyama, minê tu vê rewşêda, di nava daponijîna da bikişanda.

Azerî destên wê ramûsa:

- Were,-got,-em ber vê Îmamzadê bisekinin, bi vê evrayê sond buxun, wekî emê tu dema ji hev neqetin. Bila tu hêz, me ji hev neqetîne. Bila kirina tu kesî, xwestina tu kesî heleqetîyên me ne teribîne, him jî hetanî dawîya jîyana xwe, em ji hev nexeyîdin.

Merzîyeyê destê xwe li kevirê Îmamzadê xist û got:

- Ez sond duxum!

- Ez jî sond duxum, -Azerî got, -û porê wê maç kir.

Ber êvar bû. Ji qelişteken textên çarmedora Îmamzadê, tîrêjên zerîn xwe avitibûne ser

“Pencte”-ya tirbêye tûnc. Merzîye ker-lal sekinîbû, nivîsarên ser “Pencte”- yê, pîne-patikên çarmedorê da gilê-gilê girêdayî mêze dikir.

Maşinên Îngîlîsan, yên leşkerîyê, qelfe-qelfe bûyî mîna morîyên tizbîya zerîn pey hev, pey hev rêzbûyî, rêda diçûn. Raste, Azerî li alîyê Merzîyeyê dinihêrî, lê bin çavava rêza van maşinan mêze dikir. Te tirê birînên dil diziqîtiyan. Bona Merzîye vê rewşa wî tê dernexe, ewî zefta xwe dihanî. Gava ji dengê maşina Merzîyeyê vegeirî piş xwe nihêrî, îdî Azerî xwe xayî-nekir got:

- Binêhêre, memleket ketîye çito rojê, dagirkar rîya wêra serbest, aza diçe, tê û gişk awa dihesîbînin, ku gotî hema habe. Mecala min hebûya, minê ev maşinên zerîn yeko-yeko bida ber gullên topan. Min yek jî silamet bernedida. Merzîye, ez nikarim li vana binihêrim, were em ji vira herin.

Merzîyeyê li rûyê wî nihêrî. Deremên dêmên wî kişîya bûn, req bibûn. Ev dêmên wî, ne ew dêmê pênc deqîqa berê bûn.

- Raxan evana kirine hakimê me!

Azerî giliyê wê nivcî birî got:

- Naha jî evê yekê kurê wî Memmedrza didomîne. Ez jî van şahên veçekirî ketime şikê. Ez li wana rikindarim. Naha ev text-tac, ev qanûnên şahtîyê bona min, mîna tiştêkî pêkenîye. Ez van gişkan dinelînim. Ez xwe-xwe jî dinelînim. Ez bona wê yekê neletîyê li xwe tînim, wekî mehekê berê, min li bereka çîyayê Arîzê şerkarî dikir, pêwîst bû min altindarî bibîra, yanê jî li wira bimirama, wekî îro min ev derpê xwekirîyên kine zerîn, tankên wa-

ne zerîn, yên ku, di rîyên Welêda serbest dişûşin, nedîta. Naha gava ez li soqaq û xasbaxçên bajêr digêrim, hinekî jî şerm dikim. Ji gel şerm dikim, ji nasên xwe şerm dikim. Ger ev kincên leşkerîyê li meye, pêwîste em qîreta memleketê bikişînin. Lê em çi dikin, çima em ewqasî bê dil bûne? Ez dixwezim ji vira birevim, kuda dibe, bila bibe. Ez nikarim van dîdema binihêrim.

Azerî sipîçolkî bibû, dest lê dihejîyan. Merzîyeyê nizanibû çi bikira. Çawa ber dilê wîda bê. Nişkêva kete bîrê, wekî bav mala serheng Razîye, li mêvandarîyê hîvîya wêye. Lema jî bi lez got:

- Darîyûş, em herin, pêwîste tu min hetanî meclîsekê verêkî. Em herin, derenge. Em di nava qewlekî dîrokî bi bobelata dijîn. Evê yekê tenê di rûyê gunekarîya teda destnedaye? Serkarên memleketê, ev rewş pêşta anîne. Tu çima ji gel şerm dikî? Te dijî dujmin şerkarî kirîye. Du rojan pêşîya wan girtîye. Em herin, dostê min. Min heta wê derê verêke.

Azerî kete milê wê. Di nava hewa sayî da derketine rîya çodê. Merzîyeyê milê xweda heja destê Azerî seh dikir.

X X X

Li avayê serheng, yê duta da şayî bû.

Nava mêvanada serê Taxixan, yê rût-zelût wê deqîqê hate kivşê. Ewî ewqasî guhê xwe nêzîkî

devê serheng dikir, wekî ji serê wîyî zelût bîzevedihat.

- Binê, tu evî bi kefenkî, - serheng got, - û destê xweyî rastê rûyê xwe xist. - Binê, tu min bi kefenkî, ez haj wê pirsê tunenim! Lê ji vir wêda ezê haj pê hebim. Ez hatime ser wê nêtê, wekî berna-ma dewletêye bazirganîyê, îngîlîs bi xwe dinavînin.

Taxixan dîsa devê xwe nêzîkî guhê serheng kir û mîna mirovekî surdarê wî, yê ku wîra gilî-gotîna dibêje, alîyê xweyî çepê- rastê nihêrî, got:

- Kur jî di rîya bavêda diçe. Ewî jî piştî xwe kutaye îngîlîsan.

- Mera çi, kî piştovanê kêye. Bila karê me bimeşe. Kî kere, em jî palanê wanin. Pismamo, ez rast dibêjim, yanê na?

- Serkar, qurbana gilî-gotinê tehim, em timê awa jîne. Kî bûye ker, em jî bûne palan. Lê de tu were, hingî ev îngîlîsana ketine nav kar...

- Tu ji wê yekê qe nerehet nebe. Ewana stûyê min. Para wan bide, axatîyê bike, dixwezî paşê lap bibe xwedanê memleketê.

- Tuyê çawa parê bidî wana, ka ewana mirovin, wekî nêzîkî wanabî?

- Rzaxan çawa par dida, tu jî usa bide.

- Bi zanebûna min, Rzaxan par dida almana.

- Çil û sê selefê bazirgdnîyê wanra dabû girêdanê.

- Çawa îngîlîsaran rê bivînî?

- Rê eve, meselen, bêtî, wekî ez dixwezim beşên karxanê, yên hêwişandî, ji Îngîlîstanê bînin.

- Rehme li bave te be, eva bû tiştêkî pijîyayî, min femkir, lê maşînên karxanê jî malên almanac-nin.

- Çi firqî. Îngîlîsê here ji almana bistîne, bîne bide te. Ewana pêl pîyê hev nakin. Tu karê xwe bike, lo camêro.

- Ewana şer dikin, çawa diqewime bazirganî-yê bikin?

- Ew çî ku tu dibînî, ew seraye. Wekî bikarbî kûrayê bibînî, tuyê binihêrî Îngîlîstan, Amêrîka, Almanîya yekin. Ewana hersêk jî dijî Şûrevîne. Ewana dixwezin dawîyê li Şûrevîyê binin. Bona wana ya here bi xof ew - Şûrevîye, ne ku faşîzm. Naha te fem kir?

- Serkar, te ez heyr-hejmekar kirim. Min qe nizanibû tu ewqasî hişdar û mirovekî dûrdîtîyî. Tu lap sîyasetzanî. Eferim tera!

- Eferim Rzaxanê em tore kirîra bêje.

- Welleh dewra wîda memleket ne bê xweyî bû.

- Taxixan, ware em vê axaftinê dirêj nekin.

Paşê vegerî mirovên odêda rûniştî mêze kir û ser axaftina xwe da zede kir:

- Ca binihêre, binê ewana çawa ketine heyra xwe. Rehma Xwedê li bavê Rzaxanbe jî, li kurbe jî. Lo camêro, tu çî zanî, diqewime sibê şah vegere. Tu minra îlacekê bike. Dinihêrî ev mal-hebûn, ev der-dor bê xweyî maye. Ez dixwezim xanimek he-be, bê li van dera xwedantîyê bike.

Taxixan di nava hestên qayîlbûnêda, hinekî xwe civande ser hev, dîsa bi fesal der-dorê xwe nihêrî, guhê xwe da ber devê serheng, got:

- Serheng axa, tu kê bixwezî, bizanbe, mifta wê malê destê mindaye. Ne rehet nebe. Tenê dûr-va tiliya xwe dirêjke, paşê vekişe, cîyê xweda rûnê. Wê demê tuyê bibînî, wekî Taxixan jî îngîlîseke. Min nan bi guhê xwe nexwerîye.

Serheng ew hemêz kir û got:

- Taxixan, serê tekim, binê bi serê tekim, bawerke, wekî rojên min awa derbazbin, ezê herim xanimeke îngîlîs bistînim, ezê wê demê bibime mîstêr, bila ev reyîsê polîsan, serwêrê leşkerîyê Asaye, ez çi zanim, ew kêye, kê nîne, bila derêne pêşîya min, binê wê çawa derên. Îdî wedê zorkarîyê xilazbûye. Gotî em ji nezerîya Nîtsşê dest vekîşînin. Kanê ew rojên me, ku fermanدارên me ji Nîtsşê, ji Hîtlêr minak dihanîn. Rewşa dunyayê hatiye guhastin, dem-dema sîyasetê û diplomatîyêye. Pêwîste usa serjêkî, xwîn derneyê. Serheng Asa haj dunê tune. Ew berêda serhişk bûye, dawîyêda ewê xwe, serê xwe buxwe. Zulmkarê kurê zulumkara, naha ketîye eşqa mêrxasîyê. Ber kurê şah durûtîyê dike, bi xweşî çûye şerê pêşenîya Kurdistanê.

- Serkar, tu rast dibêjî, hurmeta alman, ya Nîtsşê xilaz bû. Naha pêwîste bi hişk Îngîlîsava bizeliqî.

Dema Taxixan ev gilîyana dihanîne serzara, dema guh dida serheng, bi mitalên xweva bal "xanima Îngîlîs" bû. Ewî ev gil-gotin hundurê xweda

hildixist-dadixist, çima ez bi xwe “xanimeke îngîlîs” nestînim û nebime serzanekî memleketê? Di nava van ramana da ewî got:

- Bi zanebûna min, ji vî bajarî tu keçika kê bixwezî, wê bidine te. Ji vê yekê bawer bike.

- Tu hela keçika dibêjî, ez qayîlim jinebîkê bistînim.

- Na, na, ev çi şermdarîye, mirovekî mîna teyî maqûl, xwedan hebûn, here jinebîkê bistîne, lê wê mera çi bêjin.

- Îdî keçik min nakin, Taxixan, -serheng qest-bende awa got, -wekî gilî bîne ser keçika wîye bedewe-rindik.

Bona servekirina vê pirsê îdî dem bû. Taxixan hinekî bi rik got:

- Keçik qelet dikin, serê xwe kêvir xistine, wekî te nestînin.

Taxixan hêdî-hêdî nêzîkî meremê xwe dibû. Ewî serheng “pîj” fikir, wekî derbarê vê yekêda bi her alî daxweza wî bizanbe. Lema jî got:

- Serkar, keçhogireke keça min heye. Îdî pêwîste servekirî biaxîfim, çi şerm. Ew keçika keçikeke bi hişsewda û êgine. Her tenê eybeke wê heye, ewe desttenge. Navê wê jî Zuhreye...

- Taxixan can, tu bi însafa xwe bêje, em rabin vê dema xweda, yeke belengaz bistînin, lê heval-hogirê mera çi bêjin. De, tu bi xwe bêje, tu meslehet dibînî?

- Serkar, çi bêjim, ez jî mame metel.

- Lo camêro, çima metel mayî? Keçika te çend salîye?

- 24 salîye.

- Lo Taxixan, ez qurban, qe te derbarê care-nûsa wê keçikêda mitale kirîye?... Lo camêr, welleh-billeh, ev îranîyana qe kêrhatina xwe nizanin, paşê poşman didin...

- Serkar, axir gilî ne derbarê Merzîyeyê - daye?

- Em deyîndarin, wekî derbarê hetebîya Merzîyeyê da têkebine xemxurîya.

Taxixan serê xwe berjêr kir, destên xwe mizdan û bin çavava li serheng nihêrî. Serheng dîsa ew hemêz kir, serê wîyî rût guvaşte sîngê xwe û got:

- Hemû tiştê qencbe, tuyê nedî der.

Vê gavê xwedanê karxana pembû Ferasetî axa rabû ser pîya, zimanê wî hev diket û bi qerf got:

- Serheng, tu serê min, naha ku te û serwêrê bacgehêyî birêz pirsên dunyayê danîne ber xwe çareser dikin, kerema xwe, pirsê Îtalîyayê jî binihêrin, serhevda bînin. Ewana belengaz bûne, naha him darşiva Hîtlêr li wan dikebe, him ya partîzana. Ez li we bimirim, wê pirsê jî binihêrin xilazkin, em dikarin hinekî jî we çavrakîn.

Mirovên li meclîsê kenîyan. Ji vî kenî dihate kivşê, wekî gişk serxweşin.

Mirovekî çav kortda çûyî, porê bîz-bîz bûyî, rabû, ser pê zorê disekinî, kasa destê xwe bilind kir. Ew dewsgirtîyê serwêrê beledîyê bû. Tu kesî guh nedida wî, lê ewî got:

- Axano, biborînin, ku ez rûdantîyê dikim. Ez pêşnîyar dikim, hema îro em serheng Razî bizewcînin. Ger ew bî bimîne, way-way li rewşa bajêr...

Ken-henek tevî dengê şîqe-şîqa badeyan bû û şabûneke bi ecêb pêşta anî. Gişk rabûne ser pîya. Serheng çavên xwe kuta bû Taxixan. Te qey digot, tevgelên meclîsê ji axaftina wana, hinek gilî-gotin fem kirine.

Serheng destên xwe virda-wêda bakir û got:

- Axano, min bizewicînin, ez jî bizewcim. Kor çî dixweze, du çavan, yekî şaş, yekî rast.

Her ku ew diaxifî, dikete rewşa mirovê berê-da xeniqî.

Serheng hê gilîyê xwe xilaz nekiribû, Merzîye û Azerî li ber şêmîka dêrî hatine kivşê. Te hew di-zanibû culetbûnekê xwê avîtiye ser lêvên Merzîye-yê ewa vedibîşîrî. Lê Azerî ji şerma reşqemilî bû.

Vê weşê te tirê kevir avîtime gola beqan. Gişkan badeyê destên xwe danîne ser pêşxwînê û alî-yê mêvanên nûh nihêrîn.

Taxixan pêşîyê hewzanibû ev efserê Merzîyeyêra hatî, karê bacgehêra girêdayî hatiye, yanê jî mêvanê serheng Razîye. Lê dît Merzîye nêzîkî wî sekinîye, şikber bû û ji cîyê xwe rabû. Merzîye-yê pêşbirîn da wî pêşta hat, û got:

- Ev evserê minra hatî Azerîye. Min ew de-watî vir kirîye. Maqûl serheng, bi gorîya we min şaşî kirîye?

Serheng Razî hêz da xwe, hate nikî Merzîye-yê, hinekî kete ramana û got:

- Hûn ser seran, ser çawan hatine. Keremkin rûnên.

Taxixan ser pîyan qerimî bû. Evê culetbûna keça wî hemû xwestinên wî, rêkişandina wî, serobin kir. Naha ewî serheng çawa bida bawerkirinê, wekî heta naha Merzîyeyê tu dema culet nekirîye ku, mêrekî ne nasra derê pêşîya bavê xwe. Serheng berê xwe da rûniştîya :

- Axano, bibine nas, ev bedewa, keçika Taxixane tik-tenê Merzîye xanime.

Berxanedarê berxana risq, yê serbazxana duda, efserê milk Serşarî rabû ser pîya, bada destê xwe bilind kir:

- Evê jî vexwin, eşqa keçên bedew!

Serheng Razî serda zêde kir:

- Eşqa Merzîye xanimê û efserê cîwanî wêra hatî!

Reyîsê tixûbê posta jandarma, bada destê xwe bilind kir û dirêjî Merzîyeyê kir:

- Keremke xanim, -got,-keçên meye nûh dem gotî bibine xwedanê çanda Avropayê. Pêwîste ewana hînbîn, bikaribin bade destê xweda bigirin.

Merzîyeyê destê wî wêda devda û bi miqîm got:

- Çanda Avropayê çanda bê ebûrîyê nîne, wekî ji tu tiştê şermnekî, navê çanda Avropayê dayînî ser hemû tiştê neqayîl û buxudana bavêjî wê.

Te hew dizanibû ev gotinên Merzîyeyê ava sar reşande ser mirovên meclîsê. Taxixan ser keçika xweda hêrs bû:

- Merzîye, bîrneke tu li kuyî. Hatî, rûnê, cîyê xwe bîzanbe.

Azerî nexwest poşman bûna hatina meclîsê bide der, bi rewşeke dijwar vebîşîrî û li Taxixan nihêrî. Ewî fem kir, wekî bavê wê ketîye rewşeke nemir-nejîyînê, lema bal Merzîyeyê rûnenîşt, ser pê sekinî û çavra kir.

Serheng Razî usa fem kir, wekî ew bona nav-hurmata leşkerîyê rûnanê, lema jî got:

- Axano, werên em bada xwe bilindkin û eşqa netewîyê ku, bedewa wîye awa heye vexwin.

Azerî serheng hê wedê dibistanêda xwendinê nas dîkir. Wan dema serheng zû-zû dihate bal dostê xwe. Asa û tev digerîyan.

Azerî destên xwe serhevra biribûn, danibûne ser sînge xwe, piş Merzîyeyê, xwe kutabû dîwêr sekinîbû. Serheng Razî şanî kir û gote Azerî:

- Kuro, rûnê!

Azerî gilîyê wî ber guhê xwera derbaz kir. Ji ber ku, xwedan peyvîrê leşkerîyê, gotî bi fermî karnîyarî hevbin, lê serheng ev rizim teribandibû.

Serheng careke mayîn bi rizmê zabitîyê karnîyarî wî bû :

- Kuro, rûnê!

Azerî ber bi wî vegeirî û got:

- "Mêrsî".

Reyîsê jandarma posta tixûb got:

- Lolo, mirov nikare, van evserên xwedan rayeyê nizm, bide hewaldinê. Te tirê ewana ne Îranînin. Usa tê kivşê, ewana li welatekî dinê, bi awakî cuda hatine perwerde kirinê.

Azerî:

- Em bi sewdayê we ne Îranînin, lê mîna we ne almanin jî.

Serheng nihêrî, wekî firsete, bilind-bilind û bi rik got:

- Dengê xwe bibire, tolaz, tu beqî kîjan pêgava, li rayedarên ji xwe bilintir, gilîya vedigerînî!

Azerî:

- Serkar, ewî bi vekirî ez laf kirim.

- Qenc kir, wekî tu laf kirî, deynê te ewe, wekî guh bidî, serê xwe xarkî.

- Maqûl serheng, ger her kesî erka xwe cî-bi cî bizanbûya, îro memleket nedikete vê rojê, li leşkerîyê xwedan rayeyê bilind, xwedan rayeyê nizm laf kirinê, bê rûmet kirinê, xwedêgiravî bi wê yekêva ji bin deynê xwe...

Serheng gilîyê wî nivcî birî:

- Tu xwedan rayeyê nizm, tuyê daha kîjan deyîndariyê têkî stûyê me?

- Ne ku ez, lê dîrok, welat wan deyîndariya dide safîkirinê.

- Diqewime tu wê yekê bêjî, em jî fem kin.

- Çawa hebe jî, dîrokê û weten ne gotîye, gava maşin û tankên leşkerîyê, yên Îngîlîsan, li soqaq û xasbaxçanra serbest virda-wêda, çûnê-hatinê, xwedan rayeyên memleketêye bilind, kêf-henekava mijûlbe?

Serheng bi tirane û rik got:

- Erê, me fem kir, naha memleketêda, beşê hinek partîyên sîyasî, mîna karîyên pey baranê, serê xwe bilind kirine, ev xwedan rayeyê nizm, xwe

sipartîye wana. Dixweze me kaşke nava sîyasetê. Xorto, me rewşên awa gellekî dîtîye. Kî bûye ker, em jî wanra bûne palan. Tu here bona rewşa xwe bigirî.

- Ez bona rewşa xwe digirîm, lê hûn nahêlin. Wedê min rû bi rû dujminra şer dikir, qe ne eyan bû, hûn maqûl ku bûn. Kî zane, we kîjan meclîsêda awa "Welathizî" dikir?

- Dengê xwe bibire, tolaz ! Bê tore! Ger tu ji xwe mezinaran nikarî rûmetê daynî, mîna keleman ber çavên min neseke.

- Rûmetê, birêztîyê hûn bi xwe dîteribînin. Min Merzîye xanim verêdikir, lema hatime vira. Hatina xwe jî poşmanim.

- Bavê Merzîye xanimê, pismamên bavê wê, dostên wî li viranin, lê tu kîyî?

Azerî xwe ker kir. Qe xwe jî nizanibû bona çi? Ewî li Merzîyeyê nihêrî. Merzîyeyê serê xwe berjêr kiribû û ker sekinîbû.

Azerî hate ser wê nêtê, wekî pêwîste ji vira here û lema jî bi rizma leşkeriyê xatirê xwe, ji wan xwest, paşta vegerî here, vê gavê yekî got:

- Qe tu haj ji rizma leşkeriyê tunenî. Xwezila tu parleşkeriya minda bibûyayî, binê min çi dihanî serê te.

Azerî paşta vegerî û got:

- Maqûlo, hûn tenê nebendîya dikarin bîninê serên kesên xwe. Lê hûn hîn nekirine, nebenîya bîninê serê dujmin. Lê çi ku ma pirsê rizma leşkeriyê, me ew û çaplûs-durûtî tevîhev kirîye. Me jî biçûkên xwe rizm na, lê timê dewa durûtîyê kirîye.

Bona wê yekê jî, yên me, du rojan zêdetir ber
dujmin temûl nekir.

Ew ber şemîkê sekinî bû, yên meclîsê ber
çavên xwera derbaz kir. Nêrînên wî xwe avîtime ser
porê Merzîyeyê, yên di rengên karîbaran. Merzîye-
yê pêra-pêra ev yek seh kir û vegerî li wî mêze kir.
Ronahîke geş xwe avîtibû ser lêv, dêm û çavên
wê. Ji vê lêhîrandina wê, ew hinekî jî ruhdar bû û
karnîyarî meclîsê bû:

- Ger gilîyên we tunenin minra bêjin, destûrê
bidin, ez herim.

Serheng Razî rabû, desmala destê xwe,
avîte ser pêşxwînê û got:

- Tu bê destûr hatibûyî, bê destûr jî here!

Azerî dîsa bi rizma leşkerîyê paşda vegerî û
dêrîva derket. Bi pilekanaran zû-zû dakete jêrê. Hê
ecêb û rîka ku, meclîsêda pêşta hatibû, nehatibû
teribandinê. Merzîyeyê rabû û gote bavê:

- Bavo, ez jî diçim:

Taxixan hê nizanibû çi bêje, weke qirpînîya
çavan wede derbaz nebibû, Merzîye jî odê derket.
Deng ji Taxixan derneket. Gişkan li wî dinîhêrî. Ewî
ne ku, derbarê Merzîyeyêda mitale fikir, lê derbarê
wê yekêda mitale fikir, çawa rêkê serhengra bîbî-
ne, ji Îraqê cerda perçê hevrmûş bike.

Ferasetî bi ecêb tûka gewirîya xwe daqur-
tand, got:

- Ev jî cîwanên meye nûh gihîştî.

Pervîz Kuvserî dibistana leşkerîyê xilazkirinê şûnda, ew şandine par-leşkerîya li quntara çîyan, ya ku 6 km dûrî bajêr bû. Pervîz li mehela Çalhesen xan da, kuçeke biçûke tengda, avayîkî binerdî hên da dima. Bavê wî Mîrze Hesên Kuvserî ji bajarê Kengaverê bar kiribû û hatibû vira cî-war bibû. Îdara notariûsêda kar dikir. Wedê papaxên bi navê "Pehlevî" bi zorê nûjen bûnê, ew ji wan kesê yekemîn bû ku, ew papax dida serê xwe û derdikete nava bajêr. Lê ev culetî ser wî giran rûnişt, ji ber ki, hema wê rojê ew hate nizmkirinê. Ew ji ber çavên Rûgîyê û birên wê - Îsmayil, Cebrayil ket. Dîya Pervîz Rûgîye jineke kore-kor oldar bû. Li sûka sergirtî dikanên birên wê, yên ettariyê hebûn. Wana perçên bêz, mahûd, çît distandin-difrotin.

Mîrze Hesên mirovekî çavvekirî, jîr, zû nûh-dem pejirandî bû. Carna bona hinek pirsan ew û jina wîye nezan, li hev diketin. Lê Mîrze Hesên ji wedê zûtir dunya xwe guhast. Pey mirina bavêra, xalan li wî starî kirin. Xal bibûne sebebkar, wekî ew dibistana leşkerîyêda hatibû pejirandinê û ew bi serfînîyazî xitim kiribû.

Îdî salên zarotîyê û têgiştîyê serra derbaz bibûn. Naha Kuvserî efser bû. Ser pîlên wî du steyrk dibiriqîn. Ev xortê bejinbilind, reşqemer, jarik, hinekî jî way-wayîk bû. Dê timê xemxurîya wî dikişand, lema jî ew ji deb, karkirina malê dûr bû. Pervîz ewledê wêyî tayê tenê bû, lema jî hemû

gotin û xwestinên wî mîna ayeyê Quranê digîhan-
de cî.

Sala xwendinêye dawîyê da Kuvserî bi zex-
mandina xalan zewicî bû. Jina wî – Mîna ne keça
kurdan bû, lê mîna keçên kurdan çefî davîte serê
xwe, girêdida. Cîranê wan timê kurd bûn. Zarokê
erf-edetên wan, ji kincên wan hizdikir. Dîya Pervîz
meta Rûgîyê Mîna ecibandinê, keçikê seraser
kincên kurdan xwekiribû. Ewê fînoyê dorhêl bi
polikên zîvava xemilandî dabû serê xwe. Gûzik û
zendên wê bi bazinên zîv bûn. Kurtikê li wê, bi
xişirava hatibûne neqîş-neqîş kirinê. Deste
gulmixekê hişkirî timê pêşîra kurtikê sorîgevezda
darda kirî bû. Evê rewşê keçik bedew dida kivşê û
ji kincên wê bîna xweşik dihat. Bejin-bala wêye
paqîş, kenê wêyî xweşik mirov heyr-hejmekar
dihîşt. Dayîkê keçik hebandinê şûnda, gellekî
nekişand dewata Pervîz û Mînayê hate lêdanê-
derbazkirinê. Ewana gihîştine mirazê hev. Sal hatin
derbaz bûn. Dêmên Mînayê timê mîna ewrê reş
xitimî bû. Pey mêrkinêra ewa ketibû vê rewşê. Ew
sê sal bû, zarên wê nedibû. Lema jî hey nava
mitalada bû. Xesûya wê jî malda zû-zû derbarê
zarêda diaxîfî.

Rûgîyê timê malda sikûmê xwe dadixist û ev
yek tunebûna zarêra dida girêdanê. Carna jî dizîn-
kava digote Pervîz: “Mala ku, bê zaroye, şayî
nabe”. “Jineke dinê bistîne, bila tera zar bibe”.

Carna Mînayê ev gilîyên dê, yên ku Pervîzra
digotin, ji zarê wî dibihîstin. Ewê derzkiribû, ku ev
pirseke ferze. Lema jî bona vî alîda çarenûsa xwe

safîke, diçû bal felvekirin, tasgirtan, nivişkiran. Lê çi feyde? Ew sê sal bû, xesîyê zar dikire menî wêra şer dikir, nav-nûçk dihanî serê wê. Kuvserî jî heftê carekê dihate mal. Ewî ev yek karkirina parleşkerî-yêra nedida girêdanê, lê menîya tunebûna zarê derdixiste holê.

Mînayê malda xurek dipet, fêra dişûşt, çi dikir, ne dikir, pîrsa zarê, ramana ewa dibir derdixiste nebanê dest negihîştî, xwestinên çarenêbûyî. Ewê Pervîz hiz dikir. Mîna bûkeke usa nîbû, wekî mêr weke çarenûsa xwe bibjêre, yanê jî buguhêze. Lema jî qe mitale nedikir ji Pervîz bê berdanê, here merekî mayîn.

Nişkêva ji hewşê yekê bangî wê kir:

- Mîna, lélê Mînayê, tuyê herî mizgeftê?

Ew dengê jineka cîrana wê - Hecerê bû. Mînayê hema gilîyê mizgeftê bihîstinê, karê xwe wêda danî, çarşev hilda, avîte ser serê xwe û pilekanara dakete jêrê.

- Erê, meta Hecer, ezê herim. Ezê herime ber dergê Xwedê, ewe bawerîya mine dawîyê.

Ji zêrandina tik-tenê, ramanên bê hafî ewa diheliya. Meta Hecer û Mîna gihîştinê mizgefta cumeyê, ji serê mînarê dengê ezanê dihate bihîstinê. Ev dengê ku, mîna ava sar li bajêr dihate reşandinê, dilê Mînayê diêşand. Ewê ev deng bihîstinê, mirina xwe dihanî ber çavan. Wê tirê gava ewa mirinê, gava ewê bibine mala wêye heta-hetayê, wê bi vî dengî ezanê bidin û wê bangî hemû mirovên bajêr bikin, wekî bêmirazeke carenûs reş, dunya xwe guhastîye. Ewê bin vî dengê

ecêbda bê binax-kirinê. Mîna girîya. Hecerê îske-
îska wê dibihîst, lê xwe ker kiribû, ji ber ku, ewa haj
derdê wê hebû. Ew jî zanibû, wekî Mîna ber her
dengekî kewrek digirî.

Li dora hewza mizgeftêye mezin, êpêce mi-
rov çarmêrikî rûniştibûn, nimêj dikirin. Îro meremê
Hecerê ew bû, wekî bê mizgeftê û mele Husêyn
bivîne. Ewê dixwest bona kurê birê xwe Sûrûs
duakê bide xwendinê. Kurê birê wê li pêşenîya
Senendecê, ji alîyê şoreşvanên kurdan da hatibû
kuştinê. Mele Husêyn melekî bajêrî bi nav-deng
bû. Hecerê hê zarotiyêda mele nas dikir, lema wîra
serbest di-axifî, çi dilê wêra derbaz dibû digote wî.
Mînayê pêşberî mele Husêyn rûyê xwe hişke-hişk
girêda bû. Ewê li rîdana meleye bi hene, dêmên
wîyî hur-pizî, çavên bijiqî dinihêrî, ketibû ramana û
nizanibû çi bêje. Lê mele li jina nedinihêrî, morîyên
tizbîya reşe dirêje dêsta, ser hevda dev dida û te
qey digot, pêsta ew gilî-gotinê ku, wê bêje, pirseke
dihê-jand.

Hema Hecerê dixwest biaxife, nişkêva Mîna-
yê kire kûre-kûr girîya. Mele Husêyn karnîyarî wê
bû:

- Keça min, çiye derdê te, çima digirîyî?
- Derdê min mezine, -Mînayê got, -û daha jî
bilind-bilind girîya.

Êmê çend deqîqan şûnda got:

- Apê mele, min dora serê vê mala Xwedê bi-
gerîne, îlacekê li min bike, ber Xwedê bigere, ber
pêyxember bigere, yanê na, ezê xwe bukujim, ûhu,
ûhu.

- Keçka min, ne min pirsî, derdê xwe bêje, cîyê sekinî megirî, Xwedê dermanê hemû derdî daye, zane. Ewê rê nîşanî me bike.

- Apê mele, li erdê ji te, li jorê ji Xwedê tiştêkî naxwezim. Çi belayê dide min, bila bide, lê bila ew Xwedayê mezin bi mezintaya xwe, ewledekî kor, qop bide min.

- Eva çend sale, te mêr kirîye?

- Eva nêzîkî sê salaye.

- Mêrê te kîye?

- Mirovekî qence, leşkere, lê dîya wî, herro tunebûna zarê dide rûyê min, kurê xwe hîn dike.

- Mêrê te kêderê xizmetê dike?

- Li bereka çiyayê Qesrî-Şîrînê, parleşkerîyêda...

- Lêlê, wekî usane xwestina te ewlade?

- Belê, axa, qurbana cedê teme, min dora serê ewledên xwe bigerîne...

- Pirr pak, keça min, hinekî bi sebirbe.

- Apê mele, çiqasî bi sebirbim, ez amedeme herime ber mirinê, tenê bila Xwedê ewledekî bide min, mirinê jî bila bal wî mêrî rûreş nebim, bila ocaxa min kor nebe.

Mîna bi şewat-şewat digirîya. Mele berdilê wêda hat got:

- Keçika min, naha ku, tu hatî ber dergê Xwedê, naha ku, tu ewqasî hewcî alîkarîya wîyî, ezê mîna bendekî belengaz, ber Xaliqê Jorîn bigerim, bila ewledekî bide te.

- Bila Xwedê temenên dirêj bide te. Bila Xwedê sîya te, ser serê van bendên muselmanaye belengaz kêr neke.

Hecer rabûnê, Mîna jî rabû, çarşev li xwe pêça. Mele Husêyn amade dibû here nimêjê. Gişk hîvîya wî bûn.

Mîna ji dêrî derketinê bi bawerî got:

- Xaliqê Jorîn, ez qurbana qudreta te bibim.

X X X

Mîna ji mizgeftê derketinê, serê wê gêj bû. Ewê ber bi malê zû-zû da gava. Dilê wê fire bibû, bona wê yekê, wekî ewê li hûzûra mele Husêyn ya dilê xwe, derdê xwe wîra qal kiribû, yek jî meleyê bona wê, ji Xaliqê Jorîn alîkarîye bixweze. Ewê dêmên xwe qayîm-qayîm pêca bû, bibû gula ne bijiqî.

Mîna jî neke usa bû, wekî ewê ew qasî jî bawerîya xwe li ecêba, tilsîma nedihanî. Lê nava van sê salên dawîyêda, jîyanê ewa ewqasî posîde kiribû, mîna mirovê berêda xeniqî, ku destê xwe davêje qirşa, a usa bawerîya xwe da bû ser ecêba.

Ji vê qewmandinê jî, çend meh derbaz bûn. Lê Mîna nebû xwedanê ewled. Ewa jar bibû, kelîya bû, mîna belgê binavê zer bibû. Pervîz jî heftê carekê ji parleşkerîyê dihate mal, ev rewşa jinê dîtî, bawerîya xwe ji wê unda kir û îdî derbarê zarêda gilî nedikir. Evê yekê hinekî jî Mîna bê bawerî kiribû.

Ewa mîna dara kurmxwerî hêdî-hêdî reşdiqe-
milî û diweşîya. Gulîyên wêye dirêje reş, mîna
hevirmûş hêdî-hêdî diweşîyan, çav korta diçûn,
mîna şamê diheliya, dilop-dilop dihate erdê.

Kuvserî jî li parleşkerîyê mîna berê nedikete
xemxurîya serbazên hîndarî kirî. Ew hindikî diaxifî,
timê nava mitalada bû. Ev gişk bi rewşa jina hizkirî
Mînayêra girêdayî bû. Ewî tirê bajêrda gişik vî
derdê malbeta wana zanin û cizaretîya ku ewana
dikişînin tê derxistine. Ji ber ku, dîya wî ev pirs
ewqasî li hevanîbû, dabû wermandinê.

Destpêbûna havînê bû. Cîyê ku, Kuvserî lê
kar dikir guhastibûn. Bîst heyşt kîlomêtra dûrî
bajêr, li berê gola Xizirê parleşkerîyêda dîsa ser-
bazara mîna berê hîndarîya leşkerîyê derbaz dikir.
Vî karîra girêdayî, ew du heftê bû Kuvserî nikaribû
here mal. Yek jî, ji alîyê Sakkiz û Baneyê bi
serkarîya Hamo xan dest bi şoreşê bibû. Bona vê
yekê jî, li parleşkerîyê da rizm hatibû guhastinê.

X X X

Roja dawîya heftîya sisîya, Mînayê dizî
xesîyê û cîrana birîyar kir, here bal mêrê xwe.
Nêzîkî parleşkerîyê ji maşînê peya bû. Ewê ji vir, ji
wir cîyê hêwirgeha parleşkerîyê pirsî. Kuvserî bi
dêmekî xitimî ewa pîşwaz kir. Ewî qe bawer
nedikir, wekî jina wî dikare bê derê vira. Evê
qewmandina çavra-nekirî xirab hukumî ser wî kir.

Li rûyê Mînayê ji şabûn, hetavîya berê tişteke tune bû.

- Pervîz, -Mînayê bi kelogirî got, -ez bê sûcim, bila rîka te li min neyê.

Ewê bi çavên hêsir, bi posîde li rûyê mêr nihêrî. Ew jar bibû, ji dil bona wî kewgirî. Nişkêva destê wî girt û bire ser lêvên xwe. Çend cara maçkir. Çavên Kuvserî tijî hêsir bûn. Ewî nexwest jin wî, vê rewşêda bibîne, lema jî rabû derbazî oda dinê bû. Mînayê usa têderxist, wekî rîka mêrê wê hat û bona jî wê dûrkebe, rabû derbazî oda dinê bû. Ewa rabû derketê hewşê, bona tu kes hêsirên çavên wê nebînin, qe nezivirî piş xweva jî nenihêrî û da ser rê. Çawa hatibû, usa jî paştê vegerî.

Kuvserî hêsirên çavên xwe paqîş kir, dil da ber dilê xwe û vegerî cîyê rasthatina bi êşjan, lê Mîna ne dît. Derketê derva, ewa li wir jî tune bû.

XXX

Sibê Kuvserî destûr stand û ber bi malê lezand. Rêva kete mitala, bona zêrandinên Mînayê bide kêr kirinê, bibe şîrîkê derdê wê, bicedîne cîyê parleşkerîya xwe buguhêze û ewê jî bibe bal xwe. Ew gihîşte malê, derî bi şabûn vekir, lê Mîna nedît. Mirov şande mala dîya xwe. Mîna li wir jî tune bû. Çûne mala xalê gerîyan, çi feyda... Çawa dibên, dîya wî jî hate hewariyê, lê Mîna minê bibû.

Heftêkê li bajêr Mînayê gerîyan. Organên berpirsiyar, yê bajêr tevî vê yekê bûn. Tu kesî tişteki xêrê dernexiste holê. Ji undabûna Mînayê heyşt roj derbaz bibûn. Karkarên selexanê li berê çêm, rastî meytê jinekê hatin. Wana derbarê vê yekêda posta jandarmara gotin. Mesîyan guhê jinika xeniqî bi morîyava, poz, lêv, tilîya qilîşkê, ya destê çepê xweribûn. Pey lêkolîna çend rojara hate zanînê, jinika xeniqî, jina Kuvserî Mînaye. Ewa ji rasthatina Kuvserî paşda vegerîyanê, rêva maşîneke buhurî siyar dibe û heta pirê tê. Li wira peya dibe, êpêcekî çêm mêze dike, paşê ji pirê xwe davêje.

Pey şîna Mînayêra Kuvserî nizanibû çî bike. Komîta rêvebirinê dijî wî û dê ewqas tawanbar û pirs-pirsiyarîyê bê bingeş, bê fermî dibirin, ew bêzar bibû. Ya here giran ew bû, kî ku ber dilê wîda dahat, kê ku wîra sebir dixwest, Pervîz di nava çavên wanada dijî wî şikberî didît. Li vir, li wir gilîkî hajî digerîya, wekî sûckarê mirina Mînayê mêr û xesûya wêye. Te tirê ev şikberî nava lêrihandinên gişkada kûr-kûr hatîye veşartinê. Kuvserî ev şikberîyan didît û seh dikir. Alîkîda mirina Mînayê, alîyê dinêda şikberîya, ew kewirek û posîde dikir. Kuvserî dixwest ji vir bihêle here, ceza-cizaretîyê bide xwe û bi vê yekêva "gunê" xwe, ber ruhê Mînayê paqîş, bide şûştinê, sivikirinê.

XXX

Kuvserî dostê xwe Azerîra name nivîsî:
"Dostê minî ezîz, Azerî. Eva çend heftene ez nava şînêdame. Jîyan, der-dor, erd-esman min dihicirîne, dixeniqîne. Mîna bê sûc xwe avîtiye nava pêlên çemê bi leqem û minê bûye, ruhê wê rehetbûnê nade min. Ewa şeva dikeve xewna min. Gava dixwezim bikevime ber pîyê wê, ber bigerim, ewa minê dibe, kûre-kûra wêye bi şewat, bi kizik xewnên şeva li min herimandîye.

Dostê minî delal, ax wedê me mekteba leşkerîyêda dixwend, çawa bê xembûn. Lê me nizanibû paşdemîyê çi me çavra dike. Me nizanibû, miroveke bi navê Mînayê, ya feqîr, bê sûc, wê tunebûna ewled xwera têke derd-kul, bobeleteke mezin bîne serê xwe, bibe qesasê xwe. Me nizanibû, welatê me, wê bin çerxên tankên derekeda bê hincirandinê. Me nizanibû, wekî ordîya Îngîlîsan wê rizgarîya me pêpeske. Me nizanibû wê tiranê xwe, li gelê meyî hêlûk û dîlovan bikin. Me ev yek nizanibû. Ez van mirovên kincên zer xwekirî, dagirkaran, yên ku xwe danîne dewsa axa, kerxet dikim.

Ez yên ku, gel kirine nava xewa şîrîn û derbarê hêza ordîya Îranêda çîrok hevanîne, kerxet dikim! Ez Rzaxan kerxet dikim! Ez xwe jî kerxet dikim! Naha jîyan bona min bûye karpêkeke bedewetîye ser şanogehê. Dostê min, ew roj derbaz bûn, xeza bûn. Derbên giran, yên evê jîyana netê,

ez pêpes kirim. Sîtara min hilweşand. Kewa min ji hêlûnê da firê.

Dostê minî hêja, diqewime ez sûcê xwe, bi bilindaya mirinêva bidime şûştinê. Diqewime ez vê carenûsa xweye reş, bi top-agirê pêşenîya li Sennedecê bidime ronahî kirinê. Na, ez gunehkarê mirina Mîna bê gunehim. Min nikaribû dilê evîndara xweye bi ronahî, ji kovanên heder û ji derewên li hevanî bida parastinê, lema gunehkarim û ezê tu dema nikarbim xwe efûkim. Bona ez van gunehkarîyên xwe bişom, pêwîste jîyana xwe bikime bereke-pêldayî, tirpe-tirpa dilê xwe bikime zengilekî û guhê kerra vekim.

Dostê hizkirî, min biborîne, wekî min tu postîde kir. Ji te pêştir dostê min tune. Şêwirê bide min, alîkarîyê bike, wekî dikarî min ji vê herîreşkê derxe. Zef spas!

Pervîz Kuvserî".

XXX

Azerî derva xwe kuta bû zînê ser qelexa textan. Nama Kuvserî xwend û kete mitalan. Ew hate ser wê nêtê, wekî here bajêr, vê roja tengda bibe alîkarê hevalê xwe. Ew çavnihêrîyê serekleşkerê parleşker – Muftahî bû, yê ku hê ji şêwir-civîna leşkerîyê venegerî bû. Mirina Mînayê dilê wî jî leri-zand, him jî evê namê ezîzên wî, kirine bîra wî. Ewî têderxist, wekî van salên dawîyê ew gellekî ji qewm – lêzim, dostan dûr ketiye.

Azerî heyşt sala berê ji Tebrîzê derketibû. Hewşa wane bi çûk, ya rex çem, avayê wanî duta yê ji bilûkên sor avakirî, xuşe-xuşa ava karêza di hewşêda, belgên darên bihokê, kelaxa (desmal-mendîla bona serê jina) Şekîyêye reng binefs, ya li serê Şerîfena dîya wî; potê Mîrhêyderê bavê wî, yê ji mahûdê reş, yê ku eva bîst sal bû ku, xwedikir, herdu stûnên li hewaleyê, yên ji dû zerbûyî, wêneyên çivîkan, yên ku, wî zarotîyêda bi mismaran kişandî, yek jî burîyên dêye reş, yên ku, tu dema kilnedayî, biskên wêye cênikada daliqî, yên mîna ecêbeke evra, yek jî bîna gîha-pincaran, ya taybetî ku, ji dikanê ettara tê, ji kincên bavê kêmnebûyî, rengê wîyî sipîcolkî, qerçimekê nava burîya da, leqa-leqa diranê wîye pêşîyê, gava nimêj dikir, nêrînên wîye bin çavan, çavên wîye qerimî, mîna lên-ta bîranînê hatin ber çavên wîra derbaz bûn.

Êpêce wede bû, ku ewî ji ezîzên xwe name nestandibû. Şuxulkarîya li parleşkerîyê, fêrbûna dersan, zû-zû cîguhastina kar, bona şandin, stendina nama bibû hasêgeh. Nava wan heyşt salanda tenê carekê, du sala berê bona şîna Nezerînê apê xwe çibû Tebrîzê. Li wir, bona kincên efserîyê ji der-cîrana, ji dost-nasa şerm kiribû. Ewî têderxist bû, gişk ne ku li wî dinihêrin, lê li kincên lê dinihêrin û nava vê mêzakarîyê da dilsarîk hatibû veşartinê.

Azerî, ji wedê Merzîyeyêra kivşkirî, du roja berê hatibû bajêr. Lê vê carê ew li dîdemeke bi ecêb qesidî. Sehet yanzdeh bû. Li soqaqa sereke pêda-pêda dikanên mezin, serbarê serda, kînotêatr jî hatibûne dadanê.

Li soqaqan û xasbaxçan xêncî maşinên Îngîlîsaye leşkerîyêye zerîn, ne maşinên mayîn, ne jî mirov dihatine kivşê. Te hew dîzanibû rewşeke rizmê der destdaye.

Azerî kete mitala. Ramanên wîra kenê Merzîyeyê, porê wêyî zerînî ser hevra pêldayî, dîdema avayê dutayî li kuncekî Tebrîzê, yek jî Kuvserî hat derbaz bû. Xêncî van hersê ramana, tişteki mayîn bîr nedihanî. Ew diçû, ewî dida gava. Li pêşîyê rûyê Kuvserîyî reşqemilî, beşera Merzîyeyê xweş, yek jî avayê ku, têda kal-pîrek dijîn, ew çavra dikir.

Meydan bi mirovan kimkimîbû. Te tirê bi zorê hemû binelîyên bajêr beravî vira kiribûn. Jinên bi çarşev derketibûne ser banê xanîyên dora sûkê, ser banê hemaman, dikanan, yek jî zaran, çawa jorda li bîran mêzekî, usa mêze dikirin. Ji pênc kuncan mirov dikişîyan tijî meydane dibûn. Çawa pênc çemên gur bikişe bê, tijî bereke mezin reng hêşîn bibe. Her ku wede derbaz dibû, bera mirovan diwerimî, usa bibû, wekî li ser dîwaran, dora hewzên wan dera, li berbanîkê dikana, li ser serê stûnên têlêgrafan mirovan cî nedida hev.

Yekî jî ser kevirê pilekana îdara wezaretê dikire qare-qar, çî digot, kesî nîzanibû. Lê dengê wî

nava vê bera mirovada, dibû dengê ber bayê gur. Li ber îdara nezmîyê jî, du rêz ajanên destada çek sekinîbûn, lingên xwe vajî kiribûn, çek danîşanî bera mirovan kiribûn.

Kalek zûr bibû li Azerî, daha rast li kincê wî-ye efserîyê dinihêrî. Azerî berbirî wî bû:

- Apo, çi bûye?

Kalê li ser vî efserê cîwan metel ma, gelo ew vê demê, li vira çi dike û bi ecêb got:

- Têkoşîne, gel nîn dixweze, dewê dike, wekî nan erzanbe...

Kalê hê gilîyê xwe xilaz nekiribû, pêlên mirovan, ew devdane nava rêzên teng. Azerî vegeerî piş xweva nihêrî, dît ew nava qelfê mirovadaye. Gişka bi ecêb wî dinihêrîn. Ew bi kincên xweva, wê deqî-qê ji gişkan dihate cuda kirinê. Kaskêtê serê xwe hilda, ji ber ku, kaskêtê dûrva ew dida naskirinê. Lê ewî nikaribû kaskêtê destê xweda xayîke, diqewimî ew bihata hicirandinê. Ewî kaskêt careke mayîn da serê xwe. Îcar jî ewî nikaribû kînbuxsa mirovî, çavên wane bi agir-alaf binihêre. Ji ber ku, ev kînbuxs, ev neqayîlbûn diji organên dewletê bû. Lema jî têkoşînan gişkan bi ecêb li wî dinihêrîn. Îcar Azerî zelal tê derxist, mirov naxwezî wan kinca mêze-kin. Vê demê ew yek kete bîrê, çawa li Tebrîzê cîranê wan Hacı Mêhdî, gava kurê wî Cemşîd mekteba efserîyê xilaz kiribû, çawa wî çûbû bi tenbe deste kincê efserîyê kurra dabû dirûnê û çawa cîran dihatin bi hewas li wan dinihêrîn. Wê demê bavî wî - Mîrhêyder hate ser wê nêtê, wekî rikî Hacı Mêhdî axa Darîyîş bide xwendinê, bike efser.

Dê dijî vê yekê bû. Qe hewasa Darîyîş jî tunebû bibe efser. Lê rojekê ew kuçê rastî Cemşîd hatinê, ser kincê wîye leşkerîyê heyr-hejmekar ma bû. Ew kinc usa li bejin-bala wî dihat, bala mirovan dikişande ser xwe. Darîyîş bejinêda ji wî bilind bû û ev kincana wê daha rind li bejina wî bahata. Dê wê weşê ev hewasa kur tê derxist û hate ser wê nêtê, wekî careke mayîn dijî xwestina mêr derneyê.

Azerî nava pêlên bera mirovada, ew rojana ber çavên xwera derbaz dikir, bîr dihanî. Li piş stuyê xwe nefesa qelfên mirovan seh dikir. Dîsa jî, bi ramanên xwe çû Tebrîzê, kincên kurê cîranê wan Cemşîd kete bîrê. Wekî ew kincên Cemşîd, yên efserîyê nibûya, ew nedibû efser.

Naha ev kincên efserîyê, nava qelfên mirovên bi hewar-gazîda, bibûne sedemê kîn-buxsa wî.

Eva cara yekemîn bû, wekî Azerî didît mirov ewqasî bi rik li karkarê dewletê dinihêrîn. Pêla bera mirovan ew devda, anî derxiste ber wezaretê. Vê gavê dengekî hurumîyî bi rik, ser qelfên mirovanra derbaz bû:

- Ay gel, bila reyîsê wezaretê bi xwe bê, me bide serwaxt kirinê, çima nan ji 4 krana, hetanî 6 krana zêde kirine!

Palekî, yê ku kincê kar-kombînêzon xwekirî, lepgir, destê xwe nava hewêda ba kir bi qayîm got:

-Bila reyîsê wezaretê jî biceme! Mera nan pêwîste! Em nikarin nanê bi 6 krana buxwin!

Azerî haj rewşa bajêr tune bû. Ewî tu dema nedihanî hişê xwe, wekî diqewime leşkerê

hemyekîtiyê têkeve bajêr, pirs a borîyê wê li hev-
keve, bê teribandînê. Bêxovkirina xwerin-vexwe-
rina 20 hezarî zêdetir leşkerê Îngîlîs, Amêrkayê
bajêrda pirs a borîyê teribandibû. Yek jî mirovên,
ku xwedanê dex! bûn, ew pangeh-embara da xayî
dikirin û giranî pêşta dihanîn.

Paleyê li pêşîyê, yê ku kumekî gewr li sêrî,
pencekekî kewn xwekirî, derkete ser derbanikê
têlêgrafê û destê xwe dirêjî wezaretê kir û got:

- Gel! Paleyên ku, vira beşter bûye, ez
bijartime çawa wekîlê xwe, hetanî, hêjaya nîn 2
krana danexin, emê ji vira neçin!

Mêrekî rîdanreş, bi sivik derkete ser kevirê
hewzê û serda zêde kir:

- Em Fêyzabadana jî dibêjin, wekî wezaret
hêjaya nîn kême neke, topê jî nikaribe me ji vira
bileqîne!

Ji nava tevgeran yekî jî awa got:

- Xwedan nanno, wera mirin dest dide!

Tevgeran bi hewêrze wekilandin:

- "Mirin,"! "Mirin"! "Mirin"! Ev dengana çend
cara hatine wekilandinê. Mirovên ku derketibûne
ser kunbezên hemaman, yên ku rex avayên bazar,
dikana çîr girtibûn sekinibûn, dûrva mîna çivîkên
ser sîmên têlêgrafan dihatine kivşê. Şagirtên hos-
tên dikanên solan jî deng dabûne dengê hev,
diqîrîyan:

- "Mirin"!

Nişkêva seqirtîke bi ecêb meydan hingavt.
Reyîsê wezaretê derkete balkona wezaretêye ke-
vin, ya tayê duda. Nişana kaskêta wîye mezin ber

tavê birq veda. Ewî herdu destên xwe bilind kir, zû
ji daxist û bi dengekî bilind got:

- Ey gel! Gişk vegerine malên xwe, ser karên
xwe! Sibê îdara beledîyê vê pirsê serhevda bîne!

Ewî hê gilîyê xweyî dawîyê negotibû, tevge-
ran bi xofeke ne dîtîva kirine qûje-qûj:

- Hûnê nikaribin me bixapînin! Pêwîste hema
roja îroyîn fermanê bidine nandarxana!

Rewşenbîrekî cîwanî serqot, porê sêrî rind
şekirî, bi galûstik, yê ku pêşdevanîya tevgeran di-
kir, gilîyê reyîs nivcî hîşt, got:

- Bila ziktêr bêne helikandin!

- Bila nan baha kir bêne helikandin!

- Bila reyîsan bêne helikandin!

- Bila îngîlîs bêne helikandin!

Tevgeran bersîv dan:

- "Bila bêne helikandin"! "Bila bêne helikan-
din"!

Serkarê wezaretê destê xwe, da ber devê
xwe û bi hemû hêzîva qîrîya:

- Ne wera dibêjim ji vir bicemin! Eva serhil-
dane!

Tevger dîsa ser hevra, ber hevra çûn, hatin.
Serokê ku, balkonê sekinîbû, dane ber keviran.

Ji pêlên tevgeran Azerî litimî, ew ji parava
devdan. Xortê pêşîyê sekinî, bi enîşka xwe par-
xana Azerîye rastêda lêda. Azerî ewa parava
hemêz kir. Lê pêlên mirovên bi kîn, ew ji cîyê se-
kinî çend gava wêda avîtin.

Azerî pêşman bibû, wekî ketibû nava vê
bobelîskê û dîcedand ji vira here, ji wan nêrînên tûj

xwe xilazke. Tevgerê mîna dêwa devê xwe vekirî-
bû û dixwest der-dora daqurtîne. Ew mîna dêwê
birîndar diquncîl, dihejîya, ser hevda dirêj dibû, kin
dibû û dikire hele-hel.

Dengên gulan meydan hingavtinê, hej mey-
danê ket, dengên xeniqî hatine bihîstinê. Nava
gullebarandina pêşîn û duda da weşekê nekişand.
Gişk ber bi kuça revîn. Meydan mîna ava bîrên tijî,
ser hevra kişîyane çend kuçan. Tevgerên, ku
berjêr direvîn, çi dikete ber wana, hûr-xweş dikirin,
sera derbaz dibûn.

Azerî raste-rast nava meydanêda sekinî bû û
dinihêrî çawa mirov rê nadine hev direvin, derê
kîjan dikanê, kîjan hewşê vekirîye dikevîne wira.
Dengê mirovên bin pîyada mayî, yên birîndar tev-
hev bibû, nale-nal, zare-zara wan dihate bihîstinê.
Mirovên ku, li meydanê ketibûne bîrên avê dest-
pîyê xwe virda, wê da ba dikirin.

Azerî li revoka dinihêrî hewzanibû kuçaran
qîr, avîreş dikişe. Sê birîndar ser kevîrên raxera
meydanê ketibûn, li erdê mabûn. Gava careke
mayîn ji serbazxanê serbaz anîn, wana dora
meydanê girtin. Azerî nava meydanêda tik-tenê
ma. Ewî nihêrî li pêşîya serbazan yekî bejinbilind,
bi berçavk, kêvxweş diçe. Ew kes wedekî li mekte-
beke leşkerîyêda dewsgirtîyê komandîr - Ferasetî
bû. Ewî Azerî naskir û got:

- Hûn li vira çi digerin? Diqewime hûn jî tevî
şoreşvana bûne?

Azerî nêzikî wî bû û got:

- Destûrê bidin menîya wê yekê bêjim, ez çima li virame?

- Naha, vê rewşêda wede tune, em ewê pirsê safikin. Paşê.

Azerî nizanibû çî bike. Yek jî ewî li vira çidikaribû bikira. Mirov revîbûn, meydan vala mabû. Bona birîndaran ji meydanê hildin çend ejan destên wanada serpentê sanîteryîyê ketine meydanê.

Vê demê maşineke taybetî ya leşkerê Îngîlîs, pey hev, pey hev signal da, kete meydanê û bal Azerî bizexm tormiz da, sekinî.

Ji maşinê gênêralek peya bû. Ew, gênêral Vayvîl bû. Azerî xwest ji ber çavên wî xwe take. Lê ev yek mîyaser nebû. Gênêral ew naskir. Ew bi ken, çend gava ber bi wî hat û bi rizma leşkerîyê destê xwe bilind kir û pirsî:

- Maqûl Azerî, li vira çî dîke? Diqewime tu jî tevî şoreşvana bûyî? Tişteki bi ecêbe.

Paşê vegerî kittên solên li meydanê, papaxên vala mayî mêze kir û ser axaftina xwe da zêde kir:

- Yeqîn we ez bîr nekirime?

Azerî qe xwe neşkênad, got:

- Ez li gelîyê çîyayê Arîzê rastî we hatime. Gênêral, ew rasthatin tu dema bîra min naçe?

Azerî ev gilî gotin û bi rizma eskerîyê selam da. Gênêral destê wî girt, berjêr kir û got:

- Bi zanebûna min hûn Azerbaycanînin, ji Tebrîzêne?

- Hema usane, gênêral.

- Ji vê heşîrê, dîsa ew der rinde. Lêytênant, qe bona wê derê ber xwe nakebî?

- Çi bêjim, xizmetkarîya leşkerîyê dewê dike, ku...

- Ger tu bixwezî, dikarî li wir xizmetîyê bikî.

- Ew yek çawa dibe? Ez mizûrî vira kirime.

- Wekî tu bixwezî, em dikarin mizûrîya te bu-guharin, cîguhastî wirakin, lê bi qewlekî.

Ewî xwe bi dildarî da kivşê, vebîşîrî û serê xwe ber bi Azerî kir, got:

- Qewl jî ewe, wekî tu li wira gura me bikî.

Azerî kete rewşeke nebînîyayî û hê derz kir ew çî dixweze. Ewî careke mayîn devê xwe nêzîkî guhê Azerî kir û hêdîka got:

- Emê ewê yekê jî bîrnekin, wekî te dayînine serkarê rûdîngehê.

- Gêneral, tabîya min destûrê nade, ez bi-bime serokê rûdîngehê. Yek jî, ez qe ji pêşeyê xwe qayîl nînim.

- Çîma, lêytênant?

- Min hê ciwantîya xweda ev pêşe hiznekîrî-ye.

- Min tu çawa topavêjekî êgin, li parleşkeran pesinandîye.

- Gelo, çîma hûn dixwezî topavêjekî dayînine serkarê rûdîngehê?

- Pêwîste serkarê rûdîngehê daha gellekî sîyasetzanbe, ne ku leşkervan. Rast nabêjin, lêytênant? Ez dixwezîm tera vekirî bi axifim. Hema roja roj min seh kir, wekî ji gişkan gellek tu kovanî, çîma leşkerê me hatîye ketîye welatê we? Belê, kovan

bûna efsarekî mîna te, yê bi qîret, cî bi cîye, ji ber ku, welat, wetenê te hatîye dagirkirinê. Ji roja ewlîn min tê derxist, ku tu efserekî bi xîretî. Ez wê yekê jî zanim, ku azerbaycanîyan bona wetanhizîyê gellek îmtahan dane. Bona wê yekê jî, ez dixwezim gava welatê we ketîye vê rewşê, hûn bi êgintî wêra xizmetkarîyê bikin. Azerbaycanêra.

Hema Azerî dixwest tiştekî bêje, Ferasetî nêzîkî wan bû. Ewî bi rizma leşkerîyê selam da gênerâl Vayvîl û paşê berê xwe da Azerî:

- Naha em dikarin tera bi axifin. Keremke!

Gênerâl tevî axaftinê bû:

- Maqûl servan, destûrê bide, em axaftina xwe kutakin.

X X X

Ferasetî tu gilî ne got, ji wan dûrket, lê bi kîn li Azerî nihêrî. Hê kete bîra Azerî, ku ewî sê hefteya berê, li meclîsa serheng Razî da Ferasetî dîtibû.

Ferasetî çûnê şûnda, bona ku Azerî ji vê rewşê derê, qestbende berê xwe da gênerâl û got:

- Maqûl gênerâl, çend rojan wede bide min, ez derbarê vê yekêda ramana bikim.

Gênerâl ew dewatî maşîna xwe kir. Azerî hate ser wê nêtê, wekî vê fîrsetê ji dest bernede, lema jî ber bi maşîna gênerâl çû. Lê ev yek ne bi dilê wî bû, lema xwe-xwera kire şer. Ji ber ku, sê hefteya berê, ewî li meclîsa kêfê maşînen îngîlîsa

rexne kiribû, lê naha bi xwe diçe wê maşînê sîyar-be. Ferasetî jî çawa tevgelekî wê meclîsê ew yek dîtibû. Vê demê gêneral gote Azerî, wekî biborîne pêwîste ez serîkî serkarê wezîrîyê xim.

- Gêneral, wekî usane destûrê bide avtoajoyê xwe, bila min bibe serê sûkê dayne, vegere. Ez mîna efserekî bi sîyanet gilî didime we, ku ezê derbarê pêşnîyara weda nêta xwe bêjim.

- De bi xatirê we, hetanî rast hatina me. Ez bawerim hûnê ji nêt û pêşnîyara min hafîyê rast derxin. Gûd bay!

Gêneral bi îngilîsî teme da avtoajoyê xwe û pilekanên wezîrîyêra zû-zû da gava, derkete jorê.

Azerî maşînê hetanî ber derê mala Kuvserî da ajotinê. Ji maşînê peya bû, spasîya xwe da avtoajo. Maşîn vegerî û sivderêra derket, çû. Azerî kete nava mitala û dîcedand meremê pêşnîyara gêneral tê derxe. Ewî usa verevûrt kir, ku gêneral dixweze berê kîn-buxs, kudreta wîye dijî leşkerê hevkarîyê, bide leşkerê Sovêtê, ya ku vê demê Azerbaycanêda cî-war bûye û paşê li wira ewlekarîya taybetî bide derbazkirinê.

Azerî derê hewşê kuta. Lê ji hewşê tu deng nehate bihîstinê. Tu kesî derî venekir. Ew paşda vegerî. Nava sûkêra derbaz bû, derkete kuça mezin. Naha ewî seh fikir, wekî dilê wîda, valabûneke mezin heye. Nava vê valabûnêda der-dor reşqemilî bûn. Bobelata Kuvserî ya taybetî, birîndarê bê xweyî, bê xwudane ku, pêşberî wezîrîyê mabûn, karnîyara gêneral Vayvîlî, ev gişk hundurê wîda li hev piçilikî bûn.

Kuçe pey kuçara diman. Peroja mirovan, hê li rûyê wana dihate xanê kirinê. Dikan, sûk, îdare, destçêxane vekirî bûn, lê de tu were, xofê, perojîyê bi ecêb û bi kovan her der hingavtibû.

Azerî nava mitalada dida gava. Ewî hew dizanibû servan Ferasetî, serheng Razi, gênerâl Vayvîl pey mitalên wî ketine û li wî dinihêrin. Ew ser wanra derbaz dibe. Çend gava şûnda Azerî kete nava dunya xweya evra: avayê mala wanî duta, yê ku li Tebrîzê hewşeke çûke-seqirtîda cîwar bûyî, herdu stûnên hewalê, herdu wêneyên çivîkan, yên ku wî ser wan stûna verotibû, kişandibû, nêrinên Merzîyê, porê wêyî karîbar ber çavên xwera derbaz kir. Weşek jî derbaz bû. Ber çavên wî dewsa herdu stûna dê-bavê wî, dewsa herdu wêneyên çivîkan Merzîyê û ew bi xwe dahate kivşê. Belê, du stûnê ku, xanîk xweyî dikir, kal-pîrek, du çivîk...

Di nava van mitala da, qe ewî bi xwe jî nizanibû, çawa hatibû derketibû ber dervezeyê mezinî bi texte. Ev derveze, dervezeyê mala Taxixan bû. Mala Merzîyê wana.

Azerî ser vê ecêbê kenîya. Xwest ji vir dûrkebe. Lê hêzeke mezin ew girt, xayî kir. Te hew dizanibû ev derveze bûye meqledûz û wî berbi xwe dikişîne. Ewî destê xwe dirêjî derveze kir, derî vebû. Hewş hate kivşê. Nava hewşêda hewza şeş qunc hate kivşê.

Azerî destê xwe ji derveza kişand. Te tirê meqledûz nava hewşêda hatîye danînê û ew ber bi xwe kişand. Xulamên dora beroşa mezin berav-

bûyî, dengê pêlavên pîyê Azerî bihîstinê, herek rabû alîkîda çûn. Azerî di rewşa nerengîyêda hate ber hewzê û vê gavê ji tayê duda dengê hate bihîstinê:

- Ya Xaliq, eva yeke nedîtîye?

Ev deng, dengê Merzîyeyê bû. Ewa ber şîbaqê sekinî bû û derbarê Azerî da raman dikir. Hemû qewmandinên derbazbûyî û yên qewimî ber çavên xwera derbaz dikir, wîra diaxîfî, rewşa wî dipirsî. Carna jî çavên xwe dukuta dergê neqîş bi neqîş û xwe-xwera digot, wekî wexta Azerî bê dêrî veke, ewê wîra tevayî hesreta kişandî, huba bi agir-alaf hinekî kêmkê, hinekî vêsîne û diqewime çarenûsa wêye ne eyan bê çareserkirinê.

Weşa Merzîye nava ramanda bû, derveze hate vekirinê û peyra dît, wekî efserekî bilind, buruqeytan, dêm xitimî kete hewşê. Pêşîyê ewê hewzanibû ev mîna her tim neqşê xemên wêne, hatinê ber çavan. Perda xema ji ber çawa minê bûnê, ewê hesretkêşê xwe Azerî dît.

Roja îne bû. Merzîyeyê dêrekî hêşînî biriqî xwekiribû. Guharên guhada, yên daliqî, bedewî ser bedewîyêda didane dêmê wêyî giloverî sipî.

Lê te qey digot, Azerî hewza, ku dora wê bi mermerên sipîva hatibû hilçandinê, zeliqîye û nizane çi bêje. Bi qewlê heyî, gotî ewana du roja şûnda rastî hev bahatana. Ewî nizanibû menîya hatina xwe nişkêva, çawa bi Merzîyeyê bide zanînê. Ewê ji tayê duda, bi heyr-hejmekar virda, wêda dinihêrî.

Ewana li hewşê rastî hev hatin. Ewî qe nizanibû ew û Merzîye çawa ji hewşê derketine, hatine gihîşîne ber meydana mezin. Dîsa der-dor ber çavên Azerî bi rengên ecêb hatibûne wergirtinê. Tewbûna van renga her tenê maşinên îngîlîsaye zerîn, yên ku qure-qure dihatine ajotinê, bê xembûn, diteriband. Ewî çavên xwe ji wan renga kişand û Merzîyeya mîna kevotkê hemêz kir, got:

- Îro tuye çawa rindikî!

Merzîyeyê serê xwe ba kir û porê wê nava paş-pîlada, mîna pêlên ava çemê zelal serhevra çûn-hatin. Jî çavan hetabî, ji lêvan hub-hizkirin dibarî. Azerî dîsa kelimî:

- Merzîye, îro tu lap horî-melekî!

Merzîyeyê vegeirî li Azerî nihêrî û posîde bûna wî tê derxist, pirsî:

-Darîyûş, lê tu çima usa xitimîyî?

Eva cara yekemîn bû, wekî Merzîyeyê bi navê wî, gazî wî dikir.

- Ez bi xwe jî nizamim. Şev nerehet razame, diqewime ji wêye.

- Wekî usane, tu şeva ranazêyî, lê çi dikî?

- Qet, dikebime mitala, xemên xwe hemêz dikim.

- Derbarê kêda mitala dikî?

- Derbarê te da?

- Çima çi bi min hatiye, wekî ewqasî derbarê minda dikebî ramana?

- Mitale dikim, gelo mehekê te nebînim, wê çawabê? Diqewime nişkêva tu min begem nekî,

yekî mayîn bistînî, yanê jî te bidine yekî dinê, wê demê rewşa minê çawa bibe?

Ev gilîyên, ku bi dengekî lerizî hatinê gotinê, te hewdizanibû, bûne aveke sar û ser serê Merzîyeyê da reşandin.

Merzîye roj bi roj bedew dibû û rojên cîwantîya xweye bê xem derbaz dikir, ji ber ku piçe-piça serhange bi evîntî, ser barê serda, xazginîyê wê jî hey diçûn zêde dibûn. Carna ji oda mayîn kake-kaka kenê wê, li dê tesele dibû û ewê Merzîyeyêra şer dikir, ew şîret dikir. "Lêlê, keçikê, usa mekene serê teyê biçelîqe, der-cîran hene, guhê gişkan li ser meye. Ê, xwezila berê, xêncî debavê kesî navê keçikê nizan bû. Paşê jî mêrê wê zanibû. Merzîye, yên ku, şeqa-şeqa vî dengê kenê te bibihîzin, wê mera çi bêjin? Ewlada min, bi hissewda be! Sîyê nevêje ser navê xweyî paqîş".

Carna dê ev gilî qe ji oda Merzîyê dengê ken û kilaman nehatinê jî digote ewlada xwe. Li mal derbarê Azerî da gilî ketinê dê hinekî dixeyîdî. Ewa hindikî dida axaftinê. Dihate xanê kirinê, wekî dê îdî derz kirîye, ku bi şer-şûrt ev pirs nayê çareserkirinê, him jî ev yek karê merra jî girêdaye. Lema jî dê ewqasî deng nedikir. Lê Merzîye bi navê Azerîva firnax dibû, gava rastî wî hatinê, mîna şire-şira ava kanîyê guh dida ser gilî-gotinê wî, carna dilê xweda ew dipesinî, bilindî erşê ezmîn dikir.

Gilîyên, ku îro Azerî bi lerizî gotin, ewa bê gav kirin, têkeve nava mitalan. Van dawîya bavê ewa xwera dibire meclîsan. Serheng Razî bi çavên

xweye mîna çavên mesîyên çavşor kirî li wê dinihêrî, gilî-gotinên wîye bi bedewî, ev gişk qe xweşa wê nedihat. Bavê wê zû-zû derbarê jîyana li hev piçilkîda, derbarê rojên diwarda qal kirinê, qewmandinên, ku dora wê diqewimîn, ewa şikber kiribûn. Ewê rind zanibû bav dixweze wêya bide mêr. Mêr kî dibe bila bibe, her tenê bila ew dewlemendbe. Bi wê yekêva bav dixweze pirsên aboriya xweye li hevalîyayî bide dasekinandinê û çivakîyêda di alîyê fermî û aboriyêda cîyê xwe bide miqîm kirinê. Lê ewê ew yek jî rind zanibû, bê hiz-kirin, tu dema, ewa serê xwe tu kesîra danenîne ser balgîkî. Vana Merzîye bêgav dikirin, wekî ji ken-henekê cîwantîya bê xem dest bikişîne, rîya çarenûsa huba xwe, ya bi dûman mêzeke.

Merzîyeyê qe ne dihanî hişê xwe, wekî diqewime wedekî dirêj, ewa ji Azerî biqete. Lema jî ev mitalên, ku nişkêva derketibûne holê, ewa didane şaşkirinê.

Ewana rê diçûn. Ew rê rex baxê bereka çiyara derbaz dibû û dihat li pira bi keviran çêkirî asê dibû. Wî alî pirê rîya tenge, ku bi keviran hatibû raxere kirinê, nava baxada nedihate kivşê. Dûre-dûr, li cîyê, ku hêşînaya baxa xilaz dibû, rêzên girikan dihatine xanê kirinê. Ji girikan karxanên keviran, kevir dikolan derdixistin û devê şikevtên wan reş dikir.

Azerî carekê jî van derara derbaz bibû. Gava ewî kincê evserîyê xwekir, derkete xizmetkarîyê, tê derxist, wekî nava wî û der- dorada kendal pêşta hatîye. Ewî mekteb xilazkirinê, bê pirs, bê hewal

ew şandine cîyê kivşkirî. Azerî bi culet sedemê vê yekê, ji sereng Ezemî pirsînê, bona wê yekê serê wî gellekî êşandibûn. Serbarê serda, serheng hey gef li wî dixwerin. Nêta Azerî ew bû, bajêrda bi-mîne, serbazxanêda xizmet bike û hero rastî Merzîyeyê bê. Lê gilî-gotinê serheng, hemû xwestinê wî sero-bino kir, per-baskê ku, pê dixwest ber bi Merzîyeyê bifire, hûrxaş kir û got:

- Oxlani¹, nêtên xwe bicivîne ser hev! Te bin ala şah da sond xwerîye. Lê hunerê te kanê?

Ev gilîyên ku, mîna sûckarekî didane rûyê wî, ew didane serwaxt kirinê, wekî naha tu ne mirovekî serbestî, lê bindest, berdestî. Ev gilîyên bi kîn-kudret, mîna bivîrê ko dilê wî ketibûn û stûnên xwestinên wîye mermer hûr-xweş kiribûn. Rastî jî ewî sond xweribû, wekî ewê Xwedêra, şahra, welêtra aminbe, him jî çokveda bû, pêşa ala şahra maçkiribû. Ew hê jî vanara amin bû. Ev amintî beqî bawerîyên dilê wî, beqî daxwez-xwestinên wî, di nava ruhê wîda dijîyan.

Lê ev daxwez û bawerî li pareskerîya ku, wî xizmet dikir, li kevira ketibûn. Ewî bi çavên xwe dîtibû, bi guhên xwe bihîstibû, çawa hinek serbaz bê tirs derdiketine dijî peyvîr bilinda, gilî li wan vedigerandin. Leşkerîyêda rêkûpêka qayîm nema bû. Bawerîya serekleşkerên ordîya ku, du roja zêdetir ber leşkerên hevkarên doz nekiribû, bal tu kesî nema bû.

1. Oxlani – kuro, lawo

Soqaq-kuçanra çûyîn-hatina maşînên îngîlîsan, yên reng zerîn Azerî jî posîde kiribû. Naha, gava ewî tevî Merzîyeyê kuçêra gav dida, wî tirê gişk him bi çavnebarî, him bi rik-keser li kincên wîye zerîne efserîyê, pêlavên saqdirêje reşe biriqî, nîşana eskerîyêye li enîyê mêze dikin. Vê demê ewî giranîya baskên xweye şikestî ser pîlên xwe sehkir: "Baskno, baskno, gelo we kêderê fira xwe unda kir? Hûn kêderê mîna kulîlka per-per bûn, hatine weşîyanê? We çima hêza xweye giran, mîna şûr ji kêlîn nekişand, ewir qut-qutî nekir, lê bawerîya xwe unda kir? Lê çima ev danezbûn, bû para we? Naha ew baskana weke baskên mirîşkên melisînin, kinin, çawa pêwîste nayêne vekirinê? Mîna çûkên malan, ji vê çarmedorê, difirine ser çarmedora dinê, her tenê cûcikan ditirsînin, carna jî xwe ba dikin, xubarê radikin".

Merzîyeyê hewar-gazîya dengê dilê wî nedibihîst. Lê wekî vê demê Merzîyeyê li çavên wî binihêrîya, wê ev gazî-zarîn di nava nêrînên wîda bidîta. Ewê virda, wêda li baxa dinihêrî. Vîllayên dutaye nava hêşînayêda bilind-bilind "Çîrokên avayên bilûkek zêr, yek zîv" dihanî bîra wê. Tenê Merzîyeyê dikaribû bi wedelî pêşîya agir-alava wîye, hey li hev zêde bûyî bigire. Ji ber ku, ewa ruhdarê vî efserê cîwan bû. Azerî nedixwest evîndarîya roj bi roj zêde bûyî, kûrbûyî çawa heye usa Merzîye bizanibe. Ewî xwe ji vê yekê dihêwişand. Yek jî çawa dikaribû evê hêza Xaliqê Jorîn ya ku, ser wî bûye hukumdar veşêre, çawa nede zane-

bûnê? Ev yek ne dibû. Gava Merzîyeyê hub-hizkirina wîye bi agir-alav dîtinê û tê derxistinê, wekî ew ber bedewîya wê heyr-hejmekare, ewa mîna gula sor vedibû.

Ewana ser zinarê gola nava baxada rûniştibûn. Wî serê golê du zara av xwedikirin.

Azerî destê xwe danî ser destê wê û got:

- Destên te bedewin, destên kewa...

- Kêdera wana bedewe?

- Binihêre, ev tilîyên te dirêjin, mîna şimayê sipîne, kefa destê te mîna hundurê pîyala sipîye.

- Diqewime neynûkên min jî mîna şûşane ?

- Hema usane, mîna şûşanin.

Azerî vegerî avê nihêrî û bi dengekî lerizî got:

- Ez bal te bûnê hemû derdê xwe bîr dikim, gişk ji bîra min diçin.

- Axir, çi derdê te dikare hebe?

- Mirov bê derd nabe, Merzîye. Min jî berê hewzanibû, derd-kul gişk destên mirovan bi xwe-daye, lê naha dinihêrim, min wan dema şaşî kirîye. Wedê kuçaran, ber çavên gelra, ev maşinên îngîlîsan, yên zer serbest derbaz dibin, çawa derd te hilnede nava xwe? Nava leşkerîyêda bê bawerî pirr bûye. Sîya axên îngîlîsan, gêneralan, sercênan xwe avîtiye ser leşkerên me. Bona, ku welatê xwe da karekî bikî, pêwîste ji van dagirkarên, ku heqê wan ser vê axê tune, destûrê bistîni. Ev derd, derdekî mezine. Ev derd zû-zû nayê mehandin-givêrandinê. Tu li wan merivên li meclîsa serheng Razî nenihêre. Wan mirovan genim xwerine, ji cen-

netê derketine. Çawa ewana bi xwe dibêjin, kî bibe ker, ew palanê wanin. Naha fîşengan, gulên topan, bi jimar didine me. Paşê jî derbarê van gişkada, ji me pirs-hewala dikin. Diqewime ez bikaribim derdê xwe bîrkim, na derdê vana nayê bîrkinê, nayê kişandinê. Rûmeta mine leşkeriyê hatîye pêpes-
kirinê, ez nikarim ser axê bi serbilindayî bigerim. Serbarê serda, bi derdên hineke mayîna jî hatime barkirinê, wekî jîyan tenê ji me herduya bûya, îdî çi derdê me hebû. Her kes bi der-dorên xweva hatîye girêdanê. Tu nizanî gava min bobeleta Kuvserî, ya jîyana wîye taybetî, bihîstinê çiqasî ber xwe ketim.

Azerî derbarê şîna malbeta Kuvserî Merzîyeyêra qal kirinê, reng dida, reng distand. Merzîyeyê derheqa vê bobelatêda ji devê wî, vî, bi sera-bera bihîstibû.

Azerî bi dilekî birîndar gilîyên xwe domand:

- Mîna mirinê şûnda Kuvserî hê bi kûrayî bengîtiya xwe, ya ber bi wê derz kiribû. Gellek cara wedê tiştek ji destê me derketinê, kesek ji jîyana me qetîyanê, hê em wê yekê bi şewat derz dikin. Çiqasî, ku Mîna jîna wî bû, diqewime ewî ewqasî hebûn-heyîtiya wê tê dernexistibû.

Merzîye kelimî:

- Hûn mêr gişk bê rehmin..
- Ez jî?
- Nizanim.
- Lê ez zanim. Hûn jin ruhberê nazdar û cindîne.

Baxvanekî kal pênc-şeş gava dûrî wan sekinîbû, zûrbibû li wan mêze dikir. Ewî bi axatî, ridansipîya xwe birêz da kivşê, berbirî Azerî bû:

- Axano, keremkin warne hundur, bibine mêvanê vî baxî.

Azerî jî vî dengî veciniqî û bi dengekî hizkirî got:

- Selam!

- Fermo, kurê min, keremkine bax, wera xizmetîyê bikim.

- Zef spas! Wekî stekanek ava sar hebûya, meyê vexwera.

- Keremkine hundur, ser sera, ser çavan, - kalê got, -û kete nava bêx.

Kalê zû jî nava bêx derket, hate ber şêmîkê û got:

- Fermo, derbazî hundurbin, hinekî hêmîn bibin. Bax yê Xwedêye, ez jî baxvanê wîme.

Ewana derbazî hundur bûn, Azerî got:

- Baxekî bedewe. Hela binihêre, çiqas darên fêkîya henin.

- Kurê min, bêje maşallah, darên fêkîya pesinan hiznakin. Te ku ew pesinandin, ewê hişk-bin, yanê jî wê nexweşkebin.

- Maşallahbe, rastî jî tu mirovekî bi pergali.

Merzîye ketinê nava bêx, hênîkayî hate wê. Ev hênîkayî deremê wêra derbaz bûn, hate nava dil. Wî serê bêx gulên sipî, bi devîyên gulên sorva hevpiçilîkî bibûn. Ewa bê hemdî xwe berbi devîya çû. Bi destê rastê ser gulên sipî gerand û wanra kire piçe-piçe: "Gulno, hûn çiqasî cindînin, bedewin,

lê heyf zû diçilmisin, jîyan-heyîtîya hemû bedewa mîna jîyana we kine, lê ez naxwezim bibime gul, naxwezim bibime gulên mîna we, çawa xweşe gava tu gulava xwe li dunê dîreşînî, çawa xweşe, gulên mîne sipî, çawa xweşe”...

Azerî piçe-piça wê dibihîst:

- Merzîye, tu xwe bi xwera dipeyîvî, lap bûyî sêntîmêntal, ger ser vê bedewîyêda jî sêntîmêntalek jî zêdebe, pêwîste ez dînbim û ji vî bajarî derêm, herim.

- Îdî tu ji bajêr çûyî. Qe em nizanin, tu li ku xizmetkarîyê dikî. Sura leşkerîyêye...

- Wekî destûra min, destê min da bûya, ez qe cirikekê ji te ne diqetîyam.

- Bavê min dikaribû ev şuxul serhevda bihanîya.

- Ez bi karşandinok şandime cîyê naha. Tişt nabe, emê rêkê vê yekêra jî bibînin.

Merzîyeyê burîyên wîye reş, dêmê wîyî wastîyayî, yê hinekî dirêjbûyî mêze kir. Dîsa destê xwe ser gulê sipî gerand û ber xweda kire piçe-piç. Ewa ser baxê kalê heyr-hejmekar mabû. Pergarîya bêx ji dara dihate kivşê. Darên bihokan li dora çarmedorê hatibûne nikandinê. Paşê jî darên hinaran pêda-pêda hatibûne rêz kirinê.

Merzîyeyê gulanra kirinê piçe-piç hulma Azerîye germ tê derxist û seh kir, wekî ewî porê wê ramûsa. Ewê xwest wêda vekîşe, lê nihêrî ewa nava milên Azerîdaye. Azerî lêvên xwe dêmê wêya xistinê, Merzîyeyê seh kir, wekî bedena wê dile-rize. Hêzeke nebînyayî ewa nava hemêza Azerîda

xayî dikir. Porê wêyî ber tavê mîna zêr birqvedayî, hilşîyabûne ser rûyê wê. Vê gavê baxvan wêda hat û got:

- Erê, lawên min, binihêrin, ev jî palaz, ser kanîyê rûnên, vê deqîqê ezê wera rezan beravkim bînim. Paşê hûnê tê derxin baxvantîya min, çito baxvantîye.

Azerî got:

- Na, bavo, em naxwezin ji vêya zêdetir ezîyet bidine te.

- Na, kurê min, -kalê hat pêşberî wî sekinî got, -wekî hûn rezên baxê min tem nekin, min carekêva bîrkin. Yek jî tu wedê rojîyêye...

- Bavo can, navê te çîye?

- Navê min Husêynkûlîye. Berê ji wan karxanên kevira girtî, hetanî himberî vî çîyayê Axdaxê baxê bavê min bûye. Ez wê gavê zaro bûme. Bavê min, van baxa qumarêda dide der, paşê rehmetlêbûyî xwe dukuje. Semender axa qumarêda vî baxî ji bavê min dibe. Ew dibe sedemê kuştina bavê min. Paşê ew axa ji vî baxî hinekî dike ser navê min ku, ez bi awakî bijîm.

Wana bi dilêşî guh dane kalê, lê Azerî lez diket, lema jî rabû û got:

- Apê Husêynkûlî, bona vê rûmet girtina te, em pirr-pirr kêfxweş bûn, Xwedê ji te razibe.

- Lawê min, mirov gilîyê xweyî dawîyê pêşta nabêje.

Kalê ev gilî gotin û bi gavê fire kete nava daran, ji ber çavan nehate kivşê. Azerî ev firset ji dest berneda, xar bû Merzîyê ramûsa. Paşê porê

evîndarê, yên zerîn, baxê kalêyî di rengê karîbar-
da, avayê duta, yê dûre-dûr, ew du stûnên dûda
zerbûyî, hêlûna herdu çivîkan hat ber çavanra
derbaz bûn. Pêra jî, guhê wîda dengê çivîkên
bêxda; yên ku tevî şîre-şîra ava kanîya nêzîk bibû,
dihat.

Ciwantîya bi qudret, du evîndar nava destên
xweda girtibû, xayî dikir. Dêmên herdu maşoqa
sor-gevez dikir. Te tirê ewana nava kilamên evîn-
dara ewlînda hatine pêçandinê. Nişkêva dengê
pîyê kalê hate bihîstinê.

- Keremkin, -kalê got, -buxun, helalî webe û
sinîya fêkîya danî ber wan û ser axaftina xweda
zêde kir:

- Wekî hûn payîza dereng bîn, a wê demê
hûnê behrê destên baxvanê kal daha rind bibînin.

- Apê Husêynkûlî, eger wê demê jî awa
zehmet bikişînî, emê neyên.

Wana gilas dixwerin. Kalê jî zûrbibû, li wan
dinihêrî. Ewî dixwest tişteki bêje. Azerî ev yek tê
derxist û got:

- Lo apo, tê kivşê gotineke te heye?

- Mirovan çavên hev nihêrînê, têderdixe pirs-
hewal hene, te rast derz kirîye. Min dixwest derba-
rê qewmandinên doda tişteki bizanbûya. Li meyda-
nê çi qewmîbû? Qeletîke xwera dikim, lê dixwezim
bizanbim, çima vê memleketêda qe rizim nemaye,
wekî gel didine ber gullan? Eva cara yekemîne,
wekî ez jîyana xweda tiştê awa dibînim. Qe mirov
çekê dikişîne ser mirovên bê çek?

- Min jî, -Azerî got, -ecêba ha ne dîtîye. Te qe nizanibû, kî keviran davêje şûşa, hûr-xweş dike, kî cêra li serwêrîyê dike, kî deqîqê carekê gazî-hewara dadixe. Gişk tev-hev bibûn. Hindik mabû, elahêzret jî bidine ber cêran.

- Kurê min, gel birçî manê, kulfetê xwe rêne-birinê, serwêr kîye, wê lap kalikê-kalikê şahra jî cêran bikin. Lo birao, ez dor serê te bigerim, lê gel çi bike? Qe kîloya nîn bi 6 krana dibe? Qe nanê ha gewrîya mirovada diçe? Axir, çi sûcê gel heye? Naha dem, çi deme, wekî gel didine ber gullan? Ger awa bidome, pêwîste keşkulê bidî destê xwe, têkevî nava Tebrîzê, tûrik bavêjî stuyê, xwe, têkevî best-beyaran, bibî dewrêş, wekî bikaribî ji vê bê ebûrtîya dunê xiazbî.

- Ê kalo, lê nêta te çîye, wekî tu ji vê dunê xeyîdîyî, te xwe daye kuncekî vî baxî? Diqewime tu jî dixwezî bibî dewrêş?

- Lawo, hema ez dewrêşim, salewextê nava vî baxîdame, hevalbendên min jî, ev dar û şîre-şîra avêye, Ez ji tem-lema vê dunyayê hatime birînê. Ruzê min kerî nan, kase şîre. Yek jî fêkîne. Ez bizanibim ezê birçîda nemirim, qe wana jî naxwum. Bila çavqul, yên ku, xwedanê axa bê sero-binîn, yên ku bi bînekê dixwezin gundan, baxan, daristanan, kerîyan, revoyan daqurtînin, yên ku, ji vê jî têrnabin, dixwezin dunê daqurtînin, buxwun, têrbîn. Lê ez zanim ewanayê bi vê jî têr nebin. Qe Xwedê jî nikare wana têrke. Pişt kûza, tenê tirb rast dike. Hema ku, ew kes dimire, mîna Îskenderê dunê dagirkirî, destê wî jî tabûtê derdixin, mêze dîkin,

dibînîn, dîsa daxweza wî ji vê dunê heye, kulme ax dikine nava kefa wî, te tirê ew ji vê kulma axê têr dibe û destê xwe dikişîne, dike hundurê tabûtê.

Xwezila ew kes, yanê jî, ewana mirinê ser wanra bisekinim bêjim:

- Lo dêwno, lo hûtno, lo yên ji vê dunê têr-
nebûno, yên ku tenê ji xwe têr bûno, hûnê ku, bên
têkebine vê rewşê, bêne mala qebirê, mîna hemû-
ya adî, erzanbin, yekbin, lê çima dibine sedemê
rojreşîya ewqas mirovan, qira wan tînin, lê çima bi
kefenekî hatine mala qebirê, Lê kanê ew mal-mil-
kên, ku mêzina dunyayê xarkirîye? Kanê ew heyte-
hol, ew hêza cebrê? Bila her tişt li we herambe!
Çawa li Rzaxana heram bû! Kanê tewbûn, têgihîş-
tin, bedweyîya dunyayê? Ey, ziktêr, zikçewalno,
timakarno, we qe ji vê dunê çi bir? Qe tişteki!

Wana guh didane kalê. Ker-lal bibûn, te hew
dizanibû hemû gilî-gotinê wana hatibûne bîr kirinê.

Azerî didît, çawa qerçimekê çermê gewrîya
kalê ser hevda qat dibin, çawa vedibin. Wî tirê kalê
nediixife, lê ew çermê gewrîyê, yê ku, daliqîye
dipeyîve. Him jî ewî usa dizanibû, wekî destbavêjî
vî çermê daliqî bikişînî, ev gilî-gotinên kalê wê
weke dunyayê dirêjbin.

Ji axaftina kalê ew yek hasil dibû, wekî
malbeta wî tune. Pey bobelata qumar leystîka ba-
vêra, ew bajar-bajar gerîya bû, mîna dewrêşan jî-
yan derbaz kiribû, dawîyêda ji hal ketibû û hatibû vî
baxîda hêwirî bû. Ev darên baxê ku, bi dîlovanî
dabûne wî, xwera kiribû ewled û mîna bavekî
xemxurîya wan dikişand.

Azerî rind tê derdixist, wekî camêrê Huseynkûlû jîyanêda bin neheqî, nerastî, buxdan-karîya civakîyêda hatîye hicirandinê, lema jî, bê gav maye hatîye ev bax xwera kirîye sitar. Azerî ew jî dît, wekî Merzîye bi heyr-hejmekar li kalê mêze dike, lema jî ev rêz anîne serzarê xwe:

"Her bîşe guman meber kê.

Xalist şayed kê, peleng xofte başed"¹...

Merzîye bi dil ketibû nava rewşa kalê û di xweda dişewitî. Wekî mecala wê hebûya, wê ew xwera bibira, li kuncekî hewşêda cî-warek bida kalê û melhem bida ser dilê wîyî birîndar.

Kalê nihêrî deng ji wan dernayê, dîsa dûmayîn da serbuhîriya xwe:

- Ev darana ewledên minin, çarna ez hew dizanim, ev darana ne biçûk bûne, lê min ewana dilê xweda xweyî kirine, paşê ji dilê xwe derxistine, nava axêda nikandine. Ev darana nîvê minin. Zerrîdinokê dunya minin. Lê ez çûkim, dora wan digerrim, bask didim difirim. Ez bê wan nikarim bijîm.

Ez hewzanim naha ewana guh didine min. Ewana dijî nerastîyên dunyayê dikine hewar-gazî, digirîn, ji çavên wan, ji sîng, belgên wan dilop-dilop hêsir dibarin. Merzîyeyê li rîdana kalê dinihêrî. Ewa ditirsî-ya çavên kalê mêzeke. Hewdizanibû, ger ewa çavên kalê mêzeke, diqewime kalê tê derxe, dilê wêra çi derbaz dibe.

1. Bawer neke, her war valaye,
Diqewime li wir piling razaye.

Ew mirovê ku, hêsirên dara dibîne, hewar-gazîya wan dibihîze, yeqîn wê têderxe dilê wêra çi derbaz dibe. Ewa hinekî nava xofêda bû. Ewê pîlê xweyî çepê kutabû pîlê Azerî û tu dema nedihanî hişê xwe, wekî li tenîştê bajêr, di nava hemêza darên hêşînda, kalek dikare bijî û ew usa dişêvîne ku, dunya nivê wîye, ew zimanê dara derz dike, hewar-gazîya wana dibihîze û hêsirên çavên wan dibîne.

Wedê ewana ji kalê qetîyan, Azerî nava mitalên xweda daha jî qewîn bû. Ber çavên wî dunya bedew bû. Ev bedewî di nava tewbûn, yekbûna wêda bû. Wekî dunya ser çend para bê parevekirinê, ewê bibe cehenneme, civakî jî kerîkerî bibe, bibe jor, jêr, wê demê yekîtiya bedewîya dunyayê diteribe. Gava her tişt tewe, bedewe, parpar, kerî-kerî bûnê bedewîya xwe unda dike.

Ji bandora gilî-gotinê kale bû, yanê jî, ji tiştêkî mayîn bû, Merzîye ketibû milê Azerî. Diqewime ew kirin, wê yekêra girêdayî bû, wekî xofa gilî-gotina ewa hingaft bû. Diqewime ev yek ji sawa baxê dûrî der-doran bû. Azerî jî, ser vê nêzîkbûna wê heyr-hejmekar ma bû. Ewana bi mitalên kûr, bin bandora qalkirina Husêynkûlîda gav didan. Vê weşê efserekî nîşana dijbandîyê, ya pareskerîyê, li mil girêdayî, wêda hat, pêşberî Azerî sekinî, ser zimîn selam da wî û got:

- Hîvî dikim destûrnama serkar nîşankin...

Azerî dest avîte berîya xwe, kete bîrê, wekî wî ji serkar destûr stendibû, ku here bajêr, lê sebira wî nehat, hîvîyê nesekinî ku, katib destûrnamê

binivîse, bide wî. Ew bê destûrname ji pareskerîyê derketibû. Ewî rûyê efserî tûj nihêrî û tê derxist, gotî ew here îdara dijbandê. Ew kete rewşekê xirab, bi pêşman gote Merzîyeyê:

- Tu here mal. Ezê herim rewşê bêjime reyîsê dijbandan. Delala min, ber xwe nekebe, hema ji wir derêm, ezê bêm serîkî li texim.

Wana ber bi navîna bajêr gavanê, Merzîyeyê parava li wan nihêrî û xwe xwera got: "Pêwîste derbarê vê yekêda elamî bavê xwekim. Bi wê yekêva ezê Azerî ji destê dijbandan bidime xilazkirinê, him jî bavê minê têderxe ez wî xortî hizdikim û ezê tu dema qayîlnebin Razî bistînim". Ewê ev gilîyana dilê xwera derbaz kir û nîzanbû çi bike? Nedîxwest Azerî di nava vê hêwirzêda bihêle, here.

Azerî û nobedarê desta bajêr, yê îdara dijbandan, gihîştinê îdarê, ewî nihêrî, wekî maşîna gênerâl Vayvîl li ber dêrî sekîniye, ew bi ecêb ma. Ew çawa revokê ji pareskerîyê radestî reyîs kirin. Azerî dît çawa servan Ferasetî û gênerâl Vayvîl mîna du mirovên nêzikî hev, hevra diaxifin. Wê gavê ew kete şikê. Ewî awa derz kir, wekî pey meşêra gênerâl hinek pirs pêşniyar kiribû, naha jî hatîye vira wî çavra dike û dixweze wan pirsê bide safîkirinê, bersîva wan bistîne. Lê şikberîya Azerî ne bi cî bû. Gênerâl Vayvîl bona meremekî dinê hatîbû vira. Do li berpala çîyayê Pero îngîlîsan xime-çadir dabûne vegirtinê û komandariya wana serbazên hinda fêrî kirinên eskerîyê dikirin û ji wana yek venegerîbû pareskerîyê. Serkarê dijban-

da Ferasetî bi têtêfonê gênerâl Vayvîlra axifî bû, wekî eskerekî hînda serxweş ji alîyê dijbanda, li mehela Fêyzabadê, ku xwestîye têkebe tolexanê-fahîşexanê, girtine, anîne îdarê. Gênerâl Vayvîl hatibû ku, wî eskerê hînd hilgirt bike.

Azerî derda hatinê salam da, lê Ferasetî ji cîyê xwe rabû, bi rizma leşkerîye selama wî vegirt û got;

- Azerî, îro tu maqûl, nayêyî naskirinê. Tu geh diçî meşê, geh dikebî rewşa hizkirîyê sersem. Mixabim, efserekî mîna teyî miqîm, bê destûr ji parêskerîye derketîye û bajêrda tiştê ne layîq dike.

Azerî ji teqila gilîyên wî derz kir, wekî ew dixweze heyfa xwe ji wî hilde. Ne wî mala Razîda xwedêgiravî ew bê hurmet kiribû. Him jî Ferasetî li mala serhengda, dît çawa ew bi vekirî berbirî Merzîyeyê dibû, ji gilî-gotinê wî hêrs ketibû. Ferasetî efserekî almanhiz bû. Gişkan ev yek zanibû. Ewî bi xwe jî, ev yeka ji tu kesî venedişart. Li îdarê, fêza dîwarê ku ewî piştî xwe dukutayê, nexşeke mezin lêda bû û serfinîyazîya almana, ya bintara Moskvayê, bi nickandina alên biçûk dida kivşê. Serrikinê rojnameyên almana ewî hero derbarê şêrda, bi alên biçûk nexşe neqîş-neqîş dikir. Lê van rojên dawîyê ew posîde bibû, ji ber ku, bintara Moskvayê îdî eskerê faşîst alt dibû.

Naha, gava Azerîra diaxifî, ev kîna xwe dida der. Gênerâl Vayvîl jî ev rewşa Ferasetî tê derxistibû. Dema ew hate hundur, dît fêza serê Ferasetî nexşe heye û ew bi alên biçûkva hatiye qul-qulkirinê. Gênerâl jî tê derxist, wekî Ferasetî

almanhize. Gêneral li Îranê nûnerê dewleta Îngîl-
terê, yê leşkeriyêyî fermî bû, ewî rind zanibû
Almanîya faşîst dijî welatê wî di qewlê şêrdaye, lê
ewî ber van kirinê Ferasetî çavên xwe girt.

Ferasetî bi rik karnîyarî Azerî bû:

- Ji we tê pirsîkirinê, vê rewşa welatda,
sedem çiye we rizma leşkeriyê teribandîye? Ke-
remkin bersivê bidin?

- Ezê bersiva vê pirsê nedim!

Azerî awa got û rengê wî hate xitimandinê,
paşê serda zêde kir:

- Ji ber ku, ev der ne cîye pirs-hewalaye?
Yek jî...

Lê Ferasetî nehîşt ew hevoka xwe ser hevda
bîne, gilîyê wî birî û got:

- Yek jî çi? Maqûlo, hûnê çi keremkin bêjin,
me hînkî, perwede bikin, çawa li meclîsa serheng-
da...

Ji van gilîyan çavên Azerî, yên bin burîyê
reşe qeytanîda, te tirê agir-alav girtin. Te hew
dizanibû ev gilîyên Ferasetî bûne pitik û embara
bênzînê ket.

- Yek jî dixwezim bêjim, gava ji welat diaxifin,
pêwîste bizanibin, we welat kirîye vê rewşê. We ew
avîte bin pîyê leşkerê hemkar.

- Vê pirsêda ez ne sûckarim, wekî sûckarî
heye, em gişk sûckarin. Min sêva sor neşandîye
pey leşkerê hemkar.

Azerî enîşka xwe kuta pêşxwînê û şabû,
wekî gilîyên wî ewqasî bi zexm li hoşkê ketîye, him

jî tê derxist Ferasetî ketîye rewşeke giran, lema bi qure got:

- Ji nexşeya fêza serê we tê kivşê, hûn çiqasî almanperestî û ew almanperestan rewşa welata, ya îroda weynekeke çawa dilîzin. Cenab Ferasetî, tu ne bona rewşa welat, lê bona rewşa rojên dunyayêye dawîyê, bona guhastinên, ku nava leşkerda pêşta hatîye nerehetî. Tu minra ne ku, mîna efserekî Îranê, lê mîna efserekî alman, yê ku bîntara Moskvayê poz hûr-xaşbûyî dipeyvî. Evê yekê, ne ku, tenê ez dibînim, lê gênêral Vayvîl daha rind dibîne.

Ferasetî mîna mirovê nîşkêva derb lêketî, ji cîyê xwe banzda ser xwe û bi rik got:

- Dengê xwe bibire, rezîlo, ne tu tiştê! Te hê tema zordestîyê temnekirîye. Zordestî mirovên mîna teye stuqalim tîne rê.

Pey van gilîyara Ferasetî reng da, reng stend, dêmên wî xitimîn û ji vê yekê ew him bi zexm, him bi posîde, belengaz hate kivşê. Bona ew rewşa wî neyê kivşê, ewî destê xwe kişande rûyê xwe û careke mayîn bilind-bilind kire qîrînî:

- Pagonên wî bişêlînin! Bigirin! Elametiye bidine pareskerîyê!

Ferasetî ev gilîyana bi awazekî bê wete got û dihate kivşê, ew hinekî poşmantîyê dikişîne. Azerî ewê deqîqê ev yek tê derxist. Ewî qe seqirtîya berê ne teriband û ji gotinên xwe paşda venekişîya, kêlimî:

- Bi girtina minva, hûnê nikarbin ser kirinên xwe bipecinin. Ez li kêderê dibim, bila bibim, ezê

bidime peyîandin, wekî kîne gunekar, ku welat ketîye vê rewşê?

Ji nêrînên gêneraal Vayvîl dihate kivşê, di vê qalêda ew alîyê Ferasetîne. Lê dîyar nîbû, ev alîdarî bona meremê kefil hildana serbazê hînd bû, yanê jî, ji hurmeta avokî bû, ya ku serkarê dîjband Ferasetîra dihate kirinê.

Ferasetî hinekî virda, wêda nihêrî û dîsa bi rik got:

- Diqewime, sûckerê rewşa Kurdistanê jî ezim? Dova li wira dest bi pevçûyînê, şêr bûye! Diqewime qe Hamo xan dest bi şêr nekirîye, min destpêkirîye?

- Sûckarê wê yekê jî zulumkarîya Rza xane, em xapandin, xwe jî revî çû û yên mîna teye almanperest di nava hewirzêda hîşt.

Gêneraal nava nerehetbûnêda bû, çi mîtale dikir, ne dikir, xwedê zanibû û nişkêva got:

- Axano, ez gellekî heyfkarîya wê yekêdame, gotî we efsarên awaye maqûl, pirs ne anîyana negihandana vê pêgavê? Ez hê Ferasetî ewqasî jî rind nas nakim, lê haj şervanî, miqîm bûna Azerî heme. Ew bi mera tevayî, li gêdûkê pêşa çîyayê Erez mîna efserekî Îranê, yê bi şereza şer dikir. Ez efserên awa dihêjînim. Em bi meremê dagirkariyê nehatine vî memleketî. Em hatine bere cesûse almanaccin. Em tevî karê we nabin. Lê bizanîbin, ev qal tu dema we serbilind nake.

Dema Azerî xwest dêrî veke derê, sekinî û vegerî Vayvîl nihêrî. Te qey digot gêneraal ji wan

gilîyên xwe quretî derz dikirin, lê Azerî bi nêrînên tûj ew mêze kir, got:

- Gêneral, hûn tu dema ji Îranê derneketine, hûn timê li vira bûne. Ev hatina naha jî ya leşkerîyêye. Evê dersê bidine Ferasetî...

Gêneral Vayvîl rabû ser pîya. Bi vê yekêva dixwest bêje, ez tapîya xweye bilind û nav-namûsa eskerê zordestîyê, çawa efserekî layîq dikarim biparêzim. Lê Azerî îdî ji odê derket bû. Li sivderê ew efserê hînd rû bi rû, rastî hev hatin. Emmamekî reng hêşînî qayîm serê wî bû. Rûyê wî bi rûdan, çavên wî bi xew bû, pêşîya bilûzê wîyî zer vekirîbû. Ji kincên xwekirî, ji zola perçê sorî li enîya emmame sêrî, dihate kivşê, ew agirpereste.

Vê gavê Azerî Merzîye anî ber çavan û derbarê wêda kete mitalan. Merzîye piş dêrî sekinîbû û hemû axaftin rind bihîstîbû. Pey çûyîna Azerîra ewê taw nekir û derbazî hundur bû:

- Axa, min biborîne, -got, -min Azerî bêgav kir û bi xwera bire bajêr gerê. Gunekarê vê yekê ezim. Ewî gilîyên min erdê nexist, derneketê dijî xwestinê min. Ew yekî serbilinde û destûra min hebûya, minê bigota ew efserekî bi bizmite. Ez derbarê wêda ji we tu tiştî hîvînakim. Lê hîvîya min her tenê ewe, destûrê bidin, ji vira bavê xwera têlêxim.

Ferasetî rabû ser pîya, destên xwe rex xweda berda û mîna almana cîyê civakî çawa rûmeta jîna dîgirin, usa kir û got:

- Xanim, ez we nas dikim, him jî mîna xanimêke bi hêja nas dikim. Bavê we jî nas dikim...

Wekî hûnê têtêxin û bêjin ku, ser xatirê min, Azerî ji vir berdin, ezê wê destûrê nedim.

Merzîyeyê qe rûyê wî nenihêrî, got:

- Wekî usane bavê minra têtêxin, bêjin ku, Merzîye li Îdara dijbandaye, bila bê, min ji vira bibe.

Ferasetî vê karnîyarêra qayîl bû û Taxixanra têtêxist. Gêneral Vayvîl rabû, cî nîşanî Merzîyeyê kir, wekî ewa rûnê. Ewa cîyê kivşkirî rûnişt. Ewa kete mitala, çawa bike Azerî ji vê herîreşkê, ji vê aravê bide xilazkirinê, yanê na, paşdemîyê, ewana dikarin wî bidine daqurtandinê. Lê ewa ji dengê pîyan, ji ramanên xwe qetiya. Ewê dît, çawa serbazê hînd pêşberî gêneralê Îngîlîs hişk-hola firaqet sekinîye, çavên wî bi xof, dêmên wî bi birînin. Merzîyeyê bi zimanê Îngîlîsî fem dikir û ji axaftina wana, ew yek derz kir, wekî cezayê serbazê hînd wê giranbe.

Wedê Ferasetî torbenda zincirî, qayîşa piştê hînd, seheta wî vegerand, da wî, Merzîyeyê têderxist ew bûdaîye, him ji piş dêrî dengê bavê bihîst. Taxixanra tevayî serheng Razî hatinê hundur, him Merzîye, him Ferasetî, him jî gêneral rabûne pîya. Taxixan selam da û ber bi keçika xwe çû. Ewî ewa hemêz kir û pirsî:

- Keça min, tu ku, ev der ku?

Taxixan ji rewşa heyî, ji wê yekê femkir, wekî ewa li mal nîbûye, tê derxist ewa rastî Azerî hatiye.

- Bavo can, -Merzîyeyê got, -min û Azerî li soqaqê diaxifî, dijbanda ew girtin û anîne vira.

Taxixan hinekî bi hêrs gote keçika xwe:

- Ne, gotî tu biçûyayî mal?

Gavadinê serheng Razî li oda Taxixane xebatê da, hundurê xwe dixwer, wekî çawa bike, Azerî ji Merzîyeyê dûrxe, bi vê yekêva keçikê tenê bihêle û bona dewatê ji bavê wê destûrê bistîne. Raste, Razî û Taxixan bona vê pirsê bi vekirî hevra tiştek nedigotin, lê di vê yekêda meremê wan yek bû. Lema jî serheng nêzîkî pêşxwina Ferasetî bû, ew hê ser pê, bi rizma eskerîyê sekinîbû, destê xwe da ser pîlê wî û got:

- Servan, Azerî jî bi qîrete, efserekî cîwane. Telaya zimanê wî nenihêre. Zimanê kê awa tele, îê timê rind xizmet dike. Ewî bide gazîkirinê, bila bê, wî berde, bila bihêle here. Dema welat di rewşeke girandaye, pêwîste efsarên awaye hêja, bi hiş-sewda bidî xebatê. Naha ne dema hevda ketinêye, servanê min. Ez ser wê nêtême, wekî maqûl generalê jî minra qayîle.

Ewî awa got û berê xwe da gênêral Vayvîl. Gênêral çend cara serê xwe hilbirî-daxist û bi wê yekê qayîl bûna xwe dida gilî-gotinê serheng Razî. Paşê got:

- Hûn firnaxbin, wekî efserekî weyî awayî xwedan peyvîr bilind û aqil heye.

- Were em hevra bibine nas, -Razî got, -destê xwe dirêjî gênêral kir, paşê serda zêde kir:

- Ez serheng Razîme, serwêrê îdara jandarma, ya vîlayetê.

Gênêral bi sivik destê wî givaşt, got:

- Gênêral Vayvîl, komandarê pareskerîyê, ya leşkerê tankan.

- Ez pir şame, wekî maqûlekî mîna wera binêzîk bûme nas. Erê, min derheqa kesetî û mêrxasîya weda bihîstîye. Naha jî we rû bi rû dibînim.

Vê weşê dane zanînê, wekî du serbaza Azerî anîne. Dema Azerî kete oda serwêr, zû derzkir, wekî rewş çawane û hinekî şermoke bû. Taxixan zûrbû li wî nihêrî. Lê serheng Razî got:

- Xorto, tu xût mîna dîkê cengêyî, dengê te jî hemû derê tê, ez kuda diçim, tuyî li wirî.

Azerî dengê xwe nekir. Tê derxist, wekî ji wî alî Merzîye li wî mêze dike. Nêrînên wan kete ser hev. Seh kir, wekî Merzîye hinekî bi firnax tê kivşê, ev firnaxbûn ne bona wê yekêye, ku Taxixan li vê derêye, lê ew bona çarenûsa Azerîye.

Serheng dîsa mecal neda Ferasetî biaxife, hinekî bi kinêzayî got:

- Xorto, paşnavê te çîye?

- Azerîye.

- Azerî, pir-pir qenc. Naha wede ne ew wedeye, rabî hevda bikevî, hev veçirî, pêwîste naha li pêşenîya Kurdistanê mêrxasîyê bidî kivşê. Naha nêrînê leşkerê hevkarîyê li meye. Ewana dixwezin şêrda serketina me bibînin. Dostê min serheng Asa şeş roja berê bi xwestina xwe çûye şêr. Pêwîste ji vir gişk seraser herine şêr. Yanê na, diqewime yekbûna memleketê, tewbûna wê ji dest derê, wekî naha her kes xwe alîkîda bidê, alîkîda bikişîne, memleketê bela-belabe.

Her ku serheng diaxifî, çav û nêrînên Azerî li nexşeya fêza serê Ferasetî bû, dînihêrî. Ewî bi

nîşanên alan, li rêça bintara Moskvayê, ya parastinê mêze dikir.

Ferasetî nihêrî Azerî pêşberî efserê tapîbîlind bêvêc sekinîye, lema got:

- Azerî, fêrîqet bisekine, baldarî be!

Azerî qe xwe şaş nekir, got:

- Ez li nexşeya weye bi pergalî dinihêrim. Ez hîvî dikim hinek guhastinên biçûk têkine nava nexşeyê, çend nîqîtkên bintara Moskvayê, usa jî bajarê Tûlayê ji alîyê leşkerên Sorda, ji faşîsta hatîye paqîş kirinê. Wekî bawer nakin rojnama "İttîlaat"-ê binihêrin.

- Tera çî, ez bi xwe zanim, -Ferasetî bi hêrs got, -û bi wê yekêva dixwest xwe nîşanî Taxîxan û serheng Razi bike. Serheng serê xwe berjêr kir. Azerî bi awayê eskerîyê selam da, weşekî fêrîqet sekinî û got:

- Destûrê bidin, ez herim û bi lez xwe şêra bigihînim.

Serheng jî, gêneral Vayvîl jî, bi rewşa fêrîqetê sekinîn.

Azerî hinekî serê xwe Taxîxan û Merzîyeyêra berjêr kir, bi qeydê eskerîyê paştî vegeirî, ji dêrîva derket, çû. Dengê gavê wîye giran Merzîyeyê dûrêdûr bihîst.

X X X

Ew nêzîkî sê meha bû ku, pareskerên leşkerîyê li 50 kîlômêtrîya Senendecê, li alîyê

başûra gundê Vervendê, dijî serkarên şoreşvanên kurdan û dijî deste-qelfên wane çekdar şer dikirin. Di nava hêzên herdu alîyada cudatî hebû, lê di şêrda ev yek nedihate kivşê. Navînêda xêza şerkariyê jî tune bû. Ji ber ku, şoreşvana zû-zû cîwarê şerkariyê diguhastin. Lê leşkerê dewletê timê di rewşa êrişêda bû. Li pêşên daristanan, zaxe, gêdûk, newelên bi kevir-kuçik, zinarên çîyan cîyê şerê şoreşvanan bû. Wana rê-dirb, çîya-banî, newel-gelî rind nas dikirin, cîkî ne disekinîn, ji alîyê wanada hindik mirov dihatine kuştinê, lema jî timê di êrişêda bûn. Lê eskerê dewletê dûrî van destanîna bûn.

Serheng Asa çawa komandîrê eskerên beşa peyayên sisîya şandibûne vê navberiyê û wana dijî şoreşvana şer dikir. Ew efserekî bejin bilind, hestûgir, xesîyetreş û yekî hindik kenîyayî bû. Gava ewî deste dişande şêr, hetanî mirovê dawîyê nehata kuştinê, ewî emir nedida, yên nûh herine êrişê. Tankeke Asa, ya taybetî hebû. Ewî bi vê tankê êrişên eskerên peya mêze dikir, bona kirinên wane xirab, bi dengêkî bilind li wan cêr dikir, bona yên qenc, ew dipesinandin. Ewî nêzîkva şervaniya efseran, hafiya emirê xwe mêze dikir û gava didît serbaz dixweze bireve, derbazî alîyê dujmin bibe, serrast bi snaypêrêva parava lêdida.

Naha jî Asa nêzîkî qeleça pêşin dibû. Dixwest ji vira cîyê ku, şoreşvana girtiye, bi dûrbînêva binihêre, taktîka şerkariyê bide guhastinê. Lêytênant Kuvserî çavnêrîn li wî dikir. Asa ji

nava çiqilên devîya mêzekarî dikir, di deftera rûkêşta hinek şanî dinivîsî.

Ji berojê çîyayê pêşber dûyê sipî dikişîya erşê ezmîn. Şoreşvana li berojan agir vêxistibûn, lê ewana bi xwe, xwe dabûne jorê, cîyê pêwîst girtibûn. Evê yekê dujmin şaş dikir. Serheng Asa zûva ev kirin-taktîka şoreşvana zanibû. Eva cara duda bû, ku wî şoreşvanê kurdanra şer dikir. Cara pêşîn, se sala berê, zivistanê, li nêzikî Ûrmîyê, hatibûne rû bi rûyê hev. Ew berfa ku, weke bejina mirovan barî bû, tu dema nayê bîrkinê. Sîyarên kurdan jî, berf mîna qeleçan qelişandibûn, te tirê kuçara derbaz dibin, qe serê hespên wan ne dihate kivşê. Lê naha destpêbûna payîzê bû. Hewa seqirî bû. Dûyê kuçikê agirê ku, şoreşvana dada bû, raste-rast dikişîya erşê ezmîn.

Şoreşvanên kurdan bi pêncderbên îngîlîsan armanca xwe didane ber nîşanê û raste-rast lêdidan.

Serheng him deftera rûkêşda şanî, nivîsar dinivîsî, him bin lêvada dikire piçe-piç û dida cêra:

- Ax, duruzên, kurên duruza, hela binihêrîn xwera li ku hêlûn çêkirine! Ewana hewdizandin wê ji destê topên me xilazbin!

Kuvserî him gilî-gotinê wî rind dibihîst, him ewî çî digot fem dikir.

Hinekî şûnda ewî dîsa kire kote-kot:

- Ca tu li wî binihêre, derketîye ser zinêr, şelê xweyî fire virda, wêda ba dike, tîfinga destê xweva me dide tirsandinê.

Paşê berê xwe da Kuvserî û bi hêrs got:

- Ca ewê tifingê bide vira, lêdim wî bisekitînim, bila bizanbe cêrkirin, gefxwerin çawa dibe. Ca tu qismetê me binihêre, leşkerekî awayî bi heyte-hol, dijî kê şer dike. Rastî jî, tu qismetê me binihêre, leşkerekî awayî bi hêz, dijî kê şer dike. Dijî 5-10 şoreşvana sekinîye û dijarîyê dikişîne. Tfû, kafirno! Tu jimara wan binihêre, berxwedana wan binihêre!

Lê Kuvserî qe guh nedida gilîyên wî. Ewî jî mîna serheng li pêşîyê, li cîyê ku, şer diçû dinihêrî. Ew ketibû mitala. Te hewdizanibû, mitale mîna guşîyê qeşayê, buruyên wîda daliqîne. Lema jî ewî buru serhevda ne diqirpand.

- Kuvserî dibînî? -serheng got û ew ji mitala dûrxist.

- Erê, maqûl serheng, dibînim.

Lê Kuvserî qe tiştek ne didît. Xenîc bejin-bala evîndara xwe Mînayê, ya bê miraz, tiştek nedidît. Ewî gellekî dixwest, wekî qe na, vî derdî, nava şêrda birke, bi çavên vekirî çarenûsa şerê mirin-jîyînê mêzeke, lê...

Ewî xwe-xwera dikire şer, wekî careke dinê derbarê Mînayêda mitala neke, lê ewî bi xwe jî nizanibû, te hew nihêrî bejin-bala wê hat, ber çavên wî sekinî.

Ewî naha, careke mayîn, bersivdariya şêr û ya efserîyê kire bîra xwe û hate ser wê birîyarê, ku tenê nêta xwe bide şêr û serheng çavrake. Li pêşîya xwe dinihêrî. Mija ku, ji newalê derdiket zinar, der-dor hingavt bû. Vê weşê, li serê zinarê herî bilind, bizineke çile-qerqaş hate kivşê. Qe

sturîyên xweye ciqil-ciqilî ba ne dikir û te hewdizanibû, ew peykele. Dûman ser wêra hêdî-hêdî derbaz dibû û berbi başûr diçû.

Serheng Asa simêla xweye kurt bada, hêdîka kuxuya. Kuvserî femkir, wekî ev kuxandin bona wê yekêye, bala wî bikişîne ser xwe. Asa kete ramana: "Bawer dikim, wekî xwerina şoreşvanên kurdan îdî xilaz bûye, ewanayê sibê cîyê xwe buguhêzin. Wekî em rîya piş wî çîyayî, ya ku diçe gund bikaribin bigirin, emê wan bikine nava dor girtinê".

Belê, risq-xwerina şoreşvana xilaz bibû, lê ewana birçî nediman. Wana nêçîra teyr-tûyan, kûvîyan dikir.

Asa bi sûkûm berbirî Kuvserî bû:

- Kuvserî, sibê tuyê bi xwe serbazan bibî êrişê. Binihêre, vê xêzê-xetêra here.

Ewî awa got, deftera destê xwe vekir û bi xêz-xetê kişandîva, rê-dirb nîşan kir.

Kuvserî destê xwe dabû ser bişkoka kaskêtê, req sekinîbû, qe alîyê ku, serheng nîşan dida, nedinihêrî û kêlimî:

- Maqûl serheng, ez dibihîzim, ezê sibê serbazan bibime êrişê!

Ewî pey vê gotinêra ridana Asa nihêrî, û vê demê Mîna hat ber çavanra derbaz bû. Ewî destê xwe dirêjî wê kirinê, dît tilîya wîye qilçikê tune...

Asa ber bi wî vegerî. Tûşe-tûş çavên wî nihêrî. Wirda şabûn dît, lê ew şabûn geh vêdiket, geh ditemirî, geh diçilmisî.

Bona xwe ji nêrînên serheng take, Kuvserî çend cara buru qirpandine ser hev, bi wê yekêva dixwest wêneyê Minayê ji ber çavan minêbe.

Xorto, dîsa tu nava xemadayî? Bigire, bavêje, vê kesera sêntîmental, tuyê xwe bedbextkî, heyfa min li te tê, mirov bi kaw-kubar bûnê, ew bedew tê kivşê, ew serfinîyaz dibe, mirov sistbûnê, bin piyada dimîne, hetanî tu dikevî ramana, hafîya derdixî, yê bi hêz ser tera derbaz dibe. Bi hêzbe. Ev dunya, dunya hêzaye. Gel jî yên bi hêz hez dike, gel yên ku wî xerbend dike, yên ku wanra zulmê dike, yê ku jîyana wana ji rîya heq dadixe, wana diwerimîne, dipesîne, pey wana diçe. Gel dijî hêzên usa şer dike, çêra li wan dike, ketinê firsetê wana dukuje jî, lê ewana bi hêzin, lema jî ber bi wana gavan davêjin. Lê yên bi hêz gişk mîna hevin. Ewana bona wê yekê bi hêzin, wekî dikarin, zulmê bikin, mirovan bukujin, ji rehimdîlan bi her alî cudane, ewana dikarin xwestina xwe, kirinên xweye qilêr stuyê wan bialînin. Ez jî mîna te demekê sêntîmental bûm. Min tê derxist, wekî kevir-kuçik jî bînê dikişînin û ewana jî zindîne. Lê van gişkan ez mîna belgê binavê zer dikirim, ez paşta dixistim, jar-hejar dikirim, ji hevbeşên min paşta dixist. Razî ji min rintir, bona wê yekê cî girt ku, ew ji min bê rehm bû, dikaribû vira bike, dikaribû mirovan bixapîne, dikaribû kulma xwe ser serê jaran, belen-gazan xayîke.

Kuvserî ev gilîyana li mekteba eskerîyêda, ji komandîrên tapî bilind bihistibû. Lema jî ev gotina-

na, bona wî çawa mektebêda mîna dersa wekilan-
dî, bê hewas û bê wete bû.

Dewsa wê yekê ewî dixwest bejin- bala
Mînayê çawa hebû, usa bîne bîra xwe, sibê ne ku
ev gilîyana wê, wî bibîne êrişê, lê Mînayê û ruhê
wêyî paqîş. Çarenûsa Mînayê, lênihêrandina wêye
bi posîde, hesreta wêye bona ewled, ramûsana
wêye dawîyê, ya germe ser destê wî...

- Kuvserî, tu efserekî bi culetî. Min ev yek ji
roja ewlîn da têderxistîye. Jîyan ya culetaye. Qis-
metê mirovên tirsonek qula mişkane, para wan jî
hûrîk-mûrîkê ber mişka mayîne. Li bal min pirtûka
ulumdarê alman Nîşşşên heye, ezê bidime te,
bixûne. Min ev pirtûk xwendinê şûnda, dest ji sêntî-
mêntalîyê kişand.

Kuvserî ketibû mitala wê yekê, gelo Nîşşşên
torîvanê almanaye, an na, mekteba eskerîyêda
gişkan ew pirtûk xwendibûn. Asa dîsa dest bi pesî-
nê xwe kir:

- Ez dijî jina gellekî bêxem bûme, min li wan
çawa dujminê xweyî şêr nihêrîye. Hema bona wê
yekê jî serê min silamet maye, ez bi fen-fêlê wana
nehatime xapandinê. Lê te, dest avîtiye çarenûsa
bûkeke bextreş û hey diçî... Tu çiqasî dijî jinê
serhişkbî, ewê daha gellekî te hez bike. Hişyarbe,
ser hiş-sewdayê xweda ware, xwe nede bîrandinê.
Derheqa êrişa sibê da mitale bike.

Lê van gilî-gotina nikarbû Kuvserî ji cî
bileqîne. Dê mê Mînayêyî xweşik, kincên wêye, ku
mîna jinên kurdan xwekirî, vebîşrandina wêye bi
şermoke, ketine bîra wî. Bêxemîya wêye dijî wê jî

kete bîra wî û mîna mirovê şermoke soro-moro bû. Bona serheng evê yekê nebîne, berê xwe da çî-yan. Vê gavê dilê Kuvserîra ew yek derbaz bû, wekî ew bibe yekî xwedan destûr û bikarbibe nêtên serheng yên dijî jina, bide pêpeskirinê, seranser jîyana xwe, hêza xwe dîyarî karekî usa bike, belkî beqî wê kirina xwe, jîyanêda guhastinên nebînîyayî têke nava çarenûsa jina, dewsa nêta serheng, ewî dixwest, li rûbayê dunê xirabî û şerkarî bê hildanê. Ewî derbarê Mînayêda mitale dikir, te tirê ew li gelîkî kûr, ber çemekî rûniştîye û xuşe-xuşa ava gur guhê wîda tê. Çemê ku Mîna têda xeniqî bû... Dîsa şerê ku pêda-pêda li berojê çîyê dihate domadinê ber çavên wî nedihate kivşê. Her tenê çemê ku, bibû sedemê tirba Mînayê dihate xanê kirinê.

Wedê ew şandine pêşenîyê, ewî sond xwer, here heyf- rika jîyana xwe, ya reşe-heş, giran û ya ji wede zûtir qusîyayî, ji şoreşvana hilde, bi wê derd-kulên xwe sivikke. Ew hema bona vê yekê hatibû şêr. Ew hatibû, wekî ji zîndana mitalan xilazbe. Hatibû, wekî pêsîra xwe ji bêebûrtîya bajêr xilazke. Lê çawa ewî mitale dikir, usa nebû. Raste ji bêebûrtîya, rezîlîya bajêr dûrketibû, lê ketibû nava dorbereke, ku bîna xwînê û barûtê dihat. Li vira ew rastî wê yekê hat, wekî zordest, yên bi hêz, zalim, belengaz, hejaran dihincirînin.

Nişkêva pey hev çar gulle hatine avîtinê, ew ji mitalan qetîya. Gullek kevirê dîwarê hilweşîyayî ket, qest-qerezî kulme xwelî reşande rûyê Kuvserî û kire vizinî derbaz bû, çû. Asa kire qirînî:

- Xarbe! Yanê na, wê serê te bifirînin!

Kuvserî xar bû. Dîsa çend gulle ser serê wîra derbaz bûn.

Asa piş dîwarê hilweşîyayî sekinî bû û bi tirane got:

- Xorto, ne tu tirsonek nînî. Tu qey dibêjî, ecel ser serê te birîye. Nabînî alîkî dîwêr hilweşîya-ye, derbaz bûnê, serê xwe xarke, derbaz be. Here amede be... Sibê, şebeqê êrişke.

Pey van gotinara, Asa qe guh neda tu tiştî, vegerî piş avayê yekta û ji ber çavan ta bû.

X X X

Hewa nişkêva germ bû û serheng Asa ser vê yekê ecêb ma. Ew ji Kuvserî qetîyanê şûnda, hate bal herdu darê bilind. Serbazan pêşda bi perdên sipî, dora daran girtibûn, ewî av xwe kir, paşê derbazî xanîyê yekçavî bû û ser çarberê veleziya. Ev xanî, wextekê avayê çayxana kevîya rê bû.

Êvara dereng bû, tarîyê erd hilçinandibû. Asa ketibû nava mitalên kûr. Ew derbarê êrişa sibê da ketibû zikir. Kaxizê çend cara serhevda qatkirî, destê xweda virda, wêda welgerand, nihêrî. Şiba-qêra dît, wekî şoreşvana agir dadane, dû dikişe erşê ezmîn. Ewana wî agirî geh vira, geh derhanê vêdixin, du quloz-quloz dibe. Şoreşvan bi vê yêkê-va dixwezin topavêja bixapînin, nizanibin niqitkên ferz kêderêne. Şoreşvana ji cîyên cuda-cuda gule davîtin, deng derdixistin, wekî nîşandaran şaşkin.

Asa ev yek zef rind zanibû. Lê ewî bawer dikir,
wekî êrişa sibê, wê bi serfinîyazî bê qedandinê, ji
ber ku, li çîya pey germêra dûman her derê digire.
Ger sibê dest bi dûmanê bibe, ewê êrişa taximê bi
serfinîyaz bike.

X X X

Her tişt cî bi cî, cîyê xweda bû. Bona êrişê
hemû kar hatibû kirinê, Asa tenê ji Kuvserî nerehet
bû. Ev efser ber çavên wî hinekî zexel, hinekî da-
ponijîn dihate kivşê. Serheng ditirsîya, wekî diqewi-
me dema êrişê, Kuvserî dijî dujmin dilrehmîyê bike.
Ji ber ku, wî tirê, hemû daponijîn dilrehmin. Dil-
rehm jî tu dema şêrda nikarin şer bikin.

X X X

Gava Azerî gihîşte xêza pêşenîyê, tarî ketibû
erdê. Li çarnika rê serbazekî ew da xayîkirin û des-
tûrname ji wî xwest. Azerî pirsî:

- Xêza pêşenîyê dûre?
- Deh deqîqa rê çûnê şûnda, tuyê avayîkî
yekta bibinî, wî avayîda serheng Asa dimîne.
Karnîyarî wibe.

Azerî gihîşte ber avayê yekta û nişkêva
sehweke giran kete ser wî. Dilê ku, dikire tirpe-tirp
û hêdî-hêdî ji hêz diket. Bi awakî dijwar derî kuta.

Derî dadayî bû, hema vê demê ji hundur dengê hat:

- Lolo, ew kîye?
- Ez dixwezim serheng Asa bibînîm.
- Tu kîyî?
- Ez bi karşandinokê şandime pêşenîyê, lêytênant Azerîme.

- Ew efserê revoke-ferarî, Azerî?
- Ferarî na. Bê destûr çûbûme bajêr, lema...
- Çima bê destûr çûbûyî bajêr?
- Min dixwest bona karekî ferz, rastî dostê xwe Kuvserî bêm.

- Dostê te li vê derêye, dikarî herî bibînî. Here evraqên xwe bide wî, desta topavîtinê hilde-bipejirîne, amedebe.

- Ser sera, serheng, ez amedeme desta topavîtinê hildim.

- Here, bêje ku, serheng Asa got, tu komandîrê desta topavîtinêyî.

- Maqûl serheng, ser sera.

Azerî tarîyêda gav da, şa bû, wekî Kuvserî li vire. Çend gava şûnda serbazek derketê pêşîyê û Azerî ji wî pirsî:

- Pareskerîya Kuvserî li kuye?

- Ez jî diçime wira, -serbaz qe serê xwe bilind nekir got, -û nese kinî rîya xwe cedand.

Rêda Azerî dît çawa serbaz di qeleçadan, li der-dora wana, pêda-pêda veleziyane, servekirî razane. Hewa seqirî, xitimî bû, mirovan nikaribû bîna xwe bikişîne. Te hew dizanibû ser dêmên mirovên paldayî, ronahîya hîvê ketîye reqasê. Her

tenê tirtirikan seqirtî dîteribandîn. Serbazên bi çeke dordar jî, li cîyê rûniştî dihênîjîn. Ji nava ronahîya hîvê qelefatek hate kivşê û bi dengê xeniqî got:

- Bisekine, tu kîyî?

Azerî cîyê xweda qerisî, nizanibû çî bêje. Deng careke mayîn hatinê wekilandinê, ewî got:

- Ez lêytênant Azerîme! Darîyûş Azerî! Hatime pareskerîya Pervîz Kuvserî da xizmet bikim. Serheng Asa ez şandime.

Tarîyêda nefeseke germ li rûyê wî ketinê, hinekî veciniqî. Hema vê demê yekî parava ew hemêz kir.

Azerî tarîyêda bi dijwarî rûyê Kuvserî bijart. Di tenê da biçûk bibû, soraya dêmê wî waşîya bûn, ji hestûyên dêman, yek jî, ji lêvên wîye qalim tê derdixist, wekî ew Kuvserîye. Nava dengê wîda gazin hebû, bi posîde got:

- Kîjan qezayê, wêranîyê tu anîyî derxistî vê cehnemê?

- Pervîz, min bi xwe hîvî kirîye, ez şandime vira.

-Dostê min, dîsa welathizîyê tu hingavtî.

- Ez li bajêr, li te gerîyam.

- Darîyûş, bi rastî, ez jî bi hîvî kirina xwe hatime vira. Yeke ez tu dera nikarim biseqirim. Qe na, şerê çirikekê min ji Mînayê dûrxê. Lê serast gulle barandîna şoreşvana mecalê nadin têkevî nava mitalan.

- Ez çûbûme bajêr, wekî te bibînim. Li wir gişk hev qesidîbûn, hev ketibûn. Gel rabibû dijî

bahabûna nîn. Bi kulma dihatine hev, bi kîn-buxs dipeyvîn. Wezîrîya wezaretê didane ber kevîran.

- Em li vira bahabûna nîn nizanin, haj gewmandina tunenin. Em ji gel qetîyane. Em nika-riş mîna gel bifikirin.

- Qence, wekî tu dûrî gilî-gotinê Îngîlîsan, yê genîyî. Ji gêneralên wan, yekî, Vayvîl gote min, ku were te bişîname Azerbaycanê, çawa reyîsê bargeha leşkerîyê, wira bixebite. Ez ketime fikiran, ez ku, reyîsê bargehê ku?

- Dostê min, li vira jî gilî-gotinê genî-kurmî, bê ebûr hene. Tuyê gişkan bibîhîzî, bibînî. Tuyê bibînî çi tînine serê kurdan. Tuyê bibînî çawa axa û bajonên wan ji alîyê Rzaxan da hatîye dagîr kirinê, çawa rûspîyên wan li Qesrî-Qacarê hatîye gullekirinê, çawa zimanê wan hatîye rezîlkirinê. Ev du mehe ewana li çîyan, gêdûkan, newalan da dijî me şer dikin û berxwedanin. Ez neqayîlim pozê yekê wana bê xwîn kirinê. Min qe ewana nedîtine.

Vê şevê awa axaftina dostê wî, Azerî nerehet kir. Te tirê Kuvserî ji bilindcîkî diaxife.

Kuvserî dîsa dûmayîn da axaftina xwe:

- Ez hêçka jî peygerê tîm. Gotî em sibê êrişkin, êrişî ser kêkin, çima êrişkin, heta naha jî minra ne eyane. Fermana serheng Asa ahaye:

"Êriş!, "Êriş!" "Pêwîste hêlûna şoreşvanên kurdan hilweşînin!"

Kuvserî dît, wekî Azerî hinekî nerehete, awaza dengê xwe nimiz kir, destê xwe danî ser pîlê wî û got:

- Dostê min, qe nerehet nebe, tuyê li vira bijîyî û her tiştî bibînî. Yek jî, tu jîyanêda timê mirovê qenc gerîyayî. Lê tuyê tu dema rastî yên usa nêyî. Yên usa, yanê hê ji dîya xwe nebûne, yanê jî gişk qirbûne, xilazbûne çûne.

Kuvserî pey van gilîyan hinekî tevizî. Dilê wî mîna kûrexanê hildibirî-dadiket. Bona dawîya axaftina xwe, serhevda bîne, destê xwe ji ser pîlê dostê xwe hilda, got:

- Tu şandine pareskerîya min, amedebe ! Tu bi topan, ez bi nîzan... Lê ewê rind bizanbe, neyar tune. Destê meyê negihîje wanan. Ewana li serê çîyan, em vê derê, binê newalêda...

Hinekî şûnda ewana dora ocaxê bi kozîyê gire-gire, yên pêşta bin xulîyêda cirûsî rûniştin. Heta naha wana ewqas steyrk nedîtibûn. Te hewdizanibû erşê ezmîn daliqîye jêrê, ew daliqîye ser bendeva çîyan. Dordar dengê pîyên serbaza, yên giran-giran, dibihîst. Te tirê perdeke reşe giran kişandine ser erşê ezmîn û ew jî, bi steyrkên bêjimarva daliqîye erdê. Kuvserî çokên xwe hemêz kiribû û ser hevda qincilîbû. Ewî çavên xwe kuta bû, çavên ku, hêdî-hêdî ditemirîn, dihatine girtinê, derheqa qewmandinên bajêrda mitale dikir. Lê ewî nedixwest derheqa wê yekêda tişteki ji dostê xwe pirske, ditirsîya, nişkêva dostê wî derbarê Mînayêda gilîkî nûh bêje, wî careke mayîn nerehet bike, birîna wîye kewgirtî rake, careke dinê birîndarke. Ewî qe derbarê malê-malbetêda jî tişteke ne dipirsî. Ne ewê sibê here êrişê. Demên awada gotî,

serbaz bi ruhşabin. Azerî ev nêta dostê xwe tê derxist û got:

- Yeqîn dixwezî pîrskî, li bajêr rewş çawane?

- Na, dostê min! Lê ez wê yekê dizanim, gel tu dema şaşîya nake. Ew zane, qewmandineke îro, dikare bibe mizgînîya sibê. Diqewime sibê rewş daha xirabbe. Memûrên dewletê serê xwe unda kirine. Tê kivşê şah jî di rîya bavê xwe da diçe. Alîkîda leşker dişîne ser kurdan, alîyê dinêda jî, li bajêr her tişt li hev piçilikîye. Em jî xulamê dewletê-ye bi kirêne. Ewana kêderê nîşanî me bikin, emê li wir jî şerkin.

Azerî him guh dida gilîyên dostê xwe, him jî dicedand gotinên serheng Keffarî, yên ku li mekteba eskerîyê qal dikir, bîrbîne. Wê demê serheng digot, wekî gel mîna kerî peze, kuda dixwezî, têke pêşîya xwe bibe, usa bikî serê xwe daxweza wanra ne êşînî, gava dijî şah û dewletê radibine têkoşînê, pêwîste ewana bi her alî bêne hicrandinê. Te hew dizanibû pey van gilîyara Azerî gotinên baxvanê kal jî dibihîst. Nûra wî hat, ber çavên wîra derbaz bû. Ewî tê derdixist, wekî ev herdu mitale dijî hev sekinîne û hundurê wî kerî-kerî dîkin, wî dikine du beşa, ew vedigere dibe mirovekî bi du awayî mitale kirî. Naha memleketêda gişk bûne nefsdarên du awayî mitale kirî. Kuvserî jî, ji wan kesana bû ku, bi du awayî mitale dikir, bi awakî gav davît. Van mitala ew kovan kiribû. Vê kovantîyê kaw-kubariya cîwantîya wî nimz dikir, bawerîya ronahîya wîye sibê, ya geş dida pêpeskirinê. Ew bibû kerî hesinê zenggirtî, yê ne pêwîst.

Kuvserî rabû ser pîya. Tarîyêda ew mîna peykelekî giranî bilind hate kivşê. Destên xwe serhevra bir, danî ser sîngê xwe û li kozîyên êgire, ku îdî ditemirin mêze dikir û nişkêva bi kîneke mezin kêlimî:

- Dostê min, tu qey dibêjî, ez û tu dundan û ewledên vê memleketê, yên bê bextin. Em bixwezî, ne xwezî, gotî em dijî xwestinên xwe gava bavêjin. Em bixwezî, nexwezî pêwîste em gulla bavêjine hejaran, bê sûcan. Lê ew jî heye, wekî tu xwe neparêzî, xût ew mirovê hejar wê te pêpeskin, ser tera derbaz bin, heyfa şah wê ji te derxin.

Em çi dikarin bikin? Pêşê me eve. Dunya ne mîna wê yekêye, çawa ku, em mitale dikin. Dunya, dunya qirêcan, ya kaf-kûnê, ya hukumdarên xwîn mêtaye. Vê dunyayêda belengaz jî, zulumkar jî weke hev gunekarin. Belengaz bona belengazîya xwe, zulumkar jî bona zulumkarîya xwe... Ez vê dunya hevrûtî ricim dikim. Ewa jî bin pîyên min direve. Ez dixwezîm wêya bigirim, xweyîkim. Dixwezîm wêya bihejinim, wêya bidime hişîyar kirinê. Çawa kesek tune rabe bêje, leşkerê ku nikaribû dijî eskerê îngîlîs şerke, lê yê ku dijî 50-60 şoreşvana şer dike, gelo ew mêrxasîye? Ez naxwezîm bi wî awayî bibime mêrxas. Bila mêrxasîya awa bibe qismetê yên mîna Asa.

Her ku Kuvserî ev gilî-gotin bi rik digotin, tarîyêda destên xwe bilind dikir, dadixist, sîya wan mîna şûrekî serê Azerî diket. Azerî têderxist, wekî ev rik, ev bê bawerîya ku, dostê wî kirîye pêşîya xwe dibe, çend rojan jî bidome, ewê nexweşkebe.

Azerî rabû ser xwe û qest xwe şa da kivşê, dostê xwe hemêz kir:

- Ez jî mîna te difikirim, -got, -meseleke pêşîya binîme serzara: "Dost-dosta ten gerek, ten olmasa gên gerek" ("Gotî dost, dostra hev girêdayî-be, hev girêdayî nîbe, pêwîste ji hev dûrbe"). Rind gotine, lê şêrda destûra me tune awa bifikirin. Paşê emê derbarê wê yekêda bi axiftin.

X X X

Merzîye ji îdara dîjbandyê vegerînê, ji pirtûkxana Sînayê nexşeya Yekîtîya sovêtê ya ku, beşa Avropayê tomerî dida kivşê, stend, anî li dîwarê oda xweye razanê xist. Ewê ew nexşe, mîna nexşeya li oda Ferasetîye kar, kaxizê sor derbazî ser derzîya kir, qul-qulî kir, pêva kir û ew kire rewşa rojnîşa şêr. Ewê hero rojnameya "Îttîllaat" distand, ser bingeha agahdarîya cîyê derzîya, duguhaşt. Raste Merzîyeyê ev yek xwera kiribû mujûlî, lê nikaribû Azerî bîrke. Gava ewê li nexşeyê mêze dikir, dêmê wîyî bi geş, dihat ber çavên wêra derbaz dibû. Ew himberî mêrxasan, aktyoran dikir. Ew himberî Kênmanîjard, Jak, Rîçard Talmaç, Bûstêrgrab dikir. Lê bi gorîya wê Azerî li tu kesî wana nedîçû. Mêrxasên evînen sêntîmêntal yên sînemeyê sazband, xweşa Merzîyeyê dihat. Lê tu yek ji wana ne mîna Azerî bû. Ewê tu mirovekî naskirî hiberî Azerî ne dikir, wê tirê dunêda yekî usa tune, wana himberî hevke. Merzîyeyê serheng

Razî û Azerî himberî hev kirinê, dilê wê bi xwestineke hetanî naha nenasva tijî dibû. Jîyana serhengê tere-tijî, ya paşdemîyêye hetab, bi kefîltî, nav-dengê wîyî bilind, Merzîye bê gav dikir, wekî kûr-dûr mitale bike. Derheqa van gişkada bavê wêra hey qal dikir. Carna bavê keça xwera derbarê surên jîyanê, qanûnên ne nivîsarî, yên ku, bi çavan nedihatine kivşê, qal dikir û dawîyêda her tişt dihanî nefsa Razîra dida girêdanê, wekî şer xêra kê xilaz dibe, bila bibe, ew mirovekî her tiştîva bêxofkirîye. Taxixan dicedand keça wî bibe jina serheng. Keçika ku, hê xweşiya mêrtîyê, hetavîya jîyanê ne dîtibû, ew gilî-gotinê bavê bihîstinê, dike-te nava dunya mitalan û wana ewa fitil-fitil digerdandin. Ewê mitale dikir, wekî Razîra mêrke, wê nava tapîbilindên bajêr û serekotîya civakîyê da bibe bûkeke here hizkirî. Ewê mitala wê yekê jî dikir, wekî mal-milkên Razî, xizmetkarîya wîye di pareskerîyê da, ya bi nav-deng, evîna kalêyê bêhinber wê ya wê be. Him jî evserên cîwan, malbeta wanda cudatîya temenên sala dîtinê, wê di xweda bikizirin û wê hey bicedînîn bi heyr-hemekar nêzîkî wê bin. Ewê jîyanêda tu ezîyetî, tu zehmetî nekişîne û bi serfinîyazî bijî. Van nêt-mereman demekê, ewa ji Azerî, jî hub-hizkirina wîye bi agir-alav diqetand, lê zû jî, careke dinê, evîndariya Azerî ewa dihingavt, dişewitand. Dahatîya efserê cîwan, nêrî-nên wîye kûr-dûr, şerkarî, culetbûna wî bawerîke mezin tijî dilê Merzîyeyê dikir. Fikirên Azerîye li îdara dijbandan û li meclîsa mala Razî da, ku anîbû serzara, kirinên wîye bi culet, usa ewa heyr-

hejmekar hîştibû, mal-milkên Razî, nav-dengê wî, wêda dev dida û ewa ber bi Azerî dikişand.

Şev-roj Merzîye destpiçolkî van fikiran dibû. Bona ku, ji van mitala dûrkeve, dest davît, wekî şuxulekî bike. Naha jî alên sor-sorike derzîyanvan kirî, ewa ji dudiltîyê dûrdixist. Ewê carna alên sorik ji ser bajarê Tûlayê, Lênîngradê, Kûrskê hildida, datanî ser welatên Avropê, yên ku ser tixûbê yekî-tîya Sovêtê bûn. Diqewimî ev yek, bona wê yekê di hate kirinê, ji ber ku, Azerî awa dixwest. Ewê ji axftina Azerî ew yek fem kiribû, wekî ewî dixwest Yekîtiya Sovêtê faşîzmên Almanîyê derm-daxke, altindariyê bide bêxofkirinê. Ger usa bibe, dunyayê rewşa xwe buguhêre, heqîyê altindariyê bibe. Merzîyeyê hero rojnama "Îttîllaat" distand, ser bingeha nûhçeyên wê leşkerê Sovêtê hinek bajarên biçûk û avan ji faşîstan dabû aza kirinê. Dinihêrî ew nav-nîşan nexşeyêda tunenin. Ewê alên biçûk usa diçikand, di ramanên xweda, bi sed kîlomêtra leşkerên faşîst paştî dikişand. Van rojên dawîyê Merzîye diçû kînotêatra "Barbod"-ê. Kînoxronîkên derbarê şêrda, ku li wir dihatine kîvşê, mirov dînar dikir. Altbûna almana, ya bintara Moskvayê, şerê bona Stalîngradê nihêrinê ewa zendegirtî di-ma. Di nava van şerada ewê nîgara Azerî dihanî ber çavan. Carna jî ewê hew dizanibû, waye Azerî nava şêrdaye, bi pareskerîya xwera tevayî şer dikin. Roja ku, Merzîye ji Azerî qetîya bû, karê wê ew bû, wekî bi alên biçûkva rîya Ordîya Sore şervanîyê bide kîvşê, di hiş-sewdayê xweda Azerî û Razî himberî hevke.

Şerê duda jî didomand. Eva şerê li Senendec, Saggizê û Banê bû. Şoreşvanên kurdan û leşkerê Îranê şer dikirin. Hero rojnama derbarê vê yekêda elametî-agadarî didane weşandinê. Erê, ev şer himberî şerê hemdunyayêyî duda, gellekî biçûk û tenik dihatê kivşê.

X X X

Merzîye hetanî gewrîyê nava lêhêf û binrexêda hatibû tepisandinê. Dîsa derheqa Azerîda mitale dikir. Êvar bû. Ro diçû awa. Tîrêjên tava roda der-dor qijilandî, zereya xwe avîtibû ser şûşên oda Merzîyeyê razanê, ye ku nêzîkî karxana pem bû. Qe ew dengên meydana fûtbola bajêr, "Ûra"- "Ûra", yên ku ji wir dihatine bihîstinê, nikarbûn xelegên zincîra ramanên Merzîyeyê biqetîne, ji wana dûrxê.

Lê li oda dinêda Taxixan ber roderê rûniştibû, ketibû mitalên kûr. Ewî derbarê Merzîyeyê da, derbarê hetabîya wêda, derbarê kelmel-malê bi rîya qaçaxî, ji Xanegîn û ji Bexdayê anîda mitale dikir. Rîya derbazbûna van kelmelan û mifta wana destê serheng Razîda bû. Çawa dibên, ewî bi xwe dixwest keça xwe bide Razîyê sê cara zewicî, carna jî rîka xwe bi wî dihanî, kifir-kifûr, neletî ser vî mirovê qure, serbilinda dibarand. Carna jî xwe-xwera digot: "Çi bikim, şuxul awa jê girtîye. Gişk aha dîkin. Hemû kes bona nefsa xwe, bona kêrhatina xwe diçerçire. Lê çima ez usa nekim ?

Çima ez keçika xwe nedime mirovekî usa, yê ku, nava civakîyêda bi nav-denge, xwedanê hebûna mezine? Çima ez bi destî wî malê qaçaxîyê nedime cî bi cî kirinê”.

Serheng Razî jî dikaribû beqî Taxixan qellek tiştî qezencke. Cara yekemîn ewî keçikeke mîna Merzîyeyêye cîwan distand. Bajêrda bedewa usa tune bû. Bi nêrîna Razî lezeta dunê pênc roje, çima ew wan pênc rojan bi tem-lem derbaz neke? Ya duyemîn, beqî Taxixan dikare malê qaçax bîne Têhranê. Ji ber ku, dunê timê awa namîne. Dunya-yê bê guhastinê. Aparata dewletêye naha wê ji cî bileqe...

Serheng mirovekî dunê dîtibû. Ew ji pêşekarê leşkerîyê, daha gellekî bazirganê bi cêribandî bû.

Taxixan hê ber roderê rûniştibû û nava mitala da bû. Car-cara dest davît simêla xwe mizdida, vedigerî derê oda girtî, ya Merzîyeyê dinihêrî. Vê gavê ewî qe nedihanî hişê xwe, wekî diqewime sehetekê şûnda Razî bê mala wan mêvan. Razî hatibû ser wî meremî, wekî ew çiqasî gellekî nêzîkî Taxixan û Merzîyeyê bibe, ewê ew qasî Taxixan fêke bi bandora xwe.

XXX

Dengê gullebaradina şoreşên kurdan, ji şebeqê sehet hefta hate bihîstinê. Wedê ku, serbazên ximeyada û yên ji wan der razabûn, ji

dengê gullan hişîyar bûnê, ew sehetek bû, Kuvserî tarîyêda êrişî ser cî-warê şoreşên kurdan kiribû. Ev êrişa, xwedê giravî, ya peygerê bû, ya ku bi plana serheng Aşa dihate mîyaserkirinê, weke 90 serbaz tevî wê bibûn. Kuvserî rizma eskerîyê û şanîdan teriband bû, bi xwe pêşîya destê diçû. Ew êpêcekî ji serbaza dûrketibû. Serbazan ev dûrîhevketin dapojinperestî, sersemîya wîva dane girêdanê û qest paştaya vegerîn. Lê Kuvserî serê xwe kiribû ber xwe, te tirê serbaz bîr kiribûn, ber bi çiyê direvîya. Ewî usa derz dikir, naha ew, ne ku nava şoreşvanên kurdan û pareskerîyê da direve, lê nava du dunyayê da, nava tarî û sîyêda, nava avê û reşayêda, nava jîyan û mirinê da, nava peranîya û mirovan da direve û ew çiqasî di vê rîyêda bireve, ewê negihîje dawîyê. Ew kesên ku, nava du pêşenîyada virda-wêda direve, ked-xûdanê dide rêtinê, dibe şehîd, yanê jî hêdî-hêdî ji holê tê rakirinê, ew dunya bi xweye. Paşê ew dunya sero-bino dibe, xopan dibe. Ne, Kuvserî bi xwe jî, nava van herdu dunya da maye, tê hicirandinê, pêpes kirinê, ew nikare xwera cîkî bigire, te tirê, ew timê hewêda dardakirîye, jîyanê da jî ew ber destê tabî bilinda dinok-toze. Naha ewî êrişî şoreşvanên kurdan dikir, lê bi xwe jî nizan bû, ev êrişa, yanê nêzîkbûne.

Vê gave bejin-bala Mînayê hate ber çavan. Ewî çarenûsa xwe nava çavên wêda didît û dicedand bireve bigihîje wê, ewî serbazên ku, pey wî direvîn bi carekêva bîr kiribû. Dilê wîda ewê xwestinê serê xwe bilindkiribû, wekî ew bireve bigihîje Mînayê, çarenûsa xwe tevî çarenûsa wêye

qusandî bike, bi wê yekêva ewê bibe yekî her tim zindî, destnegihîştî. Wî her tişt, her kes, dîya xwe û xalên xwe jî bîrkiribû.

Berbangê bi serkarîya wî, wana êrişî şoreşvanên kurdan kirinê, wî usa têderdixist, ew diçe bigihîje Mînayê. Mînayê gazî wî dikir. Gazî dikir, wî bibe bigihîne hetavîya hub-hizkirina wana, gazî dikir ew bê, bibe yekî nebinyayî, cawîdan. Ewî zanibû, wekî fişekên şoreşvanên kurdan, yên ku tarîyêda avîtinê şemal didin, dûrbînên hereket nîşankirî tunebûn. Lema jî Kuvserî bi lez ber bi be-rojê çiyê dilezand, ku sibê ron bûnê, şoreşvanên kurdan bikarbin wî serrast bidine ber nîşanê. Berî êrişê ewî usa birîyar kiribû. Eva jî birîyara xwe kuştinê bû. Ewî nedixwest pey Mînayêra bijî. Ewî xwekuştin ser wê yekêra digirt, wekî hetanî nava du dinyayêda bimînî, virda, wêda birevî, hetanî tu bi dudunya, bi dudilî dijîyî, mirin ji wê bilintire. Birîyara xwekuştinê, wê wî ji bobelatê, ji rojên qîre-qetranê bide xilazkirinê û ewê bigihîje Mînayê.

Wî xwe kuştinê ser wê yekêra digirt, wekî hetanî nava du dinyayêda bimînî, virda, wêda birevî, hetanî tu bi dudunya, bi dudilî dijîyî, mirin ji wê bilintire. Birîyara xwekuştinê, wê wî ji bobelatê, ji rojên qîre-qetranê bide xilazkirinê û ewê bigihîje Mînayê.

Weşa dengê reqe-reqa gullên şoreşvanên kurdan hatinê bihîstinê, Kuvserî bi hiş-sewdayê xweva bawer dikir, wekî ew îdî digihîje meremê xwe. Tenê wîra tevzî derbaz bûn, lê qe talaşa wî nîbû. Evan tevzîya dilê wî dane ber êş û janan, lê ew zû derbaz bûn. Gulle mîna tavîya baranê ser wîda dibarî.

Kuvserî îdî parava ne dinihêrî. Ewî her çirik çavra dikir, wekî ewê bibe xurê nîşana gullên şoreşên kurdan. Ev hêvî, hêvîdarîke bi ecêb bû. Bona bigihîje ruhê Mînayê, yê bi evra, carna ew derdikete ser girikê devê rê û xwe-xwera digot ku, wexta gullên tîfingên bêrnoyê, yên destên kurdan, wî bihingivîne. Wexta ewê bibe nîşana gullên risasê reng gewir. Vê gavê ewê ji dudiltîyê, ji dudunyatîyê, ji bindestîyê, berdestîyê xilazbe û kesekê nizanibe biryara xwekuştinê, hê wedê ew nehatibû nava şêr, dabû. Kesekê nizanibe, wekî roja ber avbenda Xizirê rûniştibû, ew hatibû ser wê nêtê.

Kuvserî berojê çîyêra hevraz quloz dibû. Ew westîya bû. Kincên wîye bin, nava xuyêda bûn. Lêvên wî û pêçîya wîyê ser destrêjik-tetikê tevizî bûn. Wekî wî bizvirîya piş xwe binihêrîya, wê bidîta, çend esker hatine birîndarkirinê, li erdê veleziyane. Lê eskerên mayîn ji tîrsa gullên kurdaye serrast, ketibûne ber sitara kevîr û zinaran. Lê Kuvserî dîsa berojê çîyê dabû ber xwe. Wî dît, wekî Mîna ketîye pêşîya wî, ber bi bilindaya çîyê direve, ewî jî dabû pey wê. Ewî tu tiştek seh ne

dikir, her tenê dengê gure-gura gullên şoreşvanên kurdan, yên ku gelfi-newal hingavtibûn, dibihîst.

Asa bi dîrîşîyê xwe, ew ber bi şoreşvanên kurdan şanî kir.

Asa bi dîrîşîyê xwe, ew ber bi şoreşvanên kurdan şanî kir.

Asa bi dîrîşîyê xwe, ew ber bi şoreşvanên kurdan şanî kir.

Asa bi dîrîşîyê xwe, ew ber bi şoreşvanên kurdan şanî kir.

Asa bi dûrbîna duçiqil-dubifilva rêzgeha şer mêze dikir. Ew ser tevger, kirina Kuvserî zendegirtî mabû. Ew ser wê yekê daha gellekî zendegirtî mabû, Kuvserî lap nêzîkî şoreşvanên kurdan bû, lê gelo çima wî nadine ber nîşana gullê. Asa bîn teng bibû. Dujmin dikaribû Kuvserî xerbend bike. Asa hew zanibû, ku eva taktîka êrîşkirina komandîr, ya taybetîye, lê ew hereketên wî wekî, çima ew bi qirma destê xwe gullekê navêje neyar û ev evserê cîwanî dem-demî ew kire nava şikê. Bê vê yekê jî, Asa hema roja-rojda ji wî ketibû şikberîyê. Lema ewî Kuvserî him şîret kiribû, him şewir dabû wî. Naha Asa di xweda diqic-qicî. Lê Kuvserî hey hildikişîya jorê. Ew ji gullên şoreşvanên kurdan ne ditirsîya, serê xwe kiribû ber xwe diçû û hindik mabû bigihîje dujmin.

Asa dilê xweda miqîm birîyar pejirand û bi dengê rik, ji adyûtantê rex xwe tîfinga snaypêrê xast û meremê xwe neda der, got:

- Wê snaypêrê bide min, ez diya wî şoreşvanî bidime girîdanê.

Asa snaypêr da destê xwe, ew danî kêleka qeleçê, pêşîyê ew ber bi şoreşvanên kurdan şanî kir, paşê usa kir adyûtant nebîne, devê tîfingê daxiste jêrê. Nihêrî Kuvserî westîyaye, bi dijwar-

dijwar berojra hildikişe, tîfing rastevekire paşpîlê wî. Ewî piştî Kuvserî hilda nava dorgera snaypêrê û tetika wê kişand. Tetik kişandinê şûnda, destê xwe jî tîfingê kişand, zû dûrbîna bi dubifil hilda û alîyê Kuvserî nihêrî. Kuvserî serhevda quncilî, paşê alîyê rastêda xar bû, bi pîyê xweyî çepê nîvtûr kişand û deverîya hate erdê. Serheng şabûna xwe neda der.

- Tu qey dibêjî li Kuvserî xistin, -got, -ca were tu jî binhêre.

Adyûtant du gava pêşta hat, dûrbîna dubifil hilda mêze kir, lê Kuvserî nedît. Kuvserî deverîya ketibû. Hema vê demê Kuvserî destên xwe kuta erdê, beqî qamên wan rabû ser xwe. Pêşîyê vegeerî parava nihêrî, paşê rîya xwe domand. Adyûtant got:

- Cenab serheng, Kuvserî rabûye ser pîya û careke mayîn êriş dike. Lê ji desta leşkeran gellekî dûr ketiye...

Asa careke mayîn bi dûrbînêva li beroj nihêrî. Kuvserî hevraz hêdî-hêdî dida gava. Ewî qirme dabû destê xwe û bilind-bilind kiribû, diqîrîya. Dengê wî bi zorekê dihate bihîstinê...

- Li minxin, wekî qîreta we heye, li minxin! Ez li we nîfretê dikim! Ji we wê da kî hene, li wan jî nîfretê dikim! Li vê dunyayê nîfret dikim!...

Ez xwe li xwe nîfretê dikim! Ez yên mîna xwe neletîyê lê dikim, yên ku dibine mirîyê tapîyê, dibine bin dest, ew çî dibêjin, bê gilî diqedînin. Ez naxwezim bijîm! Min jî ezabê van herdu dunyan bidine xilaz kirinê!

Paşê Kuvserî zivîrî, berê xwe da leşkerên xwe, got:

- Êy, hey, ez nîfreta mezin li we tînim ! Ew gullên ku, hûn davêjine şoreşvanên kurdan, gotî bavêjine esker-leşkerê îngîlîs. Ewana me bere hev didini! Em hev didine qirê! Ewana wê qirê mêranî-mêrxasî hesab dikin! Em hev dixapînin! Hûn çima van belengazan didine qirê! Ne, hûn bi xwe jî belengazin!

Dengê Kuvserî hate birînê. Vê weşê Asa bi snaypêrê gulla duda avîte pîlê wîyî rastê. Ew ji wê derbê, deverîya hate erdê.

Azerî ji kirinên Kuvserî him ketibû şikê, him ne rehet bû. Ewî ew jî dît, wekî Asa du gulle avîte dostê wî. Lê ewî bawer ne dikir, evê yeka nekirî, Asa mîyaser kir. Ji vê kirina qîlêr Azerî ricîfî û nîşkêva emir da batarêya topan, agirbez ser hev-ser hev hate avîtinê! Dengê topan gişk lerizandin! Çend deqîqan şûnda Asa ser serê Azerî birî û bi dengêkî hovîfî, qirîya:

- Axmaxo, ne tutişto, bê hişo! Gullên topa bihêwşîne! Kê emir daye te, gullebarandinê bide sekinandinê!

Topavêjan qe hîvîya emirê Azerî nese kinîn, agirbez dane sekinandinê. Hema ku agirbez hate sekinandinê, ji çîyayê pêşberî wan kevir, kuçik, zinar hatine hêl kirinê, ewana hevdiketî, ji dengê top-tifingan zêdetir deng derdixistin.

Asa careke mayîn bi kîn-kuduret got:

- Kê emirê gullebarandinê dabû te?

- Wîjdana min! -Azerî got û bi nêrînên tûj li wî nihêrî.

- Bila korbe wîjdane te! Te qelet kirîye! Çima tu xwe serê xweyî?

- Ez bê serî xwe nînim!

- Wekî tu bê serî xwe nîbûyayî, te bi sedavan gulle badilhewa ne davîte hewa. Me ewana ser piştê hêstîra, bi ezîyetê kelban anîye. Gotî ewana wededa pêwîst bûnê bêne avîtinê.

- Min ewana ne avîtime hewayê, min avîtime dujmin.

- Meremê te çibû?

- Meremê min ew bû, wekî dujmin bitirsînim, Kuvserî bîname anîne. Parava li wî dan. Bona wê yekê pêwîste, ewî bînine vira.

- Tu cîwanî, tevî şera ne bûyî, qanûn-qayda nizanî. Kê tu şandîyî vira, bila ji destan qopbe! Kuvserî bi carekêva ji pareskerê xwe qetîya bû, dûr ketibû. Kê li wî xist ne eyane. Diqewime eskerê wî, bi xwe li wî xist. Bona wê yekê, wekî ewana tenê hiştin, xwe revî.

- Kê jî lêdabe, ev kirin cînayete.

- Wekî ev yek cînayetkarîbe, cara yekem tuyî tawanbar, ji ber ku, gotî dengê gulle barandina to-pên te nehatana birîne.

- Kuvserî ji alîyê milê weda hate lêdanê.

- Lo heylo, qey dibêjî, tu dixwezî me têkî nava tawanbariyê?

- Ev kirin tawanbarîya ser tawanbariyêye, tawanbarîya dadgehîye!

- Dengê xwe bibire, tişt pê ne bûyo! Tu dixwezî serê me têkî nava gije-vija xwe, dujmin jî bê, me ji holê bide rakirinê.

- Ez dixwezim bizanibim, kîye qetilkarê Kuvserî.

- Te qe'et kirîye! Bona vê yekê heqê te tune.

- Na, heye.

- Tune!

- Ez dostê Kuvserîme, wîjdana min ser min hukum dike.

- Lolo, geveze-meveze ne peyve, binê ezê te jî jora da, deverîya bînîme erdê.

- Na, tuyê nikarbî wê yekê bikî.

Wedê serheng dest avîte qirma kêleka xwe-ye rastê, adyûtantê wî wê weşê qirme kişande ser Azerî.

Azerî jî bi lez qirma xwe derdixist û rastevêkire ser adyûtant. Herdu serbazên mayîn yên ku, rêbarî li serheng dikirin, xwe şaşkirin. Serheng dît rewş girane, qirma xwe kêre cî, paşda vegerî û bê etb-şerm cêr kir, ji wir dûrket.

Azerî cîyê xweda dilerizî. Rika wî ji tixûbê xwe derketibû, kinê-buxusê lê-lê bû, wî bixeniqîne, mîna belgê ber bayê gur badibû. Ewî dixwest li gişkan bide zanînê, wekî Asa bi snaypêrê li Kuvserî xist. Lê bê wê jî, hemûyan ev yek rind zanibûn. Tu kesî, tîrsa dengê xwe nedikir. Lê naha Azerî daha gellekî ketibû xemxurîya wê yekê, çawa dibe, bila bibe; pêwîste Kuvserîyê birîndar bide xilazkirinê. Pêwîst bû, vê gavê birînê wî bêne pêçandinê û

paşê bişînîne nexweşxana eskerîyê. Diqewime ew ne mirîyê?

Azerî çavên xwe kuta cîyê ku, Kuvserî deverîya ketibû, dît dostê wî qunculîye ser hev, mîna niqitkeke reşayê tê kivşê. Hewa jî îdî tev-hev bibû. Ji alîyê bakûr, ji newalê dûmanê, perda xwe dikişande wan der-doran. Dema awada şoreşvanên kurdan cî-guhasî dibûn.

Nişkêva Azerî çirp kir, ji qeleçê derket. Ewî qe piş xweva nenihêrî, ber bi cîyê ku Kuvserî ketibû, revî. Şoreşvanên kurdan ew hildane ber nîşanê û ser wîda gulle mîna tavîya baranê reşandin. Ji vize-viza gullan ewî têderxist, ku şoreşvana ew hildane ber nîşanê. Lê ew pêşta direvî. Tirsawî her tenê ew bû, wekî parava wî nexin. Ne, Kuvserî parava hate lêdanê. Ewî ew yek jî zanibû, mirovê ku, wêda destevala tê ser şoreşvana, ewana gullan davêjine hewa. Lema jî tirsawî ji Asa bû.

Asa serê xwe ji qeleçê derxist, tiranên xwe bi kirinên Azerî kir, cêr pey cêran li wî kir. Ji tirsawî hewarî li Azerî danexist, wekî ew paştawegere.

Ewî snaypêr-tifing zexim-zexim, bi kîn, bi hêrs destê xwe da diguvaşt û paş-pîlê Azerî kire nava nîşana dûrbînê, lê dudilî bû, derbarê hafiya vê kirinê da mitale kir. Ewî xwe-xwera got, wekî ez Azerî jî bukujim, bi wê yekêva jî, ser kuştina Kuvserî jî, wê bê tepisandinê. Lê de tu were, ditirsîya diqewime rojeke usa bê, ewê bêgav bimîne û bersîva heqîyê bide.

Asa nava bera mitalada dixeniqî, nizanibû çi bike? Lê nişkêva tetikê snaypêra nîşan hildayî

kişand. Wî tirê gulle raste-rast paş-pîlê Azerî hingavt. Wê weşê dil-hinavê Asa mîna beroşa qîr-qetiranêye ser agirê gur, di xwe da kelîya, paşê nêzikî têlêfona best-beyarê bû, bi dengê hovtî emirê agirbezê da. Gulle li pîlê Azerî ket û ji destê êş- janê kire îske-îsk, ofe-of. Dengê gullebarandina batarêya topan çîya-banî hilda serê xwe. Ji hewerza gullebarandina topan şoreşvan daha jî ketine rikê û dixwestin edetê xwe biterbînî û Azerîyê destevala bidine ber gullan. Asa ev yek rind zanibû. Ewî ew yek jî zanibû, wekî wê paşdemîyê bide kivşê, gava bona wê yekê emirê agirbezê dabû, ku Azerî ji gullebarandinên şoreşvana bida parastinê. Avîtina topên gullan, li cî-warê şoreşvana bû encamê tengezarîyê.

Dûmana sixte hêdî –hêdî çîya di nava xweda dipêçand. Ji qulla li piştê ketî, bedena Azerî jan dida. Lê ewî ber bi Kuvserî dicedand. Azerî lez diket. Dixwest zû bigihîje dostê xwe û wî hilde bibe, diqewime wî ji mirinê bide xilazkirinê. Lê vê gave êşeke kuştinê ji pîle wîyî rastê rabû û hemû bedena wî da ber tîrên kulê. Vê weşê ewî tê derxist, wekî ew him parava hatîye birîndarkirinê, him pêşva. Bi awakî dijwar serê xwe bilind kir, alîyê Kuvserî nihêrî. Dûmanê ew der-dor, çîya kiribûne kitana sipî.

Azerî dîsa hemû hêza xwe civande ser hev, wekî bicedîne bigihîje hewarîya dostê xwe, hey hayê... Parava dengê li wî tesele bû. Ew dengê serheng bû:

- Ev bîşerefana ne şandine ser dujmin şêr,
ewana hatine vira artistîyê bikin, hatine vira nîgara
bedewetîyê bidine kivşê!

Dema Azerî ev deng bihîstinê, çavên wî
reşevêhatin, dûmanekê perda xwe kişande ber
çavên wî. Ji piş perdê, ewî dêmê Merzîyeyê, yê bi
ken, kuçeke seqirtî, avayê duta, stûnên wê, li ser
wan wêneyê du çivîka dît. Wê wêda Azerî tê
derxist bedena wî teviziye. Ew ser kêlekê, ser axê
velezîya... Wî tirê ev tevizandin ji axê rabû û
derbazî bedana wî bû.

X X X

Îzzetê kurd mirovê duda bû, dît wekî Kuvserî
parava hate lêdanê. Ew ji wan şoreşvanê kurdan
bû, ku li zinarê herî bilinda qeleçe çêkir bû. Îzzet
ser hereketê vî efserî lap zendegirtî mabû. Ew hat
derkete berojê çiyê, lê gullek neavît. Çavên wî, li
wî bû. Hema ji gulla pêşîn ew qincilî serhev, jorda
hate erdê. Îzzet elbêra verevûrt kir, kê gulla
snaypêrê avît, ji ber ku, ew li cîkî bilindî usa mey-
dana şêr mêze dikir, te qey digot, ew kefa destê
xwe dinihêre. Cara duda gulla snaypêrê hatinê
avîtinê, ewî rind dît tîfinga snaypêrê destê kêdaye.
Ew jî didît, wekî vî efserê birîndar hey dicatedand ber
bi bilindaya çiyê bê. Îzzet derbarê çarenûsa vî
efserîda, derbarê wê yekêda, çima ew ji alîyê
hogirê wîda hate gullebarandinê, kete mitalên kûr.

Paşê Îzzet ser wê yekê zendegirtî ma, wekî ewqas esker diji 12 şoreşvana şer dikan. Di nava şoreşvana da ew yê 12-a bû. Bi emirê Hamo xan van 12 kurdan, ji berojê vî çîyayî, rîya sereke ya ku diçû Senendecê diparêstin. Dûman destê bi destê dihat. Eva dûmanêke sixte bû. Dûmana awa çend roja nakişe, naçe. Ewî ev der, erd û esman rind nas dikir. Ewî ew jî zanibû, dûman hatinê, ewê cîwarên xwe biguhêzin. Awa bûnê nîşana topên dujmin badih hewa diçû. Heta dujmin cîyên wan rastere dikir, êpêce wede derbaz dibû.

Weş bi weş nerehetîya Îzzet zêde dibû. Ewî xemxurîya efserê birîndar dikişand. Ev yek bona wî qewmandineke nebinîyayî bû. Evê nebînayê Îzzet ber bi wî efserî birîndar dikişand. Evê ecêba ser ecêbê, ew mîna meqlêdûzê pêberjêr, ber bi berojê çîyê dikişand. Te hew dizanibû, nale-nal, zare-zara efserê birîndar digote Îzzet, here cangorîyê bike. Ewî dixwest xwe ji ber çavên gişkan taldeke, dakeve jêrê û qe na, li rûyê efserê birîndar mêzeke. Diqewime ew yekî nase... Diqewime ew birazîyê Hamoye? Ne ewî jî eskerîyê da qullix dikir. Birayê Hamo zindanêda kuştibûn, qestbende kurê wî anîbûne nava vî şerî, wekî wî nîşanî Hamo bikin, bi wê yekêva derba giran li ruhê wî, heyîtiya wî, xin.

Gava dûmanê der-dor sipî kirinê, Îzzet birîyar kir, dakeve paik û efserê birîndar bibîne. Ewî rêdîrbên çîye rind nas dikir û ev yek wîra ewqasî jî ne dijiwar bû. Îzzet tu kesîra, tu tiştek ne got, dakete jêrê. Ew bi fesal nêzikî cîyê ku, efser hatibû birîndar kirinê, bû.

Îzzet lap nêzîkî efser bû û kuxuya. Tu deng ji birîndar derneket, ew ser efserda xar bû, guhê xwe danî ser sîngê wî, têderxist ew nemirîye. Gullê deremê pîlê rastê, yek jî deremê pîyê çepê bela kiribû.

Îzzet ser birîndara sekinî, kete mitalan. Qira ku, serbaz û efsaran anîbûne serê kurdan, ber çavên xwera derbaz kir... Du salan berê, wedê bi serkarîya Hamo xan, şoreşvanan dijî Rizaxan şer dikirin, xûşka wî - Mukerremê, teştî tijî xurek dabû ser serê xwe û şoreşvanara xwerin birinê, ewa bibû xurê nîşana efserekî vê bejin-balê, vî rengî kinc xwekirî.

Îzzet efserê birîndar rastkire ser piştê û rûyê wî mêze kir, ew nas nekir. Lê dêmên wîye qerci-mekî, çavên wîye korta çûyî gellek tişt digot.

Dêmê wî ne mîna dêmê hemû efseran bû. Ew yekî jarik, hestûyê dêman bijiqî bûn û wana şedetîya gellek derd-kul, merezan didan. Dîsa daxwezîyê ew ber bi birîndar dikişand. Îcar ewî li tu tiştî nenihêrî, mitale nekir, wekî wê paşdemîyê çi bibe, çi nebe, nêzîkî Kuvserî bû, xar bû, bi herdu destava piştî wîva girt û ew bi zexm ji erdê hilda, da gava. Hinekî şûnda birîndar li ser mila, ew nava dûmanêda nehate kivşê. Lê li cîyê ku, Kuvserî erdê ketibû telte-telte xwîn ma.

Îzzet ji kîlomêtrekê zêdetir rê çûnê şûnda, nikî daristanê Sakkizê Kuvserî danî erdê. Ji vir wêda, hetanî gundê wan, rîya 5-6 deqîqa bû. Zûr-bû li rûyê Kuvserî mêze kir. Bijangên wî jî bi xwîn bûn. Îzzet dest avîte simêla xwe, mizda û kete mitala. Wekî ew birîndar bibe mal, Hamo xanê wîda bikeve, xezeba wî anî ber çavan. Vî birîndarî li vir bihêle here, ew jî ne tu mêranîye. Nişkêva dilê Îzzetra ev nêt derbaz bû: "Ern-xezeba Hamo xan berga tişteki nagire, lê wekî birîndar li vira bihêlim, herim, Xwedê wê qenîmî minbe". Îzzet hate ser hukumê Xwedê. Kuvserî bilind kir, ew avîte ser pîlê xweyî rastê, di nava daristanêra, ber bi gund çû.

Dûmanê da, hetanî derê male, tu kesî Îzzet nedît. Berî gişka jina wî – Gulpesend bi hatina wî hesîya. Ewa hinekî tirsîya, lê hate dilê wê, yeqîn hevalekî mêr hatiye birîndar kirinê, alî wî kir, birîndar hêdîka danîne ber şêmîkê. Jinikê destê xwe kişande rûyê birîndar û veciniqî, got:

- Îzo, ev mirîye.

- Na, ew nêmirîye, mirîbûya min ew nediha-nî.

Îzzet qewmandin kurt jinêra qal kir û teme da:

- Temê bide Fîrûzeyê bila derbarê vê yekêda tu kesîra, tişteki nebêje.

Paşê wana birîndar hildan birine mal. Jinikê bere xwe da Îzzet:

- Îzo, lê nişkêva ew bimire?

- Bimire, ezê wî bibim dayînime wê derê, ji kêderê anîye. Jinik, ew mirovekî bi ecêbe, rehma min li wî hat, lema min ew anî. Ez vê deqîqê vedigerime cem hevalan, kî zane diqewime hetanî ez bêm, ew ser xweda bê. Bicedînin birinê wî dûdermankin.

Gulpesendê bin çavavan li mêr mêze kir. Porê wî bij-bijî bibûn, hinek daketibûne enîyê, ji çavan agir, ji rûyê wî jer dibarî. Ewê bi dengekî nizim, te hewdizanibû, ewa ber mêr digere, got :

- Dilê te ne li me dişewite, ne li xwe. Îzo, ne tu zanî eva mirovê dewletêye. Wekî saxbe, Xwedê zane wê çi bînine serê me, hela Hamo xan nabêjim, ew bibihîze wê çerm ji piştê me rake.

Îzzet nêzikî jinikê bû û got:

- Gulpesendê, dilê min hukumî ser min kir, min jî ev yek kir. Îdî çi dibe bila bibe. Şuxul ji şuxul derbaz bûye. Eva 4 sale em dijî leşker şer dikin. Dîsa dibêjim, dilê min awa xwest. Min nikaribû zorê li dilê xwe bikim.

- Îzo, îdî tu tiştekî nebêje. Ez haj dilê te heme. Xwedê weke dilê te, bide te. Tu here, ka binê em çi dikin?

Îzzet timê xarbûnê, dêrîva der ketinê, li dara bihokêye derê malê dinihêrî. Bilindaya vê darê, weke bejina Îzzet nîvçe bû. Ew û Fîrûze hemsal bûn. Fîrûzê wede bi wede wê dinihêrî, ew av dida, lê dar bilind ne dibû. Bihokên ser darê timê hêşîn diman.

Îzzet, ku derkete hewşa malê, nizanibû here şer, yanê here cem Hamo xan. Bi rastî, ewî

nedixast vê lezê derbarê birîndar da Hamo xanra tişteki bêje, ji ber ku qe ne nav, ne paşnavê birîndar zanibû. Ewî ew jî zanibû, ew evê qewmandinê Hamo xanra nebêje, ji gund gundîkê here bêje.

Ew kete rê. Nava dûmanêda bi lez-bez diçû. Dengê gullan nedihatine bihîstinê. Şoreşvanên kurdan cîyê şervanîya xwe diguhastin.

Îzzet bi gavê fire da gava. Gava gihîşte nikî daristanê Saggizê, fitilî ser topikra dakete jêrê, ber bi cîyê şêr çû. Lê tu dostekî xwe li wir nedît. Şervan cîguhastî bibûn.

Îzzet nava rê-dirbên zinaran derbaz bû, hate qeleça xweye berê. Dûman kişîya bû. Hewa mîna şûşê dibiriqî. Weke kîlomêtrekî dûrî qeleça wî, beşên topan yê leşkerîyê, baregeha qeleçan û ya pareskerîyê rind dihate kivşê. Li alîyê rastê-devê rêda, avayê yekta, ku berê çayxane bû, lap zelal dihate xanêkirin.

Çavên Îzzet mîna dûrbînê zelal-zelal reş ji sipî cuda dikir. Li banê xanîyê yekta stêrê lihêv-binrexê jî mîna kefa destê wî hate ber çavan. Îzzet yeqîn kir, wekî hewa germ bûnê, yek dertê wira û radizê. Nişkêva çi hate hişê Îzzet, ewî tîfing da destê xwe û veleziya. Tîfing rastevekiere ser lihêv-binrexê, nişangehêra ew der hilda nişanê, wî tirê naha yek li wir razaye. Evê kirina wî êpêcekî kişand.

Nêteke ewa jî hate hişê Îzzet, wekî tu dema efserê tabî nizim nava lihêv-binrexêda ranazê, hebe-tunebe, ya efserê tabî bilind, yanê komandîr vira radizê. Ewî xwe-xwera got: "Wekî min yeqîn

bizanibûya, wira kesek razaye, minê bi gullekê ew heta-hetayê rehetkira. Lê, wekî şev bêm gullekê bere wê niqitka nîşan kirî bikim”...

Ewî rabû tîfing danî ser zinêr, alîyê çepê, rastê bi kevirên biçûkva qayîm kir. Du kevirê mezinva jî, rast, çep qundax da berkirinê. Careke mayîn li cîyê nîşan kirî nihêrî. Dît ewî tîfing raste-rast tûşî lihêv-binrexê kirîye.

Îzzet rabû, ji zinara daket û rê-dirbên hatîra paşta vegeirî.

- Îzo, ha kuda diçî?

Îzzet veciniqî. Serê xwe bilind kir, bi dengê Mehemmed, ew naskir.

Îzzet ser kevirê mezin sekinî got:

- Ez li we digirim.

Dûman kişîya bû, hewa dîsa germ bû. Mehemmed şelme ji serê xwe hilda, vekir pê xûya serê xwe paqîş kir, ew careke mayîn girêda. Tavê usa dizeriqand, ji serên zinar-zera te tirê agir dada-ne, alavê davîte rûyê mirovan.

- Heme, çi heye, çi tune? Te nizanibû Hamo xan ez pirsîm, yanê na?

- Erê, li te digerîya.

- Te nizan bû, bona çi?

- Na, nizanîm.

Dilê Îzzet tijî şik bû. Diqewime hinekan derheqa efserê birîndarda, Hamo xanra tiştêk gotîye... Îzzet eyan kir, wekî şervana cîyê xwe ne guhastine, lema jî got:

- Heme can, de wekî usane, ez berê herime cem Hamo xan, paşê vegerime qeleça xwe. Tu mi-qatî alîyê rastêbe, hetanî ez bêm.

Gotî Îzzet ji vî çîyayî daketa, derbazbûya, biçûya gundê Hamo xan. Gund weke nîv kîlomêtirî dûrî Senendecê bû. Axayên kurdan zû-zû li vira rastî hev dihatin û hevra dişêwirîn.

XXX

Hamo xan palê xwe kutabû ser çend balgî-yên ku, rûyên wan ji perçekî hatibûne dirûnê û qelûn dikişand. Ew yekî jarik bû. Çavên wî korta çibûn, bi rik, bi hêrs bû.

Îzzet ber dêrî sekinî, hîvîya wê yekê bû, axayê gazî wîke. Ewî car-cara serê xwe dirêjî hundur dikir, wekî xwe nîşanî Hamo xanke. Hinekî şûnda Hamo xan got:

- Îzo, were hundur, bêje min binê, çi heye, çi tune, xêre, şere?

Îzzet derbazî hundur bû, dutayî bû, sekinî.

- Were, pêşta were, qalke, qe çi heye, çi tune?

- Saxîya we, axa. Dibên, te ez pîrskirime?

- Belê, çek, topa bi zincîr pêwîste. Here biki-re, bîne.

- Wekî hûn keremkin, ezê herim, peydakim, bînim.

- Çi wextî dikarî herî?

- Çi wextî keremkin, xan axa.

Ji gep kirina Îzzet Hamo xan fem kir, kêfa wî tune, lema jî pirsî:

- Li şêr çi heye?

- Xan axa, serê tekim, ezê îşev lêdim reyîsên wan bukujim. Yê ku ewqas serbazê feqîr dane qirê, pêwîste ew bi xwe here hate-nehatê.

Hamo xan kenîya. Nêyîya dirêj, ya qelûna ber xwe, kire nava lêvên xwe bi lezet, bi temeke xweşva kişand. Dûyê boz ji devê xwe pif kire he-wayê got:

- Îzo, parastvanên reyîs gellekin, tuyê nika-ribî wî bukujî. Reyîsan bona ruhên xwe, serbaz û efser xwera kirine çarmedor, paşda vekişîyana rehet rûniştine û serkarîyê dikan.

- Xan axa, ezê bukujim, ezê lap rehet, nava lihêv- binrexêda bukujim. Destûrê bide wî bukujim.

- Pak here, bukuje. Wekî nekuji, ezê pozê te jêkim, bi guhê teva pînekim.

Hamo xan îdî derbarê çek stendinêda tiştek ne got. Ewî virda, wêda mitale kir û ev şuxul paşta xist. Îzzet xanra serê xwe berjêr kir û hêdîka ji malê derket.

Sibetira wê deng-hes bela bû, wekî îşev serheng Asa kuştine. Axayên kurdan ev qewman-din bihîstinê, yeko-yek, dudu-dudu dihatine mala Hamo xan. Gişk beşter bûnê şûnda, xan merivek şande pey Îzzet û bi ken got:

- Do Îzo gote min, ezê wî bukujim. Gotina xwe kir. Ji destê zalimê kurê zalima, çi bêjî tê. Eh, hela bila bê, ka binê ewî, ew çawa kuştîye.

Gava Îzzet hate oda şêwirê, ya Hamo xan, gişkan bi ecêb li wî nihêrîn.

Deng-bes hatibû belakirinê, wekî şev serheng Asa di nava lihêv-binrexê da bi gulla tîfingêva hatîye kuştinê.

Hamo xan bi dengêkî yekbêjî got:

- Îzo, serheng Asa te kuştîye?

- Belê, xan axa.

- Te çawa kuşt, qe tu ji ser zinêr daneketîyî jêr?

- Kuşt da...

- Axir, çawa, bêje em jî bizanibin.

Îzzet axara qal kir, çawa roda tîfing rastevekirîbû, çawa nîşan hilda bû, çawa şev hat, tetik kişand, gullek berda.

Hamo xan qure-qure qelûn kişand, qulab-qulab dû ser xwera berda.

X X X

Azerî ser çarberê, nava cî-nivîna velezîya bû. Pîlê wîyî rastê kitanêva hatibû girêdanê, destê rastê bi desmalekêva stuyê wîda hatibû darda kirinê. Ewî çavên xwe vekir, der-dorê xwe nihêrî, ximeyêda tik-tenê bû. Azerî gazî kir, lê ji tu kesî deng derneket. Tîrêjên tavê ji derîyê ximeyêra xwe avîtibûne rûyê wî. Ji derva çîve-çîva çivîkan dihat. Ewî cedand, wekî qewmandinên do bîr bîne, serê wî gêj bû.

Serbazê ku, derva dordarî dikir, dengê Azerî bihîst û hate hundur, selam da û got:

- Cenab efser, hûn dixwezin nîn buxun, keremkin bêjin, herim bînim.

Serbaz vebîşirî, diranên wîye gire sipî hatine kivşê. Lêvên wîye qalim hejîyan, dêmên wî xitimî bû. Dolaxa solên wî sistbibûn, ser hevda qerçimî bûn.

Azerî bi dengê zirav pirsî:

- Ez li kêderême?

- Em li pêşa avbenda Xizirê, li wargê doxtrîyê-sanitaryîyê.

- Li vê derê xêncî min birîndar hene, yanê na?

- Hebûn, do qewm-lêzimên wan hatin, ew birin. Hinekan jî maşin girtin, bi xwe çûne bajêr, birînen wan sivik bûn.

Azerî bi milê çepê hêz da xwe rabe, vê demê êşeke nebîniyayî ew hingavt. Te hew dizanibû, alîyê wîyî rastêda çiyak darda bûye.

Ewî pirsî:

- Lê em hîvîya kêne?

- Gotî maşin bê. Hetanî maşin bê, pêwîste ez li bal webim.

Azerî li derva nihêrî. Li berojê çiyê zaxeke biçûk hate kivşê. Qeliştêka zaxêda qalikekî merêkî hatibû dardakirinê û ew ber bê virda-wêda dihate bakirinê. Bi wê yekêva Azerî tê derxist, rastî jî ev der berojê avbenda Xizirêye. Ew carekê, sê sala berê, hatibû vira û avbendêda av xwekiribû. Ji gundên der-doran mirov dihatine vira zîyaretê. Têra

dihate dîtînê, wekî tirba Xizir Pêyxember li viraye. Ava golê dibirin, çawa teberik bi nexweşa didane vexwerinê. Sosina rewşa avbendê rewş bi rewş bedew dîkir. Mirov bi şabûneke mezin dihatine vira, qevzên sosina berav dîkirin, dibirine malên xwe. Mirovên ku, vira dijîn timê bi firnax digotin, wekî usa dibe, şev Xizir Pêyxember di nava avbendêda çirê vêdixe. Hinekan ev yek bi çavên xwe dîtine.

Azerî rabû, hate ber derê ximeyê sekinî. Serê wî dêşîya, ew mîna gêja bû. Dûmaneke zirav xwe avîtibû ser avbendê. Evê dîdema xwezayê xerîbî tijî dilê wî kir. Avayê mala wane li Tebrîzê, hate ber çavan. Paşê dît, ji nava herdu stûnên avayî Merzîye li wî dinihêre. Heweke sar hate dêmên wî. Bedana wî lerizî-jan da. Bi sersemî nêta wîra ew yek derbaz bû, wekî hema ku qenc bû, destûrê bistîne here mal. Merzîyeyê jî xwera bibe. Destê wê, bide destê dayîkê. Bila cîran bêne dîtina wê, bila bavê wî, bin lêvava vepişire, bila bişî bêne pêtinê, bila keç-bûkên dûr-nêzîk, deste-deste bêne dîtina hizkirîya wî.

Azerî cîyê xwe da qerisî bû. Ewî tê dernedixist birîna wî dizqîte, yanê na. Dîsa Merzîye ji nava dûmana ser avbendê derket, hat pêşberî wî sekinî. Şewq-şemala wê avîtibû hemû derê. Du çivîk ser serê wêra virda-wêda difirîn, dihatin bas-kên xwe herdu stûnên mala wan dixistin, paşê ji ber çavan unda dibûn. Ew çivîkana yên çarenûsa wî bûn, ewî wêneyê wana di zarotîyêda kişandibû.

Nava vê "şabûna" wî da, serheng Razî kete bîrê. Li rûyê wî, yê mîna cermê ga, kenekî bi tirane

hebû! Çavên serhenge bijiqî tijî kîn bûn. Ev kîn tevî dûmanê bibû û mîna ewrekî reş wêda hat, Merzîye nava xwe da pêça.

Ew Azerî li ber ximeyê usa ketibû nava dunya mitalên xwe, qe dengê maşînên ku, hatibûn birîndaran bibin, ne dibihîst.

XXX

Sibetirê cenazeyê Asa birine Têhranê. Serleşker Refîî danîne dewsa wî. Xwedêgiravî, vî serleşkerî zor li şoreşvanên kurdan kiribû û ewana paştta, ber bi Senendecê dabû vekişandinê. Refîî efserêkî hurpûz, sergerm, serkêş, rênebir bû. Ew bi eslê xweva ji Tebrîzê bû. Lê ew her tenê sê cara li Tebrîzê qesidibû. Her carê jî, ew li wir du-sê rojan mabû. Refîî nikaribû bê jîyana Têhrana kim-kimî bijî. Qesreke wîye mezine nûhdemî û dûrî bajêr vîlla wîye bedew hebû. Lema jî serleşker gellêkî dûrî Têhranê ne dima. Berî hatina xwe Refîî gotibû elahezret, wekî min bişîne wê pareskerîya ku, dijî kurdan şer dikin, mehekê wede bide min. Ezê nava mehekêda şoreşvanên kurdan derm-daxkim. Rast mehekê...

Ew heftek bû, wekî Refîî hemû hêza xwe civandibû ser hev û dest bi êrişê kiribû. Lê serkarê şoreşvanê kurdan Hamo xan îdî westîya bû.

Ji ber ku, şoreşvana hero neqayîlbûna xwe didane kivşê, dew dikirin, ku ne çek heye, ne xwe-rin. Lê Hamo xan dixwest dest bavêje tivdîrên nûh,

dujmin bixapîne, wana heta zivistanê li vê navberîyê xayîke. Ji ber ku, ewî bawer dikir, wekî wê zivistanê bikarbe pêşîya êrişa bigire. Ewî ew ji zanibû, berfa zivistanê çîya-banîya, rê-dirban digire û di serê neyarada roja reş tîne. Alîyê dinêda Hamo xan dest avitibû fen-fêlan, dixwest dujmin bixapîne.

Dema serleşker Refîî ji Hamo xan wesandina hevhatinê stendibû, xwe kuta bû tanka Asa, ya biçûk û derbarê hevhatinê da ketibû ramanên kûr. Raste, wesandinê ew hinekî qure kiribû, lê ew di nava şikberîyê da bû. Wana salekê berê serkarên şoreşvanê kurdan xapandibûn. Rizaxan Quran wanra şandibû û ewana dabûne bawerîkirinê, wekî wê xwestina wana biqedîne, bi cî bîne. Wê salê Refîî hê tapî serheng bû. Ewî Qurana şah şandî, da ser serê xwe, bê çek ber bi serekên kurdan çû. Ew gihîştinê bal serkarên şoreşvanên kurdan, Quran paç kir, nêt-meremê şah, sonda wî û xwestina wî gihande serkaran. Şoreşvanan bawerîya xwe bi şah ne anîn, lê bawerîya xwe bi Quranê anîn û çekên xwe radest kirin, ji şerkarîyê destvekişandin. Lê du rojan şûnda leşkerê şah êrişî ser kurdan dike û şoreşvanan yeko-yeko digirin, dest-pîyên wan girêdidin û dişînine Têhranê. Li her derê hukumeta leşkerîyê tê elam kirinê. Malbetên şoreşvana tene nefîkirinê. Wedê Hamo xan rewş awa dîtîne, di rîya çîyara direbe Îraqê.

Naha ew qewmandin dihatin ber çavên serleşkera derbaz dibûn. Ewî nikaribû pêşîyara Hamo xan, ya bê wede, bihemîne. Ew ji heyfhilda-

na kurdan ditirsîya. Bona ku, efserên tapî nizm tu tişteki seh nekin, ji cîyê sekinî emir da:

- "Amedebîn"!

Lê bi xwe kete nava mitalên bi tirs-xof.

Berêvarê serleşker ji Hamo xan wesandina nûh stend û îcar hinekî ji şikberîyê dûr ket. Hamo xan wîra wesandîn şandibû, wekî binelîyên bajêr amedene esker bipejirîne, serkar jî dikarin rastî hev bîn, bona şêr bidine rawestîne, tevî hev axaftina bidine derbazkirinê.

Refîî qure-qure karnîyarî efserê tapî nizm bû, got:

- Ev bê rehmanan nexwezin dijî me şerkin. Gotî awa jî bibûya. Wana sê sala berê derba min dîtine.

Vê weşê sergurd wêda hat, bi rewşa esker selam da û got:

- Cenab serleşker, ewana him dibên warên em hev bîn, him jî dibêjin werên em bi tevayî meşê derbazkin. Çiqas eskerê wan heye, wekî ewana dixwezin tevî me meşê derbazkin.

- De, wekî usane mirovên wane rêzane hene. Wana fem kirîye, wekî ewanayê nikarbin ji bin lepên mine hesin xilaz bin.

Serleşker Refîî du peyger û pênc serbaz şandibû bajêr. Ewana vegerîne Refîî nan duxwar û araqa Îrmîyê weduxwir. Peygeran ew jî şikberîyê derxistin. Lê ewî carna çavên xwe dukuta roderan, dikete mitalan. Serbaza tê derdixist, ew hê di nava şikberîyêdaye.

Serleşker cedand wan şikberîyan ji xwe dûrxe, destekî xwe bilind kir, paşê daxist, pozê xwe mizda, got:

- Em pêşnîyara wana dipejirînin, lê pêwîste neyêne xapandinê!

Paşê ewî dîsa destê xwe bilind kir û serbazan hew zanibûn, serleşker eşeretî da, wekî ew derêne derva. Serbaz hevra-hevra derketine derva. Refî jî bi şidîyayî-şidîyayî pey wan derkete derva. Ji hereketên wî dihate kivşê, ew karnîyara şoreşvanên kurdanra qayîle.

Serleşker cara dua emir da:

- "Amedebîn"!

Vê weşê borî hate lêdanê.

X X X

Sibetirê, berbangê, Hamo xan mirovek şande pey Îzzet, wekî ew bê bal wî. Îzzet mîna her car duqat xar bû û derda hat. Ew hema usa sekinî û hîvîya emirê xan bû.

Rişîyê çalma serê xan hilşîyabûne enîyê. Ewî him qelûn dikişand, him bin çavava li Îzzet dinihêrî. Bi vê yekêva xan derba xwe nîşanî Îzzet dida. Ewî têderxist bû, Îzzet ne Îzzetê berêye. Bê xemtî, xwesertî li bal wî pêşta hatiye. Îzzet jî tê derxist, wekî hineka derbarê efserê birîndarda wîra gotine. Bonê ji bin zordestîya xan xilazbe, Îzzet got:

- Xan axa, keremke, fermo, ez xizmeta teda amedeme.

Xan giran-giran axifî, her tenê lama wîye jêrîn dihejîya:

- Here Xanegînê, bêje Mûrad, ji aliyê topada dijarîyê dikişînin, bila zûtirekê du heba bişîne.

Ji gava dinêda Îzzet pişta xwe kûz kiribû, ew rast kir, got:

- Ser sera, ser çavan, xan axa.

Ew him jî şabû, wekî rika axê negirtîye. Lê Îzzet vê pirsêda şaş bibû. Gilîyên xane jêrîn ew lerizand:

- Yek jî, wî efserî bukuje!

Îzzet nava çavên Hamo xan nihêrî. Ewî dixwest bizanbe, gelo ev emirê xan çiqasî bi miqî-me! Nêrînên çavên xane bi kîn, zulumkarîya wî dida kivşê. Îzzet bi kîn-kudret pêçîyên destên xwe bi şeqe-şeş ser hevda qatkirin, hemû hêza wî beravî nava kulmên wî bûn. Lê zefta xwe anî. Ewî zanibû, kî emirê xan bi cî neyne, cizareta wî gellekî giran dibe. Îdî kêr hatibû li hestû asê bibû, te tirê tirs-xofa xan ji ser Îzzet firîye. Hamo xan pismamê wîyî dûrbû. Îzzet ji emirên xan, yên neheqe bê cî, çawa dibên, îdî têr bibû. Emirên wîye ku, timê jîyana mirovan dikire bin qezîya mezin, gellek cara ew duqusandin, dilê Îzzetda bibû derdekî mezin. Aliyê dinêda, hê birînê Kûvserî kurbûn, qenc ne bibûn, mirovê birîndar çawa bukujî. Ew yek jî bona Îzzet ecêb bû, wekî çima Kuvserî qe gullek ne avît, çima parava li wî xistin? Hetanî ev pirs neyêne

zelal kirinê, kuştuna wî efserî wê neyê çaresekirinê. Lema jî Îzzet got:

- Xan axa, ez nikarim wî efserê birîndar bukujim?

- Çima?

- Bona wê yekê, wekî ew ne dujminê meye.

- Tu ji ku zanî?

- Ewî ber bi me guile nedavît, parava li wî dan.

- Ew dujmin nîbe jî, qe dost jî nîne.

- Ew kîye nizamim, lê zanim, ew ne mîna yên mayîne. Mirovên wana bi xwe parava bi snaypêrêva li wî dan.

- Îzo, ez dixwezim wî saxe-sax bibînim. Wana çawa birê min bi cizaretî kuştine, ezê jî wana usa bidime kuştinê. Mirov rehmê li dujmin nayîne. Sûcê birê min çi bû? Diqewime, ewî 16 salan Rzaxanra, leşkerê wîra xizmetkarî ne kiribû? Gelo, çima te nedît, te ne bihîst, birê min bi namerdî kuştinê şûnda, welêt sareser kilam avîtine ser wî? Gilîyên ku, wî gotibûn, mîna kilaman dîstiran, yanê na? Lê naha çi bi te qewimîye? Diqewime tu jî derbazî alîyê wan bûyî? Ca min bide serwextkirinê, ev çi qewmandine? Çi bi te hatîye?

Îzzet serê xwe kiribû ber xwe. Hamo xan derbarê wê yekêda her derê qal fikir ku, çawa Rzaxan birê wî daye kuştinê. Cuda, gava kurdên sade dişande şêr, dişande dijî Rzaxan şer kin, bi şewat bobeleta birayê xwe wanra digot, dibiland. Carna ew qewmandin anînê serzara, bi xwe digiriya. Lê van paşdemîyan gava Hamo xan ev

zulmkarî qal dikir, evê yekê ne ku hukumî ser Îzzet dikir, lê serbarê serda ew diecibî.

Çav li Hamo xan sor bibûn, bijiqî bibûn, hindik mabû ewana ji palikan derên. Evê yekê şedetî-ya wê yekê dida kivşê, wekî xan amedeye, destê xwe bavêje hemû xirabîya, hemû netêya. Lê ji ber çavên Îzzet efserê jar, dêm reş-qemilî ne diçû. Guhê wîda zare-zara wî, ofe-ofa wî di hate bihîstinê. Yek jî Îzzet bona tişteki mayîn diji Hamo xan derdiket. Îzzet tu dema qayîl nedibû, wekî mirovekî birîndar, yê ku, mala wîda star bûye, bibin bukujin. Lê der-cîranê vê yekêra çi bêjin? Pîyên Îzzet ser bera gul-gulî qerimîbûn, bedena wî tevîzî bû, bi diwarî got :

- Ezê nikarbim wî bukujim? Wê li Xwedê jî xweş neçe!

Xan qelûna xwe wêda devda, xwe hinekî rastevekir û bi hêrs got:

- Ezê hineka bişînim, bila bên, ewî mala teda bixeniqînin û bibin laşê wî bavêjine newalekê.

- Xan, ev yekê neyê serê xwe!

- Qeletîyê, serhişkîyê meke! Gotî ev efser bê kuştinê!

- Xan, min bukuje, lê destê xwe nede birîndarê mala min.

Xan ji cîyê xwe çirpikir, rabû got :

- Biceme here, naxelefê kurê segan ? Nanê min tu har kirî ! Ezê te bidime post kirinê, postê te wî efserîra bikime kefen!

Îzzet paşopêl ji dêrîva derket, lê Hamo xan hê dida cêran.

Îzzet wê şevê qet raneza, ha mitale dikir, wekî çawa bike, pêsîra xwe ji xezeba Hamo xan xilazke. Ew ketibû wê zikirê, wekî bona çekan here Xanegînê, ditirsîya mirovên xan wê bîn, efser ji holê bidine rakirinê.

XXX

Kuvserî ji destê êşê, germayê hetanî berbangê kêlek-kêlek welgerî. Lê ya qenc ew bû, wekî mirin îdî ji wî dûr ketibû. Sibê zû çavên xwe vekirinê, her tişt ber çavên wî sero-bino dihate kivşê. Guhên wîda dengên gulla dihate bihîstinê. Gulpesendê destê xwe li rûyê wî gerand, danî ser enîya wî. Enîya Kuvserî, ya xwîdayî, ewa kire nava tirsê-xofê, wê tirê eva xwîdana mirinêye. Mîna mirova bawerîya her tiştî undakirî, ewa ji kezevê nalîya, kere-ker hêsir barand. Te hew dizanibû, ewa rojên xwe digirîya. Pey raketinêra, Fîrûze anînê dunê, çavên wê hatibûne girtinê, jîyana wê bibû telte ewrê reş. Ewa malda tenê manê, mîna zara sêwî dikire îske-îsk, ji dil digirîya, xwe-xwera digot: "Min bi van çavan ocaxa Îzzet temirand, çarenûsa keça xwe reşxemiland". Lê rojekê, ji Xwedêda bû, ji benda bû, hinekî ronahî hate çavekî wê.

Gulpesendê gilîkî mêre xwe-Îzzet ne dikire duda. Ji ber ku, çavên wê hatinê girtinê, ewî ewa berneda bû, hêwî ne anîbû ser wê. Lê Îzzet mîna mêrên çê, daha gellekî dikete xemxurîya wê. Lema

jî gilîkî wî ne dikire duda. Wî çi bigota, ewê bi dil ew mîyaser dikir. Lê ewê xema dilê xwe, bi hêsirava kêr dikir, rewşa seqetîya xwe, bi dilopên hêsirava pîne dikir...

Sibê zû derê hewşa Îzzet wana hate kutanê. Yên ku, derî dikutan, mirovên Hamo xan bûn. Îzzet kincên xwe xwekir, dest avîte desteka şûrê ji hestûyê filan, hilda kire berbenda piştê xwe. Tifînga bêrnayê jî da destê xweyî rastê, stuyê xwe dirêj kir, oda Kuvserî têda razayî, nihêrî. Birîndar hişyar bû, çavên wî vekirî bûn. Ew ser penîya hat, ser serê Kuvserîra sekinî, kûz bû, ji nêzîkva dêmên wî mêze kir. Dîsa ew zêrandin, êşandin ji rûyê Kuvserî dihate kivşê. Lê Kuvserî kefiya serê Îzzet çawa nava dumanêda bibîne, a usa dît. Îzzet nava du rîyada mabû. Dihate xanê ew jî karê kirî, hinekî poşmane. Ser oxirê, li şêmîkê sekinî, careke mayîn efserê birîndar nihêrî, hundurê xwêda hilxist-daxist, wekî hetanî ew here, vegere, Xwedê zane wê çi bi qewime.

Derê hewşê dîsa hate kutanê. Ewî wê weşê dilê xwera derbaz kir ku, ew bûye piştovanê heqîyê, lema jî bi gavên şidîyayî ber bi hewşê da gava. Jina wî Gulpesendê herdu destava pêşa wî girt û got:

- Îzo, meçe, wê te bukujin, qurbana teme, me tenê nehêle!

- Tu here, têkebe mal! Ezê ji ber derê xwe, bere wandim, wê bihêlin herin! Ez îro diçime Xanegîrê. Mirovên Hamo xan bere hundur nede. Bizanibe, eva seredana mine dawîyêye. Gulpe - send,

ezê esse vegerim, hema ku vegeriyam, ezê we jî hildim, herime Tebrîzê. Emê li wir bijîn.

- Îzo, meçe, ewanayê li texin, ew namerdin!

- Metirse, jinek, minra jî Îzo dibêjin.

Îzzet îdî qe tu tiştî nenihêrî, çû derê hewşê vekir. Ber dêrî du mirovê bi çek sekinîbûn. Kefiyê serê wan reşbûn. Bi kuncê kefiyêva devên xwe girtibûn. Îzzet li şemîkê mîna dîwarekî sekinî û destrêjka bênonê kişand û got :

- Hûn bi rebê jorîn, bihêlin herin! Xwînê hilneşîne ocaxa min! Ez zanim hûn bona çî hatine. Ger hûn birîndar bukujin, ew yekê lewt-lekê gelê mera bîne! Xwedê jî dibîne ew ne suckar, tawanbare. Ew jî mîna me bedbext, hêsîr, xerbende.

Ew mirovên bi çek, hê gilîyê dawîyê nehatibû gotinê, paştâ zivirîn, çûn. Îzzet ji cîyê xwe ne livî û kete mitalan: "Gelo, ev mirovanan çima nişkêva vegerîn çûn? Hamo xanê min jî, birîndar jî bide kuştinê. Lê kesek tune pirske:

- Min çî xirabî kirîye?"

Vê gavê meremê Îzzetî herî mezin ew bû, wekî birîndar ji xezeba Hamo xan xilazke. Vê weşê dilê wî fire bû, tevziyên rehetbûnê dilê wîra derbaz bûn, ronahî hate çavan. Lê evê rewşê gellekî nekişand, ewî nihêrî ji wî serê kuçê sîyarek hate kivşê. Pey kihêlê Hamo xan, du mirovên bi çek direvîyan. Hamo xan gihîştinê ber derê Îzzet, gema hespê kişand, sekinî û mîna çiyakî jorda hate erdê. Ew û Îzzet pêşberî hev sekinîn. Îzzet berî wî kêlimî.

- Axa xan, selam!

- Lo, kurê dêlika, hela salamê jî didî min!
Dewarê kurê dewara!

- Xan, mede cêra, çima ez qûlê ber destê te,
yê girêdayîme?

Hamo xan qamçiyê destê xwe bilind kir û bi rik jorda anînê, Îzzet zenda wî hewêda girt û xayîkir. Xan destê xweyî çepê avîte qirma kêleka rastê. Lê destê wî negihîşte qirmê. Lê herdu mirovên bi çek jî çend gava pašta vekişîyan û tifing rastevekirine ser Îzzet. Îzzet bi lez xwe da nikî xan û çeka xwe kişande ser wana. Xan peynek avîte zikê wî, lê ji Îzzet negirt, ji ber ku, ew di wededa pašta vekişîya bû. Peyna xan vala derbaz bûnê, ew mîna gilokekê erdê ket û ser hevda hol bû. Vê demê dengê Gulpesendê ew derana hildane serê xwe:

- Lo, ez dora serê we bigerim, hûn ji me çi dixwezin? Me jîyana xwe da, seraser wera qulix kirîye! Mêrê min jî, ez jî mîna sêwîya ber destê we xebitîne. Ev jî roja me? Naha jî hatine, dixwezin me di mala me da bikujin! Me çi kirîye, çima me dukujin? Şah jî me dukuje, hûn jî... De bêjin, ka binê gunê me çîye?

Paşê Gulpesend hat pêşberî Hamo xan sekinî, got:

- Min bukuje! Min ew birîndar anîye mal! Îzzet haji vê yekê tune. Min bukujin gelî, namerdan! Çavên we hatine girtinê, naha jî mirovên xwe dukujin. Çima ev jî mêranîye?

Gulpesendê pêsîra Hamo xan girt û ber bi derîyê hewşê kişand. Te hew dizanibû herdu çavên wê jî vebûne, ronahîya çavan di serê xanda

bibûne tirêjên birûskê. Dilê jinikê bi heşir-meşira salava tijî bû. Naha ewana hev girtine, bûne hêze-ke mezin û mîna mêkutan xan didine ber derbizexman. Ji hewar-gazî, heristandina Gulpe-sendê guhê xan hatine xitmandinê, milên wî sist bûn, rex-ta ketin. Ewî usa xwe şaşkiribû, şerm nekira wê birevîya. Di nava vê rewşêda birê xan Zerduştî, qewmandinên ku, hatibû ser wî, hat ber çavanra derbaz bû. Birê wî jî bibû efser, wî jî dijî şoreşvana şer dikir. Lê dawîyêda çi bû ? Ew bû qurbana şikberîya şaha. Pey gullekirina birêra, çawa dibên, Hamo xan hatibû şikestinê, ew çilmisî bû, kawîtiya xwe undakiribû.

Birê wî yekî bejin bilind, tapî bilind, efserekî rûken bû. Gava birê wî gihîştibû peyvîra serhengîyê, rojekê Rzaxan hatibû pareskerîya wî. Leşker bi du rêzan sekinîbûne. Şah destê xwe dide evfserên tapîbilind, lê rex serbazaran bê xem derbaz dibe. Dema digihîje dawîya rêzê, ji serbazan dipirse:

- Gazinê we heye?

Serbazek rûyê birê Hamo-Zerduştî dinihêre, dibîne ewî rû bi kene, lema jî bi culet dibêje:

- Elahezret, gazinê me ji xwerinêye.

Şah ji van gilîyan dilteng dibe. Dawîya vê qewmandinê Zerduştî birê xwe-Hamo xanra awa qal dike:

- Zivistan bû. Li erdê weke buhustekê berf hebû. Şah hinekî rûyê efser nihêrî, çirikekê kete mitala, paşê xarbibû, ji erdê kulme berf hilda, nava kulma xweda givaşt, giloka berfê dirêjî efserekî kir û got :

- Evê giloka berfê, yeko-yeko bidine hev.

Bi emirê şaha, wê giloka berfê serbaz didine hev. Dema giloka berfê digihîje serbazê dawîyê, şah dibêje:

- Naha giloka berfê nîşanî min bike.

Giloka berfê destên serbazada dihele hinek dimîne. Serbazê dawîyê, wê piçika berfa destê xwe dide şah. Şah, berfa ku, destê wîda dilop-dilop dike, nîşanî serbazan dike û dibêje:

- Min berf awa dabû we?

Şah qe hîvîya bersiva serbazan nasekine, gilîyên xwe didomîne:

- Ez her tiştî didime we, lê hetanî tê digihîje we, mîna vê berfa destê min dihele û dilopên wê digihîje we. Malê we, para we, rê da tê xwerinê.

Şah ev gilî-gotin bi rik got, dêmê wî xitimî, buriyên wî mîna ewrê reş ser hevda hatin, bi gavên fireva ber bi maşîna xwe çû.

Birê Hamo xan ev yek ber çavên xwe dîtibû û bi hûr-gilî xanra qal kiribû.

Ji vê qewmandinê wedek derbaz dibe Zerduştî digirin. Ewî dişîninê Têhranê. Du salan di kela Têhranêda cizaretîyê didine wî, paşê dibin li Tebrîzê gulle dikin. Sedem jî ew bûye, wekî wî serbaz di ruhê aza, serbestda tore-perwede kirîye. Ger ew serbaz usa nehata tore kirinê, ewî culet ne dikir û şahra usa gazinê xwe nedikir.

Berî gullekirinê ji serheng Zerduştî pirsîbûn, wekî vê dema dawîya jîyana xwe da, tu çi dixwezî, xwestina te çîye ? Ewî gotibû: "Rûyê min kurkin û

gulavê jî bîrnekin". Çend deqîqa berî kuştina xwe, ewî kilam jî stra bû:

"Der aftarê sûzan¹
Çê zehmetha keşîdem".

Ewî zindanêda ev kilam avîtibû ser xwe. Dema ew anîn gullekin, ewî rêzên ewlîn, yên kilama çarenûsa xwe stranê wî gulle dikan.

Behsa kuştuna serheng Zerduştî memleketêda coş-pêleke mezin pêşda anî bû. Leşkerên pareskerîyê gellekî ber xwe ketin. Ji ber ku, hemûya Zerduştî çawa efserekî rêkûpêk û bi keletar, çawa yekî bi ken-henek nas dikirin. Zanibûn ew efserekî jê hatiye, mîna mirovekî qenc berbirî serbazan dibû.

Çend salan berê Rzaxan ax-erdên begên kurdan zorê zeft kiribû. Gullekirina birê heyf ser heyfêda anîbû. Ji wî wedeyîda Hamo xan hatibû lerizandinê. Heyfhildanê dilê xan şev-roj vediçirî, disot. Heyfhildanê ew ji gellek karî paşt xistibû.

Naha, wedê ew hewşa mala Îzzet da sekinî bû, derbarê efserekî birîndar, yê mîna birê xwe da, ketibû ramana.

Dijberîya Îzzet ew hinekî heşiyat kir, ew ser hişê xwe da hat. Ewî çarenûsa efseran himberî çaranûsa Zerduştî kir. Ewî hinekî heqî dida Îzzet.

1. Bîn tava germda,
Min çî zehmet ne kişand.

Lê ro-navarojê yekî mîna Îzzet rabe dijî wî derê, evê kirinê Hamo xan dîn-har kir. Ji ber ku, Hamo xan hînbibû mirovê mîna Îzzet bişêvîne, çawa qûl-bendê xwe, xulamê ber destê xwe. Ew timê hînbibû, yên mîna Îzzet wîra çawa xulam bipeyîve.

Hamo xan di nava van mitalada hetanî niçê kuçê çû. Ji mitalan dûrket û vegerî piş xweva nihêrî. Îzzet derketibû kuçê û pey wî dinihêrî. Wan herdu sîyarên bi tîfing, hesp destkêş kiribûn, pey wî dihatin. Nişkêva kilama birê guhê wîda hat:

“Der aftabê sûzan
Çê zehmetha keşîdem”....

X X X

Wedê leşker kete nava bajêr, Hamo xan mala xweda qelûna avkî dikişand. Her ku devê xwe dirêjî qelûnê dikir, hîvîya wê yekê bû, wekî wexta guhê wîda wê dengê gulla bê bihîstinê. Ji qelûnê dûyê zirav dikişîya, li şûşên roderê asê dibûn, ew mîna dûmana zirav dihate kivşê. Mirovên li dora wî rûniştî ne ku, Hamo xan mêze dikirin, lê li “dûmana” dor şûşê dinihêrîn.

Mîna Hamo xan, xanên kurdan, yên mayîn jî palên xwe kutabûne balgîyan. Hamo xan pêşnîyara hevhatinê pejirandibû. Îdî dereng bû, wekî pêşîya wan qewmandina bêne girtinê. Wana pêşta ew yek birîyar kiribûn, wekî hema ku, leşker kete nava bajêr, gulle ku hatine avîtinê, ewê rabin û

herekê alîkîda here. Hamo xan xwera rê kişandibû. Rîya wî pêşîyê ber bi Xanegînê, paşê ber bi Bexdayê bû. Desta çekdarên wîye here nêzîk dora Hamo xan beşter bibûn. Lê çavên wî li revê bû. Ji çavên wî tirêjên bi ecêb dibiriqîn. Heta naha tu kesî ewa di nava rewşeke awada nedîtibû.

X X X

Avayên yek ta, yên dora meydanê bi mirovan hatibû wer girtinê. Jin û zar hilkişîyabûne ser banên wan avayan û zûrbibûn li leşkerê ku, bi marşa eskerîyêva dihatne bajêr, mêze dikirin.

Serekleşker Raffî li ser tankê dor-berê xwe nihêrî, dît wekî esker hîvîya emirê wîne. Bi emirê wî, wê dest meşê bibûya.

Vê gavê Hamo xan di nava hevalbend û çekdarada sekinîbû û çavên wî li revê bû. Ewî dizingava neqşê revê kişandibû û naha jî derbarê wê yekêda mitale fikir. Bona heyfa xweye salekê berê hilde, tivdîra wî ev bû:

“Gava hevhatinek hebe, ewê hinek şoreşvana derxe ser banê xanîya, hinekan li kolana bide veşartinê û nişkêva êrişî leşker bike, heyfa xwe hilde. Paşê, here li mal-milkê ku, berêda derbazî Xanegînê kiribû, bibe xweyî”. Lê alîyê dinêda ewî hê heyfa birê xwe ji Rzaxan hilneda bû û ev yek bîrnekiribû. Birê wîyî bê sûc ji alîyê wîda hatibû gulle kirinê. Ger ewî bikaribûya heyfa birê xwe ji Pehlevî hilde, wê hemû mecalên xwe pêkbanîya.

Ew amede bû vê rîyêda ji her tiştî derbazbe. Lê ewî rind zanibû naha tu rîya heyf hildanê tune.

X X X

Hema dengê top-tifingan hatinê bihîstinê, Kuvserî çavên xwe vekirin. Ew çav stûnê malê yên dûgirtî ket û bi ecêb virda, wêda nihêrî. Vê gavê Fîrûze ser wîda mël bû. Kuvserî pirsî:

- Ez li kumê, tu kîyî?
- Tu li mala meyî. Li mala Îzzetê kurd.
- Tu kîyî?
- Ez keça Îzzetîm, Fîrûzeme.
- Kê ez anîme vira
- Bavê min digot, wekî tu birîndar kirine, ji berojê çîyê hildaye, anîye vira.
- Bavê te çi kareye?
- Bavê min ellafekî nîsk, noqit, xijileg- komir firotîye.

Kuvserî çavên xwe digirt, vedikir û dicedand qewmandina bîne bîra xwe. Çavên Fîrûzê li rengê wîyî sipîçolkî, xewîrî bû. Ew du roj bû dê û keçikê hingiv-rûn bi efserê birîndar didane xwerinê. Kuvserî jî li xwerina rex çîyê xwe dinihêrî û ketibû ramana: "Gelo ezê çawa bin qencîya van xanima derêm". Dêmên wî lap biçûk bibû. Dema wî dixwest bimore nemir, dema dixwest bijî, nikaribû bijî. Bona wî emir-jîyan dijî xwestinê wî hatibû hûnan-dinê, te tirê ew dujminê wîye. Te hew dizanibû bona wî gilîyên paqîş û amin, heqî û rastî ji holê

hatîye rakirinê. Bona xatir-bîranîna Mînayê dixwest xwe, ji xwe heyfê hilde, lê ew jî nehatibû çareser-kirinê.

Ewî Fîrûze di nava reşayêda didît. Kuvserî hey çavên xwe serhevda diqirpand, lê ew reşayî ji ber çavan nediçûn. Ewî bi dengêkî zirav got:

- Fîrûze, wekî ez rabûyama ser pîya... Tê kivşê min hûn gellekî êşandine.

- Tişt nabe, me gişkan dûa dikir, wekî tu zû saxbî.

- Fîrûze, dibe ez rabime ser pîya, tu çi meslehetê didî?

- Birînên we giranin. Bavê min digot, we gellek xwîn unda kirîye. Pêwîste hûn gellekî buxun, Bavê min mezinê weyî lapî mezin, bi gullê lêdaye, kuştîye.

- Tu dibêjî, bavê te mezinê me kuştîye?

- Belê, bavê min.

- Çawa kuştîye?

Fîrûzê wîra qal kir, wekî bavê wê, çawa mezinê wan kuştîye.

Kuvserî çavên Fîrûzeyê, yên gire bi posîde meze dikir, rûyê wêyî reşqemilî dinihêrî, him jî dilê xwera ev gilîyana derbaz kir: "Wekî usane Asa hatîye kuştinê. Gotî ez ji vira rabim û careke mayîn xwe bavêjime hemêza şerkarîya mezin. Pêwîste ez heyfa Mînaya delal, ji vê civakîyê hildim. Îdî minra mirin destnade, hetanî bîhîna min hebe, ezê dijî neheqîyê şerkarîyê bikim".

Birînên wî diziqitîn. Bona êşa birîna hinekî kêmke, ewî pêçiyên destê xweyî çepê gez dikir. Nava vê zêrandinê da ewî gote Fîrûzê:

- Ez dixwezim herim. Alîkarîyê bide min, ez rabime ser pîyan.

- Hûnê kuda herin, ka hûn dikarin rê herin?

Bona Fîrûzê bide bawerkirinê, Kuvserî xwe rastkir, ku rabe, lê nikaribû. Serî lê gēj bû. Lê ewî vê yekê nenihêrî, dîsa hêz da xwe û rabû, xwe dîwêrva girt.

Fîrûzê bi dengê ricaf got:

- Hûnê kuda herin?

- Ezê herime bajêr.

- Bavê min teme daye, wekî hetanî ez neyê, birîndar tu derada bernedin. Yek jî naha li kolana gulle tene avîtinê.

- Na, ez nikarim li vira bimînîm. Çûyîna min girînge.

Pey van gilîyara ewî destê xwe ji dîwêr kişand. Hat ku bikeve. Beden lê hejîya. Çavên xwe girtin. Çavên xwe vekirinê, tirêjên tavê, roderêra xwe avîtine ser wî. Ji vê ronahîyê hêz hate wî. Bedena wî dilerizî, lê ewî hemû êş-jan pêpes kir û ser pîya sekinî.

- Na, gotî herim, şerkim! Pêwîste heyfa Mînayê hildim! Ez naxwezim badilhewa bimirim...

Kuvserî awa got û ber bi dêrî çû. Te hew dizanibû lawaz-zeyîf bûn, jar bûn, bê bawerî tevhev bûne û pîlê wîda hatine darda kirinê û wîya berjêr, ber bi erdê dikişîn. Ewî serê xwe kuta dêrî. Derî vebû. Ew litimî, hat bikeve. Fîrûzê ew

parava girt. Ewî destê xwe danî ser pîlê Fîrûzêyî jarik, girt û got:

- Xûşkê, min bibe maşînekê sîyarke, gotî ez herim.

Dê-keçik çiqasî ber wî gerîyan, ewî dest ji rikdarîya xwe nekişand. Ji dualiyada ketine bin milê wî û ew derxistine hewşê. Ji kolana dengê gullan dihat. Ewana hêdî-hêdî çûn derketine kolana mezin. Wêda maşîneke rengzer ya bi navê "Vayt" hat. Fîrûzê destê xwe bilindkir û avtoajo gihîştinê bal wan, sekinî. Ew ber bi Kêrmanşahê diçû. Kuvserî maşîne kirin. Maşin rê ketinê, dengê Kuvserî hate bihîstinê:

- Fîrûze!

Fîrûze pey maşîne revî. Ewa ber bi dengê bergerîyayî, yê ku bi êş-zêrandinêva kim-kimî bû bezîya. Vê demê tanka ku, hate kolana mezin, ber bi maşîna rengzer gulle reşand. Ev tank, tanka serekleşker Raffî bû. Gava tank kolanara derbaz bûnê, şoreşvanên kurdan nişkêva ew dane ber gullebarandinê. Hema ji gullebarandina yekemîn, şoreşvana meytê 12 serbaza raxiste erdê. Ji vê kirina şoreşvana Refî bibû mîna pilingekî har.

Fîrûzê nihêrî nikare bigihîje maşîne, sekinî piş xweva nihêrî, dît dîya wê nava kolanêda ketiye, maye. Ewa ber bi dê revî. Gulpesend di nava xwîna gevezda hatibû mewiçandinê, kêlek-kêlek serhevda weldigerî. Gulla tankê paş-pîlê wêra derbaz bibû. Ji qîrînîya Fîrûzê te tirê hemû mirovên malên der-doran hişîyar bûn. Te hew dizanibû pey hewargazîya wêra dengê gulî avîtinê hate birînê. Bona

Fîrûzê her tişt hate dawîyê. Ewê nihêrî nava kulma dêda bişkokeye sorlêdayî heye. Ev bişkok ji pêşîra kincê Kuvserî qetîya bû. Ewê dixwest wê bişkokê bigihîne xweyê wî û lema kolanêra direvî. Çavên wê ne didît, destê xwe dirêj kiribû, kulma xwe ser hevda anî bû û ber bi tankê direvî. Refî ji vê yekê xof kişand û wî tirê, jinik dixweza bomba destê xwe bavêje tanka wî. Lema jî ev feqîra-feqîr dane ber gullan.

X X X

Merzîye ji xewê rabûnê, hema bi kincê şevêye deyîl dirêj, yê mîna gulên çileqeraş, bê bawerî, hat ber neynûkê sekinî. Porê wê hilşiyabûne ser paş-pilê wê, ewê bi herdu destava ewana qevd kir, avîte piş stuyê xwe. Ewê serê xwe ber bi neynûkê dirêj kir, bi şikber dêmên xweye qerçimekî nihêrî, bi tilîyên xweye zirava cermê rûyê xwe kişand, ew sipîçolkî bibûn. Du-sê cara çavên xwe girt, vekir. Nava kûraya çavên xwe da Azerî dît. Di nava wê nêrînê da, nava wê dîtinê da du hukmdarê çarenûsa wê hatine kivşê-yek serheng Razi, yek jî Azerî bû. Ewa vebîşirî. Dihate kivşê ewa ji carenûsa xwera şaye. Paşê vegerî bejin-bala xwe nihêrî, wê tirê ewê serma kir, dîsa çû kete nava cînivînê germ. Dest avît ji ber serê xwe reşbelekek derxist, ku bi qelema reşva hatibû nivîsarê, bi hewasekê mezin xwend: *"Merzîye delalê, wedê vê namê tera dinivîsim îdî êvare. Ji herdu alîya dengê*

gulla hatîye birînê. Gişk nava toz-xubarêdanin. Em
 hîvîya şîvêne. Min destê xwe ji tetika çekê kişandî-
 ye û tera namê dinivîsim. Ez li vê meydana bi sew
 û ya ku, bîhîna mirinê jê tê, di nava mirovên rune-
 kurkirî da, yên ku dengên wan zexm bûne, ji nêrî-
 nên wan jer dibare, rûniştîme te bîrtînim û vê name
 dinivîsim. Dilê minda tu weke erşê ezmîn bilind,
 dest negihîştîyî. Ez dixwezim ji nava van qeleçên
 ku, bîhîna barûtê jê tên, dengê te bibihîzim, destên
 teye zirav bigivişim, gulava porê teyî zerîn bînkim.
 Ger tu, tenê tu nîbûyayî, ger min tu nasnekirayî,
 ger huba te dilê minda hêlûna xwe çênekira, yeqîn
 ezê zûva bibûma xurê gulekê. Wekî bêjim, ez b-
 ona te dijîm, ew ne şaşê, ne cewte, ne derewe. Erê,
 delala min, ez te ji ruhê xwe gellektir hiz dikim, lê
 naxwezim te bivînim, ji te direvim. Ji ber ku, ez
 dibînim, tu keçikeke hêjayî dewlemendîya gewre,
 hêjayî mirovên peyebilindî. Ezê nikarbim parazge-
 hîyê li sînore çarenûs û hetabîya te bikim. Van
 gişkan wêda datînim, ez te hizdikim, ezê te hizkim.
 Lê naxwezim te nava hurada, nava çavqulên malê
 dunêda, mîna bûkinga xemilî, mîna tişteki sar bivî-
 nim. Ez zanim tu bi xwe jî evê yekê naxwezî. Lê
 hinek hene, dixwezin te têkine kelmelekî nava
 malê, te têkine pira xweye dahatîyê. Ewana mîna
 min mitalê nakin. Ez te hesab dikim, çawa ruhdarê
 xwe, çawa per-baskê xwe, çawa ser tacê xwe,
 çawa germaya dilê xwe. Ez dixwezim vê jîyanê
 têkme nava kenê te, nava şabûna te û mîna kase-
 ke şerbetê vexwum. Ah, ez çi mirovekî safîme,
 binihêre, şêrda daxweza hineka çîye, daxweza min

çîye? Gelo, ev dewir-zeman ne bi qerfe? Gellek cara evîndar, maşoqên dilbirîn nagihêjine mirazê xwe. Erê, erê ewana qe bi mirazê hev şanebûne. Yên ku dixwezin şabin, digirîn, yên ku dixwezin bi-jîn dimirin. Kî qerfê xwe li dewrê-zemîn, jîyanê dike ew qenc dijî, kî jî jîyanê hez dike, ew timê di nava xizanîyê, nava êş-janêda dijî.

Vaye aşbaz nêzîkî me dibe, me dewatî şîvê dike. Ez tarîyêda rûniştîme û derbarê teda ketime ramanên kûr. Ev çi rewşe ez ketimê, tu qey dibêjî, ez cunî bûme? Gişk bi min dikenin. Na, tê kivşê, gişk bi aşbaz dikenin. Ser zikê wîyî mezin dikenin. Ew yekî bejinkin, qelewye. Hema te li wî nihêrînê, ken tê te...

Merzîye, min hê ji te name ne standîye. Çêbe, nanivîsî, menivîse, ez zanim, wekî te ez bîrkirime. Lê ezê tera binivîsim. Ev yek jî, dil dide, ber dilê min. De bi xatirê te. Te maç dikim. Azerî”.

Eva cara pêncê bû ku, Merzîyeyê ew name dixwend. Her ku, ewê name dixwend, ruhdar dibû.

Ewa bi wê nêtê ji nava cî rabû, wekî Azerîra namê binivîse, bersîva pirsên wî bide, gazî-xwes tinên wî bihêjîne, dîsa nivîsara reşbelekê nihêrî. Azerî navnîşan awa nivîsîbû: “Pêşenîya Kurdistanê, êskadrona topxana, Azerî”. Ev navnîş bona wê tiştekî bi ecêb bû.

Merzîyeyê zûrbû li nexşeya dîwêr mêze kir. Alên biçûk li ser navê Stalîngradê û Lênîngradê da hatibûne çikandinê. Ewê derbarê agadarîyên dawî-yê da tiştek nizan bû. Li vê nexşeyêda pêşenîya

Kurdistane nehatibû kivşê. Ewê nizanibû, wekî şerê bona azaya welat da, bê jimar mirov tene qirê.

Merzîye derbarê Azêrîda ketibû mitalên kûr. Ji roderêra tirêjen tavê xwe avitibûne ser destên wê. Ewê dixwest vê demê per-baskên wê hebin û di nava payîza zerînda bifire, xwezayê hemêzke. Hetanî ku, ewa Azerîra, ne bibû nas, tiştên awa ne dihatine serê wê. Van xwestina ewa daha gellekî di Azerîra dida girêdanê. Diqewime eva evîn-hizkirin bû. Ewê evîn-hizkirinê bi alav di sînemeyda dîtibû, di bûyerada xwendibû. Lê kî derdikete dijî hub-hizkirina wê, lê kîjan menîya ne dihîşt ew Azerîra naman binivîse?

Qurebûnê û pozbilindayê nedihîşt ewa Azerîra namê binivîse... Ewê nikaribû dijî van hesta şerkarîyê bike. Van hestan nedihîştin ewa qelemê bide destê xwe û hizkirîyê xwera namê binivîse. Van hestan destên wê rex wêda dixistin. Te tirê ew dest ne destê wêne.

Merzîyeyê fem kiribû, wekî bav dicedîne wê bide serheng. Tenê bi vê rîyê bav dikare, di civakîya bilinda cîyê xwe bigire, tenê bi vê rê ew dikare bibe xwedanê karxana ristinê, ya ku zûva daxweza wîye. Merzîyeyê rind zanibû rîya berbi Azerî, wê pêşîya daxweza rîya bavê bigire. Lema jî gotî, bona daxwez-xwestina xwe bicedîne bavê xwe ji wê rîyê dagerîne. Pêwîste usa bike, di hundurê bavê xwe da, rîya ber bi civakîya bilind bide pêpeskirinê. Bona wê jî rêkek hebû. Ew jî ew rê bû, wekî bavê keça xwe pirr hizdikir. Hizkirina bavê dikaribû bibe kefilê rîya ber bi Azerî.

Van mitalan Merzîye nerehet dikir. Ewa keçikeye bedew bû, vê bedewîyê ewa ber bi heta-bîya dunyayê, ber bi dewlemendîyê dibir. Lê Azerî pêşîya vê rîyê birî bû... Ew ketibû nava rêbirina bavê û keçikê. Ewa nava du rîya da mabû, nava du agira da dişewitî.

Her ku, Merzîyeyê derbarê evîna xweye ber bi Azerîda mitale dikir, ewqasî jî dijî xwe şerkarî dikir. Te hew dizanibû Azerî hemû dilhizî û daxwezê wê ber bi xwe kişandibû, kiribû nava bê keştiya xwe, nava hub-hizkirina xweye evra. Azerî nava ruhê wêda bibû mîna meqledûzê û ewa ber bi xwe dikişand. Merzîye mîna tîra avîtî sist bibû. Vê demê ewê jîyana Azerî, ya dahatî, jîyana xweye tevî wî, serbarê ser da, rewşa şêr dihanî ber çavên xwera derbaz dikir. Vê demê hest-xwestinên wêye ber bi rîya civakîya bilind sar dibûn. Hub-hizkirinê altindarî dibir. Merzîyeyê mîna mirovê miqîm birîyar kirî, bi bizûtîn ji cîyê xwe rabû û piş pêşxwînê rûnişt, Azerîra name nivîsî:

"Dostê minî ezîz, min sê namê te stendine. Van naman ez mîna xeleqên zincîra qayîm tera dame girêdanê. Van naman ez kirime xerbendê te. Ez nikarim ji wan biqetim. Her ku, ez derbarê teda mitale dikim, di nava teda qenderên rind dibînim. Şevan namên te didime ber serê xwe û bi wan bîhîne dikişînim. Nizanim çi bi min hatîye? Nizanim çima hatime guhastinê? Ez hewcî te û gilî-gotinên teye nêtkûrim. Ez jarbûme. Tu hatinê, tuyê min qelafetekî dinêda bibînî. Ya here bi tirs ewe, wekî ez hînî tenê bûnê bûme. Naha jî oda xweda tenê

rûniştîme û derbarê teda mitalan dikim. Dilê min hewariyê-gazîyê li te dadixe.

Naha, te tirê herdu şamdan-gulê ber roderê li min dinihêrin. Pirtûkên kevin, yên ji medresê çawa bîranîn mane, ew jî li min dinihêrin. Lê ez derbarê te da ketime nava ramanan. Carna jî te dixeyîdim, careke mayîn li hev tîm. Nava van hest û pirte-pirtada ez sêfil bûme. Ez çiqasî sêfil dibim, tu ewqasî altindar dibî. Li ber çavên min, tu jî gişkan bilintir tîyî kivşê. Ez hîvîya rîya teme. Ez usa hîvîya rîya teme, çawa dara hişke-hola hîvîya baranêbe. Diqewime ez şaşîya dikim. Lê ez ewê zanim, dil tu dema şaşîyê nake. Dilê min te dixweze, hîvîya teye.

Merzîye”.

Merzîyeyê name nivîşî, rabû kincê xwe xwekir, dêrîva derketinê, carîyê namek dirêjî wê kir. Ewa jî Azerî bû. Ewê bi destê ricaf name vekir xwend:

“Delala min, Merzîye. Ez hatime birîndarkirinê. Nexweşxana leşkerîyêdame. Netirse. Wê zûtîrekê min ji nexweşxanê berdin. Hema ku, ez berdame, ezê bêm te bivînim. De bi xatirê te. Azerî”.

X X X

Dema Azerî rastî servan Hesenî hatinê sibe sehet 6 bû. Tirêjên tava zerîn xwe avîtibûne ser berfa bendeva çîyayê Pero û dibiriqîn. Zinarên çîyê

ber çavên mirovan birq vedidan. Çîyayên nizme dora çîyayê Pero vê berbangê bilind-bilind dihatine kivşê.

Azerî berî Hesenî got:

- Selam! Ez şame me hev dît!

Hesenî wê weşê selama wî venegirt, ji hespê peya bû, du-sê gava ber bi wî hat, bi rizma eskerî-yê destê xwe bilind kir û got:

- Lêytênant Hesenî. Ez birîndara dibime nexweşxanê.

Azerî destê wî, bi destê xweyî çepêva girt, givaşt û pîlê xwe li pîlê wî xist û got:

- Yeqîn hûnê min jî bibine nexweşxanê?

- Li vira, bi mera 20 kes birîndar hene. Desta me alîyê Baxebrîşîmêyî rastê, devê çemda xime vegirtine hîvîya minin. Ji bajêr hekîmek hatîye ewê me mualîce bike.

- Wekî usane hekîm dikare alîkarîya doxtî-rîyê, ya ewlîn bide birîndarên me jî.

- Êrê, ew hekîm yekî qencî, hemd fireye.

- Mera him jî hekîmê zane pêwîste. Rewşa hinek birîndaran pirr girane.

Hesenî nekete kûraya gilîyan, lê hinekî bi nerazî got:

- De, were em herin hekîmra bibine nas.

Ewana ber bi baxan çûn. Azerî rêda got:

- Ewqas birîndar, wê yekê dide kivşê, şerekî giran derbazbûye. Yek jî şoreşvanên kurdan mêşîndarên zorin.

Hesenî reng-rûyî xwe tîrş kir, got:

- Naha komandariya bilind, emir kirîye, bi firinda bela şoreşvana bidin. Naha, ka binê ew rêbirana wê xwe ku veşêrin?

- Ev ne tiştêkî diware. Ewanayê têkebine nava şikevt û zaxên bi sur.

- Ewê di şikevtada çend meha bimînin? Xwerin-vexwerina wana xilaz bûnê, wê destê xwe bilindkine hewa.

- Bona ku, ewana destên xwe bilindkin, gotî hemû rîyên alîkarîyê bêne birînê. Her şev ji gundan wanra xwerin û vexwerin tê birînê.

- Çima ew yekê timê bê kirînê?

- Belê, him jî hetanî wê demê, emê bêjimar esker undakin, paşê jî, emê vekişin cîyê xwe da rûnên.

Hesenî ji vê axaftinê hêrs ket. Lam- çena wî dihejiya. Him jî bona wê yekê, di şerê dawîyêda, li Senendecê, serkarên şoreşvana hinek xapandibûn, dabûne ber gullan. Naha ev kirin jî dikete bîra Hesenî, daha ji dîn-har dibû. Azerî ev yek tê derxist û qestbende ev pirs da:

- Bizanebûna te, gelo meremê şoreşvanê kurdan çiye?

- Dostê min, ez ewqasî jî ne sîyesetzanîm, wekî bizanibim şoreşvan çi dixwezin. Ez ewê yekê zanîm, wekî kî dijî dewletê dertê, ew qetilkare, yên usa pêwîste hetanî radestbin bêne qirê.

- Şoreşvanên Kurdan bi tîfingên Îngîlîsava şer dikin. Ewana bi çekên Îngîlîs gulla davêjine me. Tê derxistina wetaya vê gellekî hêsaye.

- Ez ji sîyasetê dûrim. Bila Îngîlîsana, lap dewletên ji wê mezintir tîfinga, topa bide wana, ewanayê tu demê nikaribin pêşîya leşkerê me bisekinin. Ev gişik lîstikeke bi wedelîye.

- Çawa ez zanim di welat da rûmeta Îngîlîsan roj bi roj zêde dibe. Diqewime dew-doza şoreşvana kirina Îngîlîsaye?

- Almanaya yeko-yeko welatên Avropa-Rojava girtiye, Îngîlîs ewqasî jî bê hiş nîne, şoreşvanên kurdan derxe dijî wana. Pêwîste rûmeta Îngîlîsan ser ya almanaya bê girtinê. Lê rûmeta Almanaya li îdarên leşkerîyê û milkîyêda daha pîre.

- Împêriya Almanaya împêrîke gellekî bi hêze. Nasîonalîzma Hîtlêr wê Almanîyayê derxe ser rîya here mezin.

- Lê nasîonalîzma me wê me bibe derxe kêderê? Derhaqa vê yekêda gelo pêwîste mirov bifikire, yanê na?

Te tirê Hesênî jî vê pirsê veciniqî.

- Nasîonalîzma me şahtîye. Şahtî di nava sedsalîyên dirêjda hiş-sewdayê gelda bûye ya netewî. Şahtî dunyayêda bi rûmeteke bilindva tê bîranînê.

- Wekî usane, nasîonalîzma me şahtîye.

Hesênî bi teqil, bi awazekî serrast got:

- Gotî Şahtîbel!

Azerî jî vê cehilê him hêrs bû, him xwera hafî derxist. Tê derxist Hesênî kîye...

Ava çêm çend çiyada tiş-tişî bibû û mîna mera xaro-marô pêberjêr, ber bi Baxebrîşimê dikire leme-lem dikişîya. Li alîyê rojava Baxebrîşimê, li beroja çiyê, xime hatibûne vegirtinê. Evan ximeyên reng zerîda eskerê Îngîlîs-hînda diman. Vî rengê zerîn gênerâl Vayvîlî û hatin-çuyîna wane serbest kire bîra Azerî. Bejin-bala Merzîyeyê jî hat ber çavanra derbaz bû, Vê demê mirovekî bejin nîvçe, rûken derkete pêşîya wan. Ewî destê xwe dirêjî Hesênî kir û got:

- Ez, bijîjk Xaçîyanim.

- Ez jî lëytênant Hesênîme. Min birîndar ji şêr anîne, alîkarîya we pêwîste.

- Hûn rêveberîyê li birîndarê nikî avbendê dikin?

- Belê.

Xaçîyan serê xwe kire ber xwe, bi kardarî mitale kir û got:

- Keremkin, bêjin bila birîndara bînine vira. Pêwîste alîkarîya sivte bidine wana, paşê yên ku, hewcî nişdarîyêne bişîninê bajêr.

Hesênî çûnê şûnda, Xaçîyan berbirî Azerî bû:

- Tê kivşê ew mirovekî gellekî bihêrsê. Mirovan li rûyê wî mêze kirinê, ev yek zelal tê kivşê.

- Bijîjk, pey mera, nişkêva êrişî pareskerîya wan kirine. Dora wan bi çaralî girtine. Lê çawa we got, ew mirovekî bi hêrsê!

Bijîjk hinekî kete mitala, paşê kelimî:

- Azerî, dîsa mirovên ku, ji sêrî hatine birîndar kirinê gellekin. Ez metel mame. 70 selefê birîndara ji sêrî hatine birîndar kirinê. Çavên şoreşvana derê, yeman mêşindarin.

Azerî ji kûraya dil ax kişand û got:

-Bijîjk, lê parava li min dane.

- Serkar, firqî tune, birîn-birîne, yanê li sêrî, yanê li piştê.

Paşê bijîjk û Azerî çûne "doxtirxanê", bijîjk wê deqîqê birîna Azerî nihêrî û got:

- Serkar Azerî, birîna te sivike. Tu lez nekeve, wekî te daynîne ser pêşxwîna nişdarîyê. Li bajêr birîndarên giran pirrin. Tu ber xwe nekeve, ezê te bi xwe bibime bajêr. Ezê gulla Îngîlîsan bi tilîya xwe nîşanî nişdar bikim. Dema nişdarîyê ezê li bal tehim. Çawane, qayîlî?

- Bijîjk, ez qayîlim. Tu mirovaran usa zimîn derdixî, mirov qayîle bona te here serê xwe bide ser pêşxwîna nişdarîyê.

Doxtir kenîya, ronahî hate dêmê wî. Lê evê yekê gellekî nekişand, çavên wî tijî hêsir bûn. Bona Azerî evê rewşê nebîne, berê xwe wêda kir.

Eva çendek bû Xaçîyan şandibûne rûdîngeha leşkerîyê, çawa bijîjk zoma eskerîyê. Ta- bîya wîye eskerîyê tune bû. Ew bi ruhê xweva mirovekî edilî bû. Ewî dikaribû dil bide ber dilê nexweşan, birîndaran. Ewî dikaribû nexweşan bide kenandinê, têkeve nava ruhê wan û bîn-bawerîyê pêşta bîne. Ewî li Fransayê xwendibû.

Naha jî bîn-bawerîya Azerî êpêcekî zêda kiribû. Wana hevra ber bi ximeya nîşana "Doxtirî-yê"-xaç li ser, dane gava.

Rêda bijîjk got:

- Azerî, ez diçime ximeya doxtirîyê, hinekî şûnda were şuxulê min bi te heye.

Weke sehetekê wext derbaz bûnê, Azerî raste-rast berê xwe da ximeya bi nîşana bijîjke. Azerî serê xwe dirêjî hundurê ximeyê kirinê, bijîjk hêk sipî dikir. Bijîjk Azerî dîtinê, hêk wêda danî, hat ew hemêz kir û paşê destê wî girt anî hundur. Bijîjk karnîyarî wî bû:

- Hîvî dikim, rûnên tev min nîn buxwûn.

- Medê min tune, bijîjk, pir spas.

- Na, keremke vira rûnê, binihêre ez çî pêş-nîyar dikim. Araqa kişmîşa. Te qe ji wê vexwarîye?

Xaçîyan ji cîyê rûniştî, paşt a vegeerî, gumguma avê derxist, niximandina devê wê derxist, ew nêzîkî pozê xwe kir, got:

- Eva dermane, araq nîne. Pêwîste ji vê araqê mîna dermîn vexwuyî.

- Na, na bijîjk, min biborîne, heta naha ez qe nizanim tema wê çawane.

- Pêşnîyara bijîjk tu dema xirab nabe. Wekî xira bûya, min qe vedixwar. Vexwe, naha pêwîste tu hinekî vexwuyî. Ewê jî bêjim, tevî hemû dermanê avî ji vê heye. Lema jî nebêje min tu dema vênexwarîye. Te vexwarîye, tama wê jî zanî, lê ne weke vê dozê.

Azerî nexwest destê bijîjk, yê ber bi wî dirêj kirî, paşt a bide. Stekana biçûk ji destê wî girt û

çawa dermîn vexwî, ewî dilopek daqurtand, paşê got:

-Bijîjk, ez bona saxîya te veduxum.

- Vexwe, bila nûşbel! Ew gulla ku, emê ji bin pîlê te derxin, ezê têkime nava hinek pembû û bişî-nime Îngîlterê û ezê binivîsim, bi van gullê we mêrxasên meye mîna Azerî ji cîyê xwe nalitimîn.

-Bijîjk, tu, her bijîyî, ez pirr-pirr şame. Bila ev hestên teye mirovayê her tim hebin.

Ewî awa got û stekana araqêye duda ser gewirîya xweda vala kir. Bijîjk bi ken got:

- Pah, tu lap pisporê araqê bûyî!

Hinekî şûnda aloşeke germ bedena Azerî hilda. Ewî hew zanibû, lêvên wî daliqîne, lema zû-zû destê xwe dirêjî wan dîkir. Ew ji gilîyên doxtir, yê derbarê Îngîlîsan da şa bibû, lê li ximeyên rengzerîn hatinê ber çavan, posîde bû. Ber çavên wî rengê zerin, tevî hewa payîzêye sar bibû û wî serma dîkir.

X X X

Maşina "Vayt"-ê, ku Kuvserî sîyar bibû, êvarê tarî gihîşte bajêr. Rêda çend cara rewşa wî hate guhastinê. Dûrva ronahîya bajêr dînihêrî. Li meydanê rêz bi rêz fayton û maşin sekinîbûn. Ji cîyê sekinî ewî xwest pêşta here, gava xwe avîtinê, hat ku, bikeve erdê. Avtoajok nêzîkî wî bû û got:

- Tuyê herî kêderê, em te bibin li wir peyakin.

- Min bibine bal sûka sergirtî. Ezê herime kolana Zerrînabadê, avayê dawîyê...

Avtoajo ew anî ber wî avayî peya kir. Maşina, ku ew anîbû vira, ser milê rastê zivirî, ber bi mehela Çalhesenxanê çû. Vê demê Kuvserî cedand rabe, here rewşa wî dîsa xirab bû. Lê ew rabû ser pîyan, herdu destên xwe kişande porên xwe, med kir. Ronahîya çirên ku, li herdu alîyên kolana vêdiketin, mîna rimên bi agir çavên wî qul dikir.

X X X

Ew roja sisîya bû, ku Azerî nexweşana "Şîr û Xûrşîd"-êda, oda 12-a radîza. Bijîjk Xaçîyan bi xwe Azerî anîbû vira. Ewî jî nîşdar hîvî kiribû, roja emeliyata nîşdariya Azerî, ew jî li wir amedede.

Nava du roja da jî Azerî analîzên pêwîst hildan û roja nîşdariyê kivş kirin. Gava ew roja nîşdariyê hesîya, nerehet bû. Hezar mitale hatin, serê wîra derbaz bûn. Merziye, avayê wanî li Tebrîzê, herdu stûnên avayî û li ser wan neqîşkirina herdu kewan, qewmandinên şêr, çawa parava Kuvserî hatibû lêdanê, çarenûsa qusîyayî, ya evîndara wî Mînayê hatie ber çavan, gilî-gotinên ku, gotibûne serheng Razî hişda hatine wekilandinê: "Jîyan, gerdûn bi tewe-tew bedewe. Bona ev bedewî bê parastinê, xayîkirinê, ew kar kirin û de-yîndariya mirovên qencin".

Vê gavê li bêx rasthatina baxvan Husêynkûlû jî kete bîrê. Nêtên wîye derbarê jîyanêda, derbarê mirovanda, derbarê rastdgelîyê û zordarîyêda. Lê Merzîye qe ji ber çavên wî ne diçû, ew çavkanîya jîyana wî bû.

Wedê hat, here oda nîşdarîyê ber derî sekinî û derbarê Merzîyeyêda kete nava mitalan... Ewî bi giran-giran derî kuta û hate hundur, got:

- Bijîjk, biborînin ez hatime bi we bişêwirim.

Bijîjk nehîşt ew nêta xwe serhevda bîne, cî nîşanî wî da, ew rûnê. Ew ser krêslroyê rûnişt û dûmayîn da axaftina xwe:

- Bijîjk, bê qanûnîbe jî, ez hatime ji we destûrê bistînim. Berî nîşdarîyê sehetekê destûrê bidin, herim qewm-lêzima bibînim û bêm.

Bijîjk ji bin burîyê qalim û reşbelekva li wî mêze kir û got:

- Axa, tu hûn diçine meydana mirinê, wekî herin qewm-lêzima bivînin.

Bijîjk rabû ser pîya û bejina xweye rihalî rast kir û hat pêşberî Azerî sekinî, mîna mirovekî dilşewat got:

- Ez bi şêwir wera dibêjim, wekî hûn ji nexweşxanê derneyêne derva. Diqewime serma li wexe. Hewa xirabe, neme. Wekî serma wexe, diqewime kirina nîşdarîyê bê dijkirîyê. Bizanbe, nîşdarîyê çend deqîqa bikişîne. Heta naha tu kes ji vê nîşdarîyê nemirîye. Heftêkê şûnda hûnê rabin bigerin. Wê gavê dixwezin, lap herine mala xwe.

Azerî serê xwe kire ber xwe. Bi vê yekêva dixwest bêje, wekî bijîjk, jîyana min destê tedaye,

him jî bawerîya xwe bi te tînim. Bijîjk ji cîyê xwe rabû, hate ber roderê sekinî û got:

- Belê, awa meslehetê, bi curekî dinê nabe.

Hereketê bijîjk û ev gotina wî, nîşana wê yekê bû, wekî Azerî, rabe here cîyê xwe.

Azerî jî ev yek derzêkir, rabû ku here, bijîjk got:

- Axa, hûn dixwezin îro bi qewmên xwe bidine zanînê, bila bên te bîvinin.

Azerî nêzîkî dêrî bûnê got:

-Bijîjk, zef spas, diqewime ya qenc eve.

Azerî bi hezar mitalava hate oda şeş çarberan. Ser dêv veleziya. Birînên wî diziqitîyan. Hinekî şûnda rabû, derkete hewşa nexweşxanê. Darên li hewşê rengê payîzêva, bi rengê zerva hatibûne perde kirinê. Devê birînên wî jî zer dikirin.

X X X

Oda serheng Razi, ya bona mêvanan gellekî mezin bû. Dîsa "mêvandarî" bû. Du roderên wê li hewşê dinihêrî. Merziye bin seheta ku, nava herdu roderada hatibû darda kirinê, rûniştibû, him guh di-da ser axaftina serwêrê bajêr Heşterî, him bi destên xwe hinek porên ku, daketibûne ser guhê wê, qevz dikir, dikire rewşa guşîyan.

Heşterî bi dengekî zexim diaxifi, destê xwe badikir û bi wê yekêva dixwest gotinên xwe bi gişkan bide bawerkirinê. Ewî meclîsêda ji gişkan gellectir li Merziyeyê û Taxixanê, ku nikî wê rûniştibû.

dinihêrî û te hew dizanibû çî dibêje, tenê bona wana dibêje:

- Gotî dunê ber amedekarîya zabîtên alman, yên eskerîyê û ber ruhê wanî çangir serê xwe berjêrke. Axa Îtalîyê bin pîyên faşîzmêda culet nake bihîna xwe bikişîne. Serfirazîya altindarîya leşkerê Alman hindik maye ser Okêana Atlantîkêra derbazbe. Xasbaxçên bajarên Îngîlîstanêye reng bi reng, ber bombên Almanaye bi per-bask dihejin, ba dibin. Çima Almanîyayê di nava wedekî kurtda pareke dunyayê qevz kir? Bona wê yekê, wekî merem û daxwezên wanî mezin heye. Ev merem û daxweza mezin ewe, wekî ewana bibine xwedanê dunyayê. Ji vî meremî mezintir, bilintir ez tu meremî nizanîm.

- Meremê Almanîyê, wekî bibe xwedanê dunyayê, nikare dunyayêda bibe meremê herî mezin. Meremê mezin gotî ruhê gelva bê girêdanê. Kêrhatina wê, pêwîste bi erf-edet, çandêva bê girêdanê. Dagir kirina dunyayê, nikare dunêda bibe meremê herî mezin.

Evan gilîyana mirovekî hinekî serîrût, jarikî bi posîde got. Ew pêşberî Heşterî rûniştibû. Himberî kincên Heşterî xwekirî, himberî zexma wî, ew belengaz dihate kivşê. Kincên lê gewir, waşîya bûn. Navê wî Hellac bû. Bi rastî ne ku navê wî Hellac bû, lê bernavê wî. Ewî bin gotarên xweye weşandîda ev bernav dinivîsî. Ew rojnamevanekî rind bû, lê bi gotarên xweye pey hev, pey hev weşandîva zehlê gelleka biribû. Hatina wîye vê meclîsê jî bi ecêb bû. Hellac nava civakîyê û rewşenbîrên

efrandarda mirovekî ber bi çav bû, bona rûmeta serheng bal wî pêşta bê, ewî ew gazî vê meclîsê kiribû. Serheng dixwest nêt-dîtinên xwe, yên derbarê şerê Kurdistanê da, bi deste wî bide weşandinê. Ewî dixwest derbarê mirina Asa da, derbarê wê yekêda, wekî ew kî bûye, derbarê kirinên wîye qilêrda gotaran bide weşandinê û bi wê kirinêva derba xweye heta-hetayê dujminê xwe-Asaxe. Yek jî, leşkerê alman li Avropayê, taybetî, li Yekîtiya Sovêtê da rastî derbê giran dihat, ev derbên giran roj bi roj zêde dibûn. Vanra tevayî dahatiya Almaniyê, xwedê giravî ewê bibe xwedanê dunyayê, Razî kiribû nava şikberîya û bawariya wî kêmkiribû. Bona wê yekê jî serheng devgerê çanda Îngîlîsan-gotarvan Hellac anîbû vê meclîsê, wekî paşdemiyê ewî bona kara xwe bide xedatê.

Heşterî bi hemdê xwe berbirî Hellac bû û got:

- Hûn, Hellac axa, dîsa ser nêtên xweye berêne. Ev yek qe min nade şakirinê. Çima? Ji ber ku, dunya ber leşkerê alman serê xwe berjêr dike, her tenê tu, yanê jî sed mirovên mîna te, dixwezin ber wê sêlafa gur bigirin. Hûn nexwezin tava rasgelê bivînin. Wede heye. Dîrokê hemû tiştî bide peytandinê. Ez leznakebim. Ez ser gotina xwe dimînim. Lê gava du sala berê almana Bêljîk, Suvêycî û Otrûş dagir kirinê, we gotarên xwe da ev kirinên almana dîpesinî. Naha, wedera, qewmandinara girêdayî we nêrinên xwe guhastîye. Ez dîsa dibêjim, Almaniyê bibe xwedanê dunyayê. Em gotî dahatiyê û dunyayê bi çavên almana binihêrin.

Hellac bi kudret:

- Axayî Heşterî, belkî hemû gel bi almanî bi-
axife?

Serheng Razî bi ken rabû ser pîya. Ewî
destê xwe kişande ser porê xwe û got:

- Lo axano, tu ev meclîs, meclîsa sîyasiye,
ku hûn ewqasî kûr-dûr diçin. Ez hîvî dikim çiqasî
dikarin, ji sîyasetê dûr bin.

Taxixan jî tevî axaftinê bû:

- Axano, sîyaseta ne vî alî, ne ya wî alî,
sîyaseta navîn, îro ya dewleta meye. Navîn bûyîn
him jî şîretê Quranêye. Nizanim, kîjan ulumdarî
gotiye, gava qale-qalê, herdu alîyara jî nermayî pê-
wîste. Yanê na, ev qale-qala weye sîyasî, dikare
pêxemê li meclîsa mexe.

Heşterî destê xweyî dirêj hetanî enîya Hellac
dirêj kir, hinekî bi henek got:

- Axa, alman dixwezin dunêda raya cûhûda
bibirînin, şukur Xwedê, tu cûhûd nînin.

Hellac çirpkire ser xwe rabû, serê wîyî rût ber
ronahiye biriqî, bi rik, bi dengekî ricaf got:

- Alman ne tenê cûhûdan dixwezin bikine
xerbend, lê hemû gelan. Alman birçiyê axê, birçiyê
xwînê û zeftkarîyê. Em nikarin dîroka gelên xwe
û axa wê bikine bin pîyê almana. Vê yekêra pênc-
şeş maqûl heşterîyan qayîlbin jî, lê gel tu dema
qayîl nabe.

- Lê wekî em bin pîyê leşkerê Îngîlîsda
bimînin, wê demê wê çawa bibe?

- Çima em Îranîya gotî timê bin pîyada
bimînin? Ne bin pîyada bimînin, ne jî bibine xer-

bendê hinekan. Wekî em alîyê tu kesî nesekin,
ewê bibe tawanbarî?

Merzîyeyê jî zefta xwe ne anî û tevî axaftinê
bû:

- Axano, yekalî ji her tiştî rintire. Yekalî ew
gotine, wekî tu dostê hemûyanî.

Merzîyeyê ev gilîyana usa şîrîn û usa bi
bedewî anî serzara, ku Heşterî ber vê horî-melekê
xwe ker kir û tirê bi wê yekêva heyir-hejmekariya
xweye ber bi wê da kivşê. Lê Hellac firsent ji dest
berneda, got:

- Eferîm, eferîm, keçika bedew, tu ji me
gişkan bi agilî. Ger nîsla nûh awa, mîna te mitale
dike, ew şer meraye, nêtên wan daha bi bawerîye.
Ez bi cîwanên awa firnax dibim.

Hellac bi van gilîyên xweva Heşterî da
serwext kirinê, îdî gote-gota nava me hate dawîyê,
him jî ewî ji guldane destê gula hilda dirêjî bedewa,
bedewan kir.

Serheng Razî ditirsa, wekî ev gilî-gotinên
sert dikare nava dosta hevxe. Ewî serê xwe berjêr
kiribû û potinên xwe biriqî dinihêrî, him jî ketibû
zikira, çawa bike meclîs hev nekebe.

Serheng zû-zû bavê Merzîyeyê dewatî
meclîsên awa dikir, wekî bona dewatê qayîlbûna
wî bistîne. Te hew dizanibû Merzîyeyê ji gişkan
gellektir dîdît, çawa ew ketîye rewşa mirovê bê
gav. Ewa şabû, wekî meclîs ketîye vê rewşê. Ewê
car-cara dest dida porên xwe, ew virda-wêda rast
dikir. Heşterî bi heyir-hejmekar, bi dilşewat li wê

mêze dikir. Serhehg Razî ji cîyê xwe rabû û mîna eskerekî pîyên xwe zo kir û got :

- Axano, destûrê bidin, em vê kasê saxîya elahezret vexwin. Çiqasî ku, sîya elahezret ya merdane ser vî gelîye, çiqasî ku, pêşekzanên almana rîya durrûst nîşanî me dikin, ji tu derê derb li Îranê nakebe.

Evan gilî-gotina ruhê meclîsa ku, eva du sehet bû, didomîya bi carekêva guhast. Mêvan hinek ser pîya sekinîbûn û hevra piçe-piça wan bû.

Merzîyeyê zûrbibû li wêneyê dîwêrda dardakirî mêze dikir. Ew wêne yê aktrîsa-Dîna Dûrbîn bû. Ewa nikî wêneyê Hîtlêr hatibû cî-war kirinê. Merzîyeyê rind zanibû, wekî ev aktrîsa dunêda xwedana rûmeta bilinde.

Ramûsanên wê jî bibûne menîya sênsasîke mezin. Ewê jî dixwest bibe hunermendeke awa. Lê çawa, bi çi rê? Ewê ev rê nedidît. Ewê rind zanibû, wekî bi qewlê der-dora wê, ewê tu dema nikaribe bigihîje armanca xwe. Lê ewê nedixwest ji armandaxwezên xwe dest vekişîne. Ewê rind tê derxistibû, wekî ewa ji van mirovên beşter bûyî, bi xesîyet, bi zanebûn, bi rabûn-rûniştina xweva cudaye. Lê çima ew dijî xesîyetê xwe, dijî heyîtiya xwe dertê, tê vê meclîsêda rûdinê, xwe jî, xwe datîne dewsa êksponateke mûzêyê. Bavê xût ewa mîna êksponatê bal xwe digêrand. Rîya wê rêke cuda bû, rîya evîndariyê, rîya bi hevraz-berjêr, rîya huba Azerî bû. Rêke wêye mayîn jî hebû. Ev rîya, rîya duda bû. Ev rîya, rîya serheng Razî bû. Ev rê, ew rê bû, wekî jîyanêda derdê tu tiştî nekşîne, nava hebûnê,

nava hetabîyê da jîyana xwe bi serfinîyazî derbaz-ke.

Merzîyeyê xwest van mitalan ji serê xwe derxe, bavêje. Bona wê jî ewa bi zexm ji cîyê xwe rabû. Lê gilîyên serheng, yê bi heyr gofî, ewa da sekinandinê:

- Merzîye, tu îşev çiqasî bedewî. Min heta naha tu awa bedew nedîtibû.

- Ez gellekî şame. Hûn jî rind-dikêlîmin.

- Merzîye can, meremê te ewe, wekî tu çawa daxwezeke hertimî dilê minda bimînî?

- Daxwez hebûneke şîrîne. We çawa rind got:

- Merzîye, tu ser baskên ramanên romantîkayê difirî. Bona me astengên daxwezîyê, derîyê ser meda girtî, ofe-ofa ku, ji hesret kişandinê pêşta tê, tune. Her tenê heyîtîya jîyanê heye. Ez naxwezîm tu bona min bibî daxwez, lê bibî bingeha jîyana min.

Eva cara yekem bû, wekî serheng awa vekirî Merzîyeyêra diaxifî. Merzîye şaşnîman bibû, çavên wê girbibûn. Kê ku dûrva li wan mêze fikir, xwera got, ewa ber hesreta mêranîya serhehg Razî bûye cêrî. Lê Merzîyeyê xwe undakiribû. Ew jî, ji wê yekê bû, wekî bavê bin çavan li wan dinihêrî. Wê tirê ewana çi diaxifin bav dibhîze. Lê Merzîyeyê xwe serhevda civand û got:

- Biborînin, serkar, ez ne hunerê wê yekê me, wekî daxweza we jîyanêda mîyaser kim. Yanê jî bibime hukumdarê daxweza hineka. Dunêda jîyana bê daxwez nebûye qismetê tu kesî. Jîyana bê

daxwez tune. Wekî jîyaneke usa hebe, bizanibe, ew yeke qerisîye, ji dunê, ji civakîyê hatîye qetan-dinê, hatîye cuda kirinê. Bi gorîya min, mirovê bê daxwez mîna dîware, sare.

- Ah, wekî usane, tu ser wê nêtêyî ku, tu bona min bibî çawa daxwez?

- Daxwez, ji hev gihîştinê hêjaye. Kal-bavên me ev yek peyitandine, mora xwe lêdane.

Merzîyeyê bi nêrînêntûj ev gilîyana usa bi teqil got, serheng çavên xwe ji wê kişand û wê tirê, serheng wêya hizdikê. Serheng derba van gilî-gotina, van avrûyê tûje mîna kulê her tişt tê derxist, lê ewî xwe danenî wan erda, vebîşirî, hat milê Merzîyeyê girt, ewa kişande ber roderê.

- Erê, tu dîsa bi romantîk û sêntîmêntal dimînî.

- Daxwezên min mezinin, ez bê daxwez nikarim bijîm.

- Ezîza min, ger tu bibî ya min, ezê pêşîya rîyên daxwezên te vekim. Ezê ji daxwezên te birceke belek bidime avakirinê, hemû hebûn-mil-kên xwe, ezê bavêjime ber pîyên te, gişkê, gişkê bên ber te kûzbin, ber bedewî-cîwantîya te bejina xwe bitewînin. Tenê tu qayîlbe, bavê te çawa dibê, usa bike.

- Serheng, naha daxwezên min di nava civakî û dorhêla ku, ez têda dijîm, cî-war nabe. Vê civakî û dorhêlê da, tu dema daxwezên min nikarin çareserbin.

- Mesele, tu ji kîjan daxweza diaxifî?

- Daxweza min ewe, ez bibime steyrka sînemeyê. Dixwezim bibime firindeajo, bibime nivîskar. Bi gorîya te, ez dikarim vana vê civakîyêda mîyaserkim?

- Oho, tu ser wê nêtêyî, herî derêyî cîyên here bilind. Lê belê, çareserkirina wan jî diqewime hebe. Bona bibî steyrka sînemeyê, pêwîste herî welatê dereke, li wira bixûnî, kûrsa derbazbî. Lê bona bibî nivîskar, ew memleketa me da jî dibe. Nivîskar gotinê, em bêjin mîna Hellac. Ez bi wan dexwezava firnax dibim. Melbeta me jî bi van pêşava firnax dibe. Merzîye, tu çiqasî miroveke arîyî, evrayî. Van gişkî mirov dikare safîke. Lê firinde ajotin pirseke diware. Ji ber ku, demekê min jî dixwest bibim firindeajotî. Lê ne bû. Minra gotin, dilê te zeyîfe.

Merzîyeyê bi nêrînên derb li serhehg nihêrî. Ji dêmên wîye hurpuzî bergerîn dît. Serheng bona bibe xwedanê Merzîyeyê ev gilî digotin. Merzîyeyê ev yek rind derz dikir, lê alîyê dinêda jî, xweşa wê ji van gilîyan dihat.

Merzîyeyê bi merd-merdane got:

- Ez hetabîyê li we tînim, we xwe danîye dewsa zara.

Rûyê serheng Razî hinekî qemilî û got:

- Xanîm, çawa tê kivşê, hûn jî ne zarî.

Paşê serheng vegerî li meclîsê nihêrî. Li vira 50 salî kêmtir mirov tune bûn. Wana hevra diaxîfî, dixwer-veduxwer. Lê hinekên meclîsê li wan mêze dikirin. Çawa dibên, serheng qestbende vebîşirî û

milê Merzîyeyê girt, anî cîyê vala da rûniştandinê û kanîyarî mirovên meclîsê bû:

- Axano, meclîs didome. Ez ji we hîvî dikim, usa bişêvînin hûn li malên xwenin.

Merzîye rûniştinê dît, wekî bav li wê dinihêre û axaftina serheng xweşa wê hat, ji ber ku, rewşa meclîsê geş bû. Lê alîyê dinêda rika wê, li wê hat: "Axi çima ez timê dijî xwestin û nêtên serheng dertêm. Diqewime, ewî ev mêvandarî tenê bona xatirê me daye amede kirinê. Yek jî kê destûr daye min, ez timê dijî wana dertêm. Çima ez kawbûna xwe li stûyê wan dialînim?"

Bin hukumê van mitalada ewê vegeerî li rûyê serhengî giloverî sipî nihêrî, dît li wir hê jî bergerandin heye, hinek ji vebişrandina zorê, nerehet bûn heye. Merzîye kete nava mitala: "Ger hinekî heyîtî û culetbûna min hebûya minê bigota serheng:

- Dema axaftina me, hûn ji gelîyên kûr, ji rewşa giran derketin. Min henekê xwe li we dikir. Lê hûn miqîm hatine guhastinê. Sedem jî ewe, bi pîvandina salan hûn xwe mezin hesab dikin. Bi gorîya min sal, emirê dirêj pirsê safî nake. Pêwîste bal mirovan dil cîwanbe. Min timê ji gişkan awa bihîstîye. Bavê min jî kale. Ewî jîyana salên xwe bi xof, bi tîrs derbaz kirîye. Ew 62 salîye, lê gellekî mezin-kal tê kivşê. Lo serhengo, min dilê xwe daye yekî dinê. Bona wê yekê, ji te veşêrim, lema usa diaxîfim. Ez bê wî nikarim bijîm. Ger ew bi xwe destûrê bide, ez bibime jina te, heta ew saxbe, ezê tu rûyê qenc nîşanî te nekim. Ev kirin û

mêvandarîyên ku, tu mîyaser dikî, bi dîtina min tiştên zêdenin”.

Serheng li Merzîyeyê dinihêrî û ber xwe da dikenîya. Merzîyeyê hew dizanibû, çi ku ewa dilê xwera derbaz dike, serheng wana di nava çavên wê, li enîya wê dixûne. Lema jî ber kenê serheng ewê bi qure-qure burîyê xwe serhevda anî û vekir. Vê weşê serheng nava çavên wêda şabûn û heta-bîke weke dunyayê dît. Ewî usa tê derxist, wekî Merzîye ji gilîyên xwe û bizavtinên xwe poşman bûye. Ew bi vê şabûnê rabû ser pîya û got:

- Axano, maqûlno, ez vê kasê eşqa Taxixan û keça wîye bedew, xweşik vedxwum. Ez şêkirdar, deyîndarê Taxixanim bona wê yekê, ew mirovekî çavtêre, her dijwariya ew bi xwe alt dike. Ez şêkirdarê Merzîye xanimême, wekî hatiye vê meclîsa me, bi hatina xweva em şakirin, meclîsa me rewş bi rewş kir. Axano, ez hîvî dikim saxîya bavê û keça wî vexwin.

Merzîye hate ser wê nêtê, gava ewa rastî serheng tê, êgoîzmek, qurebûnek wêya dihingivîne. Ev qurebûn ji hafiya wê yekê pêşta tê, wekî serheng ber wê digere. Ger ewa jîyana xwe wîra bide girêdanê, ev qurebûnê hêdî-hêdî zêde be. Wê demê ewê ber hemû tiştî bê xembe, ewê bicedîne di malda xwe bide bilindcîya, cîyê sekinî bixeyîde, ewê birke hub-hizkirin çîye?

Bona ewa jî van mitalan dîrkebe, bi bizotî vegeirî alîyê rastê, nihêrî Hellac li wê dinihêre, lema jî got:

- Hellac axa, ez dikarim bibime nivîskar?

Ewî serê xweyî rût, ber bi wê dirêj kir, ber wê temene bû û got:

- Xanim, ger hûn dixwezin bibine nivîskar, dikarin bibin.

- Hûn çi zanin, ez dikarim bibime nivîskar ?

- Ji axaftina weye gavadinê. Ji nêrînên weye derbarê meclîsêda. Gava dinê hûn tevî axaftina min û Heşterî bûn û we rîya rast girt, derbarê rewşa dunyayêda nêtên kûr gotin. Eva bilindayîke usane, ya ku bona nivîskara giringe. Hûn usa nizanibin, nivîskar xwedanê dunyake taybetîye, mirovek ji erşê ezmîne, na xêr. Yek jî bizanibe civakîya meda tu kes, tu tişt cîyê xweda nîne. Ev yek jî şîpûka civakîya meye. Hûn minra dibêjin nivîskar, lê bi rastî, ez ne nivîskarim. Nivîskar Viktor Hugo ye, Dikkênse, Drayzêre, yanê jî, yê ku, ez qellekî hezdikim Cêk Londone. Çarenûsa Cêk London taderziyêra kin biniherin xêncî zanebûnê, çandê, pêwîste nivîskar bibe xwedanê çarenûsa taybetî û bobelatan.

- Wekî usane ez tu dema nikaribim bibime nivîskar ?

- Çima ?

- Bona wê yekê, wekî hê ez nizanim şîpûk çîye ? Gava dibên şîpûk, ez meyt û tabûtê derz dikim. Mirov ber mirinê, di rewşa bolelatêda bê gav dimîne.

- Xanim, ew şîpûka gerdûnêye. Ew şîpûka heta-hetayê, ya bê dawîyêye. Wekî hûn bikaribin rêke pirseke çarenekirî, ya bona gerdûnê bigerin û çareser kirina wê derxine holê, ewê we bibe derxe

nivîskarîyê. Yek jî, gava tu diçî digihîjî kûraya mirinê û sereta wêya derz dikî, tu fem dikî, ewa ne mirine, lê pirsê emir-jîyanêye.

Razî zûr bibû hey li Merzîyeyê, Hellac dinihêrî û ser zexma qale-qala wêya heyr-hejmekar mabû. Ewî got:

- Gava dinê, wedê we Heşterîra diaxifî got, wekî Alman dixwezin hemû netewîya qir kin û netewî-gelê xwe bidine kivşê, çawa gelekî nebînyayî. We ev yek bona dunê şîpûk şêwand, wê demê bêje mîn binê, lê çima hûn nava mirinêda jîyanê digerin? Ger mirinêda, çawa hûn dibêjin, jîyan heye, lê çima almana sûckar dikin?

- Serheng, nava van mirinada cudatî heye. Dema mirov mîna kulîlkan vedidin, dema karê dîkin alman wana dikuje. Bi vêva jî ewana dixwezin bibîne xwedanê ax-milk-hebûna wana. Ca kerema xwe, nêta nezerîyên almanan, ya “şer gîgîyêna gerdûnêye”, bîr bînin. Gava mirovên gerdûnê qirkî, hebûna wê talan-tajankî mirin bi wete dibe? Ev ne mirina min gotîye, bi weteye, ev qetilkarî, bi seranser şîpûke. Lê mirina ku, mirov tê digihîjê ew him bi xuriste-tebîye, him bi felsefîye. Em jî mirina tebîyî, ya bi ecel tê kirinê diaxifin. Gotî mirina tebîyî hebe. Wekî mirina tebîyî tunebe, jîyanê bi kal-pîrava bê barkirinê, him jî ew kesana wê ezîyetê fîzîkî bikişînin.

- Hellac axa, hûn bi van nêtên xweva nêzîkî filosofên îngîlîsan dibin.

Merzîye karnîyarî Hellac bû:

- Lê çima hûn xwe nivîskar hesab nakin? Çima nivîskar ji we zêdetir zanin?

- Xanim, zanebûn tişteki dinêye, nivîsar nivîsandin tişteki mayîne. Him jî bikaribî zanebûnê, nêt-mereman bi bedewî bigihînin xwendevana, ew jî tişteki mayîne. Lê hebe, tunebe ez gotarvanim.

- Çima gotarvan, ne nivîskare?

- Xêyr.

- Wekî usane ez jî dixwezim bibime gotarvan.

- Xanim, jîyana xwe nekine bin qezîyayê. Gotarvanî kirin, ezabê dunyayêye.

- Çima hûn ji pêşekê xwe neqayîlin?

- Naha tu kes ne ji xwe, ne ji pêşekê xwe razîye.

Gale-galê, qale-qalê didomand, meclîsê jî hê şaiya xwe unda nekiribû.

Meclîsa ku, berê ber çavên Merzîyeyê bi dilêşî dihatê kivşê, lê naha axaftin û qale-qala tevî Hellac, bibû yeke bi wete. Merzîyeyê xênc xwe li vira jinek dîtibû. Ewê jinikê di oda aşxanêda ferafotik, virda, wêda dibir, dihanî.

Taxixan dûrva dît, wekî dêmê keçika wî bi kene û ewî ev şabûn bi çarenûsa wêra da girêdanê.

X X X

Pey ewlekarîya nişdarîyêra birînên Azerî zû sax bûn, cebirîn. Her tenê hewşa nexweşxanê

berbîna wî bû. Îdî belgên daran weşîya bûn, lê belgên darên çînaran mîna diravê zêr zer dikir. Carna belgên ku, bi zexma bê nava hewêda bi xerîb difirîn, ew posîde dikir. Van paşdemîya dê-bavê wî, mala wane li Tebrîzê zû-zû dikete bîrê. Ewî dixwest ji vir here Tebrîzê û Merzîyeyê jî xwera bibe. Ewî seh dikir, wekî naha nêt-ramanên wîye derbarê gêhêştin-kamilbûn, bedewîya dunya- yêda serobino bûne. Alîyê dinêda jî êşa paş-pîla ew gellekî diêşand. Ewî di hewşa nexweşxanêda giran-giran gav dida, şerfa ris avîtibû stûyê xwe, qotikên wê kiribû bin potikê netewî, hey mitale di- kir. Zikirên wî parava lêdana Kuvserî, kuştina Asa bû.

Hinekî şûnda vegerî oda nexweşxanê, çawa dibên, xwe talde kir, kaxiz û pênuş hilda, wekî rûdîngeha leşkerîyêra namekê binivîse:

"Ez Azerî, efserê topên giran, di şerê Kurdistanê da hatime birîndarkirinê. Ez şandime nexweşxana bajêr. Vê demê qencim. Evsertî, vîj-dana min, qîret û dostîya min, ez bê gav kirim, wekî derbarê hinek kirinên serheng Asa da elame-tîya bidime we. Dema lêytênant Kuvserî di rewşa êrişêda, ser dujmin birî bû, serheng Asa bi tifinga snaypêrêva ew hilda ber mêşindarê û parava li wî da. Min neqayîlbûna xwe danê kivşê, ewî gef li min xwerin, ez dame tirsandinê. Min neqayîlbûna wî nenihêrî, ji ber ku, qîretê ez dixeniqandim û bona deynê dostîyê biqedinîm, ez çûm, wekî meytê Kuvserî bînim. Vê weşê serheng Asa fermîna gullebarandinê dide batarêyên topan, ku hêrsa şoreşvanên kurda rake û min efserê destvala bukujin,

bi wê yekêva min ji ser rîya xwe bide hildanê. Ez ji serwêrê leşkerê xwedanê destûra mezin hîvî dikim, ku pîrsa serheng Asava mijûlbin û kirinên wîye nelayîq derxine holê û wî tawanbar bidine zanînê.

Lêytênant Azerî

Ewî careke dinê name bi balkêşî xwend, qat kir, kire berkêşê. Berkêşêda du gulle hebûn. Ew gullana bijîjk pey nişdariyêra dabûne wî û bi he- nek gotibû: "Min ji piştî te gullek, lê ji aliyê pilê çepê gullek derxistîye. Ez van gullan didime te, çawa bîranîn xweyîkê". Naha Azerî herdu gullê zrêçe dabûne destên xwe. Herdu jî êpêcekî reş- bûn. Herdu jî mîna hevbûn. Lê te rind mêzekira, teyê cudatîya wana tê derxista. Cudatî di guloverî- ya wanda bû. Azerî dixwest bizanbe ji van gulla kîjan parava piştî wî ketîye, kîjan pêrava li pîlê wî xistine. Gullek dostan lêda bû, yek dujmin. Ewî gulle destê xwe da mizdayî-mizdayî, di nava odê- da, digerîya. Ewî ew rewşa anî ber çavan, çawa ew nava du şera da mabû, çavên wî reşeve hatin. Te tirê dunê ser serê wîda hilwedîşe.

Sebira wî odêda nehat, rabû derkete derva û berê xwe da nexweşxanê, hate bal bijîjkê sereke. Bijîjkê sereke yekî tijî-hurpuzî bû, qe ew ser xweda venegerî pirsî:

Bêdê - Tu çi dixwezî?

Bijîjk - Bijîjk, ez îdî qenc bûme. Hîvî dikim min ji nexweşxanê bidine derxistinê.

Vê demê bijîjk bi tena xweye giranva, bi dijwar vegerî, berê xwe da Azerî:

- Nizanim kî bû, têlê xistibû, hûn dipirsîn. Di-xwest derbarê rewşa weda hinek tiştê bizanbe. Lê çi ku, dimîne derbarê hîvîkirina weda, ezê bijîjkan bişêwirim û wera bêjim. Ber xwe nekebin.

Azerî dilê xwera ew yek derbaz kir, yeqîn Merzîyeyê têlê xistibûye. Ewê xwestîye derbarê rewşa wîda bizanibe, çi heye, çi tune, ew çawane?

Ew çend heftê bûn, ewî Merzîye ne dîtibû. Ew wedekî dirêj bû, wekî ewî gilîkî qenc, xemrevandî ne bihîstibû. Yek jî xêncî Merzîyeyê li vê derê kîyî wî heye? Kê bê serîkî wîxe... Lê ewî şaşî dikir. Yê ku bijîjkê serekera têlêxistibû, yê ku xwestibû hinek agahdarîya derheqa wîda bizanibe, ew memûrê rûdîngeha leşkerîyê bû. Ewî teme da- bû, ku çavnêrînê wî bin, hema ku, ew sax bû, pêwîste wî radestî trîbûnala leşkerîyê bikin.

Azerî vegerî odê. Nama ku, nivîsibû, ji berkêşê derxist, careke mayîn xwend. Ew hate ser wê birîyarê, wekî name tişteki zêdeye, diqewime ewa karên wî li hev piçilkîne; hema ku sax bû, bi xwe here rûdîngeha leşkerîyê, her tiştî çawa heye usa qalke.

Nişkêva rabû, hate ber neynûkê. Li rûyê xweyî kurkirî nihêrî. Ew jar bibû, vê weşê dengê hate guhê wî. Ewî bi ecêb der-dorê xwe nihêrî. Weşekê bîhîna wî çikîya, dil sîngê wî qul dikir. Êşê girte piştê. Ew ber bi roderê çû, wekî hewşa nexweşxanê binihêre, belgên daraye zer bûyî

mêzeke, vê care dengekî nas kete guhê wî. Ev deng, dengê Merzîyeyê bû. Ewê digot:

- Ew şêrda hatîye birîndar kîrnê. Navê wî Darîyûşe, paşnavê wî Azerîye, peyvîra wî lêytênante.

Azerî bi pilekanaran, bi lez dakete jêr, li ber dêrê ew Merzîye pêşberî hev sekinîn. Merzîyeyê ew dîtînê xwe şaş kir, zembîla destê wê kete erdê. Ewê guh neda wê yekê. Kincên nexweşxanêye li wî, ewa tirsand. Paşê nihêrî wekî, şayê koça xwe ji ser dêmên wî barkirîye, dewsa wê xerîbîyê, bê kesbûnê, bê bawerîyê ew nava xweda pêçane. Ewê xwe serhevda anî û herdu destên xwe bilind kir, ew hemêz kir. Serê xwe kuta sîngê wî, lê zû jî hilda. Îcar jî Azerî serê xwe kuta sîngê wê. Merzîye qe ji cîyê xwe ne livî. Weşekê awa ewana ker-lal sekinîn. Azerî porê wêyî zerîn bîn fikir, dilê wîyî bi derd-kulan dihate dermankirinê. Têlên porê wêye zirave mîna hevrmûş Azerî jîyanêra dida girêdanê. Ev keçika xweşik çavkanîya jîyana wî bû.

Merzîyeyê dîsa serê xwe kuta sîngê wî, cend deqîqe ker-lal derbaz bûn. Ewê serê xwe bilind kir û bi hizkirin got:

- Delalê min, tu çawanî?

Deng ji wî derneket. Ew xitimî bû. Ewê têderxist, wekî Azerî bê kes maye. Evê tenê bûnê ser wî bandoreke giran hîştîye. Naha ew hewcî nazîya dê-bavêye. Bi hesreteke mezin bîra wan kirîye. Eva çend sale ewî ewana nedîtine.

Rastî jî Azerî xitimî bû, lema jî hinekî dereng, bi dengekî ricav bersîva wê da:

- Ez pakim Merzîye, wekî tu nehatayî dilê minê biteqîya.

- Nizanim min kîjan pirtûkêda xwendîye, birîna ku esker distîne, ew nîşana wîye firnaxîyêye.

- Ezîza min, usane, lê gotî tu bizanibî, tu ji alîyê kêda, li kêderê birînê distînî, têyî birîndarkirinê? Şerkariya dijî deste kurdên şoreşvan, ne ewqasî mêranî, mêrxasîye.

Merzîye qe nuqî nava nêta van gilîyan nebû. Azerî durust tê derxistibû, wekî rast hatina wana, ewa mest kirîye. Çavên wê kortda çûne. Ji dêmên wê ezabkêşî dihate kivşê. Ewa hinekî bi temen dihate kivşê. Westîya bû. Bi gilîkî, ber çavên wî Merzîye hatibû guhastinê. Azerî dixwest ev guhastin gişk bi wîra girêdayîbe.

Te hew dizanibû gilîyên wîye gava dinê, wê naha fem kir û pirsî:

- Ezîzê min, çima mêrxasî jî, virda, wêda dibê? Cudatiya wan heye?

- Heye, Merzîye. Şer dikare nava du leşkeranda, nava du enîyada, nava du dewleta pêşta bê. Ne ku, dewlet rabe leşker bikişîne ser wan kesan, yên ku, çîya xwera kirine sitar, yên ku, hêzên wan neweke heve. Ev şer, şerê neheqe. Bawer bikî, dijî leşkerê meyî li Kurdistanê, 50 şoreşvanên kurdan şer dikir. Me ev yek, ji gulleba-randina wan texmîn dikir. Ewana cîyê usa dijberin şer dikin, destê mirovan nagihîje wana. Şoreşva-nên kurdan rê-dirbên çîya mîna pênc pêçiyê xwe zaniin.

Azerî bi kîn-buxs derbarê şerê neheq da qal-dikir, lê Merzîye bi nêrînê xweva ketibû nava rewşa

wîye belengaz. Ewê dixwest sedemê vê yekê bizanbe. Ewê dixwest bizanibe ev belengazî, ev çîlmisandina wî ji ewlekarîya nişdarîyêye, ji ezabê psîxolojîye, yanê ji yê fîzîkîye? Lê ditirsîya van gişkan, ji wî pirske, ji ber ku, ew ji bin kêrê derketi bû.

Ewana derbaz bûn, çûn ser nîmketa ji darekê wêda danîbûn rûniştin. Azerî gullên ku, berîya potê xweyî nexweşxanê da digerland, derxistibû û di nava destê xwe da, virda, wêda weldigerand, him jî derbarê şêrda evîndara xwera qal dikir. Xêncî qewmandinên şêr, ewî derheqa bobelata ku, hatibû serê Kuvserî, derbarê kirinên Asa, yên qilêr, yên bi mixenet, ta-derzîyêra kir. Azerî ew jî anî serzara, wekî dema nişdarîyê, ewî porên wêye zerîn anî bû ber çavan, ji wana hêz hatibû wî. Çavên Merzîyeyê li gullên destê wîda bû, guhe ser dengê wîyî ricaf bû. Merzîyê dît, wekî Azerî ji ber van gotinên xwe diricife, dengê wî dilerize, him jî naxweze ewa bi van kirina bihese. Bona Azerî ji wê rewşê dûrxê pirsî:

- Lê evan çine destê teda, tu qey dibêjî gullenin?

- Erê, ezîza min, gullene. Yek ji pişta min, yek ji pîlê minî çepê derxistine. Bijîjk-birînsaz ewana çawa xelat pêşkêşî min kirîye.

Porê Merzîyeyê bîz-bizîbûn. Ewê ew gulle ji Azerî stend. Ew gulla mîna bindeqê bûn. Vê weşê ewê xwest Azerî maçke û bi wê yekêva êşa gullên bedena wî bi carekêva bide derxistinê. Lê şerm kir. Dewsa wê yekê, ewê herdu gulle birine ser lêvên

xwe. Gulle lêvên xweva guvaşt. Saraya zreçê lêvên wêva zeliqîn. Bîna yodê hate pozê wê.

Bona hizkirîna xwe ber bi wê bide kivşê, Azerî ew hemêz kir. Serê xwe danî ser pîlê wê. Porê wêyî zerîn qevz kir, ser hev, ser hev çendî çend cara ewa maç kir. Dilê wî hêmîn, hêmîn bû. Te hew dizanibû êşa ewlekarîya nişdarîyê hate hildanê. Paşê Azerî bi xwe jî nizanibû, çawa bû, wekî ewî, ev gilîyana reşandine ser porê wê:

- Merzîye, delala min, ez dixwezim te bibime Tebrîzê. Ez dixwezim te bi dîya xwera bikime nas. Ez dixwezim bi tera tevayî, Tebrîza ku hesreta wê dikişînim, bibînim. Ez bê te nikarim jîyana xwe, bî-nime ber çavan.

Dewsa wê yekê, wekî Merzîye biaxife, bersîva pirsên wî bide, ewê lêvên xwe herdu gullava zeliqandibû û lipitandin bi wê ne dibû. Alîkîda jî ewê xwe hetab dişewidand. Bi mitale-ramanava çû derkete Tebrîza hên, dîya Azerî hemêz kir, derbarê zaroka kurîna da, wêra çîrokeke xweşik qal kir.

Merzîyeyê birîyar kir, hetanî Azerî nexweşxanêdaye, çî ku, mala wanda qewimîye wîra tişteki nebêje. Lê Azerî ketibû şikê, ji ber ku kincên Merzîyeyê xwekirî qerçibûn, ewa kubar-kubar nîbû, ewê nêtên xwe, yên derbarê gotinê wîda, ne anî ser zara. Didît hinek qewmandinên qewmî dilê wê disotin, wana ezîyet dida wê, lê ewê derbarê wanda tişteke ne digot.

Ewî jî derbarê nama ku, wî rûdîngeha leşkerîyêra nivîsibû tu gilî ne got. Bê wê jî, qewmandin çawa qewimîbûn, ewî wêra qal kiribû.

Hewa reşevedahat. Belgên darên sipîndan, yên ku, dor bi dor hatibûne çikandinê, ber bayê payîza dereng diweşîyan. Ewana di nava bende-manîyêda, nava şayî-kovanêda bûn. Te tirê çivîkên bi ser çiqilan guh didane ser şayî û xema wan.

Merzîyeyê lêvên xwe kutabûne herdu gulla, kereker rûniştibû. Ewê dixwest bizanibe, ji van gullan kîjan parava niçikîye pişta wî, kîjan pêrava niçikîye pîlê wîyî çepê. Ewê dixwest cudatîya van herdu gullên gilover bizanibe. Lê alîyê mayînda, ewê bi xwe jî nizanibû, bona çi dixweze evan kirina bizanibe.

Îdî dereng bû. Dema ewana hatin ji hev biqetin Merzîye girîya. Dema de bi xatiran, dûmanê xwe avîte ser çavên wêye belek. Paşê ev dûman xitimî, hêdî-hêdî bû dilopên hêsiyan, li burîyan asê bûn, tevî kilên çavan bûn û ser dêmên wêye hinarîda hatine xarê. Ewê destê xwe, ji nava destên wî derxist û got:

- Min bibe Tebrîzê. Ez dixwezim wan cîwaran bibînim, li ku tu hatîye dunê.

Ewana ji hev qetîyan. Ewa digirîya. Qe girî nedihate bîra Merzîyeyê, gelo cara dawîyê kîngê girîyaye. Heta naha hêsiyê dûrî wê bûn.

Ewa ji nexweşxanê derket, kuçêra hevraz bi lez da gava. Nava destên wêda kaş-giranîya herdu gullan, li por-gulîyên wê dewsa ramûsanên Azerî ma bû.

Merzîye ji pira kevirî derbaz bû, hate hinda xasbaxçe û li wira xwest taksîyê kirêke, bigire. Ewê li wî alîyê xasbaxçe nihêrî. Wêda mirovek ber bi

alîyê wêda dihat. Ewê çirikekê li wî nihêrî û dêmên vî mirovê jarikî reşqemilî naskir. Lê tiştek ne kete bîrê. Ew kes dukulîya. Merzîye kêleka wîra derbaz bûnê, xast salamê bide wî. Lê li enîya wî zipîkên xûdanê dîtinê, zûrbû ma. Vê hewa sarda her tenê mirovê nexweş dikare xû bide.

Merzîyeyê xwe şaş kiribû. Nizanibû çi bike. Nişkêva nihêrî ew mirov vedibişire û wêya mêze dike. Her tişt kete bîra wê. Barîgeha reqasê, tangoya almana, xwekirina kincên evserîyê û Kuvserî...

Bejin-bala wî kin bibû. Pêşberî devê wî du nîvxeleqên kûr hatibûne kişandinê. Pozê wî dirêj bibû. Stuyê jar bûyî, reşdikir.

- Kuvserî! -Merzîyeyê got, -û pey wî revî.

Ew mirov cîyê xweda sekinî. Bi nêrînên sar, bi çavên kort da çûyî li Merzîyeyê nihêrî.

- Kuvserî, te ez nasnekirim?

Ewî mirovî careke dinê, navê xwe bihîstinê, xûyîdana enîya wî zêde bû. Çerm û deremên rûyê wî req bûn. Merzîyeyê bi ecêb li wî nihêrî û got:

- Axa, tu Kuvserî nînî?

- Ezim, ezim, delalê!

Ewana hatin pêşberî hev sekinîn. Xwedê dizanibû dilê wanra çi derbaz dibû.

Kuvserî sebir nekir, zû pirsî:

- Qe, Azerî çawane?

- Azerî di nexweşxanêdaye. Ew di pêşenî-yêda hatiye birîndarkirinê. Du gulle li wî ketine.

- Kîjan nexweşxanêdaye?

- Nexweşxana leşkerîyêdaye.

- Tu dikarî min bibî wira?

- Belê, dikarim. Naha ez ji wir tîm.

- Hinekî bisekine, ez bîhîna xwe bistînim. Ez jî birîndarim.

- Ez zanim, Azerî minra her tişt qal kirîye. Me hew zanibû tu mirîyî. Dema tu tîyî birîndar kirinê, Azerî diçe te bîne. Serheng Asa qesta, bi topan şoreşvanên Kurdan daye ber gulla, rika wan raki-rîye. Wana ew dane ber gullan. Gullek pêrava, yek parava li wî ketîye.

Kuvserî xar bû qayîm-qayîm çokên xwe gi-vaşt. Deremê stuyê wî tîl-tîlî bûn. Kuvserî bi dî-wêrva girtibû. Ev gilî-gotin bihîstinê, bi coşekêva ji dîwêr qetîya. Merzîyeyê dît, wekî ew litimî. Vê qa-sê keçîkek kêleka wanra derbaz bû. Çavên wê bi hêsir bûn. Ewê Kuvserî dîtinê sekinî. Ewa cîyê xwe da qerisî. Ev keçîk Fîrûze bû.

X X X

Roja binaxkirina dîya Fîrûzê-Gulpesendê Hamo xan jî hatibû. Laşê wê hewşa wanda, bin da-ra tûtêda spartine axê. Binelîyên gund, nikaribûn laşê jinikê bibine merzel, ji ber ku, esker dora gund girtibûn, kê hinekî gavê xwe virda, wêda avîtinê gulle dikirin. Refî jî, jî tanka xweye taybetî derne-diket, kî derdikete kolana dida ber gullan.

Hamo xan birîyara xweye sergirtî îdî serhevda anîbû. Naha ew firsentê digerîya, wekî bireve. Deng-hesê îzzet jî tune bû. Ew tu dema

ewqasî derengî neketibû. Çavê Fîrûzeyê li rîya bavê qerimî bû. Herro dihat xwe davîte ser tirba dê, porê xwe vediçirîya, dikire hewar-gazî, çawa dibên têre-têr digirîya, bê hiş diket. Gellek cara cîrana dihatin, ewa ji ser tirba dê hildidan dibirine mal.

Ro Fîrûzeyê nedixast ji tirba dîya xwe dûr kebe, lê şevan ji wê ditirsîya, kere-ker digirîya. Him gund, him mala wana ber çavên wê vala bibû, mîna aşekî xirab dihate kivşê. Carna evê valabûnê mîna dêwekî êrişî wê dikir. Ev vala bûn hêdî-hêdî fire dibû, Fîrûze ditirsand. Milê dinêda jî, çend rojan mala wanda mayîna Kuvserî, nava jîyana wêda rewşeke nedîtî pêşta anî bû. Ew bişkoka sorik, ya ku, ji kincê Kuvserî qetîya bû, mabû, mîna bîranînekê ewa pey xwe kaş dikir, dibir. Ev bişkok di jîyana wêda bibû surekê. Ewê ev sur ji gişkan vedişart. Ewê hey dikire axinî, ofinî çima nivîsarê nizanê? Bizanbûya wê Kuvserîra namek binivîsîya. Bi kurdî dersxanê tune bû, ewê jî bi erebî, farsî nizani-bû.

Bizanîbûya wê binivîsîya, wekî naha xêncî bavê min û te, tu kesek jîyana minda tune.

Rojekê, wedê li kolanan, li der-doran dewdoz seqirî bû, ewa jî mîna hineke dinê çû sûtê, wekî hinek nan xwera bikire. Îdî şerm dikir, wekî herro nanê cîrana dixwe. Li sûtê hinek zarên ku, rojname difrotin, dikirine qîre-qîr:

“Rûznamêyê exbar”, “Jîyana Kuvserî, ya xerîb”, “Berxwedana şervanên kurdan”, “Tanka serleşker Refîî li kolanên Senendecê”...

Evan gazîyan nehîştin lipitandin bi Fîrûzeyê bibe. Ewa cîyê xwe da sekinî. Kurukê ku, rojname difiro, hat kêleka wêra derbaz bûnê, destê rojname dirêjî wê kir. Bi henek rojname pozê wê xist û derbaz bû çû. Dîsa navên rojnaman û sernivîsarên wan bi qîre-qîr wekiland.

Ewê navê Kuvserî bihîstinê, rewşa wê hinekî tevhev bû. Paşê bişkoka-reng zerîn derxist, bi hesretî li wê nihêrî. Hema vê demê dengê pûlêmyotê hate bihîstinê. Tanga Refîî dîsa hate kivşê. Ewê gulle direşand, dîwar, derîyên girtî dida ber gullebarandinê. Fîrûze rast nava kolanêda sekinî bû, te hew dizanibû ewa hîvîya wê qetilreşan- dinêye. Vê weşê yekî Fîrûze devda û ewa hol bû, kete çelê. Ewî kesî got:

- Tu jî mîna dîya xwe dixwezî pêşîya tangê bigirî. Wexta te jî bi gulla têkine du paran, veleze erdê.

- Ez dibînim, ne korim!

Hema hinekî dengê gullan seqirînê, avtoajoyên çayxanê da rûniştî, rabûn zû maşîna sîyar bûn, ajotin.

Xortê bal Fîrûzê, çelêda veleziyayî got:

- Lêlê, rabe bireve!

- Kuda birevim?

- Rabe, maşînekê sîyarbe, bireve bajêr.

Fîrûzeyê gilîyê bajêr bihîstinê kete mitala: "Tenê li bajêr dikare bavê xwe û Kuvserî bibîne. Diqewime ewa here bajêr û ji vê bobelatê xilazbe".

Maşineke nikî wan kete çerxê. Xort ji kêleka Fîrûzeyê rabû, wekî ber bi maşinê bireve. Lê ewî dest avîte destê wê û ewana maşinê sîyar bûn.

Maşine mîna bayê birûskê, jorda dadikete rîya rast. Ewana êpêcekî çûnê şunda, avtoajo pirsî:

- Mêvanê, diçî bajêr?

Îdî avtoajo tiştê ne got. Ji neynûka fêza serê maşinê, parava nihêrî û ber xwe da got:

- Xwedê bibire, vê xizantîyê.

Hindik mabû, wekî ewana têkevîna nava bajêr, rê bi kevirên mezin birî bûn. Avtoajo hê negihîstibû wê rê birînê, serbaz nîşana "bisekine" da. Avtoajo maşinê xayî kir. Serbazekî pirsî:

- Xorto, awa kuda lezdikebî?

- Bona xizantîyê diçime bajêr.

- Qe ji papîrosa, mapîrosa çiyî te heye?

- Papîros heye, lê mapîros tune.

- Bide vira, mera papîros pêwîste.

Avtoajo ji dexila maşinê papîrosa "Yşno" derxist da serbaz.

Ji serbazan yekî got:

- Bêje wan zarên maşinêda, bila peyabin, bèn van kevira ser rê hildin, tu derbazbe, paşê dîsa wan kevira danine ser rê.

Ezîm û Fîrûze ji maşinê peya bûn. Xort çend kevir wêda holkir, lê hêza Fîrûzê negihîstê. Serbazekî dît, wekî hêza keçikê nagihîje keviran, ew wêda hat û bi kurdî got:

- Wêda here, ne tu tiştê, eva ne karê teye.

- Ne tu tişt, tu bi xweyî, hela hinek jî serda.

Serbaz pişta xwe rast kir, bi avrûyê tûj li wê nihêrî û bi rik got:

- Tê kivşê ev keça kurd, wê me buxwe!

Paşê berê xwe da avtoajo pirsî:

- Ay kîşî, (lo mêrîko), ev keçik kîye?

- Keça xûşka mine.

- Jêra bêje, bila zimanê xwe têke zikê xwe!

Fîrûzeyê tu gilî ne got. Ewa maşinê sîyar bûn, rêketin. Rêda avtoajo bi tirane gote Fîrûzeyê:

- Lêlê, keça xûşka min, vê rewşa xirabda me neke nava dijarîyan. Tu nabînî ev namerdana har bûne.

Maşin rîya çiyaye xaro-marra bi lez diçû. Wana tu gilî nedihanîne serzara. Dema gihîştine bajêr, avtoajo ji Fîrûzê pirsî:

- Keçxûşkê, tuyê kuda herî?

Ewê nizanibû çi bike, çi bêje. Weşek derbaz bû, ewê got:

- Maşinê xayîke, ezê hema vira peyabim. Zef spas!

Xort pirsî:

- Bajar mezine, bêje tuyê kuda herî, te bibimê wira.

- Hema wê li vira min çavrakîn.

Ewê awa got û ji maşinê peya bû.

X X X

...Azerî nexweşxanêda qenc bibû, lê bijîjkan destûra wî ne didan, ew derê here. Ew ketibû

şikberîyê. Rojekê du evserê bi çek hatin, ew kirine maşîneke sergirtî û birin. Ew kirine kela "serbazîyê, ya bestê". Vira wîra eyan bû, wekî kuştina serheng Asa davêjine stuyê wî.

Dest bi dadigeha bestê bibû. Azerî wê rojê diêşîya. Eşa birînên wî, nerastî, buxdanî hev alîya bûn. Ew sipîçolkî bibû.

Dadger hat, gişk rabûne ser pîya. Dadger dest kişande porê xweyî sipî, met kir, bin çavava beşterbûyan nihêrî got:

- Dadigeha besta-serbazî karê xwe didomîne. Îro, emê cezayê efsêrê li pêşenîya Kurdistanê, girtî Azerî binihêrin. Dadigeh birewnaqa rûdîngeha leşkerîyê Azerî bona wê tawanbar dike, wekî ewî rehmêtlêbûyê serheng Asa kuştîye.

Seqirtîyê der-dor hingavt. Azerî cîyê xweda quncilî ser hev. Ew gellekî nerehet bû. Dadger ev-reqên ber xwe virda, wêda kir nihêrî. Di barîgeha dadigehêda 8 kesên tapî bilind rûniştibûn. Serheng Razi jî li vira bû.

Gilî dane Azerî, ewî bi dengekî ji heqîyê hatî, got:

- Maqûlno, min nama xweye ku, wera şandîye daye kivşê, ez û Kuvserî hê li mektebêda xwendinê hevra bûne nas, bûne dost. Van paşdewîya, mirina jinêra girêdayî, di nava ruhê wîda, bi psîxî hinek guhastin pêşta hatibûn. Şêrda ewî êrişî şoreşvanê kurdan kirinê, fermandarê me, bi snaypêrêva parava li wî xist. Sedem jî ew bû, îdî ew gihîştibû xêza qelaça dujmin, şoreşvanên kurdan yanê nikarbûn li wî xin, yanê jî nedixwestin. Serheng

Asa tirsîya ew xerbend bikeve destên kurdan, ya-nê jî, ji tiştêkî mayîn tirsîya û parava ew da ber gulla snaypêrê. Evê yekê adyûtantê wî jî dikare bide kivşê. Min ev yek qetilkarî hesiband û bona şerefa efserîya xwe, ez bi fermandarê xwera ketî-me hucetê. Serheng destûr neda, ez herime hewarîya dostê xwe. Lê min nikaribû, dostê xwe birîndar li bestê bihêlim û herim şev hêmin razem. Dema ez jî qeleçê derketim, herim Kuvserî bînim, serheng birîyara gullebarandinê da topan batarêyayê. Min wê deqîqe fem kir, ku serheng qest usa dike, wekî hêrsa şoreşvanên kurdan bîne, di nava wanda coşa heyf hildanê zêdeke û min bidine ber gullan. Ê min şaşî nekiribû. Gulla ku, pêrava hatibû avîtinê li pilê min ketibû, lê gulla parava, ya ku yên me bi xwe avîtibûn, piştî min ketibû. Ez jî mîna dostê xwe Kuvserî, li erdê nava du enîyên şêrda mam.

Dadger rabû ser pîya û bi dengekî hurumî got:

- Tawanbaro, wekî qîreta teye efserîyê heye, rast bêje binê, te çawa Asa kuştîye?

- Cenab dadger, ez dîsa dibêjim, ez haj ji mirina Asa yê rehetlêbûyî tuneme. Şeva ku, rehetlêbûyî kuştine, ez giran birîndar bûm.

- Hûnê nikarbin bi van derew û kirinên xweyê xap-xapokva, pêşîra xwe ji wê qetilkariyê xilazkin. Em dikarin hemû kesê ku, vê qewmandinê rind zanin, bicivîne vira, lê ya pak ewe, hûn bi xwe hemû tiştî bêjin.

- Wekî usane, destûrê bidin, ez xwera parêzger bigirim.

- Dadigeha leşkerîyêda parêzger girtin nabe. Him jî berî mirina rehmaetlêbûyî, we culet kirîye wîra ketine hucetê, gilî-gotin li wî vegerandine. Ev jî tê hesabê çawa cînayet û teribandina rêkûpêktîyê.

- Wekî usane hûn min kuştina rehmaetlêbûyîda gunekar hesabnakin, lê di teribandina rêkûpêkîyêda.

- Belê, deqa gunekarîya weye yekê, ya teribandina rêkûpêktîyêye, ya dunda kuştina Asaye.

Serheng Razî rabû û ji dadigeh destûr stand, got:

- Min biborînîn, cenab dadger, tawanbar bona wê yekê name pêşta nivîsîye, wekî dewsa qetilkarîya xwe bide undakirinê, dadigehan bixapîne. Min di wê namêda rastî nedît.

Dadger şanî da serheng, wekî rûnê. Ev pirs bê cî bû, lê Razî dixwest xwe nîşanî Azerîke, wekî ez jî li virame. Ev jî, rêke ji dijberê xwe heyfhildanek bû.

Azerî bi kîn got:

- Belê, cenab serheng, gotî min qetilkar bikişanda ber bersivdarîyê, gunekarîyê, lê ez bi xwe kursîya gunekarîyêda rûniştîme. Bi gorîya min, gotî berî gişkan, we bi ecêb dengê xwe dijî vê neheqîyê bilindkira.

Dadger hinekî jî dengê xwe bilind kir, him jî bi rik got:

- Hûn çî dixwezin, hûn dixwezin vê dadigehêda bibine dadger û me bikişîninê ber pirsgirêkê?

Mirovên dadigehêda rûniştî kenîyan.

- Xêyr, ez ne dadgerim, lê dewkarim. Dewsa wê yekê, wekî hûn dewa min binihêrin, hûn min suckar dikin.

Hakim-dadger bi tevgera destê xwe şanî da Azerî, wekî rûnê. Azerî rûnişt. Îdî tu şikberîya Azerî nema, wekî ev dadigeh, ser rîya wî çawa dav hatîye danînê. Xêrnexwezên serheng Asa, yên berê û usa jî bona Razî bigihîje daxweza xwe, bona ew Merzîyeyê destbîne, dest avîtibûne vê qilêrîyê. Azerî hate ser wê nêtê, wekî wî ji mafê parezgerê merûm kin, ewê bi nivîsar karnîyarî elahezret bibe. Yanê na, ewê nikaribe ji vê davê xilazbe.

X X X

Serheng Razî li mêvandarîya dawîyêda nika-ribû, bi hebûna xweye weke berekê, bi gilî-gotinên şirînva, çawa dibên, dilê Merzîyeyê dest bîne. Lê bi girtina Azerî ewî şeka Merzîyeyê dida şkestandinê. Huba wî ber bi keçikê daha jî gur bibû. Bona ku, ew Merzîyeyê bistîne, hebûna xwe, heyîtiya xwe nediwêşand. Carna serheng xwe-xwera digot: "Ez daxweza xwe da heqim. Ji ber ku, hinekên salên minda, keçik stendine, lê hineka xwendevana mektebê stendine".

Serheng Razî oda karkirinêda tik-tenê rûniştibû, ketibû nava bera mitala, nava hub-hizkiri-na Merzîyeyê, nişkêva derî vebû û Taxixan bi lerizî

hate hundur. Ev hatina wî bi dilê serheng bû û pirsî:

- Taxixan, çima tu usa bi peroşî?

- Serkar, dora serê te bigerim, mal, kelmelên min girtine, dixwezin derbazî alîyê dewletê bikin. Ez hatime xwe bavêjime ber bextê te, gotî tu alîka-rîyê bidî min.

Serheng hinekî bi rik got:

Axir, çima tu nîn peleguhê xwera dibî devê xwe? Ne min çend cara tera got, were em bi şîrîkî karxanê vekin, ji karên dinê dest vekişîne. Dawî-yêda tuyê xwe roda bidî. Were em avtomobîlên almanan, yên kevin bikine destên xwe, paşê kelmelên wana û yên firinda bînine anînê, dikanekê vekin. Naha tiştên awa karê tîne.

- Ez dora serê te bigerim, tu rast dibêji. Were, tu vî malê min, ji destên van serîxiraba derxe, bide min, paşê...

Serheng nihêrî serê warîs, kejîyê ketîye destê wî, bi beşereke xweş got:

- Taxixan, tu usa bizanbe, tu ji malbeta minî. Gişk zanin ez tîm, diçime mala te. Lê tu, şuxulê te ketinê dijarîyê tîyî. Ez dixwezim rûmeta te bê bilind kirinê, pêşta herî, xanimên bajêr hetevîya xwe bi keça te bînin. Bila gişk bi tilîyan te nîşankin.

Serheng ev gilîyana çawa bavekî xemxur zara xwera bêje, şîretke, usa gote Taxixan.

- Naha ne wedê wan gilîyane, tiştê bike, malê min xilazke.

Rastî jî rewşa Taxixan giran bû , wekî kelmelên zeft kirî, nehata berdanê, ewî dikaribû mehekê jîyan derbaz kira.

Serheng rabû derbazî oda dinê bû, hat got :

- Pak, ezê îdara jandarmîyêra têlêxim, bila bêjine posta tixûb, wekî ew mal, malê mine, wê berdin.

Taxixan him bi şabûn, him bi rik vegeirî mal. Ewî hema ber şêmîkê dengê xwe avîte serê xwe û got:

- Xwedê we reş-heşke! Lo, zarên bêhişno! Bona we ez çiqasî herime ber derê vî, ber derê wî, ber wan bigirim.

Merzîyeyê zû pirtûka destê xwe wêda danî û derkete hewşê. Ewê nihêrî lêvên bavê dihejin, tê derxist ewa hêrs ketîye û lema jî xwest paşda vegere, bavê da cêra:

- Keçika bê hişa, tenê ew maye matîkê bikişînî lêvên xwe, derêyî kolanên û vê kaltîya min da, min serberjêr, bê namûs bikî!

- Axa can, çi bûye, çi qewmandinê dest daye?

- Jera mera bûye, derd-kul bûye! Tuyî sedemê hemû bedbextîya me! Ji rûyê te da, li tixûb malê min girtine, xayîkirine! Bila xwedê dewsa te, kevîrekî reş bida.

Merzîye jî hêrs ket û pirsî:

- Canim, çi bûye?

- Lê bedbextê, te xwe danîye dewsa keçê şah, lema jî ev qewmandin tene serê me! Kesî dewsa tişteki hesab nakî. Tiranê xwe li hemûya

dikî. Tu keçî. Çi destûra keça ku, bin destûra bavê-
daye, ji gilî wî derê, gura wî neke!

- Axa can, hêdîka bipeyîve, cîranê bibihîzin,
emê bê ebûr bin.

- Bila em bê ebûr bin.

- Axa can, tu bi xwe min dibî meclîsan. Ez
nikarim mirovê hiznekirî bistînim. Ez naxwezim he-
rime mêr.

- Çima tu bê serê xweyî?

Merzîyeyê serê xwe kuta dîwêr û bû îske-
îska wê, girîya Taxixan jî ber roderê sekinî bû,
xwe-xwera dikire şer, wekî çima min keçika xwe,
kire wê rewşê. Ez dijî xwestina wê dertêm. Ewî ji
hêrsa zimanê xwe, lêvên xwe dicût, wî tirê gişk dijî
wîne. Keçika wî jî, gura wî nake. Mal-dewlet jî, ji
dest diçe. Ewî gazinê xwe li çarenûsa xwe dikir.
Ewî nizanibû kêra bikebe şêr, nizanibû kîye ser
rîya wî sekinîye, nahêle di civakîyêda cîyê xweyî
bilind bigire. Ewî zanibû, wekî di mal girtinêda tilîya
serheng Razî heye. Lê nikaribû wîra tişteki bêje,
yanê tişteki bike. Lema jî ser Merzîyeyê hêrs
dibû.

Wî jî xwe bi xwe re got: "Çima min neke?"

Wî jî xwe bi xwe re got: "Çima min neke?"

Wî jî xwe bi xwe re got: "Çima min neke?"

Wî jî xwe bi xwe re got: "Çima min neke?"

XXX

Derbazkirina dadigeha eskerîyê ya duda, sê
roja şûnda destpê bû. Li vira efserên tabî bilind
beşter bibûn. Reyîsê dadigehê himberî civînên
dinê, naha hinekî nerm dipeyvîya. Şirovekirinên
Azerî, yên bi zarkî, bi nivîsar ku, kelêda, dadigehê-

da dabûn, him dadger, him pirskar bê gav kiribûn, wekî ewana kûr û dûr mitalekin. Reyîsê dadigehê qe serê xwe bilind nekir, naveroka civîna derbaz bûyî amedekarara şirovekir, paşê got:

- Sûckar di şirovekirinên xweda xwemukur hatibû, wekî ewî bona parastina dostê xwe Kuvserî, rehmaîlêbûyî serhengra ketîye hucetê, rika wî anîye. Endamên dadigehêye rêzdar jî dikarin bide ne peytandinê, wekî qewlê şêrda, kî rêkûpêka leşkerîyê diteribîne, gotî ew bê girtinê, ew sûckare.

Dadger qe awaza dengê xwe ne guhast, ev gilîyana gotin û serê xwe bilind nekir. Te qey digot, dadger bi xwe, ji van gotina bawer nedikir.

Azerî destûr stend, rabû û bi bawerî axîfî:

- Cenabî dadger, min kêlm û şirovekirinên xweda rastîya qewmandina xwemukur hatime. Lê, wekî hucet kirin dikeve nava qanûnê çawa ceza, ez ber qanûnê gunekarim. Lê wekî, sûcê dostê we tunebe, wedê emir qedandinê, parava bê lêdanê, tu kes ewê kirinê temûl nake, hûn bi xwe jî wê kirinêra qayîl nabin. Lê min bona rizma eskerîyê dengê xwe nekir, min her tenê ew yek dixwest, herim dostê xweyî birîndar hildim bînim... Yek jî, gelî axano, ez bi xwe dewkarim, lê çima ez ser kursîya sûckariyê rûniştîme? Bi gorîya min, kî ku dixweze bide peytandinê, wekî Asa ji alîyê berdes- tîna wîda hatîye kuştinê, bi wê yekêva rûmeta wîye leşkerîyê pêpes dike.

- Sûckar Azerî, nêtên te mera ne hewaskare, em piştî xwe dikutine evraqan.

-Ez ji we hîvî dikim, min bi evreqên ku, meytê serheng nihêrîne, nivîsîne, bikine nas.

Reyîsê dadgerê rind zanibû, wekî Asa dûrva hildane ber nîşanê û lêdane, kuştine. Him jî gulla ku, sîngê wî ketibû, bintara kezeva wîda mabû. Wana nedixwest bidine kivşê, wekî Asa ji alîyê dujminda hatiye kuştinê. Azerî ev yek tê derxistibû û lema şidîyayî disekinî, bi bawerî diaxifî. Ewî ew jî zanibû, bi hukumê hineka, dixwezin heyfê ji wî hildin.

Derbarê dadigehê da serheng Razî agahdari gihande Merzîyeyê. Merzîye ji vê agahîyê reşqemilî. Lê kawîtîya xwe xayî kir. Serheng Razî ew jî gihande Merzîyeyê, wekî qetilkarê serheng Asa, Azeriye? Merzîyeyê bavê xwe û serheng odêda tenê hîşt, derbazî oda xwe bû, wekî vê yekêra encamekê bivîne. Çavên wêye belek tijî hêsir bûn, ji vê derba ku, li Azerî ketibû, destên wê sar bûn, bûne mîna qeşayê. Ewê çavên xwe li odê gerand. Desta gulên ser pêşxwînê ber çavên wê çilimisîbûn.

Merzîyeyê birîyar kir, çi dibe, bila bibe, pêwîste ewa Kuvserî bibîne, her tiştî wîra bêje. Ewa hêdîka derket here, lê serheng ewa dît. Ewa jorda, ji pilekana daketinê, nişkêva sekinî, kete mitala. Bona bikaribe alîkarîyê bide Azerî girînge dest bavêje serheng. Serheng nihêrî Merzîye se-kîniye, ewa dudilî bûye, ew pilekanara bi lez dake-te jêrê, milê Merzîyeyê girt û got:

- Bi destûra we.

- Keremkin, -Marzîyeyê bê hemdê xwe, -got.

-Ez ji we hîvî dikim, min bi evreqên ku, meytê serheng nihêrîne, nivîsîne, bikine nas.

Reyîsê dadgerê rind zanibû, wekî Asa dûrva hildane ber nîşanê û lêdane, kuştine. Him jî gulla ku, sîngê wî ketibû, bintara kezeva wîda mabû. Wana nedixwest bidine kivşê, wekî Asa ji alîyê dujminda hatiye kuştinê. Azerî ev yek tê derxistibû û lema şidîyayî disekinî, bi bawerî diaxifî. Ewî ew jî zanibû, bi hukumê hineka, dixwezin heyfê ji wî hildin.

Derbarê dadigehê da serheng Razî agahdari gihande Merzîyeyê. Merzîye ji vê agahîyê reşqemilî. Lê kawîtîya xwe xayî kir. Serheng Razî ew jî gihande Merzîyeyê, wekî qetilkarê serheng Asa, Azeriye? Merzîyeyê bavê xwe û serheng odêda tenê hîşt, derbazî oda xwe bû, wekî vê yekêra encamekê bivîne. Çavên wêye belek tijî hêsir bûn, ji vê derba ku, li Azerî ketibû, destên wê sar bûn, bûne mîna qeşayê. Ewê çavên xwe li odê gerand. Desta gulên ser pêşxwînê ber çavên wê çilimisîbûn.

Merzîyeyê birîyar kir, çi dibe, bila bibe, pêwîste ewa Kuvserî bibîne, her tiştî wîra bêje. Ewa hêdîka derket here, lê serheng ewa dît. Ewa jorda, ji pilekana daketinê, nişkêva sekinî, kete mitala. Bona bikaribe alîkarîyê bide Azerî girînge dest bavêje serheng. Serheng nihêrî Merzîye se-kîniye, ewa dudilî bûye, ew pilekanara bi lez dake-te jêrê, milê Merzîyeyê girt û got:

- Bi destûra we.

- Keremkin, -Marzîyeyê bê hemdê xwe, -got.

- Xanim, posîde bûn, li rûyê weyî bedew nayê, biborînî diqewime ez şaşim.

Serheng awa got û milê wê guvaşt. Ewê dengê xwe nekir. Paşê serheng got, wekî heftekê şûnda wê meşa leşkerîyê derbazbe, lema jî ewî destê kincê nûh daye dirûnê.

-Xanim, - ew dîsa berbirî wê bû, - destûrê bidin ez wan kinca xwekim û bême dîtina we.

- Destûr, destûra weye. Ev yek bona her xanimekê serbilindayîke.

- Xanim, ez destûrê ji we dixwezim, roja ku kincê xweye nûh xwekim, bona rûmet girtina we, bêm em herine kafêkeke bajêre here rind û êvarîke bi heytehol bidine derbazkirinê.

Merzîye êmekî kete mitala û nexwest firsendê ji dest berde got:

- Erê, ev daxweza we, xweşa min jî hat.

- Spas, xanim, naha ez mirovekî dunyayêyî herî hetabim!

Serheng kete şikê, wekî yeqîn Merzîye bona malê Taxixanî girtî, bona dadigeha Azerî, usa nerm bûye, lê ewî bi xwe jî, ji vê yekê bawer nekir. Ewî ev yek him jî mêrantî, camêrtî, comertîya xweva girêda.

Merzîyeyê dil dabû ber dilê serheng, lê çî dibû, bila bibe, gotî îro ewa here mala Kuvserî û derheqa van qewmandina wîra qalke. Lema jî got:

- Axa, gotî ez li Çalhesenxanê rastî keçhevaleke xwe bêm. Ez ji te destûrê dixwezim.

- Ezê jî tera bêm. Îro tu kuda herî, ezê pey te, erdêra bixişikim.

- Serheng, - Merzîyeyê got, -zef spas, -û li wî nihêrî.

Ewana tevayî faytonekê sîyar bûn û tu kes ne axîfî. Serheng gewdê xweyî giran, ser Merzîyeyêda mêl kiribû. Ji çavên wî agir-alava şabûnê dibarî. Te tirê bîhîna porê wê, ew mest kiribû. Ewana gihîştinê Çalhesenxanê, Merzîyeyê avayê ku, sê roja berê, wê û Fîrûzeyê Kuvseryê xweva çuyî anî bûn, nas kir. Fayton li wir da xayîkirinê, ji wê peya bû, got:

- Biborînin, çend deqîqa şûnda ezê vegerim.

Ewa mîna çivîkekê ji ber çava firî, çû kete derbendekê, çend gav avît û ber derîkî sekinî û ew kuta. Ji piştî dêrî dengê hate bihîstinê:

- Hûn kê dixwezin?

Merzîyeyê dengê Fîrûzê nas kir û got:

- Fîrûze, ezim – Merzîyeme.

Fîrûzê wê deqîqe derveze vekir. Merzîyeyê hema ku, dêmê wêyî qerçimekî, reşqemilî dît, ewa hemêz kir.

- Fîrûze, -Merzîyeyê got, -ez dixwezim bi ecele Kuvserî bibînim.

Dîya Kuvserî jî, ji derge hinekî wêda sekinî bû. Merzîyeyê ewa dîtinê, ber bi wê çû, ew hemêz kir, hate rûyê wê. Dewsa wê yekê, wekî dayîkê piştî xweye kûz rast kira, ewê jî bi rûkî şa Merzîye pêşwaz kira, lê sikûmê xwe daxist, kete şikberîyê, hate dilê dê, wekî dîsa qewmandineke nebixêr hatîye serê kur.

Merzîyeyê xwe wan erda danenî, bi zarekî şîrîn got:

- Dayê, dixwezim Kuvserî bibînim, pirseke gellekî ferz heye, pêwîste wîra bêjim.

Dayîkê bi şikberî got:

- Ew ne li male, tuye çakî wî...

- Bona karekî ferz, pêwîste îro wî esse bibînim.

- Ewê sibê bê, ezê hatina te wîra bêjim, wê malda rûnê, hîvîya tebe.

- Pak, Kuvserîra bêje, bila seheta 12-a min çavrake.

Ewa dîsa xarbû, hate rûyê dayîkê û pašta vejerî, faytonê sîyar bû. Merzîyeyê nikaribû xroxî-ya xwe veşêre, him jî hîvîya pîrsa serheng nese-kinî, got:

- Em rastî hev hatin. Biborîne, em herin.

- Xanim, destûra we heye, ev nerehetbûn bona min xweşe.

Paşê serheng gote faytonajo:

- Bajo rêstorana "Bîsutûnê".

Merzîye nerehet bû. Ewê bi awakî erk got:

- Min heta naha culetîya awa nekirîye, yek jî kincên min...

Serheng qe nehîşt ewa gilîyê xwe xilazke, got:

- Emê tenê sarsarokê bixwin, derên.

- Ez bê gotina malê nikarim herim. Serheng, gotî hûn evê yekê rind derzkin.

Ewrê reş xwe avîtime ser dêmê Merzîyeyê, hat ku, dereveve. Bona neqayîlbûn, nava wanda pêşta neyê, serheng bi xweşî karnîyarî wê bû :

- Were em xasbaxçê "Pehlevî"-yêra derbaz-
bin, rewşa wêye nûhra bibine nas.

Merzîyeyê dengê xwe nekir, bê dil serê xwe
kire ber xwe.

Faytonajo rê guhast...

X X X

Carna jîyanêda qewmandînên usa, diqewi-
min mirov bawernake. Fîrûze ji maşînê peyabûnê
şûnda, êpêcekî tik-tenê nava kolanêda ma. Paşê ji
vî alî rê, derbazî wî alî rê bû. Nişkêva Xwedê ewa
rastî Kuvserî anî.

Ewê û Merzîyeyê Kuvserî anîne mala wana.
Dê-kur têr serhevda girîyanê şûnda, kur gote dê :

- Dayê, evê keçikê ez ji mirinê xilazkirime.
Bona wê tu tiştî nehêwşîne.

Fîrûze jî li qunceki malêda rûniştibû, kere-ker
digirîya. Dayîk nêzikî wê bû, hate rûyê wê û got :

- Keça min, megirî, te ku, rûmeta vî kurê minî
serberjêr destaniye, Xwedê jî zane, tu yeke hetabî.

Wê şevê jî êşa lingê xwê Kuvserî xew nekir.
Nale-nala wî Fîrûze bê gav kir, ji oda dinê rabû
hate hewarîya wî. Ewê û dê hetanî wedekî şevê çî
ji destê wan hat kirin. Av danîn, pîyê wî şûştin, birî-
na wî dû-derman kirin.

Ew hinekî seqirî. Dê çû ser cîyê xwe velezi-
ya, lê Fîrûze bintara pîyê wî rûnişt, quncilî ser hev.
Berbangê Kuvserî çavên xwe vekir, dît keçik hê
ranezaye, û gulîyên vê keçika bêkes mîna çiqil-

guşîyên dara bîyê ser pîşta wê da daliqîne. Ewî bi hizkirineke mezin got:

- Lêlê, keçîkê, kê ev dil daye te? Bila Xwedê weke dilê te, bide te.

X X X

Sibetirê, rast sehet 12-a Merzîye hate mala Kuvserî. Fîrûzê bi şerbîkê darînî mezinva, ji bîrê av dikişand. Ewê bi hesretî li Merzîyeyê nihêrî. Merzîyeyê dêrekî hêşîn xwekiribû. Porên xwe têt-têt şekiribû, hewasa mirovan wêra dihat. Fîrûze himberî wê qemilî û rengçilmisî dihate kivşê. Porê wêyî reşî sixte qirçik-qirçikî bû.

Kuvserî xwe kuta bû dîwêr û dûrva li keçikan mêze dikir. Ewî hê dûrva kêf-halê Merzîyeyê pirsî û got:

- Xêyre?

Merzîye nêzîkî wî bû, hêdîka kire piçe-piç:

- Di dadigeha leşkerîyêda dada Azerîye. Serwêrê îdara jandarma serheng Razî, dihewilî ku, Xwedê giravî qetilkarê serheng Asa Azerîye.

- Aha, wana nikaribûye menîke dinê bibînin, wekî lekê Azerîxin!

Ewana dixwezin dujmintaya xweye hên, bi kuştina Asava xilazkin, bînine dawîyê.

Wî û Merzîyeyê çend deqîqa hevra axifîn.

Îdî sebira wî nehat, xwest ji hewşê derê here. Ewî xwe dîwêrva girtibû. Destê xwe ji dîwêr kişan-

dinê, litimî hat ku, jorda bikeve. Fîrûzeyê alîkarî da wî.

Kovserî şelexî reşbelex û bûlûzekî sipî xwe kiribû. Pêşîra bilûzê wî vekirî bû. Wî porê xwe şekir bû. Ji gotinên Merzîyeyê ew reşqemilî.

Dêmen wî mina kincên li wî qercimî. Pey van gotinên ne bi xêra, ewî birîyar kir here, qewmandinên şêrda qewimî him dadigehêra, him rûdingeha leşkerîyêra binivîse. Ewî dixwest derbarê wê yekêda binivîse, wekî gava ewî êrişî ser dujmin kirîye, parava li wî dane, çawa ew ketîye destê şoreşvanên kurdan.

Ewî li ber şêmîkê ev gilî-gotinên jêrîn anî ser zara:

- Li şêrda şervanên birîndar, yên tî û birçî meydana şêrda bê alîkar dimînin, lê dema ji Têhranê efserên hêmin rûnişt "Eferîm", "her bijîn" bihîstinê, her tişt ji bîra wan diçe û ew gilîyên pesîndariyê mîna rûnê helandî laşê wan dihingivîne. Evan kûtxwera rojê carekê pesinname stendinê, serbaz, evserên bi xîret û namûs rojê çend cara tene birîndarkirinê, ewana bi xwe mixenetin, derwerin, wana davêjine stuyê welathizan.

Kuvserî nihêrî Fîrûze bi heyr-hejimkar li wî dinihêre, guhê xwe daye ser wî, ewî got:

- Kevotka çîya, lê tu çawa berbirî van kirina dibî?

Fîrûze kenîya.

- De bêje binê, kevotka çîya?

- Min, -ewê berê xwe da Merzîyeyê got, -
Kuvserî rewşeke usa giranda dîtibû, her tenê mêr-
xas dikarin giranîya usa temûlkin.

Merzîyeyê pirsî:

- Ew çi rewşêda bû?

- Ew giran birîndar bû, nava xwînêda mewicî
bû.

Guhê dîya Kuvserî ser wan bû, wêya dîsa
hêsir dibarandin.

Kuvserî karnîyarî dê û keçikan bû :

- Pêwîste herim pirskarekî bigirim, wîra
qewmandina qal kim, yanê na, wê Azerî bêşînin,
wê wî ji holê bidine rakirinê. Erê, Merzîye, tu ber
xwe nekebe.

- Hûn him nexweşîn, him birîndarin...

- Na, ez qencim, bila Fîrûze û bavê wê her
bijîn. Ewana nîbûyana Xwedê zane, wê çi bihata
serê min.

X X X

Kuçêda birîna pîyê Kuvserî usa diêşîya, te
hew zanibû, bi zexma mêkutekîva serê wî dixin.
Ewî çavên xwe gerand, wekî berbanîkî bibîne, hi-
nekî rûnê, hêmin bibe, paşê here dadigehê. Ew ser
berbanîkekî rûnişt. Feytonên bi mirovan tijî zû-zû
kêleka wîra derbaz dibûn. Êpêce wede derbaz bû.
Ewî xwest rabe here, nihêrî mirovekî bejinbilind, di
kincê kurda da, sekinîye wî mêze dike. Kuvserî
dîsa rûnişt çokên xwe mizda, paşê xwest rabe,

hindik mabû bikeve. Ew kurd wêda hat, kete milê
Kuvserî û got:

- Selam, birao, tu birîndarî, lê çima li kolana
digerî?

Kuvserî li wî nihêrî, lê ew nas nekir.

Kurd ji wî pirsî:

- Çawa bûye, tu ji gund hatî?

Kuvserî kete şikê:

- Ez li gund nebûme, hûn kîjan gundî
dibêjîn?

- Tu li mala kurd Îzzet dimayî.

Kuvserî rastî xilazkarê xwe hatibû û niqutî
dilê wî, ev Îzzete. Êşa pîya ji bîrê çû, bi şabûneke
mezin got:

- Spas, birayê Îzzet, yeqîn tu bavê
Fîrûzeyêyî. Xûşka Gulpesend...

- Belê, ew ezim.

- Spas, te ez ji bin gulle barandinê hildame,
te ez ji mirinê xilazkirime.

Paşê xwest bêje, ez jî deyîndar nemame,
keça te li mala meye, lê şerm kir, xwe ker kir.

Ewana faytonê sîyar bûn û ber bi Mîsgereba-
dê çûn. Rêva ji derd Îzzet axîfî:

- Dibên, leşker tê dora gundê me digire,
didine ber top-tifingan.

Serleşker Refîî jina mine kor dikuje. Evê hey-
fê Xwedê li erdê nahêle! Ax, kesek tune pirske:

- Lo, xulamên şah, hûn çima vî gelî qir dikin,
van mirovan çi anîye serê we?

Her ku, Îzzet qal dikir, te tirê, ruhê wî nûh dibû. Rengê wî vedibû. Rastî jî bîhîna wî fire bû, ew hinekî dêmgeş bû.

Ewî dîsa gilîyên xwe domand:

- Birao, min şev, nîvêşevê tu ji çîya anî mal, paşê çûme Xanegînê. Ji kirinên Hamo xan, ji emelê wî bêzar bibûm. Axa bona kara xwe şeran radikin, navda kasib, hejar têne kuştinê. Cîwanên bê tawan dimirin.

Kuvserî bi ecêb pirsî:

- Birayê Îzzet, tuyê bizanibî bi nêrinên te dawîya van kar-kirina wê çawabe?

- Ez zanim dawîya van kirina wê çawabe, lê nizamim. dawîya dunyayê wê çawabe.

Lêqe-leqa faytonê bû, kuçaran derbaz dibû, diçû. Îzzet dikanên duta dinihêrî û xwe-xwera digot: "Çima min jîyana xwe, ya jin-zarên xwe kirine bin qezîyayê û bi gotina Hamo xan rabûm-rûniştim? Çendî-çend cara bona çek anînê, çûme rîya hate-nehatê. Kurd bê maf, jandarman talankar, şelandinkar, erbab û axan xwînmêt".

Îzzet ji cî-warê xwe dûr ketibû, ji Hamo xan, ji tirs-qurfa wî dûr ketibû. Ewî îdî ne dixwest ber destê Hamo xan karê bike. Çarenûsa Kuvserî, yekcar ew ji Hamo xan dûr xistibû. Ewî jina xwe, keça xwe dihanî ber çavan, dilê wî agir-alavê dihingavt. Di nava vê agir-alavê da dengêkî lerizî dihate guhê wî. Ev deng, dengê xerîbîyê, dengê poşmanîyê bû. Ev deng dilda bibû kilam. Ji dilê wî, dengê kilama, ku demekê jina xwe-Gulpesendêra distira, dihat:

Tofongê-berno motekkamane,
Seggêzo-Bane getlekamane.
Lîmû, ay lîmû, lîmû ommanî,
Emşo hayem, ay lîmû can,
Lelat mehmanî.¹

Kuvserî dengê xwe nedikir û bi hewaskarîke mezin guh dida gotinên wî. Pey kilamêra Îzzet derdê xwe domand:

-Ez neketibûme pey fen-fêlên axayê kurd. Lê min rewşê nihêrînê, dît kurd rast dibêjin. Dibêjin, wekî memûrên dewletê hindik maye, dêrê jinên me derxin bibin. Mirov çiqasî dikare, mirovan rezîlke, pêpeske?

Qe tu zanî, wekî naha zîndana Kesrî-Kcarêda bêtawan 600 kurd hebsxanêdane, wana qe nadine hewaldanê. Ji ber ku ewana kurdin, ne ewana zimanê wan zanin, ne ew zimanê wan fem dikin. Çima gerekê awa be? Çima kurd ne mirovin, ne însanin?

Ew çawa binelîyê vê axê nikare dewa mafên xwe bike? Çima ewledên kurdan bê xwendin dimînin? Çima Fîrûzeyê min nexwendî bimîne? Em îzoyan nelet li axayên kurdan jî tînin. Çima? Bona wê yekê em şerdikin, xwînê dirêjin, ewana dibine xwedanê hebûnê. Hema ku ewana dibine xwedanê hebûnê, paşê radibin, dibine miro-vên

1. Tifinga "Bêrno" balgîyê meye,
Saggiz û Bane qetilkarê meye,
Ay Omanî-lîmû, îşev mêvanê teme

dewletê û destpêdikin mafê me pêpes dîkin, me dukutin, mera didine cêra.

Îzo hinekî navbirîn da axaftina xwe, îcar hate ser qewmandina Kuvserî:

- Min tu ji nava zinara derxist. Min hewzanibû tu mirîyî. Gava ez ser teda xari bûm, qirma te hil-dim, min nêhêrî tu nemirîyî. Min tu dayî pişta xwe û anî mala xwe. Rojekê min gote Hamo xan, wekî ezê mezinê we bukujim. Gişk bi min kenîyan. Ji min pirsîn:

- Tuyê çawa bukujî?

Min got, wekî pêşta ezê wera tu tiştî nebêjim. Lê ezê wî bukujim. Çima? Ji ber ku, ewî parava li te xistibû. Ew namerd bû. Min gilî dabû, ezê wî bukujim, rastî ji min ew kuşt.

Kuvserî li Îzzet nihêrî, gewrî lê ziha bû. Ême-kî zimanê wî hate girtinê. Hinekî şûnda bi ecêb pirsî:

- Tu kê dibêjî? Serheng Asa dibêjî?

- Belê, ez fermandarê we dibêjim.

- Tu çi dibêjî, Îzzet, te Asa kuştîye?

Îzzet qe zendegirtî nema, got:

- Belê, min kuştîye!

- Te ewa çawa kuşt?

- Çawa, yanê çawa? Min gotibû, ezê bukujim, min kuşt. Îdî min çawa kuştîye, kêra pêwîste?

- Na, Îzzet, dibên yên me bi xwe ew kuştine. Lema jî dixwezim bizanibim, te ewa çawa kuştîye.

- Çawa, yanê yên me. Çima ewana korin, nabînin gulle ji kîjan dûrayê li wî ketîye?

- Hema pirs di wêdaye nizanin, yanê jî na-xwezin bizanbin.

Paşê Îzzet bi hûr-gilî, çawa serheng Asa kuştibû, usa Kuvserîra mîna çîrokeke xweş qal kir.

Kuvserî qe nizanibû, jî şabûna çî bike. Êş, jana birînên xwe bîr kir.

Îzzet ker-lal serê xwe kiribû ber xwe, sekinî bû. Pozê wîyî pîjîkî jî serma hêşîn bibû. Bi lepên xweye mezine pirçva çokên xwe mizdida.

Kuvserî li çavên Îzzete westîyayî nihêrî û got:

- Naha ezê jî mizginîkê bidime te.

Îzzet qe dengê xwe ne kir, qe serê xwe jî bilind ne kir.

- Birayê Îzzet, zanî çî heye? Keça te Fîrûze li mala meye.

Îzzet çavên xwe kuta Kuvserî nihêrî. Ewî dîsa gilîyên xwe wekiland:

- Fîrûze li mala me mêvane. Naha tu bi xwe hatî. Ewa gellekî li te gerîyaye û hatiye derketîye vira.

Îzzet bê mede bersîv da:

- Fîrûze li vandra çî digere?

- Ewê bi xwe her tiştî tera bêje. Gava serbazan dora gundê we girtinê, Fîrûze li sûkê bûye. Di nava wê rev-bezêda maşinekê sîyar dibe, maşin jî tê dertê bajêr.

Çawa Kuvserî çavra dikir, Îzzet usa şa nebû. Serbarê serda Îzzet reşqemilî. Bona ku, Îzzet rind haji pirsê hebe, Kuvserî wîra qal kir, çawa wana nişkêva, li kuçê hev dîtine. Lê dîsa qerçikmekê rû-yê Îzzet venebûn.

Tarîyê erd hilçand bû, Merzîye hate mala serheng Razi. Serheng ji çavên xwe bawernekir, bi xemxurî pirsî:

- Merzîye delalê, diqewime tiştek qewimîye?

- Serheng, -Merzîye carekêva derbazî ser meremê hatina xwe bû û got, -ezê wera bi vekirî biaxîfim. Hûn gotî mal-kelmelê bavê min bidine berdanê, girtina Azerî zûtirekê bidî xitim kirinê. Bi-borînin, wekî min awa bi culet berê xwe da we. Bi-zanibin, min tu dema nikaribû van gilîyana bêjime yekî mayîn.

Serheng hinekî şaşmayî ma, paşê ewî xwe serhevda anî, got:

- Xanim, min îdî pirsî girtina malê Taxixan safîkirîye. Lê ezê nikarbim tevî karê wî qetilkarî bibim. Di vî alîda tu tişt ji destê min nayê. Tawanî-ya wî girane. Şah bi xwe heyra vî karîdaye. Ger fermaneke weye dinê heye, ez amedeme!

Êmekî seqirîyê domand, paşê serheng serda zêde kir:

- Ew qetilkarê rehmetlêbûyî Asaye. Ewî xewêda Asa gullekirîye.

- Ev yek derewe.

- Lê hûn evraq û peytandinara çi dibêjin?

- Azerî nivîsiye, wekî parava, ji alîyê yên me xwe da, Kuvserî hatiye lêdanê.

- Ewî ew bi xwe kuştîye, bi xwe jî nivîsiye, wekî rêçê undake.

- Him bi xwe kuştîye, him jî bi xwe dewa rastîyê dike? Eva ne nêzîkî hişê mirovaye.

- Xanim, wê qencbe, sibê were tevî dadigehê bibe, bi guhê xwe bibihîze, bi çavên xwe bibîne. Keremke, ev jî karta dewatnama min. Bi wê, wê we berdine barîgeha dadigehê. Ev yek ne destê min-daye, çima bona wê yekê sarayî têkeve nava me.

Serheng kart - destûrnama zerîn nivîsî û da Merzîyeyê. Ewê ew kaxez hilda, wekî qe na, ewê dûrva Azerî bibîne.

- Serheng, -Merzîyeyê bi merdane berê xwe da wî, -ez bawer dikim û dikarim bidime peytandinê, Azerî mirovekî dilpaqîş, efserekî bi şerefe. Ew tu dema nikare bibe qetilkar!

- Xanim, van gîlîya sibê dadigehêda bêje.

Serheng nihêrî ji çavên keçikê kîn, buxs dibare. Wekî di nava wanda pev ketin awa bidome, diqewime heleqetîyên wane qenc biteribe. Lema jî serheng ji cîyê xwe rabû, çû nikî Merzîyeyê rûnişt. Çavên wêye reşbelek, dêmên wêye çîleqerqaş, bîhîna gulavê raste-rast ew mest kir. Ewî xwe serhevda anî û bi dengekî bergerîyayî got:

- Merzîye, ezîza min, qe tu zanî ez çiqasî ji te hiz dikim. Nava temenê me da hinek firqî heye, lê em dikarin jîyaneke hetab derbazkin. Ez hemû qewilên tera qayîlim. Tu dixwezî ez xwe bawêjime ber pîyên te, wana maçkim?

Serheng ev gîlî gotin û ber wê çok veda. Ewî hetanî pîyên Merzîyê serê xwe berjêr kir. Merzîyeyê ev yek temûl nekir, çirpkire ser xwe rabû.

- Biborîne, -Merzîyeyê hinekî bi hêrs got, min gotî tu tiştek ji te hîvînekira. Lê rûyê min negirt, evê yekê, yekî mayîna bêjim. Ewê jî bizanibin, emê nikaribin, bibine malbeteke hetab.

- Ez bi 124 hezar pêyxemberan sond duxum, tuyê bibî yeke hetab!

- Emê nikaribin bi hetabbin, ji ber ku, ez jî yekî dinê hez dikim.

Merzîyeyê ev gilîyana bi culet anî serzara. Te hew dizanibû, ewa van gilîyan mirovekî xweyî bawerkirîra dibêje.

Serheng hinekî kete mitala, wekî çawa bersîva wê bide... Lê gellekî nekişand ew kêlimî:

- Ezîza min bizanbe, wekî tu minra hetab nebî, tuyê wîra jî hetab nebî. Hê çarenûsa wî ne eyane, paşdemîyê wê çawa bibe, tu kes nizane. Tu xwe dixapinî, heyfa te, Merzîye.

- Bila usa be, bila gotina tebe, hetabî ewe, wekî mirovê ku, tu hizdikî hetabî, diqewime...

Ewî nehîşt ewa hevoka xwe hetanî dawîyê xilazke, got:

- Merzîye, delala min, vî bajarîda gellek keç, bûk hetabîya xwe bi te tînin. Tu bi xwe nikarî, cîyê xwe bidî kivşê.

- Wedê tu yekî hez dikî, ezîyet kişandin xweşe. Hizkirîyê ku, tu paşê hez nekî, ew yeka jî xweşe. Ez natirsim.

Serheng rabû ser pîya. Pêşberî Merzîyeyê sekinî. Nihêrî, wekî li rûyê wê, ji nîşanê bergerandina gava dinê tiştek tune, ewa bi ruhê xweva bûye

eskerekî hişk-hola, amadeye mîna şûrekî her tiştî
qet-qetîke.

- Merzîye, -serheng bi dengekî hizkirî got, -
ez çavnebarîyê li te tinim. Tuyê dilê minda çawa
daxwezeke nebîrkirî bimînî. Lê bizanbe, Azerîyê jî,
bona te çawa daxwezeke her timî bimîne

Merzîye rabû, qet xatirê xwe nexwest, derî
vekir, hîşt çû.

Serheng kaskêtê xwe danî serê xwe, pey wê
derkete derva, lê ewa hîvîya wî nesekînî, da gava,
ji wir dûr ket.

XXX

Danê nîvro bû. Fîrûzeyê hewş gêzî dikir,
dayîka Kuvserî jî bi hesret vê keçîka çarenûs heva-
lîyayî mêze dikir, him jî derbarê kurê xwe da ketibû
zikir.

Nişkêva deriyê hewşê hate kutanê. Fîrûzeyê
derî vekir. Ewê bav dîtinê, çawa dibên, cîyê xwe da
bû telte qeşa. Îzzet gellekî bi posîde bû. Weşekî
şûnda, bû îske-îska Fîrûzê ji dil-kezevê girîya. Ewê
xwest bavê xwe hemêzke, serê xwe dayîne ser
sîngê wî û tere-têr bigirî, lê bavê nehîşt. Fîrûzê bi
herdu destava rûyê xwe girtibû û mîna tavîya bara-
nê, hêsir dibarandin.

Îzzet ev dîdem dîtinê kelogirî bû. Ewî xwest
evê yekê ji keçîka xwe veşêre, lê nebû. Fîrûzê bin
çavava li wî dinihêrî. Nihêrî, çavên bavê mîna ewrê
baharê tijî bûye, lêlêye hêkira bibarîne.

Îzzet ber hêsirên keçikê zeffa xwe ne anî, gavek ber bi wê avît. Fîrûzeyê ewa hemêz kir. Bavê destê xwe kişande serê wê. Keçikê destên bavê girtin, danîne ser lêvên xwe, guvaşt û serhev, serhev ramûsa. Ewê dê bîranî, tirba wêye xerîb ber çavanra derbaz kir, şîn ser şînêda anî. Ewa cara yekem bû, ewê heyr-hizkirina bavê tê derxist. Lema jî usa digirîya, te tirê hemû ava dunyayê ji çavên wê hildiştin.

X X X

Civîna dadigehê, ya sisîya, sehet 4-a destpê bibû. Merzîyeyê beqî, kart-destûrnama ku, serheng Razî da bû wê, Îzzet jî xwera derbazî barîgeha dadigehê kiribû û li cîyên cuda-cuda rûniştibûn. Te hew dizanibû, bedewîya Merzîyeyê ronahî ser ronahîyêda anîye barîgeha dadigehê. Çavên dadger û endamên dadgerê li vê keçika rengzerîn bûn. Bayê payîzêyî nerm, rodera nivcîvekirîra tijî hundur dibû. Nuxumadina ser pêşxwînê raxistî ba dikir. Ala ku, fêza serê dadger dîwarê texteva hatibû mix kirinê, dewla wê digihîşte erdê.

Pagonê Azerî derxistibûn, ew kincê efserîyê da bû.

Li rêza pêşîn gënêral Vayvîl rex Razî rûniştibû û bi balkêşî guh dida axaftina. Ewî jî bihîstibû, wekî dadigeha Azerîye, çawa dibên, balkêşîyê ew kişandibû, anîbû vîra.

Dadger rabû ser pîya û bi dengê hûrumî
karnîyarî beşterbûya bû:

- Axano, em darazdana tawanbar Azerî dido-
mînin.

Azerî rabû ser pîya. Ewî Merzîye dîtibû. Ew
ser vê yekê ecêb mabû, lê şa bibû. Hêzeke nebinî-
yayî tijî dilê wî bibû.

Dadger pirsî:

- Em jî tawanbar dipirsin, bona kîjan meremî
ewî qetil anî bû serê Asa?

- Cenabî dadger, ez vê dewkarîyê bi carekê-
va ji ser xwe wêda dikim û careke mayîn dikime
bîra we, ez ne tawanbarim, bi paşnavê min, karnî-
yarî min bin! Ez dewkarim, dema rehmetlêbûyî
kuştine, ez di nava şêrda bûm, li navberîya Xizirê,
hatibûme birîndarkirinê. Paşê ewlekarîya nişdarî-
yêra hatime derbazkirinê, ev jî ew gullene, wekî ji
tenê min derxistine.

Azerî herdu gulle ji berîya xwe derxist, bilind
kire jorê û ser axaftina xwe da zêde kir:

- Ev gullena, yek ya Îngîlîsaye, yek ya al-
manaye. Bi gullekêva yên me bi xwe, parava li min
dane, bi yekêva, pêrava şoreşvanê kurdan.

Hejeke nebînyayî di nava beşterbûya da
pêşta hat. Çend kes jî kenîyan. Gêneral Vayvîl
gilîyên Azerî, yên dawîyê rind derznekir û ji ser-
heng Razi dawa şirovekirina wan kir.

Merzîye ji şabûna lêlê bû, bifire. Ger mecal
hebûya, Merzîyeyê rabûya Azerî paçkira.

Dadger dîsa pirsî:

- Li pareskerîyêda daha kîjan dostên te hebûn?

- Ez tenê wêya dikarim bêjim, Kuvserî dostê minî herî nêzîk bû. Min bi çavên xweva dît, ew parava bi snaypêrê hate lêdanê. Ez dijî wê yekê derketim, rehmetlêbûyî ser minda hêrs bû. Ez neheq nîbûm, cara ewlîn bona wê yekê, çawa efserêk, dema Kuvser di rewşa êrişêda bû, parava li wî dan, ya duda bona wê yekê, çawa dostek, ya sisîya, çawa mirovek...

Evserekî por, rûdan sipî ji cîyê xwe rabû pirsî:

- Tawanbar, berê heleqetîyê te û rehmetlêbûyî hebû, yanê na?

- Xêyr, min cara yekemîn rehmetlêbûyî, şerda dît. Axano, bizanibin, ezê nehêlim xwîna dostê min erdê bimîne. Ezê bicedînim vê pirsê bigihînimê Derbarê¹ û ezê dewa heqîyê bikim.

Dadgeh qirîya :

- Tawanbar, bîrnekin, wekî hûn hê dadigerêdane, heta ku, şehed û evraq tune, hûn tene hesab kirinê çawa qetilkar.

- Dadgerê birêz, wekî laşê rehmetlêbûyî çavlêgerandina doxtirîyêra bê derbaz kirinê, ewê bibe bîrhana here qenc.

- Hê ew evraq destê meda tune.

1. Derbar – dergê qesra şah.

- Biborînin, lê çima hûn lez ketine? Bi gorîya min, cedandina dadigehe bê evraq, bê bîrhan bona wê yekêye, wekî hurmeta rehmetlêbûyî Asa bê kêmkirinê.

- Ew kul, -dadger bi hers got, -bi te nemaye. Tu çawa qetilkar têtî darazdanê.

- Dadgerê birêz, ez qetilkar nînim!

- Tu qetilkarî!

- Ev, dewkarîke vike-valaye!

- Her tiştê, wê li te bê peytandin!

- Ez dewa parêzgerê parastinê dikim!

Evserê ku, bal dadger rûniştibû, ber xwe da tişteke got, paşê rabû ser pîya:

- Sibê parêzgerê parastinê wê bibe alîkarê we.

Azerî bi dengekî bilind karnîyarî beşterbûya bû:

- Ez bi xwe dewkarim, lê bûme tawanbar.

- Tu qetilkarî! Te komandîr-serokê xwe kuştî-ye, ew comertî li bal te tune, wekî rabî her tiştî xwe mukurbêyî!

Ev giliyên bi rik-enir, bi tirs-xof gotî, hê devê dadger da bûn, lê gotinên jêrê ku, barîgehêda hate serzara, mirovên beşter bûyî lerizand, hej bi wan ket :

- Min serheng Asa kuştîye!

Mirovên di barîgehêda rûniştî, vegerîn piş xweva nihêrîn. Tenê Merzîyeyê piş xweva venege-rî nenihêrî, ewê çavên xwe kuta bû Azerî û zûr bibû li wî dinihêrî.

Ew deng dîsa hate wekilandinê:

- Ezim! Min Asa kuştîye! Ez dujminê wîyî pêşenîyême!

Dadgeh bi dengekî lerizî pirsî:

- Tu kîyî?

- Ez Îzzetê Mahmûdîme. Binelîyê gundê nê-zîkî Senendecême.

Ecêbê barîgeh hingavt. Gişkan li kincên wîye kurdî xwekirî, bejin-bala wî, çavên miqîm, yên bi agir-alav dinihêrîn.

Dengê Îzzet, yê ku, di navda hewar-gazî hebû, dîsa hate bihîstinê:

- Min, şêrda çawa şoreşvanek dujminê xwe kuştîye, wekî ev kirin tê hesabkirinê gunekarî, ceza bidine min, ne ku Azerî!

Merzîyeyê li serheng Razî dinihêrî. Ji çavên wîye bijiqî ecêb dibarîn.

Îzzet bi hurm-gur, bi bawerî diaxifî:

- Min filan rojê, ro cî-nivînê ku, şev Asa têda radizê hilda nîşanê...

Ewî qewmandin çawa qewimî bû, mîna çîrokeke şîrîn beşterbûyara qal kir, ev jî serda zêde kir:

- Me şoreşvana gişkan dît, çawa hatin laşê Asa birin. Eva yek, ya duda min bi van çawa dît, çawa parava Kuvseî xistin. Min Kuvserî birîndar hilda bire mala xwe. Jina min, keça min birînê Kuvserî dû-derman kirin, ew sax bû. Paşê Hamo xan bi vê kirina min hesîya... Naha Kuvserî derva sekinîye, hîvîya mine. Destûrê bidin bila ew jî bê hundur.

Heyr-hejimkarî daha jî zêde bû. Azerî ser pîya sekînî bû, hey car li Îzzet, hey car li Merzîyeyê dinihêrî.

Seqirîyê hê didomand, Azerî mîna mirovekî dunêdîtî axîfî:

- Belê, dadgerê birêz, ça kerema xwe neweke hevbûnê, dijîkarîya jîyanê mêzeke! Asa bi sitemkar gullê davêje efserekî bi namûs, xwedan şeref, giran birîndar dike, lê Îzzet, dujminê xweyî şer dibe qenc dike û careke mayîn, wî vedigerîne nava jîyanê!

Vê weşê Merzîye ji cîyê xwe rabû û bi dengê zîz got:

- Ez ber dujminê awa çok vedidim!

Dadger du cara zengil da lêdanê. Lê mirovên barîgehê ne diseqirtîn. Gişkan li vî mirovê bê xof û cangorî dinihêrîn.

Îcar dadger dengê xwe nizm kir:

- Îzzet, hîvî dikim nasnama xwe radestke. Xwe jî radestî dadîgehê bibe.

- Dadgerê birêz, tu dema nasnama min tunebûye. Lê ez bi xwe dikarim radestî dadîgerê bibim, lê...

Gişkan li Îzzet dinihêrîn. Lê Merzîye qe çavên xwe ji Azerî nedikişand.

Ji rûyê Îzzet hêminbûn, hêsbûn dibarîya. Te hew dizanibû, ew ji bin barekî giran derketîye. Dilê wî bi heqî, rastîyêva tijî bibû, lêlê bû, ji qefesê derê, bifire. Dilê wî kilam distira. Ev kilam, ne ew kilam bû, wekî faytonêda distira. Ev kilama kelê bû.

Der gorbet eger merk bêkîred bedanê men,
Aya kê kened gebr, kê dûzed kefenê men?!

Wekî ez li xerîbîyê bimirim,
Kê tirba min bikole,
Kê minra kefen bidûre?

Merzîye rabû bi gavên şidîyayî pêşta çû, bal
kursîya tawanbarîyê sekinî. Ewê hew zanibû dadi-
geh xilaz bûye. Ewê destê xwe dirêjî Azerî kir. Aze-
rî destê wê girt. Lê vê gavê du serbaz hatin, milê
wê girtin, ewa anîne cîyê wê dane rûniştandinê.

Dadger bi dengekî şikestî got:

- Dadiger hetanî sibê paşta tê xistinê.

Her tişt ber çavên Azerî mîna rengê karîbar
hate kivşê. Çavên Azerîye korta çûyî da pêlên
berêye karîbar pêldan. Barîgeh kete rengê karîbar.
Vebîşrandina wî ji rû û çavên rûniştîyan kîna heyî
da helandinê. Avayê mala wane li Tebrîzê, tayê
duda û herdu stûnên hewşêye zo, wêneyên çivî-
kên zo, yên li ser stûna neqîşkirî kete bîra Azerî.
Paşê qerçimekên rûyê apê Husêyngûlû, yên ku,
qat-qatî bibûn, nêtên wîye bi dewrêşî, yên derbarê
dunyayêda :

"Dunya bedewe. Ew tewbûnêda bedewe.
Destûra tu kesî tune ji dunyayê heyfê hilde".

Naha dunya ber çavên wî jî, di rengê
karîbardaye. Çawa payîza hewşa nexweşxanêye,
karîbar. Dunya ku, di rengê payîzêda bû, tenê niqî-
teke wê sor bû. Ew jî Stalînggrad bû, li wira altindarî

û mirin destpiçolkî hev bibûn, bona wê jî Stalînggrad sor dihate kivşê. Lema jî Merzîyeyê hê mehekê berê alêloka xweye sor ser Stalînggradê da niçikan-di bû.

X X X

28-ê meha mijdarê bû. Kuvserî kulyayî-kulyayî hatibû derketibû merzel. Li Îmamzadê, alî-yê rojava tirbeke biçûk, bê nîşan, bê berete hebû. Ew tirba Mînayê bû. Kuvserî ber wê tirbê çokveda bû, serê xwe berjêr kiribû.

Ewî keçika ku, kevîya rê sekinîbû, li wî dinihêrî û kere-ker digirîya ne dîdît. Keçikê xwe kuta bû neqewê.

Te tirê ro nikî serê çîyê bûye. Ji çîyayên bi berf bayê sar dihat û mirov diricîfî. Deste jinên çarşev lê, nêzîkî Îmamzade beravî dora tirbekê bibûn, digirîyan.

Fîrûze wêda hate ser tirba Mînayê, çok veda, girîya. Kuvserî çavên xweye bi hêsir, bi piştê destê xweva paqîş kir. Ewî milê Fîrûzyeyê girt. Te qey digot, ewana hatine xatirê xwe ji tirba Mînayê bi-xwezin.

Xelazbûna sala hezar û neh sed û çil û dudarê mehek ma bû.

Sala 1961-ê

Ahmedê Hepo - bendevê bi dûman

Dorhêla gundê me - Kamalli (nehîya Laçinê) bi bendevan hatîye girtinê, ji wan ya here bilind, balkêş, ya timê serî bi dûman, ew bendeva çîyayê "Îşiqîlî"-yê bû. Lê çima ji wedê buhurî diaxî-fim? Naha jî ew çîya, ew bendeva bi dûman, ew bede-wîya xwezayê cîyê xwedaye. Çawa bi heza-ran ewledên gelê me ji cî-warên kal-bavên xwe bêgav mane, derketine, usa jî ez.

Ji alîyê bakûr rê-dirbên vî çîyayî bi kevir, zinaran usa bi hev hatibûne pêçandinê, lipitandin bi mirovan nedibû, lê ji alîyê başûr da bi zehmetê giran derdiketî wê bilindaya sert.

Me li bereka çîyayê "Îşiqîlî"-yê salê du cara bahar didît. Baharek mîna hemû bahara wedê xwe da dihat. Lê bahara dinê mehek derbaz bûnê şûnda em şa dikir. Îdî dûman kêmbû, berf, qeşa quntarê belekîyên pêşa çîyê dihelîyan, axê xeleq-xeleq reş dikir, berfîna û bi dehan kulîlkên mayîn serên xwê bilind dikirin, dîdem, bî-na derdorên ba-hara ewlîn, tevî ya bahara nûh dibû, mirov heyr-hejmekar dihişt, mest dikir.

Naha, gava êpêce sal ser minra derbaz bûne, ne ew baharên gundê me, ne gotineke bavê min qe ji bîra min naçie. Bavê min digot, wekî xwendin jîyana mirovan da mîna baharên gundê meye. Lema jî me çar bira û du xûşka beqî keda wî, bi şêwir-rênîşandina wî xwendina bilind des-tanî.

Min 7 salîya xweda, ji pirtûka elîfbayê, hetanî sala 1990-î gellek pirtûkên dersan, yên ulmî, dîrokî, yên bedewî xwendibûn. Ev bahara xwendina mine ewlîn bû. Lê sala 1990-î gotin, deng-bes bela bû, wekî li Bakûyê bi kurdî pirtûka Ahmedê Hepo ya bi navê "Bawerî ronahî dîtiye. Bi dijarî ew destxist û bi hesretîke mezin xwend.

Wê wêda ez ketime nava wêje, dîroka gelê xwe. Ew bû bahara xwendina mine dudan.

Ez kesayet û efrandariya Ahmedê Hepo himberî çîyayê "Îşigî"-yê dikim. Ew sala 1934-a, li vî alî Erez, ber sîya çîyayê evra "Agirîyê" tê dunê, şîrînaya salên zarotîyê lê heram dikin, sala 1937-a tevî bi hezaran malbetên kurdan, malbeta wan jî tê nefîkirinê. Dibin derdixine Asîya Navîn. Pey deh salên nefîkirinê ew dixûne, mekteba navîn xilaz dike, xwendina bilînd destdîne, karên dewletêye hêleda karê dike. Endamê yekîtiya nivîskarên Azerbaycanê û yekîtiya jûrnalistên Azerbaycanê, torîvanê deh pirtûkan û gotarên bêjimar, Ahmedê Hepo timê xemxure.

Neheqiyên zemîne berbi gelê wî, astengên qewm-pismam-lêziman, dostan, nasan, nenasan bi carekêva nayê safîkirinê, nayê kêmkirinê, lema jî xemxurî, ne hêminbûn, zehmetê giran ji ser Ahmedê Hepo nayê hildanê.

Lema jî qencî, alîkarî, piştovanî, şêwirdarî timê bûne qenderên jîyana Ahmedê Hepo. Ew xwedanê bilindayîke mayîne jî. Ew bûye pêşewitî-yê gelê xwe. Bona nêta xwe makkin emê heqîkê jî bînine serzaran.

Bi serkariya Ahmedê Hepo û alîkariya hinek hevalan li Azerbaycanêda navenda çanda Kurd "Ronahî" hate vekirinê, ew bû sedirê wêyî yekemîn, li Azerbaycanêda bi Kurdî pirtûk hatîne weşandinê, bû berpirsîyarê wana, bernama zîmanê kurdî hate dayînê bû rêdaktorê wêyî sereke. Gava bi kûrayî dikevî nava efrandariya nivîskar Ahmedê Hepo dibî nîgarên hemû mîrxa-sên efirandî bi ruhê welathizîyê, şerkarî, dewkariya heq, erf-edetên gelva hatîne hilçandin, hilgirtinê.

Vira cîye navberîkê ser gotinên gotîda zêdekin. Jîyanêda minra usa li hev hat, wekî ez rê-daksîya

bernama zimanê kurdî, ya Radîoya Dewle-ta Azerbaycanêda ketime ser kar.

Ahmedê Hepo çawa berpirsîyarê vê berna-mê hemû karên rêdaksîyêra ez kirime nas, him jî hema roja ewlînda di aliyê zimînda, gotar nivîsan-dinê da, rêportaj dayînê da, hevpeyvîn hildanê da minra mamostetî kir. Ev gişk cîyê xweda. Lê min vira çi dît, bûme şehedê çi û jî çi hafi derxist?

Bûme şehedê dest emeliya nivîskar, di hemû alîya da bûme mêzekarê çap-pîvandîn, paqîşîya karê wî. Wekî ser van giska da dişewîtîya wî bê zêdekirinê, çalekî, kirinên vî xweşmêrî wê hê tew bi tewbe.

Çawa minak tiştêkê jî bînine holê. Beqî zehmetê giran, bi destî Ahmedê Hepo fonda ber-nama zimanê kurdî da, weke 300 kilam, qammiqa-mên kurdî hatîye amedekirinê. Nava wanda yên usa hene, naha bûne destneketî.

Min ji van gişka ew hafi derxist, wekî lema jî Ahmedê Hepo weke 30 sala, di rêjîma Sovêtêye hişk da, bi rûmeteke mezin, bi serfinîyazî Îdara sênzûrêda (çapemenîyê da parastina sura dewle-tê) çawa serwêrê beşeke bersîvdarda kar kiriye.

Naxwezim rex serbilîndîke bona me kurdên Azerbaycanê, ya ku nefsa Ahmedê Hepora girêdaye derbaz bim. Di nava çivakîya Azerbayca-nê da, nava nivîskar, helbestvan û rewşenbîrada rûmeta wî ser pêgaveke bilinde.

Du mînak: ya yekê. Sala 2004-a pirtûka agahdariya ensîklopêdik ya bi nave "Nivîskarên Azerbaycanê yên sedsalîya XX" ya weke hezar rûpêlî ronahî dîtiye. Wêda çîkî fire dane karkirin û efrandariya Ahmedê Hepo, çawa nivîskarê kurd.

Ya duda. Sala 2005-a girêdayî xitim bûna 50-î salîya tîlevîzor û 80 salîya radîoya dewleta Azerbaycanê,

ji nava du hezar karkaran, deste jûr-nalist bi ordên û mêdalan hatine rewakirinê, usa jî Ahmedê Hepo.

Xwendevanên rêzdar! Ev pirtûka ku, radestî we bûye, mîna kulilka berfinêye. Azerbaycanê da romana yekemîne, wekî ji zimanê Azerbaycanî bi kurdî hatîye wergerandinê. Eva cara yekemîne, wekî xwendevanê kurd romana derbarê dostîya herdu gela da, derbarê rîya şerkarîya azadarîya kurdan da, ya ewledê Azerbaycana wî alî, vî alî, wêjekarê navdar yê ku paşil-pêşil tijî derd-kule, Suhrab Tahîra dibe nas. Bila ev nebe nasîya dawîyê. Gelê me timê dostîyêra amine, em bawerin navê Tahîrê birêz wê li hemû Kurdistanê bilind-bilind bê kişandinê!

Min jîyana xweda ewqasî ew yek bihîstibû, wekî zimanê kurdî gellekî xizane, lê evê romana werger ez careke mayîn anînme ser wê nêtê bêjim:

- Gelê minî kerî-kerî bûyî, tu timê serbilind bûyî, di alîyê zimînda jî qe xeman nekşîne. Bona vê yekê, wekî zimanê te, bi dewlemendî, bi gramê-rî qe ji zimanê dercîrana paştî namîne. Her tenê bi heqîya Xwedê bêjim, yên ku xwera nivîskar, helbestvan dibêjin, weke Ahmedê Hepo biçerçirin, bona her peyvîkî biricifin zimanê me yê hemû zimanê gelê dunyayêra têkebe lecê.

Xwendevanên hêja! Qewmandinên romanê didine kivşê, wekî ewrên-reş wê bi carekêva ji ser çîyayên me bikişin! Rîya meye berbi şewq-şemalê çiqasî jî diwarbe, wê rojekê esse birq vede! Îdî yên mîna Suhraban, Ahmedan mera gazîya dostîyê, mizgînîya xêrê tînin! Wanra di efrandarîyê da serfinîyazîyê dixwezin! Bi bawerîya roja sibêye sayî ji we diqetim! De bi xatirê we!

Fexreddînê Muzaffer

N a v e r o k

- 1.Çarenûsa xerîbîyêva hilatî.....3
- 2.Beşa yekem.....7
- 3.Beşa duda.....119
- 4.Ahmedê Hepo - bendevê bi dûman.....236



PDF:

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

Tel.:

+7 918 073 48 79

